


# NUDEM

No 10 1994



Kovara Hunerî, Edebî û Çandî



## MIŞK Ú MIROV

John Steinbeck



## HÊZ Ú BEDEWIYA PÊNUSE

Mehmed Uzun



**Her çar pirtûk di nava Weşanê Nûdemê de derketine û dikarin ji navnîşana Nûdemê bêne xwestin. Her du werger liba wan bi 40 Kronî, yên din jî bi 50 Kronên Swêdîne. Ji bo aboneyên Nûdem ji sedî 10 er zantir e.**


Digel ku ev zêdeyî sed saflî ye di ser Dostoyevskî re derbas bûye jî, hê ew bi zewq û heyecan tê xwendin, berhemên wî mîna piyes li ser dik û sehneyên cihanê bi xurşî têne leyistin, ji alîyê temaşevanan ve bi balkêşî têne temâsekirin.

Sedema ku heta niha Dostoyevskî aktuelbûna xwe parastiyê ew e, ku ew ji peyvîn pûç û vala, ji gotinê tûj û sloganî dûr, lê bi gotmîn tije mane, mîna psikologekî jîr dadikeve kûraniya ruhuyeta kesan û dibe şîrîkê rebenî û perîşanîya wan.

Di Şevêن Spî de Dostoyevskî perîşanî, şerpezelî, tenêû, rebenî û evîna du mirovêñ dilpâk; Nastenkaya hivdeh saflî û xortekî bîst û şes saflî, bi hosteû tûne ziman.

Weşanxaneyâ me pirtûkxaneyâ kurdi kiriye xwedîyê vê berhema hêja.

Bi hêviya ku wê bi dilê we be...



Xelatgirê Nobelê yê 1962'an John Steinbeck, yek ji nîvîskarêñ cihanê yê bi nav û deng û xwedîyê cihekî bi rûmet e. Herciqas ew bêtür bi romana xwe The Grapes of Wrath "Tiriyêñ Xezbê" di nava xwendevanêñ kurd de tê naskirin jî, lê bêtür vê romana wî Of Mice and Men "Mîşk û Mirov" ew kiriye xwedîyê cihekî bilind û navekî gerdûnî. Mîşk û Mirov di derheqa du karkerêñ çiftlikan; Georgeê hûrûk û biaqîl û Lennieç gîrs û kêmâqîl de ye. Herdu heval ji hev naqetin, ew mîna goşt û neynûkê bi hev ve ne, her tiştên xwe bi hev re par ve dîkin, heta ew şîrîkên xewn û xeyâlên hev in jî.

E romana kurt, resimekî jiyanâ karkeran yên Amerîkaya salêñ sihî radixe ber çavan. Weşanxaneyâ me, vê romana ku derbaşî zimanê kurdi bûye, bi serbilînahî pêşkêşî xwendevanêñ kurd dike.

Ev pirtûka ku nîvîskar bi "Hêz û Bedewiya Pênuşê" navandiye, ji nîvîşen wî yên ku berê di kovar û rojnameyên kurdan de hatibûn weşandin, pêk tê. Herçiqas ev nîvîş berê hatibin weşandin jî, ez bawer im ku wê haya gelek hevwelatiyên me ji van nîvîşan tune be. Ji ber ku gelek ji van nîvîşan ji zû ve, an jî di destpêka salêñ 80 de hatine weşandin. Nîvîskar di van nîvîşareñ xwe de bi giranî li ser rewş û rola ronakbîrîn kurd diskine û di gelek waran de nêrînêñ balkêş pêşkêş dike.

Nîvîskariya Rohat digihibe salêñ wî yên zarkötîyê.


Lê xebata Rohat li deriveyî welêt bêtür kemîlî. Ji bili berpirsiyârî û endametiya re-daksiyonê hin kovarêñ kurdî, wî bêî rawestan di kovar û rojnameyên kurdan de nîvîşandiye û hê jî dinivîsîne. Herweha Rohat yek ji nîvîskarêñ kurd yê bi ber e. Wî heta niha bi kurdî û tirkî nêzîki deh pirtûkan nîvîşandiye.

Ev pirtûka ku berê hin beşen wê di kovara NÛDEM'ê de derketibûn, lêkolîneke ciðî ya tema jinan di folklorê de ye.

DI FOLKLORA  
KURDİ DE  
SERDESTİYEKE JINAN

Rohat





Xwedî û Berpirsiyarê Gişû:  
*Chief Editor*  
Firat CEWERÎ

Hejmar: 10  
Havîn: 1994

Şertên abonetiyê (salek)  
Swêd: 190 Skr.  
Welatên din 39 \$  
Postgiro: 636 36 25-2  
ISSN: 1103-1964

Wêneyên bergêñ pêş û paş:  
Ebdilrehman Kelho  
Pergala rûpelan: Nûdem


Hevkarêñ Nûdemê ( Swêd):  
Mehmed Uzun, Rohat, Zeynelabidin Zinar, Xelîl Duhokî, Mehfûz Mayî, Dilawer Mêkerî. ( Almania): Husêñ Düzen. (Norvec): Sebrî Botanî. (Austurya): Haviz Qazî. (Australia): Şahînê B. Soreklî. ( Holanda): Bedirxan Epözdemir. (Tirkiye): Cemşîd Bender.

---

**Navnîşan**  
Termo. 52  
175 77  
Järfälla/ SWEDEN  
Tel û Fax:  
8-583 564 68

## NAVEROK

- REWŞA EDEBIYATA KURDÎ / F. CEWERÎ, 3  
DÊMÊ HER EDEBIYATÊ BI PEXŞANA WÊ XUYA DIBE/  
Tosinê REŞİD, 6  
FELSEFE EVİN BI XWE YE / Şerefhan CİZİRÎ, 11  
EZ JI BER PÊŞEROJA EDEBIYATA KURDÎ NE XEMGÎN IM/  
Naci KUTLAY, 15  
EDEBIYAT DIVÊ DI NAVA XELKÊ DE BIJÎ / Şahînê Bekirê  
SOREKLÎ, 19  
PÊŞEROJA EDEBIYATA KURDÎ GİRËDAYÎ PÊŞEROJA GELÊ KURD E /  
Rojen BARNAS, 23  
EDEBIYAT JI NÛ VE AFIRANDINEKE ESTETİK E / ROHAT, 26  
EDEBIYATA KURDÎ XWE SERAST NEKİRIYE / Hesenê METÊ, 28  
HER STRANEKE KURDÎ ROMANEK E / Mahmûd BAKSÎ, 30  
ROMAN HUNERA CIVATÊN PÊŞKETÎ Ü MODERN E / Mehmed  
UZUN, 31  
DU HELBEST JI / Arjen ARÎ, 40  
RÊVINGÊ BÊNAV / Rojan H., 41  
TÊ BÎRA TE / Mervanê KELEŞ, 47  
MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN / Sebrî BOTANÎ, 50  
DU HELBEST JI / Jan DOST, 53  
PYTHAGORAS / Mustafa DÜZGÜN, 54  
SEXTIYAN / Murathan MUNGAN, Werger: Muhsin KIZILKAYA,  
M. UZUN, 57  
FESTİVALA HELBESTA KURDÎ / Heyderê OMER, 63  
MALVA SİMFONİYEKE TARİ YE / Siwan A. MUSTAFA, 71  
SÊ HELBEST JI / Necîb BALAYÎ, 76  
EZ Ú HEZ / Suut KILIÇ, 77  
AZADÎ / Kemal AKAY, 81  
MELA MENSÛRE GÊRGASÎ / Zeynelabidin ZINAR, 82  
ROJNAMEGERIYA KURDÎ / Mehfûz MAYÎ, 84  
TERORİST / M. ALÎ K., 89  
FEDÎ / ROJHAT, 94  
KARIKATORVANÊ KURD EYNAT / M. HEMO, 95  
DU KLASİKÊN BI KURDÎ / Medenî FERHO, 96  
DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTİYEKE JINAN / N. KUTLAY, 99  
SMIRNOFF / Xelîl DIHOKÎ, 104  
KURD Ú MÎTOLOJÎ / Lokman POLAT, 108  
ROMANEKE SOSYO-PSİKOLOJİK / ROHAT, 110



**Riza Topal** Bianka und Mona Lisa als kurdische Hitinnen

# REWŞA EDEBIYATA KURDÎ



---

Firat CEWERÎ

**E**m dizanin ku edebiyata kurdî ya klasîk gelekî dewlemend e. Herçiqas me berhemên Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî û hwd baş nexwendi bin jî, gava behsa edebiyata kurdî ya klasîk dibe, em dikarin bi hêsanî navêن wan bihejmérin û ji ber hebûna wan xwe di nava gel û miletên dinyayê de serbilind hîs bikin. Ev şâîrên me yên klasîk di dema xwe de ne kêmî şâîrên miletên cîrân bûne. Di aliyê bilindbûna zimên, kûraniya felsefê, form, na-verok û dûrbîniyê de, şâîrên me xurt bûn; ji ber wê yekê ye ku gava em iro jî berhemên wan dixwînin, em bi zewq dixwînin. Wê ji ber vê kûraniya wan ya felsefî be, ku Nûredîn Zaza di pêşgotina Memê Alan de Ehmedê Xanî beramberî Hegel û Marx dike û dibêje ku Xanî berî wan bi dîalektîkê

hesiya ye û felsefeyeke kûr di hunera xwe de bi kar anî ye.

Lê belê gava em edebiyata klasîk beramberî ya iro dikin, em dibînin ku em iro gelekî jar û li paş mane. Ev jarî û lipaşmayîna me, mixabin ku bi sedemên siyasi ve girêdayî ne. Di dema împeretoriya Osmanî de ziman ne qedexe bûn, milet nedihatîn înkarkirin; her mileti di hundurê sînorêن împeratoriyê de dikarîbû hunera xwe bi pêş bixista, edebiyata xwe biafiranda, bi zimanê xwe perwerdeya xwe bikira. Lê, bi avakirina Cumhûriyeta Tirkîyê re, ji berdêla ku dê êdî civat bêtir bi pêş biketa, azadî bêtir bibûya, demokrasî û bajarvanî xurttir bibûya; berevajiyê wê bû, Cumhûriyet li ser yeknetewetiyyê ava bû, perwerdeya bi

gelek zimanan dawî hat, înkarkirina hin gel û miletan dest pê kir. Bi vê yekê re, gelê kurd jî hate înkarkirin, ziman û her celeb toreya wî hate qedexe kirin.

Gava rewşa Tirkiyê weha be, rewşa ziman, edebiyat û kultura kurdî jî li ber çavan e. Ziman û edebiyat di bin sistemeke nedemokratîk de bi pêş nakeve.

Lê di gel vê jî em dibînin ku lawên kurdan li ber xwe dane, dest avêtine ziman, edebiyat û rewşenbîriya kurdî. Müsa Anter, Kemal Badîlî, Edîp Karahan, Mehmed Emîn Bozarslan hin ji wan rewşenbîrên kurdan in ku dest avêtine ziman û edebiyata kurdî, di gel pir zehmetî, girtin, îşkence û surgûnan xebatêن xwe domandine, ji me re çend berhem li dû xwe hiştine. Lê xebatêن wan mîna dilopek ji behrê bûn. Berhemên wan qedexe bûn, belavkirina wan zehmet bûn, nedigihîştin xelkê. Ji xwe gava mirov ji avakirina Cumhûriyetê û ta 1980 li edebiyata kurdî dinihîre, mirov dibîne ku bi qasî tiliyîn destekî jî, berhemên bi kurdî nehatine çapkirin.

Xuyaye ku di vê bêdengiya dirêj de, dibistana salêن sihî ya di bin serokatiya Celadet Bedir-Xan de derneketiba pêşberî me, dibû ku îro zimanê kurdî di talûkeya mirinê de bûya.

Gava li Tirkiyê kurd dihatin înkarkirin, zimanê kurdî, zimanê *tirkîn çiyayî* dihate dîtin, Celadet Bedir-Xan daket gund û bajarêن Kurdistanê, dest bi hevdana gotinan û peyvikêن kurdî kirin, dest bi weşandina kovarekê kir, di nav weşanêن kovarê de dest bi weşandina pirtûkêن bi

kurdî kir. Herweha wî gelek xort li dora xwe civandin û ew hînî nivîsandina bi kurdî kirin. Ev dibistana ku dikarîbû ji bo hemû Kurdistanê bibûya hêviyeke mezin, bi windabûna Celadet Beg re, vemirî, ew hêviya ku li ber geşbûnê bû cilmissî.

Bi vemirandina wê ekola salêن sihî re, em dibînin ku di warê xebatê li ser zimên û tevgerêن edebî de bêdengiyeke mezin çêbûye. Li Tirkiyê deng tune ye, li Sûriyê deng tune ye, ji Sovyet û Iraqê jî em bêpar in. Vê bêdengiya han heta sala 1980 ajot. Herçiqas di navbera salêن 70 û 80 de hin çîrûsk li Tirkiyê pêketin jî, dîsan kêm û bi sînor bûn. Lê pişti 1980, bi derketina kurdan ya welatên Ewrûpa re, bi xurtbûna hîsên welatperwerî û kurdayeiyê re hêdî hêdî li vir û wir, dengê nivîskaran hate bihîstin, şâîrên nû derketin, di şûna tirkî de zimanê kurdî bû zimanê me yê civakî û siyasi, me civîn û semînerên xwe bi kurdî kirin, di kongreyêن xwe de em bi kurdî peyivîn. Vê tevgera bi kurdî bêtir li Swêdê dest pê kir. Ji ber ku kurdêن ku hatin Swêdê bêtir kurdêن xwende bûn. Herçiqas di destpêka 80 de jî hin kesên tûj li hember xebatên şexsî yên şâîr û nivîskarêن kurd bi şik bûn jî, pişti demekê ew şik ji navê rabû. Gelek şoreşger û têkoşerên kurd yên ku li Tirkiyê ji kurdî bi dûr ketibûn, kurdî ji bîr kiribûn, an jî ji ber hin sedeman nedixwestin bipeyivin, li vî welaşî li xwe vege riyan, xwe zû fêrî kurdî kirin, gelekan ji wan mîna prensîp êdî bi kurdan re hew bi tirkî peyivîn; li her derê, li her civîn û civatê behsa girîngiya ziman û edebiyata

kurdi kirin. Ji xebatê van mirovan Federasyoneke komeleyên Kurdistanê ava bû, zimanê Federasyonê yê resmî bû bi kurdi; kurdên Mêrdinê, Diyarbekirê, Serhedê, yên Sûriyê, yên Êران û Iraqê di bin siya vê Federasyonê de hevdu nas kirin û xebatê xwe li ser kurdi ava kirin. Paşê jî mîna organa Federasyonê kovarek bi navê Berbangê dest bi weşanê kir, gelek şâîr û nivîskarê kurd di kovarê de nivîsandin û di nava rûpelên kovarê de munaqeşeyên li ser edebiyat, li ser ziman û hwd dest pê kir û ew jî bû sedema ku keç û xortên kurd bêtir teşwîqî nivîskariya kurdi bibin; kultura xwe, zimanê xwe, edebiyata xwe bêtir nas bikin. Xebateke mîna ya Federasyonê li Parîsê jî, bi avakirina Enstîtuya Kurdi ya Parîsê re dest pê kir. Di avakirina Enstîtuyê de navêne gelek şâîr, nivîskar û hunermendên kurd hate bihîstin, ew xebata kulturî û edebî ku di nava ya siyasi de fetisibû an jî hatibû jibîrkirin, derket pêş, kovareke bi navê Hêvî dest bi weşanê kir, di wê kovara hunerî, edebî û çandî de gelek şâîr û nivîskarê kurd nivîsandin. Ji bilî Berbang û Hêvîye gelek kovar û rojname derketin; êdî ne tenê nivîsen siyasi û ideolojîk, herweha gelek nivîsen edebî; çîrok, helbest, hevpeyvîn, lêkolîn û hwd di van kovaran de cih girtin. Herweha gelek kovarê mîzahî, kovarê zarokan, kovar û rojnameyên din, ger ne xwerû bi kurdi bûna jî, mirov di nava rûpelên wan de pêrgî çîrok, helbest û nivîsen din ên kulturî û edebî dihat.

Bi kurtî piştî salê 80 bi gelempêri li derveyî welêt û bi taybetî jî li Swêdê,


ziman û edebiyata kurdi dest bi geşbûnekê kir. Li gorî hewcedariyê vê geşbûnê weşanxaneyên kurdan hatin avakirin, ji wergerandin û çapkırına klasikên kurdi bigirin, heta edebiyata kurdên Sovyeta kevin û Iraqê jî hatin çapkırın. Di vê navê de ji vir û wir nivîskar gîhîştin, pirtûkên çîrokan çap kirin, helbest çap kirin, roman çap karin; ji edebiyata dînyayê gelek werger kirin. Yanî di hundurê deh salan de hejmara weşanxaneyên kurdan tenê li Swêdê bi ser bîstan ket, hejmara nivîskarê kurd gîhîş sihî-çilî. Ewqasî ji welêt dûr, lê bi hêviya ku wê rojekê berî rojekê vegeerin welêt, giranî dane xebata kulturî û edebî. İro bi saya serê van kurdên welatbez in ku pirtûkxaneya kurdi bûye xwedîyê bi sedan berhemên bi kurdi. Peydabûna nivîskaran, peydabûna berhemên edebî, peydabûna kovarê edebî hewcedariya munaqeşeya edebiyata kurdi û teoriya edebiyatê bi giştî anî meydanê. Me jî ji bo zelalkirina hin pirsên edebiyatê, rola rexne û rexnegiriyê, rewşa roman, çîrok û helbesta kurdi; rewşa edebiyata kurdi bi giştî ji nivîskarê kurd Tosinê Reşîd, Şerefxan Cizîrî, Nacî Kutlay, Şahînê Bekirê Soreklî, Rojen Barnas, Rohat, Hesenê Metê, Mahmûd Baksî û Mehmed Uzun pirsîn.

Ji bersivê van hevalan jî xuya dibe ku em êdî di destpêka avakirina edebiyateke kurdi ya nûjen û gerdûnî de ne.

Rûpelên Nûdemê ji bo vê pirsgirêkê vekirî ne.

Em li benda nêhîn û nivîsen we ne!...

# DÊMÊ HER EDEBIYATÊ BI PEXŞANA WÊ XUYA DIBE



Tosinê REŞÎD

**NÜDEM:** *Tu dikarî behsa dîroka edebiyata kurdên Kevnesoyetê bikî? Li ku û kijan demê edebiyata kurdî li wir ges bû? Teşwîq ji ku dihat?*

**Tosinê Reşîd:** Gava gilî tê ser edebiyata kurdên Kevnesoyetê divê em berî gişkî li ser edebiyata kurdên Ermenîstanê rawestin. Ji Ermenîstanê der çend kesan li Gurcistanê dinivîsîn, lê ew kes xelkê

Ermenîstanê bûn, li Ermenîstanê xwendibûn, berhemên xwe li Ermenîstanê çap dikirin.

Destpêka salên 30'î çend çirûşkan li Azerbeycanê jî xuya kir, lê Azeriyan bi lez û bi hovîti ew çirûşî vemirandin.

Edebiyata kurdi li Ermenîstanê ji salên 30'î dest pê kir, hema em dikarin bêjin ji ronahîştina rojnama Riya Teze (adar 1930). Ev edebiyata bi biryara partiya komunîst û hukûmeta Ermenîstanê dest pê bûye. Ji ber vê yekê jî ne ku wan mirovan dest pê kir binivîsin, ewên dayina Xwedê bi wan re bû, menîfeta wan ya nivîskariyê hebû, lê hema kî xwendin û nivîsara kurdî zanîbû, di rê û dirbêñ çapkirina pirtûkan de jêhatî bûn.

Hinek ji wan bûne bela serê edebiyata me û heyâ fro jî em nikarin ji wan bifilitin.

Vê edebiyatê ji cihê vala dest pê kir, tu pêwendiyêñ wê bi edebiyata me ya klasîk û ya wê demê re tune bû. Lewma jî nivîskarêñ wê demê ji bo xwe wek mînak edebiyatêñ ermeniyan û rûsan hildan.

Wan salan Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Wezîrê Nadîrî, Ehmedê Mirazî di nav edebiyata kurdî de cihêñ xwe girtin û berhemên xwe çap kirin.

Naveroka vê edebiyatê propoganda sosyalîzmê, jiyanâ nû û rexnekirina jiyan û erf û edetêñ kevin bû. Edebiyata kurdî wan salan bi tîpêñ laşînî çap dibû.

Bi kêm û kurtiya ve tevayî, ev edebiyata ji bo duwarojê bû bingeh. Vê rewşê heta sala 1937'an dom kir. Wê sala reş

rojnama Riya Teze û dibistanê kurdî hatin girtin, jimareke mezin ji kadroyên kurdan, di nav wan de Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Ehmedê Mirazî, Cerdûyê Gêncô avêtin girtîgehan û surgûn kirin. Pişû cenga cîhanê ya duwemîn dîsan dest bi çapkırina pirtûkên kurdî bû, li hemberî salên 30'î jimara wan çend caran kêm bûn. Ji sala 1955'an rojnama Riya Teze ji nû ve çap bû. Lî ev gişk êdî bi tûpêñ kirîlî bûn. Edebiyata kurdî li Ermenîstanê di destpêka salên 60'î de geş bû.

Şoreşa Kurdistana başvûr, ku Yekîtiya Sovyetê wê demê piştgiriya wê dikir û çapemeniya Sovyetê li scr wê pir dînivîsi, di nav kurdan de hişyarbûneke netewî, ya pir pêş de anî. Kurdên Sovyetê bi piraniya xwe ve, cara yekemîn xwe perçekî gelê kurd didîtin, Kurdistan wek niştiman, welatê xwe, yê netewî ditin. Tema Kurd û Kurdistanê cihê xwe yê hêja di nav edebiyata kurdî de girt.

Mana duwemîn jî, ew guhastinêne mezin bûn, ku di nav jiyana gelên Yekîtiya Sovyet ya berê de, piştî mirina Stalin cih girtin.

Wan salan navê nû ku hatin nav edebiyata kurdên Yekîtiya Sovyetê, ew bûn ku dixwestin ji bandûra edebiyatên biyanî rizgar bibin. Nirxên mirovatiyê û yên netewî şûna propoganda erzan û sloganên siyasî girtin.

- *Pêşketinê xwe di kîjan şaxê edebiyatê de nîşan dida? Xwendevan hebûn?*

- Kurdên Yekîtiya Sovyetê ya berê, îro

xwedîyê edebiyateke pirşax in, lê ew şaxana wek hev bi pêş ve neçûne. Ez dixwazim hinekî li ser pirsê rawestim.

Çiqasî jî nivîskarêne me yên bi nav û deng Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Eliyê Evdirehaman, Seidê İbo romanêne xwe çap kirin, çiqasî jî ew roman bi giştî ji aliyê xwendevanan ve hatin pejirandin û heta cihekî jî dikarî bêjî ne xerab bûn, lê dîsan jî ew ne anegorî pîvanêne edebî, yên rojêne me bûn. Lî çawan be jî ew bûne hîm ji bo pexşana edebiyata kurdên Sovyetê û di demeke ne dûr de divê romanêne hêja derkevin meydanê. Kesên bikaribin wan romanen binivîsin îro hene. Edebiyata me îro bi wan romanen ve avis e.

Di dereca çirokan de gavêne baş hatine avêtin, çend nimûnen baş çap bûne, lê dîsan jî îro li meydanê berhemeyeke wisan tune, ku bi giştî anegorî pîvanêne edebî, yên rojê bin. Lî em dikarin ji berhemêne nivîskarêne cihê berhemeyeke wisan derxin.

Di dereca şanogerîye de rewş wek ya romanen e. Ji salên 30'î dest pê kirî, gava li Ermenîstanê şanoya kurdî, ya dewletê hebûn, nivîskarêne kurd dest bi nivîsara piyesan kirin. Pişî girtina şanoya kurdî sala 1937'an nivîskarêne me terka nivîsandina piyesan kirin. Lî ji salên 70'î gava li Ermenîstanê (Gundê Elegezê) û li bajarê Tibilisê şanoyen kurdî verbûn, ji bo wan şanoyan piyes jî hatin nivîsandin. Çendek ji wan piyesan derketin ser dikê, baş hatin pejirandin. Lî ew yek ne ewqasî ji başiya piyesan bû, çiqasî ji hisreta kurdan bi zimanê xwe şanoyê bibînin.

Bi baweriya min di dereca helbestkariyê

de pêşketineke baş heye. Ji salên 60'î dest pê kirî, bi hinek kêmaniyêñ zimêñ ve , tevayî çend pirtûkêñ baş çap bûne. Helbesta kurdî, bi nimûnêñ xwe yên baş ve îro pirdeng û pircûre ye. Naveroka wê dewlemend e. Di nava wê de hesinêñ zêndî şûna temayêñ zêrandî û maşandî girtine. Helbestvanêñ îro dixwazin cihê xwe di nav edebiyata kurdî ya giştî de bibînin, ew dixwazin helbesta wan bibe pareke wê edebiyatê.

Lê em gerek tu caran ji bîr nekin wekî dêmê her edebiyatê berî gişkî bi pexşana wê xuya dibe. Edebiyata xurt di vê xwendîya pexşana xurt be. Eger em bi vê pîvana edebî beramberî edebiyata kurdêñ kevnosovyetê bikin ew edebiyat hê jî ji edebiyata cîhanê, ya rojêñ me bi şûn ve dimîne. Problema xwendevanan tim jî li pêşıya me bûye. Jimara mirovîn bi kurdî bixwînin tim jî kêm bû.

Hetanî dawiya salên 30'î kurd di gundêñ cihê de ser hev ( kompakt) diman. Wan salan di gundêñ kurdan de xwendin bi zimanê kurdî bû. Bi wê yekê re, bi tevayî wan salan karekî hêja hate kirin. Ji kurdan kêm mirovan xên ji kurdî zimanê mayîn zanibûn. Ev şertana gişk ji bo zêdebûna jimara xwendevanêñ edebiyata kurdî dibûn bingeh. Lê surgûn û zulma salên 30-40'î, dijwariyêñ aborî, yên salên cenga cîhanî ya duwemîn û salên piştî cengê kurd ji hev belav kirin. Hejmareke kêm ji kurdan di gundêñ kurdan de man. Ji ber ku dibistanêñ kurdî êdî nehatin vekirin, tenê di dibistanêñ gundêñ kurdan de heftê du saetan zimanê kurdî dixwendin. Di van şertan de

jimara xwendevanêñ edebiyata kurdî kêm bûn. Dîsan jî piraniya kurdan, bi xwe fêri xwendina kurdî dibûn û ji me re dibûn xwendevan. Lê bi baweriya min, gava nivîskarekî kurd pêñûsê dixe destê xwe, bi bawerî dinivîse, wekî berhemêñ wî dê rojekê li welêt bêne çapkîrin û xwendin.

- *Pîvanêñ edebî ci bûn? Rewşa rexnegiran çawan bû?*

- Pirsa pîvanêñ edebî û rexnegiriyê nexweşiya edebiyata me ya mezintir bû û wisan jî dimîne. Rojnama Riya Teze çapemeniya me ya tenê bû û gotarêñ rexnegiriyê diviya di rûpelên wê de çap bibûna. Lê ji sih û pênc salan zêdetir berpirsiyarê wê rojnameyê Mîroyê Eset bû, endamê komîta navendî, ya partiya komunîst ya Ermenîstanê bû, endamê parlamentoya Ermenîstanê bû. Wî bi temamî rê li pêşıya rexnegiriyê girtibû. Bi baweriya wî, eger gotarêñ rexnegiriyê çap bibûna, ji rojnamê û kesîtiya wî re problem dê çêbibûya. Problema edebiyata kurdî wisan jî ji wî re nebûne xem. Wî karê xwe yê şexsî di ser derd û kul û problemen edebiyata kurdî re digirtin. Ji serokatiya Ermenîstanê re mirovîn wisan dest didan û wan piştgiriya wî dikirin.

Ji bextê me re îro jî pêşewitiyêñ gelê kurd nîn in, wekî ew li her cihî bi navê kurdan dipeyivin.

Helbet carinan biryar ji jor dihatin stadin, ku bêtir guh bidine rexnegiriyê. Hingê rojname neçar dibû gotarekê, du gotaran çap bike. Lê nivîskarin wisan dihatin

rexnekirinê, ewêni ji wan ziyan tune bûn, di destêni wan de tu tişt tune bû. Pir caran ew berhemên ku dihatin rexnekirin gelekî ji yên mayîn baştir bûn. Dema rexnegiriya dilpak û objektîv tune be, pîvanêni edebîjî çenabin.

- *Em dizanin ku digel kul û kêmasiyan kurdêni Sovyetê ji xwe re zimanekî standart ava kiribûn. Îro gelek berhem bi wî zimanî û bi alfabeyleyî kîlîk hene. Lî ji ber rewşa siyasi û alfabeyleyî cihê, haya me gelek kurdan ji wan berheman tune ye. Gelo mirov dê bikaribe navê çend berheman bide, ku hem di edebiyata kurdî de, hem jî di edebiyata cîhanê de xwedîyê cihekî bin?*

- Çiqas ne pir be jî, lê berhemên wisan îro li meydanê hene; ez li vir navêni wan berheman nadim, ji ber ku navdayîn barekî giran e.

- *Carinan li hin cihan tê bîhîstîn ku hilweşandina sîistema Sovyetê ji hemû gelan bêtir ji bo kurdêni Sovyetê xerab bû. Gelo ev rast e? Ger mirov muqayesekê di navbera edebiyata kurdî ya berî hilweşandinê û piştî hilweşandinê bike, ci guherîn hene? Rewşa edebiyata kurdî niha li wir çawa ye?*

- Belê, rast e. Piştî hilweşandina sîistema Sovyetê û sertbûna pêwendiyêni navnetewî, bi milyonana mirov ji cihêni xwe bi dûr ketin. Lî eger azerî çûne Azerbeycanê, ermenî çûne Ermenîstanê, alman, yunanî û neteweyêni mayîn çûne

welatêni bav û kalanêni xwe, dewletêni wan li wan xwedî deketin, kurd li meydanê bê xwedî man.

Bi sed hezaran kurd bûne penaber, ew bi zorê ji malêni wan hatin derxistin, malêni gelekan hatine şewitandin, lê heta îro ji kesek li wan nebûye xwedî, rêxistinêni navnetewî bi pirsa wan ve mijûl nabin, heta mafê penaberiyê jî nadine wan. Di vê rewşê de pirsên çandî vedikşine ser plana duwemîn.

Ji ber dê ji niha û pêve alîkariya hukûmetê tune be û her kes divê berhemên xwe ji kîsê xwe açp bike, ez bawer nakim di van demêni nêzîk de dê tiştek çap bibe.

Lî dîsan jî nivîskarêni rast divê di nav problemen rojê de winda nebin û pênûsê ji destê xwe daneynin. Ew nivîskar niha bêtir nêzîkî derd û kul û armanc û daxwazêni gelê xwe bûne û divê em li benda aferandina berhemên baş bin.

- *Va ye tu jî tevlî refê nivîskarêni surgûnê bûyi. Surgûn dijwar e. Piştî şoreşa Bolşevîkan gelek nivîskarêni ku beramberî Tolstoy û Dostoyevskî bûn, ji Rûsyayê baz dan. Piraniya wan têk çûn, di nava problemen seksî û psîkolojîk defetisîn, winda bûn. Digel hezar zehmetiyan Nabokov û Nîna Berberova navêni xwe parastin. Ji bo ku nivîskarêni kurd jî bikaribin navêni xwe biparêzin û surgûnê ji bo fêda xwe bi kar bînin divê ci bikin?*

- Bi baweriya min problema me û ya nivîskarêni rûs yên ku piştî şoreşa

Bolşevîkan surgûn bûne, ne yek e. Ji bo nivîskarêñ rûs problema mezin ew bû, wekî bi carekê ve her tişt di welatê wan de wergeriya. Ew gelê ku nivîskaran ji bo wî dinivîsî, pirtûkêñ wan li meydanan dihatin şewitandin. Dixwestin jiyana xwe bi ûnternasyonalê bimeşînin.

"Em ê cîhana kevin ji binî ve hilweşînin"

Piştî şoreşa Bolşevîkan ne netê nivîskarêñ li surgûnê, lê wisan jî gelek nivîskarêñ li welêt an hatin girtin, an hatin kuştin, an winda bûn, an jî wan bi xwe, xwe kuştin.

Lê nivîskarêñ rûs, ku di van salêñ dawî de surgûn bûn, yên wek Soljenîstîn, Brodskî zanîbûn ji wan çi tê xwestin, loma ew winad nebûn.

Ya me jî wisan e. Em zanin gelê me çi ji me dixwaze. Gelê me berê xwe ji me neguhertiye. Hela di ser de ew li benda berhemên me ye. Em gerek tu caran ji bîra nekin, wekî barekî giran li ser milê me ye. Em divê gelê xwe ji bindestiya çanda gelê zordar rizgar bikin. Helbet li vir problema xwendevanan heye. Lê ez bawer im roj bi roj jimara xwendevanên me wê zêde bibe. Lê divê em tiştekî ji bîra nekin, xwendevanê rast haya wî ji edebiyata cîhanê heye, ew bi kêmanî ji bil zimanê kurdî zimanek du zimanên din jî dizane û bi wan zimanan hêsanter dixwîne. Ji ber vê jî em gereke wisan binivîsin, wekî ew xwendevan qîma xwe bi berhemên me bîne, nivîsarêñ me bipejirîne. Lê çawan be jî edebiyata baş zû an dereng xwendevanê xwe dibîne.

- Tu edebiyata kurdî bi giştî çawan dibîni? Tu hêvî heye?

- Gava pirs tê ser edebiyata kurdî, divê em ji bîra nekin, ku edebiyata me bi bêtir ji zaravayekî belav dibe. Em dibînin ku edebiyata kurdî ya bi zaravayê kurmancî di van salê dawî de gavine baş avêtiye. Eger salêñ berê ji bil kurdên Sovyetê çend nivîskaran bi kurdî dinivîsîn, (rasttir e mirov bêje çap dibûn) iro jimara wan nivîskaran geleki zêde bûye û bi sedan kes, li hemî perçen Kurdistanê û ji welêt der, dest bi nivîsandina kurdî kirine. Ev yeka eger ne iro, wê sibe berê xwe, yê hêja bide.


Tiştekî şabûnê ye, wekî pîvanêñ edebî çêdibin. Eger 10-15 sal berê li rûpelên kovarêñ kurdî bêtir helbest û çîrokêñ sist çap dibûn, ew ên sloganêñ siyasî bûn û tu pêwendiyêñ wan bi edebiyata rast re tune bûn, iro ji wan kovar û rojnama, yên baş xwe ber nivîsarêñ sist û ne hêja girtine.

Ji alî mayin ve em nikarin nebînin, wekî çiqasî jî bi dijwarî, lê em ber bi zimanekî stndart diçin, ez bi xwe iro ne mîna deh sal berê dinivîsim.

Bi baweriya min ya sereke ew e, wekî çiqas dijwarî be jî, çapemeniya kurdî li welêt ji xwe re rê dibîne. Bi saya serê vê çapemeniyê, em ê di demeke nêzîk de bibin şchedê berhemên hêja

Lê divê em tu caran ji bîr nekin, wekî tenê di şertêñ hebûna rexnegiriya xurt de edebiyata xurt dikare were meydanê.

# FELSEFE EVÎN BI XWE YE



Şerefxan CIZÎRÎ

**NÛDEM:** *Pevgirêdana edebiyatê bi felsefeyê re çi ye?*

**Şerefxan Cizîrî:** Bi kurtî mirov dikare weha bibêje; pevgirêdana civatê, dîrokê, kultur û jiyanasosyal çiqasî bi felsefê re hebe, ya edebiyatê jî ewqasî pê re heye. Felsefe jiyan bi xwe ye. Nivîsandina edebiyatê çalakiyek sosyal û

kulturî ye. Weke çalakî edebiyat hinek raman û normên estetîk tîne ziman. Di hemû babetê edebiyatê de raman, ziman û pîvanênen estetîkî têne şirovekirin. Ev pîvanênen estetîkî dikarin veşartî an jî vekirî bêne ifadekirin. Çawan bibe bila bibe, di tekstênen edebî de sîstemeke îdeolojî heye. Raxistin û ifadekirina ramanan bi awayekî estetîkî tê nivîsandin. Li ser başbûn an xerabûna estetîkî mirov dikare şirove bike. Lê kesê ku bibêje di tekstênen edebî de îdeolojî û felsefe tune, bi xwe ji edebiyat û çalakiyênen edebî tiştekî fahm nakirine. Di tekst û berhema edebî de, ji sedî sed felsefe heye, îdeolojî heye, jiyanacînayefî heye, sempâlî û antîpatî li hember bûyer û kesan heye, bilindkirin an jî biçûkkirina tipen sosyal û hwd... heye.

Li aliyê din jî tiştekî pir vekirî heye. Pirsa felsefê û pirsa metoda xebatê pir ji nêzîk ve bi hevdu ve girêdayî ne. Hilbijartîn û şirovekirina hinek mînak, bûyer û tipen sosyal di çalakiyênen edebî de, bi metoda xebatê û nêrînen felseffi ve têne xurtkirin û xemilandin. Metoda xebatê normçêkirin e. Metoda xebatê dilbijandin e. Metoda xebatê meşrûkirin an jî mehkûmkirina hinek raman, nêrîn û normên civakî ne. Metod û felsefe, bi hemû awayî pîvanênen zanyariyê li bêjingê dixe û ji nava genimê sor zîvan, qırşık û keviran derdixe. Metod û felsefe paqijiya malan dikin. Felsefe evînî ye. Lê ev evîndarî evîndariya zanyarî û paqijiye ye. Edebiyata ku bêî felsefe be, weke girara rijî ye û bi zewq nikare bê xwarin. Lê kesen ku girara rijî jî bi zewq dixwin hene!

Em dizanin ku yên çalakiyênen edebî diafîrinin mirov in û ev çalakî jî behsa

jiyana mirovî dike. Cihê ku jiyan lê hebe hilbijartin jî lê heye. Mirovê ku hilbijartinê nekin jî, di rastiyê de dîsan hinek tiştan hildibijérin. Hilbijartina bûyer, tîp û ramanan li gora metodên felsefî û hinek pîvanê estetikî têne meydanê. Ziman ji bo edebiyatê çi be, felsefe jî ew e.

Aliyekî din yê girîng jî heye ku divê bê diyarkirin; ger mirov li dîroka edebiyatê baş binihêre, ew ê çend tiştîn bingehîn ji bo me zelal bibin. Weke xetîn edebî û metod, weke têkiliyên edebiyat bi civatê re, weke edebiyata deman, weke analîzkirina tekstên edebî û hwd... Ez bi kurtasî bêjim; bi awayekî gişî edebiyatvan û nivîskarên kurd haya wan ji van problemên metod û dîroka edebiyatê tune ye. Bi zanistî li ba kurdan kes metodên Marksîstî, struktualistî, eksistensialistî, rexnegirî û hwd di berhemên edebî de bi kar nayne. Edebiyata me heya nuha ji sirovekirin û bikaranîna metodên edebî mehrûm maye. Bi raya min ev yeka kêmasiyeke pir mezin e û divê zû bê çareserkirin.

- *Marksizm bi perspektîveke çawan li edebiyatê dînihêre?*

- Bi raya min pîvan û çavkanî divê Marks û Engels bi xwe bin. Pir caran kesên weke Zdanov, Stalin an jî hinek serok li vî alî û wî alî li ser navê Marks û Engels, di warê edebiyat û huner de dîtinan pêşkêş dikin. Lê di rastiya xwe de têkiliyên van dîtin û ramanan bi Marksizmê re tune ne.

Teoriyeke Marks û Engels ya bi taybetî heye; materyalîzma dîrokî. Li gora vê teoriyê, civat ji du beşan pêk tê, avaniya

binî û avaniya jorîn. Avaniya binî, bi taybetî çalakiyêن ekonomîk û pêşketina maddî ye. Avaniya jorîn jî bi gişî ji çalakiyêن ramanî, hunerî, huquqî, ideolojî, kulturî û hwd pêk tê.

Edebiyat û huner beşek ji avaniya jorî ye. Bi guherandina avaniya binî avaniya jorîn jî tê guherandin. Di navbera avaniya jorîn û avaniya jêrin de danûstandinek diyalektikî heye. Herdu avanî jî tesîrê li hevdu dîkin. Tesîrê ku binî li jorîn dike, ji tesîra ku jorîn li binî dike qalindit, xurttir û mezintir e... Avaniya jorîn tu carî ne pasîf e.

Pir caran li ser navê materyalîzma dîrokî dîtinêñ çewt hatine parastin. Nezanê çepan weha gotine; Avaniya binî bi hemû awayî avaniya jorîn li gora xwe tekûz dike. Edebiyat û huner jî para xwe ji vê yekê digire. Lê li gora dîtinêñ Marks û Engels di navbera avaniya binî û edebiyat û hunerê de danûstandineke asîmetrik heye. Yanî pêşketin û bişkivandina edebiyat û hunerê raste rast ne girêdayî avaniya binî ye. Weke mînak, Marks huner û edebiyata Grekî ya klasik nîşan dide. Marks dibêje ku heger hunera Grekî ya klasik hîna jî di pir waran de weke berhemên mînak têne nîşandan, ev yeka otonomî û "azadiya" huner nîşan dide.

Marks û Engels di jiyana xwe de pir qîmet didan huner û edebiyatê. Li ser huner û edebiyatê dîtinê wan sîstematîk nebûn. Di hinek pirtûk, name û xebatên felsefî û ekonomî de pirsa edebiyatê û huner wana anîye ziman. Ji edebiyata klasik ya Grekî bigirin heta edebiyata hemdemî, Marks û Engels xwedîyêñ hin dîtinan bûn. Marks ji berhemên Aischylos, Goethe, Sheakspeare, Balzak, Dide-

rot, Walter Scott, Henrich Henie, Schiller û hwd agahdar bû. Nivîskarê realîzma burjuvazî li Îngîlîstanê, Fransayê, Almanayê û welatên Skandinavyayê baş nas dikirin. Marks pir berhemê Sheakspeare ji ber dizanî bûn. Balzak li ba Marks û Engels weke nivîskarekî pir hêja dihate pejirandin. Di dîtina xwe ya politîk de Sheakspeare, Goethe û Balzak kesê kevneperest bûn. Digotin ku tiştên em ji Balzak li ser civata kapîtalîstî û çîna bûrjûvazî li Fransayê fêr bûne, em tu caran ji dîrokvan, ekonomîst û statîstîkvanan fêr nebûne. Di berhema Balzak de hilwêşandin, fen û sextekariya bûrjûvazî hebû. Li ba Balzak çewsandina gundiyan hebû, ji bo peran xwe firotin hebû, qehpetiya bûrjûvazî hebû. Balzak di nivîskariya xwe de xeteke realîst dimeşand. Yanî rastî çi bû, wî ew dinivîsand.

Bi kurtî, wextê ku edebiyat û huner realîst bûna, wan dikarîbûn ji xebatê ilmî hîn bêtir zanyarî biafirandina. Gava ku Marks û Engels ji hev re name dişandin û li ser huner û edebiyatê dîtinê xwe dianîne ziman, gotinêne weke; Shaekspearîzekirin an Schillîrîzekirin bi kar dianîn. William Shaekspeare nivîskarekî îngîlîz yê navdar e û yet ji pêşkêşê realîzma edebî ye. Friedrich Schiller ji nivîskar û filosofekî alman e ku yet ji pêşkêşê romanîzma edebî ye. Shaekspearîzekirin ji bo metoda realîzma objektîf dihat bikaranîn û Schillîrîzekirin ji, ji bo metoda subjektîf û romanîk dihat bikaranîn. Marks û Engels di huner û edebiyatê de metoda realîzma objektîf diparasatin. Lê ji bo wan realîzm ne normekî abstract bû û li ser serê pêşketina dîrokî bû. Realîzma Homeros û realîzma Balzak ne weke hevdu bûn. Realîzm pêşketina dîrokî bi xwe bû û li gora dema dîrokî dihat guhertin.

Marks û Engels li ser huner û edebiyata politîk jî xwedî dîtin bûn. Ew di maneyeke teng û dogmatîk de, hergav li dijî polîtîzekirina edebiyat û hunerê derdikestin... Ma ku ne weha bûya, wê çawan Marks bikarîba Balzak û Shaekspeare bibira ba perê ezmana?!

- *Di dema Bolşevîkan de behsa edebiyata partiyê dihate kirin. Nêrîneke wilo hê jî heye. Tu di derheqa edebiyata partî an jî edebiyata îdeolojiyê de ci difikiri?*

- Bersiva vê pirsê bi bersiva yekê ve girêdayî ye. Ez hevalbendê edebiyata realîst im. Edebiyat dikare realîzma Homeros me, dikare edebiyata kurdi ya devkî be, dikare realîzma Honoré De Balzak be û dikare realîzma ku Maksîm Gorkî tîne ziman be. Baweriya min bi Marksîzmê heye û Marksîzm jî vê yekê weha dinivîsîne. Bi kurtî dîtinê Marksîstî di vê mijarê de, min di bersiva yekê de dan. Ew dîtinê han raste rast ji çavkanî û xebatê Marks û Engels hatibûn neqandin. Vêca ew kesên ku dixwazin huner û edebiyat bikevin bin bandora polîtîkaya rojê, bi raya min dîtina wan ne li ser xeteke Marksîstî ye. Eşkere ye ku ew nêrîn çewti in.

Di dema Bolşevîkan de şiroveke pir kûr û hêja li ser huner û edebiyatê hebû. Wek mînak mirov dikare navê Plechanov, Troçkî û Lunaçarskî binivîsîne. Ew dîtinê ku tu dibêjî di dema Stalîn de hatin ziman. Ev dîtin hemû Bolşevîkan nikare girê bide û ewen ku Bolşevîkan ji ber kirinê Stalîn biricimîne ew ê raste rast çewtiyê bike.

Lê di vir de divê tiştek baş bê rohnîkirin: Edebiyata parî û edebiyata îdeoloji tiştek e û edebiyata ku kesên xwedî partî û xwedî îdeoloji dinivîsin tiştekî din e. Kesên ku endamên partîyê

polîtîk bin dikarin berhemên pir hêja biafirînin. Lê endambûna nivîskaran di partîyeke polîtîk de tu caran nabe garanî ji bo berhemên hêja û hunerî. Bi raya min mirov divê antî-partî nebe. Mafê hemû cûre partîyan heye ku dîtinê xwe li ser edebiyat û hunerê program bike. Nivîskarênu ku endamên partiyê bin dikarin berhemên xwe li gora programa partiyê biafirîne. Lê belê ev tu caran nikare bibe pîvan ji bo kesên hunermend û edebiyatvan. Dema ku Bolşevîkan behsa edebiyata partiyê dikirin, wan behsa edebiyata ku ji aliyê endamên partiyê ve dihate nivîsandin dikirin. Diyar e ku mafê hemû partîyan heye ku ji endamên xwe hinek tiştan û sixletan bixwazin. Ma gelo Nûdem weke kovareke edebî û hunerî ji endamên redaksiyona xwe hinek pîvan û sixletan naxwaze?

Li ser polîtîzekirina edebiyat û hunerê dîtinê Marks û Engels hene. Di vî warî de xeta edebî ya ku bi navê "Almanya xort" û li Îngîlîstanê ji bi navê "Edebiyata bûrjûvazî" tê naskirin, weke mînak, ji bo edebiyata polîtîzekirî tê nîşandan. Ev herdu xetên edebî, heta ku ji wan dihat berhemên xwe tije sloganên polîtîk dikirin. Di berhemên edebî de ew slogan weke tiştekî pînekirî dihat xuyanîkirin. Ji ber vê yekê ji Marks û Engels ev edebiyata polîtîzekirî rexne dikirin û digotin ku divê kesê nivîskar dîtinê xwe yên polîtîk vekirî di berhemên xwe de ranexîne. Dîtinê polîtîk divê ji mantiqê bûyerê û rewşa dîrokî derkeve pêş. Kesê ku zêde giranî dide slogan û gotinê polîtîk, ji aliyê huner de zeif bûn. Li gora Marks û Engels kesên ku ji aliyê huner û edebiyatê de xurt bûna, wan daxwaziya polîtîk bi awayekî hunerî û edebî karîbûn anîbûna ziman. Yanî polîtîka nikare di şûna edebiyat û hunerê keve, lê belê hunermend û edebiyatvan bi metoda xwe dikarin

bûyerêne polîtîk raxin û bi kar bînin. Ew kesên ku zêde behsa polîtîzekirina edebiyat û hunerê dikin, ji pir aliyan de bêkêr in. Dixwazin kêmâniyênu xwe yên hunerî û edebî di bin siya sloganên polîtîk û "xeta partiyê de" veşîerin. Lê ez bawer nakim ku kesên weha tu caran, li tu welatan û li Kurdistanê ji bi ser bikevin û bibin pêşeng ji bo edebiyatê.

- *Edebiyata kurdî dikare ji edebiyata dînyayê çi fêr bibe? Berpirsiyarênu nivîskarênu kurd çi ne?*

- Edebiyata kurdî dikare ji edebiyata cîhanê pir tiştan fêr bibe. Bi raya min heta ku em edebiyata cîhanê, dîroka edebiyatê û dîroka ramanî û felsefê baş fêr nebin, em ê şâşiyêne mezin bikin. Mirov ne hewce ye ku Emerîkayê ji nû ve keşf bike, Emerîka berî 500 salî hatiye keşf kirin. Lê ku agahdarî û zanyariya kurdan li ser keşfa Emerîka tune be, bi hêsanî ew ê bikaribin Gola Wanê weke Okyanûsa di navbera Ewrûpa û Emerîkayê de nîşan bidin. Wê çaxê ew ê fereca huner û edebiyateke kûr ku li welatê me wekî pêwîstiyanan û avê ye, li paş bikeve û entegrasyona rewşenbîrê kurd bi edebiyat û zanyariya cîhanê re derbeke mezin bixwe. Îzolasyon ne alikariya bûrjûvazî ne ji alfakariya sosyalîstan dike. Tişten ku rewşenbîrê kurd ji cîhanê fêr bibin pir in. Lê ez di wê baweriyê de me ku cîhan ji dikare pir tiştan ji Kurdistanê fêr bibe. Danasandina huner û edebiyata Kurdistanê, afirandina berhemên hêja, naskirina edebiyata kurdî ya devkî û lêxwedîderketin û parastina mîrasa kulturî ya welêt, dikeve ser milêne rewşenbîrê kurd.

# EZ JI BER PÊŞEROJA EDE- BIYATA KURDÎ NE XEMGÎN IM



Naci KUTLAY

**NÜDEM:** *Di edebiyata tirkî de heta demeke dirêj munaqeşeya romana gundan û ya bajaran dihate kirin. Dibe ku ev yeka han li pêşıya edebiyata kurdî be jî. Gelo romana gundan û ya bajaran çi ye? An jî gelo di romanê de klasifikasiyoneke weha di cih de ye?*

**Naci Kutlay:** Di van 20-30 salên dawiyê de, di edebiyata Tirkî de, gelek

munaqeşeyen bi gelek alî çêbûn; wek "romana gundian" çî ye û di dema rojane de çîma awqas cî digire? Lê di van salêñ herî dawî de, em dibînin ku ev babet êdfî nayê munaqeşekirin. Li ser vê babetê gelek lêkolînêñ girambîha hatin amadekirin. Lewra, di derheqê vê pirsê de, pêwîst e ku meriv dûr-dirêj xeber bide. Bi ya min, gelek zehmet e, em niha li vir, di rûpelên Nûdem'ê yên bi sînorkirî de li ser bisekinin. Lê dîsa, kurt be jî, meriv dikare çend tiştan bêje.

Di edebiyata Tirkî de cihê romaninan, berî 1950 ewqas ne fireh bûn. Meriv dikare navêñ romanêñ ku heta wê demê hatibûn çapkirinê bi hêsanî bijmêre. Dixwazim bêjim ku jimara wan ne zêde bûn. Lê pişti nîvsedsala bîstî, pişti Şerê Dinyayê yê Duwemîn, rewşa ekonomik û civatî hate guhartin. Fîkrîn demokratik pêşta çûn û sermayedarî hemleka mezin kir, kirrîn-firotin û teknîka fabrikeyan gelekî hat guhastinê. Li Tirkiyê, heta wê demê gundi kêm dihatin bajaran û têkiliyên wan bi bazarwendiyê ve pir qels bû. Partiya ku Tirkîye idare dikir nêzîkî faşistîyê bû, ew ji erkê dûr ket û kêm be jî, serbestîke nû hat Tirkîyê. Burjûwazi jî hewcedariya karke ran bû, lewra gelek gundian berê xwe dan bajaran û hatin li wir bi cî bûn. Erdê wan têre wan nedikir, lê ev gundiyan duh, di bajarêñ nûhatî de, bûn karkerêñ bê kalîte. Gelek ji van gundiyan koç kirin çûn Ewrûpa, bi taybetî jî çûn Almanya. Di navbera 1940-1950'î de ji "Köy Enstitüleri"yan gelek xortêñ nû, hinek jî ji gundan bûn, bala civatê kişandin. Wan xwe nêzîkî "xelk"ê didîtin û di bin tesîra klasîkîn Yûnanî, edebiyata Fransiz, Ingîlîz û bi teybetî jî Rûs'an de mabûn.

Dixwestin halê gundiyan Tirkiyeyê, bi tehrekî nû ku ew hîn bûbûn, nîşan bidin û binivîsîn. Wisa jî kirin. Gelek çîrok û roman hatin nivîsandinê û di wan pirtûkan de babet gundi bûn, halê wan ï perîşanî bi tehrekî balkêş dihat qalkirinê. Gelekî jî romantîzma van guhartinê salên dawiyê tev dikirin û aliyê civatê ve hatin qebûl kirin. Kesêna paşverû û merivên ku rejîma kevn dixwestin û bûrjûwaziyê mezin ji vê guhastin hez nekirin, lê nikaribûn gelek tişû jî bikin. Bi vî tehrî "romana gundi" bû mode. Lê gelek romanen pêşketî çêbûn, ci heye, di vê navberê de "populîzm" eke gundiyyê jî xwe nîşanda. Neheqîya axan, feqîran, gundiyan, zordestiya jendirme û qaymegaman, hema hema di van hemû romanen de babeta yekemîn bû. Yê wek Yaşar Kemal, ev pirsegirekên gundiyan bi tehrekî gelekî giranbiha û hunermedi nivîsîn. Hinek ji van nivîskarê "romanen gundi", min bi xwe jî nas kirin, bi hinekan re hevaltî kir. Wek, Talip Apaydin, Fakir Baykurt, Memet Başaran, Mahmut Makal, Halil Aytekin.

Lê roman, çîrok an helbest wek neynika civatê ne, pirsên civatê nîşanî meriya didin. Ji bo wê jî, di wê demê de wek 20-30 salî, çîrokên gundi, romanen gundi dom kirin. Lê belê, êdî ev babet wek berê bala kesî nedikişand, xwendevan êdî ji van romanen têr bûbûn, mîna berê xweşik nedihat xuyanê. Ya herî mezin jî, êdî civat hatibû guhartin. Ew civata gundi kêm bûbû, bajar her zêde bûbûn, gundiyan meselên xwe bi xwe re anîbûn bajaran. Bêkar, bêxanî û di rewşeka civatiya gelekî nizim de jiyan êdî meseleyen sereke bûn. Li bajaran hisyarbûneca civakî her bilind dibû. Gundiyan nexwendî êdî di bajaran de tişten nû hîn dibûn, partû, komelên karke ran, yê xwendevanan dengekî nû bû. Ne gelek be jî, radyo û rojname dikete destê

insanan û insan dihatin guhartinê. Lewra êdî romanen gundi wek berê bala kesî nedikişand û munaqeşeyen li ser vê babetê dest pê kirin. Pişti cûnta eskeriyê ya sala 1971'ê zorbetiya rejîma eskerî û bûrjûwaziyê, jiyanâ kesen bajarî bûn babetên romanen. Meseleyen civakî, yêñ bajaran li pêş her tişti bûn û vê carê jî romanen bajarî hatin nivîsandin û ev tiştekî gelekî normal e. Lewra di van munaqeşeyan de "romana gundi" û "romana bajari" hatiye ser ziman. Ev klasifikasiyonâ di cî de be, an ne di cî de be, ev ne giring e, lê ev rastiyekê jiyanê ye. Demek hatiye, pirsên civakî yêñ gundiyyê li pêş hatine xuyanê û lewra jî ev babet di romanen de cî girtiye û paşê civat hêdî hêdî hatiye guhartinê û têkiliyê bûrjûwaziyê di bajaran de bûye meselên sereke û di edebiyatê de vê babetê gelekî cî girtiye. Em bixwazin an nexwazin, ev navkirin û ev babet heqîqetên jiyanê ne. Bi ya min ev tehr wê di edebiyata Kurdî de jî wisa be. Ana jî wisa ne, mora "gundi" yê li ser edebiyata Kurdî ye. Ji kerema xwe re li roman, çîrok û helbestan binihêrin. Edebîyatê bidin alfîki, babeta gundiyyê di pir alfî ve xwe nîşan dide. Ber ku em piranî civateka gundi ne. Hûn navên me yê "anonîm" binihêrin, "Gundi, Gavan, Şivan, Zinar, Çiya, Berxvan..." navên herî zêde ne. Ev tiştekî pir normal e ku edebiyata me jî wê demeka dûr-dirêj "gundi" be.

- Tu rewşa romana kurdi ya îro çawan dibinî? Di pîvanen romana roavayî de mirov dikare behsa romana kurdi bike?

- Ya rastî, civat ku pêş de diçê, ji meriya napirse û meriv zû zû jî ferq nake, lê pişti çend salan meriv dibîne ku civat pêş de çûye. Ev di warê edebîyatê de jî wisa ye. Civata Kurdî, bi taybetî ya Kurdistanâ

Tirkiyê, Kurdî nenivîsî ye û nexwendî ye, lewra di hêla edebiyata Kurdî de gelekî şûn de maye. Civat jî piranî gundî bûye, her çiqas van salên dawiyê guhastineke bajarî çêbûye jî, hela hê tesîra xwe di edebiyatê de nîşan nedaye. Divê meriv bê kompleks rastiya xwe qebûl bike. Di warê roman-nivîsandinê de em pir şûn de mane. Bi hemberî romana roavayî, ez curet nakim qala romana Kurdî bikim. Bi ya min, ana di vê gavê de, ev ne durust e. Jimara romana Kurdê Tirkiyayê çend heb in, yên kû min bi dest xistin û xwendin ji Kurdên Iraq, Îran, Sûriye û Rûsyâ jî ne gelekin. Lewra, ez romana Kurdî qels dibînim, lê, ez gelekî hêvîdar im ku wê di demeke kin de pêş de here.

- Di berhemeke edebî de rola zimêñ ci ye? Ji bo avakirina edebiyateke kurdî ya modern zimanê kurdî têr dike? Ger "na" be problem ci ne?

- Di berhemeka edebî de du-sê tiş herî girîng in; wek naverok, hevdemîbûn û ziman. Meriv dikare bêje ku xurtbûna berheman bi gelek aliyan ve girêdayî zimanê wê ye. Ziman ne tevlîhev be, rast û bi dengekî xweş bê guhê însanan pê kêfxweş dibe û rihet dixwîne. Wek meriv di nav daristanekê, di nav baxçekî de bîhna gulan hilde û bi rê ve here, meriv rûpelên wan berheman bi kêf diguhuze. Bi ya min, tişte herî girîng ziman e. Lê, waxta ku meriv li zimanê Kurdi mêze dike, dibîne ku, Kurdi ne zimanekî teng û feqîr e, lê tiştek heye, bi sed salan nehatiye karanînê. Zimanê edebî di vî warî de paş de maye. Di jiyanê de hertiş wisa ne, dema ku neyê şuxulandinê, her diçe qels

dibe. Meriv di vê jiyanâ xwe ya kin de jî dibîne, piştî çend salan em bi xwe jî ferq dîkin ku, zimanê me yê edebî pêş de çûye, lewra gerek meriv tucara nesekine, hewl bide xwe her zêde binivîse. Ji bo avakirina edebiyateka Kurdî ya nûjen, ev salên ku em tê de dijîn, zimanê Kurdî têre nave, meriv dijwariyê dikişnê, lê belê, her roj ev dijwarî her diçe kêm dibe. Piştî demekê, ez bawer im ku em ê êdî vê dijwariyê nekişînin. Ziman di gelek waran de girêdayî rewşa wê civatê ye, ana, civata Kurdi nîv gundî û nîv bajarî ye, ew jî bajarêñ Kurdistanê ne pêsta çûyi ne, ji bo wê jî Kurdiya me hela hê ne pêş de ye. Ser de jî di van salên dawiyê de gundiyyêñ ku koçî bajaran kirin, Kurdî hê jî tev li hev bû. Lî piştî waxtekê zimanê me yê biedile. Divê em vê jî bêjin, Kurdiya bajarvaniyêñ me ne Kurdiyeka paqij e, gelek caran pirs û termên Tirkî bi formekî Kurdi girtine. Kurdiya dewle-mend û paqîş di nav xelkê de tê xeberdan. Bi ya min gerek meriv ji tu tiştekî netir-se, ziman jî wek zarokan e, wê mezin û dewle-mend bibe, lê belê demeka dirêj dixwaze. Ji bo ku em ziman ji pirsêñ nekurdî paqîş bikin, gerek em tişt û he-wildanêñ bêaqil nekin. Ev di jiyanâ hemû gelan de weha bûye. Sebireke mezin û he-wildaneke bi aqil dixwaze. Yekê jî, dema ku civata Kurdi piranî rençberî û heywan xweyî kirine, bi diyalektîk, bi pirsêñ van babeten ve Kurdi dewle-mend e, lê belê di aliyê bajarvaniyê de ne wisa ne, bi ya min, wê bête guhurandinê. Çawa ku em zanin, ziman wek rewşa civatê wisa zû nayê guhartinê.

Problemeke zimanê Kurdî, hela hê gramer û qaîdên Kurdî wek zimanên

Ewrûpayî di cihekî de nesekiniye. Hinek kes bi tehrekî din û qaîdên cur bi cur kartînin. Wisa tê xuyanê ku ev rewş wê demekê dom bike. Elifba Lañînî, Erebî û Krîlî karanîn jî nahêle zimanê Kurdî bi xurtî pêş de here. Ji bo vê sebebê Kurdên Bakûr, Başûr û Rojhilat di hêla ziman ve gelekî nêzî hev nabin, ev jî dijwariyek e. Ji bo elifbayekê hela hê hemû Kurd pêwîstiyê nabînin, lê ez bawer im ku rewşa siyasî û civakî wê me hemûyan jî mecbûr bike.

- *Gazina piraniya nivîskarêñ kurd nexwendina edebiyata kurdî ye. Gelo ji bo li welêt entresa xwendin û nivîsandina kurdî zêdetir bibe, divê çi bêne kirin? Kî dê van bike?*

- Ez dikarim ji bo Kurdên Tirkîyê bêjim, hê piraniya civatê gundî ye, xwendinê nizane an jî jê hez nake, ev tiştekî normal e. Gelekêñ wan, van babetan bi Tirkî dixwînin û him jî, ji bo ku di dibistanan de Tirkî xwendine, ji Kurdî zûtir û rihettir dixwînin. Eger meriv bi serê xwe û bi zanebûn li ser nesekine wê weha here, lewra pêwîst e ku însan bi mêmû û zanebûn hewl bidin Kurdî binvîsin û bixwinin.

Tiştekî din jî heye, rejîma Tirkîyê gelek tade û zordesiyê nîşan dide, hemû kes ditîrsin Kurdî bixwînin û binivîsin. Gelek berhem qedexe ne an jî, însan nikarin li her derê bixwînin, an jî naxwazin ku kesen din bizanibin ew, tiştên weha dixwîne. Însan ne serbest in, ji karêñ xwe têñ avîtinê, li qereqol û mehkeman têñ girtinê. Gerek em qebûl bikin wisa ne hêsa ye. Em yên ku li Ewrûpa rûdinin, vê

dijwariyê rind fêhm nakin.


Divê meriv dîsa jî qebûl bike ku, rewşa ekonomik her diçe giran dibe, pirtûk û rojname jî ne erzan in, maleka Kurdekkî ya feqîr bînin pêş çevêñ xwe, rojnemek bi 10 hezar û pirtûkek jî kêmâsi bi 70-100 hezar lîra ye. Rewşa aborî, hejmara xwendevanan bibê nebê kêm dike. Ev tiştekî normal e ku, gerek hemû kes di hêla xwe de hewil bide û xwendevan zêde bibin, mixabin ku riyekê din jî tune. ” *Kî dê van bike?*” Nûdem dipirse. Birayêñ delal, ez çi bêjim? Gerek hemû kes bikin, ev deynê hustiyê civatê ye, ne tenê yê hinek kesan e.

- *Tu pêşeroja edebiyata kurdî çawan dibînî? Di kîjan şaxî de pêşketin heye?*

- Ez ji ber pêşeroja edebiyata Kurdî ne xemgîn im, ev pêşeroj, bi gelek waran ve girêdayî rewşa siyasî û civakî ye. Bi ya min, bi gelek dijwariyêñ xwe ve, her roj di vî warî de, pir tiş têñ guhartînê û pêşdeçûyinek li ber çevan e. Kurdên gavêñ mezin bavêjin. Dinya ber bi aştiyê û demokrasiyê ve diçe, ev hal wê tesra xwe li ser civata Kurdî û ew welatêñ ku Kurd tê de dijîn jî nîşan bide û edebiyata Kurdî wê ji hinek dijwariyan xelas bibe.

Zimanê Kurdî bi deng û rîtmê xwe, ji nivîsandina helbestan re her baş e, lewra hozantî pêş de diçe û wê hê jî here. Hemû Kurd pir hindik dixwazin helbestan binvîsin, bi taybetî di ciwantiya xwe de. Nivîsandina çîrokan jî wek berê nîn e, her diçe berhemêñ bi kalîte derdi Kevin. Roman û tiyatro, ev herdu şax di esasê xwe de ne wek helbest û çîrokan in. Pêşdeçûyin di van babetan de, qet nebe di vê demê de, ne xuya ye.

# EDEBIYAT DIVÊ DI NAVA XELKÊ DE BIJÎ



Şahînê Bekirê SOREKLÎ

**NÛDEM:** *Gelo mirov dikare iro behsa edebiyateke kurdî ya modern bike? Edebiyat modern ci ye?*

**Şahînê Bekirê Soreklî:** Divê em berê xuya bikin ka edebiyat ci xwebêjê dide. Ji bo hinan, heye ku edebiyat asîrîdina berhemên wek yên Goethe, Sartre, Thomas Mann, Necîb Mehfûz û yên wek

wan bi nav û deng bin. Xediyê ramanekê wisa pêkan e bibêje, na edebiyata kurdî nîn e, ji ber ku ci nivîskarêne Kurdan nikaribûne berhemên xwe bigihînin pîvana nivîskarêne cîhana edebiyatê yên bi rûmet. Li milê din, werin em bixwênin, ka ferhenga OXFORD ci xwebêjê dide bêjeya “edebiyat”. Literature: *Literary culture; literary production, the literary profession; realm of letters; writing of a country or period; writing whose value lies in beauty or form or emotional effect; the books etc., treating of a subject; printed matter.* Bi gotineke din, nivîsandina ku merov dikare wek berhemên çanda gelekî bi nav bike; nivîsarêne welitekî, yan qonaxeke dîrokê; nivîsarêne nerxa wan di qencî, babet û bandora atîfî de tê dîtin; pirtûk û yên wek wan; lênerfna bi nivîs û hemî berhemên bi nivîs edebiyat e. Heger merov vê xwebêja ev ferhenga li cîhanê bi rûmet bipejîrîne, wê demê ci guman nîn e ku edebiyata kurdî heye. Bi dîtina min, nivîsandina nameyeke qenc jî edebiyat e. Dema ciwanek nameyekê ji evîndara/evîndarê xwe re binivîsîne û yê/ya name girî wê bixwêne û bi gotinêne tê de dilşa yan dilxemgîn bibe, bêguman ew nameya berhemeke edebî ye. Heye ku graniya wê nameyê ji bo me ne ci granî be, lê ew tiştekî din e.

Li dû gotinêne li jor, em dikarin bi hêsanî bibêjin ku, erê, merov dikare behsa edebiyateke kurdî ya modern bike. Dema xwendevaneke kurd romanekê Mehmed UZUN, Mehmûd BAKSÎ, Bavê NAZÊ û hwd, yan helbesteke Şêrko Bêkes bixwîne, ji wan fêhm bike û lezetê di xwendina wan de bibîne, wê demê kesek nikare bibêje, na, edebiyata kurdî ya

modern nîn e. “Edebiyeta modern” ya kurdî ji bo min vê xwebêjê dide: berhemên wek romanen, kurteçirokan, helbestan, şanoyan, gotarêne edebî û folklorî û lêkolînan yên di sedsala bîstan de li gor gramera nivîsa kurdî hatinî nivîsandin û hejmareke ji kesêni dikarin bi vî zimanî bixwînin jê fêhm dikin. Bi gotineke din, hebûna kovareke wek RONAHÎ ya duhu, NÜDEM ya iroj û pirtûkên nivîskarêne Kurd ku iroj têne weşandin îspatêne hebûna edebiyateke kurdî ya modern in.

- *Tu pêşketinê di kîjan şaxê edebiyata kurdî de dibînî?*

- Edebiyata kurdî ya soranî di gellek şaxan de pêş ve çûye, lê eger em li vir behsa kurmanciya bi tipêne latînî dikine, wê demê pêşveçûna herî mezin di warê helbestan de ye, ji yên ber Cigerxwîn, û Cigerxwîn hevalên wî, bigir ta helbestvanêne me yên wek Ehmed HUSEYNÎ, Jan DOST, Rojen BARNAS û gellekên din. Li dû helbestan kurteçirokan têne. Tevî ku hejmara kurteçirokan di salêne dawîn de ber bi pêş çûye jî, kurteçirokên baş, mixabin, gellekî hindik in. Di çend salêne borîn de romana kurdî jî pêşve çû, herweha berhemên xwe bi lêkolînê ve eleqedar dikin, wek yên Rohat, Malmisanij, Zeyelabidîn Zinar û hwd., lê em hê di destpêka re de ne.

- *Tunebûna rexnegiran ci tesîra neyinî li edebiyata kurdî dike? Rola rexnegiran di edebiyatê de ci ye?*

- Berî rexnegiran baş bi hejmarêne layiq

hebin xwendevan pêwîst in. Dema xwendevan bi deh hezaran, sed hezaran, yan bi milyonan bin, wê demê hejmara rexnegiran jî dê bêtir be, lê di rojêne iroj de xwendevanê berhemên kurdî gellekî hindik in. Li milê din, hejmara nivîskaran bi xwe pirr û pirr bi sînor e. Hema-hema hemî kesêni bi kurdî dînivîsinin, ji dûr ve, yan ji nêzik ve hevûdin dinasin. Li gor ku ez ji dûr ve dibînim, pirraniya mezin ya kesêni di derheqê berhemekê de rexneyekê dînivîsinin, yan dostê nivîskêr in, yan ji nivîskêr hej nakin. Di dema nivîsandina rexneya xwe de, ew bi şeweke kûr dikevin bin bandora hestêne xwe yên atîfî û nikarin bi şeweke objektîv wê berhemê binerxînin. Rexnegeriya kurdî hêne di destpêka xwe de ye û ci rexnegirêne hoste û pispor li holê nîn in, ji ber ku nivîsandina bi kurdî bi xwe hêne di gavêne destpêkê de ye. Bêguman e ku rola rexnegiriyê di pêşveçûn û nerxdana edebiyatê de mezin e, lê di derbarey edebiyata modern ya kurdî de, em hê di elif û bayê de ne. Rexnegirî dikare bi sedsalan bajo, wekî di fakûlteyêne edebiyatê yên cîhanê de iroj diyar e. Li milê din, nivîskarekî ku iroj qedra berhemên wî nayê girtin, pêkan e li nik nîşen pêşerojê bibe nivîskarekî navdar. Ji xwe bîr ramekin, ku KAFKA ber mirina xwe ji hevalê xwe tika kiribû, bila hemî berhemên wî bişewitîne. Gellek nivîskarêne cîhanê yên bi dehan sal berêne nebû bixwin iroj li dû mirina wan pirtûkên wan di zanîngehan de têyên xwendine. Lê divêt em ji bûr ranekin ku rîya li pêş me rîyeke dûr û drêj e. Me ne xwendegah, ne zanîngeh hene û ne jî mamoştayêne fakûlteyêne edebiyata kurdî hene. Edebiyata me gellekî li dû edebiyâ-

ta zimanê wek almanî, îngлизî û frensî maye. Berhemên me yên edebî îroj bi pirranî hê negihîstine pîvanê felsefî û edebî yên bilind, ji ber ku me hemâ-hemâ ji sıfrê dest pêkiriye. Wek nîşe, ji bo edebiyateke wek ya almanî, ber Böll û Brecht û Mann,... Heine, Nietzsche, Fontane,... hebûne. Berî wan yên wek Goethe û Schiller hebûne û herweha. Nivîskarênen almanî ya îroj berhemên edebiyata xwe li ser hîmekî lêdikine ku yên ber wan bi sedan sal tê de xebitîne. Loma, divêt nivîskarê kurd ji kêmasyîn li holê dilsar nebe û guh nede wan kesan ku iddiâ dikin me çi edebiyat nîn e, yan diyar dikin, ku baştir e em li hêviya damezrandina dewletteke kurdî bimînin. Heger nivîskarênen îroj ji yên sibe re hîmekî nehêlin, ew ê jî wek me ji sıfrê dest pê bikin. Di bîst salêñ borîn de gavine pirr mezîn di pêşvebirina edebiyata modern ya kurdî de hatin avêtin.

Ew jî bi saya hejmareke bi sînor ji merovêñ kurd. Ev fidakariya divêt bidomîne, rexnegirî hebe, nebe. Pêşveçûn û dewlemendbûna edebiyatê dê rexnegiriya rêk û pêk jî, zû-dereng, têbigihîne.

- *Bi ya te problêmên edebiyata kurdî yên bingehîn çi ne? Ji bo başkirin û bi pêşdexistina edebiyata kurdî divê çi bête kirin?*

- Problêmên edebiyata kurdî pirr in, ku bi dîrok, ziman û rewşa îroyîn ya gelê kurd ve grêdayî ne. Gelşa herî mezîn îroj nivîsandina bi zarav û elfebayêñ cuda ye. Dû re tê nebûna xwendevanan. Edebiyata neyê xwendin dibe wek berhemên têkevin entîkhaneyan. Edebiyat divêt di nav xelkê

de bijî, hem bandorê li wan bike, hem jî bandora wan lê bibe. Dema wisa be, nivîskarê baş jî hêzê ji xwendevanê xwe digire û berhemên hê baştir diafirîne. Peyva "nivîskar" wê xwebêjê dide, ku karê wî merovî nivîs e. Di rewşa îroj de, ma gelo çend nivîskarênen kurd xwe bi pereyêñ frotina berhemên xwe xwedî dikin, da em bibêjin ku ew rast nivîskar in?! Nivîskarênen serkewtî yêñ neteweyêñ din hemî kat û pêkaniya xwe dixin xizmeta afirandina berhemên xwe. Ji bo wan merc û şertîn hêsan li holê ne. Pirraniya nivîskarênen kurd, li milê din, tenê di dema razan û vêşikirina xwe de dinivîsînin û bi hezar bela û axekufê pirtûkeke xwe didin weşandin. Problêmîne din: nebûna ferhengêñ rêk û pêk, nebûna bêjeyêñ teknolojî û têrmîn nûjen, hebûna hejmareke ji "parasûtêñ" nezan û nîvzan ku bandoreke xirab li ziman û edebiyata kurdî dikine, mayîna hin nivîskaran di bin bandora zimanê tîrkî de, nebûna dezgehêñ kurdî yên perwerdekirina nivîskarênen sibe, û gellek gelî û problêm û astengêñ din.

Li gel hemî kêmasyian jî, divêt were gotin ku ew nivîskar, hunermend û hemî kesêñ sôd di panzdeh salêñ borîn de gîhandînî çand û edebiyata kurdî, layiqî rêz û pesîdanê ne. Wan bi xîret û fidakarî û xebata xwe beşekî valahîyeke mezîn tiji kirin. Heger îroj pirtûkêñ kurdî, rojnameyêñ kurdî, kasêtêñ mûzîka kurdî, û heta filimêñ kurdî, hebin, ev ji bo geleki bindest û bêmañ ne hindik e. Geline cîhanê yên xwedan dewlet îroj ne xwedîyêñ weqa berhem in.

Nedizanim ji bo başkirin û pêşdexistina edebiyata kurdî çi divêt bête kirin! Hemî dijwariyêñ edebiyata me ji nebûna mafêñ

me yên netewî li Kurdistanê têyên. Gellekî hêsan e merov bibêje, "divêt wisa bibe û wisa nebe." Lê di pratîkê de gotin û kirin nabin yek. Bi dîtina min, partiyê Kurdistanê divêt roleke mezintir di warê pêşvexistina ziman û edebiyata kurdî de bilizin, lê bêguman, kirineke wisa jî zanistî û pâkaniyê dixwaze. Ev partiyen hêñ ta radeyeke mezin nivîsarên xwe bi tirkî, farsî û erebî dinivîsin, bêyî ku bikaribin graniyeke mezin bidin pêşvexistina ziman û edebiyateke kurdî ya yekgirtî. Ta roja îtroj rola şexsan di pêşvebirina edebiyata kurdî de ji ya partiyê kurdî mezintir bûye. Sereketiya partiyê siyasi divêt alîkariya nivîskarêñ qenc bikin, bêyî şert û bêyî sînorkirina azadiya nivîsê, da rola wan di pêşvebirina edebiyata kurdî de yeke bi nerx be. Edebiyat û propagandaya siyasi li gel hev naçin. Dîrokê, ji impiratoriyyeta Roma de bigir heta jihevbela vbûna Yeketiya Sovyêti, ev yeka îspat kiriye. Rola edebiyatê di azadiya gelekî de tiştek e, bikaranîna edebiyatê ji bo propagandayê tiştekî dîn e.

Bêyî ziman û edebiyata kurdî kurd ne kes in! Merovê hişyar û hêja piştgiriya nivîskar û hunermendêñ xwe dike. Gellek kurd ne amade ne deh qurşan jî ji bo kirîna rojnameyekê, pirtûkekê, yan kasêtekê xerc bikin. De van kesan çi maf heye daxwaza mafan ji hukmatêñ serdest bikin?!!! Dibêjine li Ewropayê nîvmilyon Kurd dimînin. Gelo çend ji wan pirtûkeke kurdî dikirin?! Li welatên cîhanê yên din wêne eyñ wêne ye. Bi kurtî, divêt merovê kurd, partiya kurd li çand, ziman û edebiyata kurdî xwedî derkeve. Heger ev nebe pêşveçûna edebiyata kurdî dê bi sînor be û dê tenê li ser milêñ hejmareke biçûk ji nivîskar, hunermend û entellektuelêñ kurd bimîne. Dema rîberêkî ziman û edebiyata gelekî, merovekî mezin yê wek

Celadet Bedirxan, ji ber xwedilêderneketinê di "bîra qederê" de jiyana xwe wenda bike, wê demê ne tiştekî matmayînê ye ku neteweya li kesêñ wek wî xwedî derneketî di şevreşîya bîra nezantiyê de salêñ dûr û drêj ji rona-hiya edebiyat û zanistiyê bêpar bimîne. Bila em ji şaatîyên wisa fêri dersan bibin.

- *Wek tê zanîn edebiyata kurdî li dervayê welêt, li sirgûniyê ges dibe,... Gelo rîska ku piştî demekê nivîskarêñ kurd li sirgûniyê têk herin tuneye?*

- Neteweya kurd neteweyeyeke mezin e. Ne wisa bûya, ew ê ji mîj ve biheliya. Cîhê dax û mixabê ye ku vî gelî dewlemendiya çand û hunera xwe bi şeweyeke devokîn tenê pêşve biriye. Lê çawa be, hebûna edebiyata kurdî, li gel hemî astengêñ berê û nuha, wê xwebêjê dide ku ev edebiyata ji vir û şûnve, heger pêşve neçe, ew ê paşve jî neçe. Hêvî ew e, ku ji vir ta destpêka sedsala 21em gelê kurd dê bi kemasî li beşekî Kurdistanê, qe nebe, mafêñ çandî bi dest xe. Berhemêñ nivîskarêñ îtroj li sirgûniyê dinivîsin ê sûdê bigihînin, û gîhandine, nivîskarêñ li welêt jî. Ci bibe, ci nebe, merovê kurd ê her li derive jî hebin. Heger ne Swêd be, ew ê li Lubnanê hebin; heger ne Lubnan be, ew ê li Emerîka hebin,... Li milê din, îtroj li Başûrî Kurdistan, li Sûriyê, li Rohilatê Kurdistanê û heta li Tirkîyê pirtûkêñ kurdî têyên çapkirine. Lê tişte girîng ew e, ku kurd bi xwe li edebiyata xwe xwedî derkevin, bi kurdî bixwêñin û xwe fêri rîezgirtina ji pirtûk û berhemêñ edebî û çandî re bikin, yan bi kemasî piştgiriya aborî û manewî bikin.

# PÊŞEROJA EDEBIYATA KURDÎ GIRÊDAYÎ PÊŞEROJA GELÊ KURD E

Rojen BARNAS

**NÛDEM:** *Gava em li dîrokê dînihêrin, em dibînin ku edebiyata kurdî ya klasîk dewlemend e, di pîvanên edebî de ne kêmî yên cîranan e. Sedemên wê yên dîrokî û civakî ci ne?*

**R. BARNAS:** Ji edebiyatê klasîk ên cîranan ez bi tenê edebiyata tirkî / osmanî dinasim. Asûrî, Ereb, Ermen û Faris cîranêne me ne û yên herî kevin in, lê mixabin di bareya edebiyata wan de tiştekî nizanim ku bikaribim ya me û yên wan bidim ber hev û bêjim edebiyata me ya klasîk ne kêmî yên wan e an ji yên wan çêtir e. Ji edebiyata kurdî jî tişte ku ez dikarim li serê du gotinan bêjim, edebiyata kurmancî ye.

Di pey vê zelalkirina pêwist de bi dilekî fereh dikarim bêjim ku edebiyata kurmancî ya klasîk ji aliye çawahînê (qualité) ve ji ya tirkî / osmanî qet ne kêmtir e. Ji aliye çendahînê ve jî hejmara şairêne yên klasîk ne hindik in. Lê mixabin berhemên gelek ji wana winda ne an hê

derneketine ronahiye.

Vêca em bêñ ser sedemên dîrokî û civakî yên dewlemendiya edebiyata me ya klasîk:

Şairên kurmanc ên klasîk bi piranî melayêñ têr xwendî û têrgihîstî yên ilmêñ dîñî yê islamê û wekî dinê yê felsefê, edebiyatê, matematikê, stêrnasî, tarixê û h.w.d bûn. Bi erebî, farisî û tirkî û bi taybetî bi edebiyata Ereb û Farisan baş dizanibûn.

Hin ji wan ji bo xwendina xwe çûne li irane, Hindistanê, Sûriyê, Misrê geriyane, alim, edîb û zanayêñ zemanê xwe nasîn e.

Ji aliye ilmî û edebî yê li gora zemanê xwe, ew bi xwe otorîfte bûn. Di medreseyan de mela digihandin. Hawîrdorêñ wan xwenda û zana bûn. Ew bi xwe kesêñ xwedî cihekî girîng yê dîwana siyasî ya otorîteya navçeyî bûn (dîwana mîr).

Şî'rên wan bi riya mela û feqehêñ wan (xwenda û zanayêñ zeman) bi hezkirinî li dîwanêñ mîr û şexan (otorîteyên siyasî û dînî), li medereseyen dinê (nawendêñ kultur û entellektuelî) di nav xwenda û zanayêñ dinê (rewşenbirêñ welat) de belav dibûn. Li gora hêjayiya şî'rê rûmeta şairê wê digitin.

Ku şair zana û xurt, şî'r hêja û gurr û xwenda an guhdar an civak têgiha û rûmetzan be, dawînî dê çawa be?! Dawînî dê bibe maka edebiyateke dewlemend.

- *Gelo nivşê iro çiqasî edebiyata xwe ya klasîk nas dike? Ji bo têrgihîstîn û jêfêdedîtina edebiyata kurdî ya klasîk pêwistî bi ci heye?*

- Kesê ku edebiyata klasîk a tirkî an farisî baş nexwendibe û li xwe nexunafti-

be, zor e ku ji edebiyata klasîk baş fam bike û zewq jê bistîne. Zimanê edebiyata me ya klasîk mîna Farisiya Nû tevîlhev e: Yê Osmanî jî wisa ye. Zimanê ya me ji bêjeyên erebî, farisî, kurdî û piçek jî ji tirkî-moğolî pêk tê. Bêje, carna bi serê xwe tu manekê nadî, ew nima (mezmûn an sembol) ye, divê meriv pê bizanibe. Divê meriv ji mîstîzmê-sûfîzmê agahdar be ku mebesta şair fam bike. Divê meriv bi hunerên edebî yên wê bizane da bigihîje zewqa naskirina ziraviya hunermendiya şair.

Ji bona jê têgîhîştinê hînkirina (education) bingehîn divê, ku Tirk di lîseyan de sê salan di gel edebiyata gelêri, tekyayî û rojavayî vê didin xwendin. Rîyeke din çapkirin û belavkirina berhemên şairên klasîk bi şerh û tefsîr dê bibe alîkar ji bona jê têgîhîştinê.

Wek ferd jê feydedîtin li ser daxwaziya meriv e, lê wek gel an netewe jê Feyde dîtin bi vê riyyê dibe ku ewê girêdana di navbera nifşen niha û pêşerojê bi pêşiyên me re zeximtir bike, serbilîndiya neteweýî dê di giyanê mirovên me de biçîne.

- *Îro behsa helbesta kurdî ya modern dice. Pîvanên modernîzmê ci ne? Tu Cegerxwîn dixî kijan kategoriyê?*

- Di şîra klasîk de hin pîvanên bingehîn hebûn: 1. Kêş, erûz bû. 2. Teşe an form, xezel, qesîde, mesnewî, rubâî, mustezad, murabba', muxammes û h.w.d bû. 3. Ziman, zimanê bilind ê ji erebî, farisî û kurdî têkel. 4. Aheng, bi beşavendên (qafîye) dawiyê û redîfan dihate dayîn. 5. Bikaranîna hunerên edebî û mezmûnan (sembolan) nîşana hunermendiya şair bû.

Ji kovara Jîn û pê de em rastî gerriyaneke (cereyan) dinê dibin: Ew ne edebiyata klasîk e û ne jî ya moderna îroyîn e. 1. Kêş a kîteyî dewsa erûzê digire. 2. Teşe bişihîbe xezel an mesnewî jî ne ew in. 3. Ziman, zimanê gelêri yê sade ye. 4. Mijara şîrê li ser Kurdistanê û miletê Kurd e; ji ber vê jî bi piranî di uslûba şîretkîrin, hişyarkîrin û navîfîdanê de ye. 5. Ahenga rîz an malikê li ser beşavenda li dawîya rîzê ye; lê beşavend fena ya klasîk ne zengîn an tam e. 6. Endîseya şair ya bikaranîna hunerên edebî ji binî tune, ew lê dixebite ku mesaja xwe ragihîne. Ebdurrehîm Rehmî û Osman Sabrî du nimûnendeyên vê yên herî ber bi çav in.

Bi hin şîrên Cegerxwîn wekî "Heval Pol Robson", "Kî me Ez" û hin şîrên Qedrî Can di reng, rûçik û hilma şîra kurmancî de guherîn xuyan bûn. Ev guherîn hê jî berdewam e.

Meyla îroyîn a şîrê ber bi vî aliyê ve ye. Heta niha ez rastî tu pîvanên tesbîtkîrî nehatime. Lê hin xisûsiyetên müşterek ên vê şîrê hene:

1. Kêş serbest e.
2. Ziman sade ya gelêri ye.

3. Muzîk li gora hunermendiya şair bi beşavendên hundir, dawîn û redîfan tê peydakîrin, lê ne ew çend gîring e.

4. Mijara şîrê bi piranî li ser pîrsên civakî, siyâsî û welatî ye. Yê evînî gelek kêm in.

Cegerxwîn di şîra kurmancî de pîreke gelek xurt û zexm e ku edebiyata klasîk û ya nû digihîne hev. Hersê dîwanên wî yên pêşî xala çara ya vê bendê û lîrîzm û forma edebiyata klasîk digihînin hevdû û di hevûdu de dikelînin.

- *Peywendiyê helbestê bi çirokê re ci ne? Roman çawan ji çirokê vediqete?*

- Di Kurmanciya jêrîn (Soranî) de helbest ji bona stran (kilam) dibêjin. Me jî vê bêjeyê bi şaşî bi maneya "şî'rê" girt û bi kar anî, lê "helbest" ne şî'r e û şî'r jî ne "helbest" e.

Du awayê vegotinê hene: Vegotina bi nezmê û vegotina bi nesrê. Şî'r vegotina bi nezmê ye, lê her perçê-nezm an menzûme ne şî'r e. Şî'r perçê-nezm an menzûmeye bi vegotinê gurr û bi pejnê dagirtû ye.

Di edebiyata klasik de çirok bi nezmê dihatin nivîsandin. Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Mewlûda Melayê Batê, Leyl û Mecnûn a Şêx Mihemed Can çirok in û çirokên menzûm in. Lê êdî kes iro çirokan bi vegotina nezmê nanivisîne.

Ji awayê vegotinê çirok û roman bi nesrê (pexşan) têne nivîsin.

Çirok serpêhatiya kesekî an xelekek ji serpêhatiyê kesekî ye. Di çirokê de kesekî sereke an qehremanê çirokê heye, serpêhatiyê kesên dinê yên bi serê xwe nînin; serpêhatiyê kesên dinê perçekî ji serpêhatiya qehremanê çirokê ye, yanî ji bîli qehremanê çirokê kesên dinê figuran in.

Roman jî serpêhañ ye, lê bûyer xelek bi xelek in: Qehremanê an qehremanê romanê di hin xelekan de dibe ku qet xuyan nekin an jî bikevin dereca figuranî. Di romanê de bûyer ji bûyeran derdi Kevin an bûyeren ji hevûdu cihê dibil sedemê hin tiştan an bûyeran û ew tişt an bûyer têni di xelekekê de digihîjin hevûdu.

Çirok bi nîsbet romanê kurtir e. Vegotina çirokê bi nîsbet ya romanê gurrtir û

kintir e, ji vegotina bi hûrikî (detalj) ya tişt û bûyeran direve.

Çirok û roman hene ku vegotina wan herikandî, teswîrên gurr û bûyeren wan pejinê xwendevan hildikin, wisa ku meriv naxwaze heta dawiyê dev jê ber de: Ji yên vê cureyê re uslûba şî'irkî dibêjin.

- *Edebiyata kurdî bi giştî xwediyyê pêşerojeke çilo ye?*

- Pêşeroja edebiyata kurdî bi temamî girêdayî pêşeroja gelê kurd e. Ku gelê me bikare bigîhije mafîn xwe yên siyâsî û demokratik, ez bawer dikim ku di demeke kurt de emê bikarin vê valahiya mezin telaffî bikin û bi hindikî bigîhîjin sewiya edebiyata cîranêن xwe.

Ku hema bi tenê rojnama Kurdistan, kovara Jîn, Hawar, Ronahî, Roja Nû li Tirkîyê nehata qedexe kirin û bidest biketa, ku hema bê alîkariya dewletê biwa jî bi tenê bi Kurdî nivisandin û belavkirin nehata qedexe kirin, ewê rewşa edebiyata me ya kurmancî iro bi awakî dîtir biya.

Em li van deran dikarin malê xwe yê belawela berhev bikin, xwedî lê derkevin û bergeha edebiyata xwe ya pêşerojê ya li welat xwes û paqîj bikin. Edebiyata miletekî di nav wî mileti de pêş dikeve û geş dibe.

## RASTKIRIN

Hejmar 9

1. Rûpela pêşî, stûna NAVEROK, rêza şesan "JI BO YILMAZ GÜNEY / Rojen BARNAS, 13" şaşî hatiye nivisandin, rastiya wê "NIHA NE WEXTÊ MIRINÊ YE / Rojen BARNAS, 13" ye.

2. Rûpel 14, bend 2, rêz 2: bêjeya paşıya rêzê bi şaşî "tewakulê" hatiye nivîsin, rastiya wê "tewekulê" ye. Em ji R. Barnas û xwendevanê xwe lêborînê dixwazin.

# EDEBIYAT JI NÛ VE AFIRANDINEKE ESTETÎK E



ROHAT

**NÛDEM:** *Edebiyat çi ye, tu dikari têkiliyên edebiyatê yên bi folklorê re şirove bikî?*

**Rohat:** Eger em folklorê bi "edebiyata devkî" bi nav bikin, wê çaxê sînorê folklorê û edebiyatê gelekî nêzîkî hev dibin. Hem folklor (berhemên devkî), hem jî edebiyat (berhemên nivîskî) du dewlemendi û çavkaniyên hunerî ne. Edebiyat, afirandin û ji nûh ve afirandineke estetîk û bedewiyê nîşan dide. Ji der vê tarîfa teng, edebiyat di babetekê de hemû çavkaniyên nivîskî jî hildîçîne nav xwe. Eger em tenê

tarîfa jorîn bidin ber çavan, folklor û edebiyat ji alîkî de zêdetir ji hev cuda dibin, ew jî tiştekî şeklî ye, tenê mirov dikare bêje ku nivîskarêñ berhemên folklorîk ne kivş in, lê belê nivîskarêñ berhemên edebî diyar in. Dema em ji van gotinêñ klasik dûr dikevin, em dibînin ku di navbera folklorê û edebiyatê de têkilî, pêwendî û nêzîkahiyêñ gelek jîndar hene.

Civateke wek civata Kurdî bi dirêjahiya salan di zikê tebiyetê de jiyaye, ziman lê hatiye qedexe kirin, dijmin timê ajoitiye ser, ve civatê çawa em dibînin bi saya folklorê tenê xwe ifade kirîye, dil û mêmüyê civatê fonksiyonên hunerî, artîstîk ji xwe re peyda kirine. Gelek berhemên hunerî bi salan li ser zar û zimanê civatê mane, hatine gîhîştine van rojêñ îroyîn. Folklorâ me, ji bo edebiyateke nûjen dewlemendiyeye herî mezin e, ji me re îmkanen bêsinor pêşkêş dike. Eger ev îmkanan neyên zanîn, neyên berêvkirin û neyên lêkolandin, mercen aferandina edebiyateke nûjen û hevdem tune ne. Ji ber ku folklor ne tenê ji aliye temayêñ cuda, ji aliye stîl, ziman û çandî de pencereyêñ dewlemendiyêñ nûh li pêsiya me vedike.

- *Gava edebiyata devkî derbasî ya nivîskî dibe, divê li ci bête fikirîn? Tu avakirina romanê ya li ser berhemên folklorîk çawan dibînî?*

- Berhemên folklorîk dema têr berev kirin, derbasî ser kaxizê dibin, ji devê xelkê ci derketiye, pêwîst e wisan jî bê nivîsin. Kesêñ berevkar mafê wî tune ye ji ber xwe tiştan tevî van berheman bike an ji van berheman angorî xwe serobino û berovajî bike. Ji ber ku karê folklorîstan ne ajitasyon û propaganda ye, karê wan berevkirin û şirovekirin e. Dema hemû şax û versiyonêñ van berheman hatin berev kirin, derbasî ser kaxizê bûn, êdî ew dibine malê xelkê, nivîskarek mafê wî tune ye, li van berheman xweyi derkeve û wek nivîskarê wan xwe bide nîşan kirin. Ji aliye din nivîskarek dikare berhemek folklorîk ji berhemek xe ya nûjen û edebî re bike bingeh. Lê belê pêwîst e ji giyanê (ruh) vê berhemê yê dîrokî û civakî dûr nekeve. Eger nivîskarek dema dixwaze

saxeke edebî ya van berheman ji nûh ve binivîse, pêwîst e bingeh û stûnên berhemên folklorik zêde nehejîne û kincen mayîn, kincen "xerib" li mîrxasên van berhemên folklorik neke. Dema her tişt hate guhartin, wê çaxê ew tam û lezeta ku di wê berhemê de heye, winda dibe, berhem dibe berhemeke riji û bêtam, hejmara "mîrxasên nenas" zêde dibin. Tiştê ku nivîskar di vê berhema nûh de dikaribe nîşan bide, ne guhartina naverokê mîrxas û derdor e, zêdetir îfade, bikaranîna zimên û ımkânên hunerî ne. Ev yeka ji bo romanekê ku li ser berhemeke folklorik hatiye nivîsin jî, derbas dibe.

- *Carinan muneqaşeya hebûn û nebûna romana Kurdî tê kirin. Tu dikarî bi kurtî behsa dîroka romana kurdî bikî. Rewşa romana kurdî iro çawa ye?*

- Ez bawer dikim ku muneqaşeyen hebûn û tunebûna romana kurdî ne ku ji ber romanen Kurdi bi hejmar tune ne, ev muneqaşeyan zêdetir li ser "tunebûna romanen çê" tên kirin. Eger em pêşketina romanen li Fransê, Ingilterê, Spanyayê, Rûsyayê û Kurdistanê bidin hemberî hev, rûberî hev bikin, hem ji aliye jimarê, hem ji aliye bilindbûna qencya van berheman de cudayıyeke mezin heye. Kesên ku dibêjin "romana Kurdî tune ye", baweriyan xwe li ser van rûberîhevkirinan ava dikan. Baweriyan wan ji gazin, lome û rexnan pêk tên. Ev kesan pey "kvalîte" digerin û baweriyan li ser vê pîvanê formule dikan.

Bi baweriya min, ne tenê roman, di her warê hunerî de pêwîst e mirov rewşa wî welatî, ımkân, mecal û mercen wî welatî jî bide ber çavan. Li her welatî, çand, huner û edebiyat, angorî pêşketina civatê ya dîrokî, civakî û aborî ji xwe re tempoke meşê bi dest dixe. Ji ber rewşa Kurdistanê ya siyasi, civatê ev firseta pêşketinê dereng bi dest xistiye an jî hewl dide, tekoşinekê dide ku xwe bigihîne vê firsetê û bi dest bixe. Bi kurtî rewşa welatên bindest wek Kurdistanê timê ji pêşketineke

çandî re bi dest nade. Ji ber ku di jiyana rojane de çawa em dibînin şerê hebûn û tunebûnê, mirin û jiyanê li vî welatî dajo. Helbet di nav van dubendiyen jiyanê yêñ tûj de karên çandî, hunerî û edebî jî, ji ımkânên pêşketinê û xurbûnê bêpar dimînin. Eger em muneqaşeyen "romanen bas" û "romanen xirab" bavêjin alîskî, em dibînin ku wek destpêk ceribandinê romanivîsê kêm bin jî, hejmara romanen ku bi kurdî tên nivîsin bi şermî be jî, roj bi roj zêdetir dibin. Di vî warâ de çend nivîskarê Kurdên "Sovyet" wek Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Eliyê Evdilrehman, Seyidê İbo, Egîtê Xudo wek roman çend berhem pêşkêşî xwendevanan kirine. Ji der vê, nivşê li dervayî welat jî çend ceribandinê mayîn hatin weşandin, wek romanen Bavê Nazê, Mahmud Baksî, Nurî Şemdin, Mehmet Uzun, Şahînê Sorekî, Hesenê Metê...Eger ew romanen ku li Kurdistanê Iraq, Iran û Sûriyê hatine weşandin jî, li ser van romanen zêde bikin, hejmara wan ji niha ve bîstî derbas dibe. Ji ber van "statistik" mirov nikare bêje ku romana Kurdî tune ye. Ji aliye din çawa em dibînin milletekî wek Kurdish ku ji bîst mîlyonan zêdetir e, jê re bîst roman dikevin. Dema mirov vê tabloya reş dide ber çavan, baweriya "romana Kurdî tune ye" xwe dispêre kijan dîwarî, mirov vê yekê jî baş dibîne. Mirov vê carê gelek dilsar, bînteng û quđumreş dibe. Ne tenê baweriya "romana Kurdî tune ye", baweriya qet tiştîkî me tune ye, bi vî tehrî ji xwe re starekê dibîne.

Rast e, gelek tiştîn me tune ne. Xwendevan, rexne, teşvik û adetên xelatdayînê û gelek tiştîn mayîn jî di nav me de tune ne. Kurd hela hê kulikekî bidin ser tîpa "U" û tîpa "I" an na, bi salan vê yekê munaqşe dikin, rewşa me ev e, ya baştir mirov vî kulikî bide serê xwe, rûnê û bifikire. Ji ber ku alfabyeke ku milletek li ser li hev bike, tune be, wê demê mirov têdigihê ku em ne tenê ji romana Kurdî, hê ji gelek tiştan bêpar in.

Ev e rewşa romanen û rewşa me Kurdish.

# EDEBIYATA KURDÎ XWE SERAST NEKIRIYE



Hesenê METÊ

**NÛDEM:** *Tê gotin ku çîroka kurdî ya nûjen cara pêşî di destpêka salên nozdehan de hatiye nivîsandin. Çîroka kurdî iro di çî merhelê de ye?*

**Hesenê Metê:** Kî çi dibêje bila bibêje. Zêde ne girîng e ku bi kurmancî çîroka pêşîn di kîjan dem û sedsalê de hatiye nivîsandin. Bêguman weke dîrokî mana xwe heye, lê wisa diyar e ku mîna hemû besen edebiyatê vê çîroka pêşîn jî cî

negirtiye, rûnenişiye. Ez ne serbilindê vê yetê me ku çîroka kurdî nod û çar sal beriya nuha hatiye nivîsandin, lê ez hêvîşikesî dibim ku pişî van nod û çar salên xwe jî vê çîroka kurdî ciyê xwe ne girtiye. Û di rewşa iro de bi qasî ku ez dibînim, çîroka kurdî di merheleyecke serxew de ye. Mîna teralê ku nû ji xew rabûye û hîn ruyê xwe jî ne şûştiye. Ne tenê ji bo çîroka kurdî, ez ji bo edebiyata kurdî jî dibêjim.

- *Wekhevî û cudayiyê roman û çîrokê ci ne? Kîjan karakter wan ji hev vediqêne?*

- Wekheviya roman û çîroka tradisyonel ew e ku ev herdu babet jî prosa ne, ev herdu babet jî kêm zêde bi hev re derketine qada literaturê, ev herdu babet jî bûyerekê vedijîne û lehengên bûyerê bi cî û wext dike.

Ku em werin ser cudayiya roman û çîrokê, di vî warî de jî heta iro gelek tişt hatine gotin. Lê cudayiyeye berbiçav ne diyar e û li ser vê yetê li hev jî nekirine. Li ser karekterê çîrokê weke karekterê bingehîn: Kurtbûyîna çîrokê ye, dibêjin. Lê ez ne bawer im ku ev jî cudayiyeye rastîn be. Ji ber ku çîrokêni bi qasî dirêjayıya romanekê jî hene û hatine nivîsin.

Lê tiştikê din heye: Tradisyonâ romanê daye xuyakirin ku romaneke bi qasî du rûpelan kurt nehatiye nivîsin. Lê çîrokeke bi qasî sed û bîst rûpelan dirêj û zêdetir jî hatiye nivîsin. Bi kurtî tiştê ku ez ê bibêjim. Mijar, hûnandin, heta derekê forma çîrok û romanê dikane weke hev bibe. Dirêjayıya çîrokê jî dikane bi qasî romaneke piçûk berfere bibe, lê... lê heta nuha romanek bi qasî çîrokekê kurt nebûye. Ez dibêjim cudayî ev e û çîrok zelalê romanê ye.

- *Rewşa romana kurdî iro çawa ye? Di pîvanê romana navnetewî de meriv dikane behsa romana kurdî bike?*

- Kêm zêde romana kurdî jî di rewşa çîroka kurdî de ye. Ne tenê çîrok û romana kurdî, ez dikanim bibêjim edebiyata kurdî xwe serast nekiriye. Karekterên edebiyatê ne karekterên bi serê xwe ne. Bi gotineke din edebiyat karekterên xwe ji ziman û kulturekê, ji dezgeh û akedimiyekekê, ji perwerdeyîya xelkê werdigire.

Ciwamêr an jî ciwanikek li mala xwe rûdine, bi tena serê xwe tiştina li hev siwar dike, bi navê romanekê dide çapê û herweha ew berhem belav dibe. Lê dema ku zanistî û otorîta zimanekî tunebin, akademiyêñ ziman û edebiyatê tunebin, rexnegir û maqûlên vî karî tunebin, xwendevan û baleke pêwîst tunebin... meriv ê behsa kîjan edebiyat û kîjan romanê bike! Ez dibêjim, ji bo me hîn gelekî zû ye ku em behsa van tiştan bikin. Ji ber ku bi awayekî pêwîst tradisyonike me û danûsitendina edebiyateke niviskî pêk ne-hatiye.

Em vejerin ser romanê xwe. Min berhemên hêja bi kurdî jî xwendine. Lezeta roman û novelên ku min ji pêñûşen biyanî girtiye, di berhemên kurdî de jî ez rastî wan lezeten hatime. Lê mixabin, hebûna niviskarekî û romaneke bi vê lezete ji bo min têr nake ku ez behsa romana kurdî bikim û bidim ber romanê navnetewî.

- *Rexne çi ye? Karêñ rexnegirêñ edebiyatê çi ne?*

- Ez baş nizanim bê rexne çi ye. Lê ez baş dizanim bê çi ne rexne ye. Serqisê: Rexne ne ew tişt e ku meriv piştî xwendina sê romanen dest bi rexna romana çaran bike. (Ez ne bawer im ku Xwedê ew jîrî dabe evdekî xwe ï dunyayı.) Rexne ne ew tişt e ku meriv rika xwe li niviskarekî girêde û bibêje ewko ne realist e, derewan dike. Rexne ne ew tişt e ku rexnegir ji ber şerm bike... ji ber şerm bike û bi navêñ veşartî li ser pirtûk û niviskaran tiştina bibêje. An jî bi awayekî bêmane pesnê niviskaran bide û bêsedem wan rakin

ezmanê heftan.

Bi qasî ku ez dizanim rexne tiştekî mîna neynikê ye. Neynikek wisa ye ku niviskar dikane li pêş bisekine, xêr û gunehê xwe di wir de bibîne, bipîve û dûre xwe serast bike... Lê mixabin... di roja îroyîn de me neynikêñ weha tunene. Heta nuha bi navê van neynikan çend şüßen derizî derketine û di wan şüşan de niviskaran xwe ne dîtine, xwendevan veciniqî ne.

Dema ku rexnegirekî xwediyê fonksiona xwe hebe, ew ê bi karêñ xwe ji bizane. Ne pêwîst e ji min an jî ji yekî weke min bibîhize ka karêñ wan çi ne.

- *Di avakirina edebiyata kurdî de tunebûna rexnegiran çi tesîrîn neyînî dîkin?*

- Ji bo niviskar alîkariyek çenabe ku başî an jî çewtiyên xwe bibîne û xwe serast bike.


Ji bo xwendevan alîkariyek çenabe ku ji valayî û veşartiyên berhemê haydar bibe.

Ji bo çêbûna edebiyatekeke kurdî bextreşîyeke bêyom e. Dema ku rewş ev be pêşketina edebiyatê jî êdî xwe disipêre niviskar. Niviskar û bextê xwe, niviskar û hunera xwe, niviskar û zanebûna xwe...

- *Ji bo pêşdexistina edebiyata kurdî rola wergerê çi ye?*

Gotineke mamoste Celîlê Celîl heye. Dema ku peyv tê ser wergerê hertim ev gotina wî tê bîra min. Digot: "Kubariya her miletikî ye ku Shakespeare bi zimanê wî hebe". Beriya hertişî werger. kubariya zimanê kurdî ye, pêşxistina edebiyata kurdî ye, dewlemendiya ferhenga kurdî ye. Ziman tê dafejinandin, ziman li bêjingên zimanê biyanî dikeve, bi wan zimanen re dikeve qayışê û di edebiyata biyanî de dibe xwedîpar, peyvikêñ jibîrbûyî an jî nû têne peydakirin... ev hemû tiştîn ha bi rola wergerê dibe...

# HER STRANEKE KURDÎ ROMANEK E



Mahmûd BAKSÎ

**NÜDEM:** *Tu dikarî bi kurtî behsa romana kurdî û rewşa ziman û edebiyata kurdî biki?*

**M. Baksî:** Romana kurdî ji hebûna Memê Alan û vir ve heye. Ger îro romana kurdî bi pêş neketibe, zexelî ne zexeliya romana kurdî ye, zexelî ya nivîskarên kurd e. Yanî keçik heye, lê kesî neçûye ew nexwestiye, kes nêzîkî keçikê nebûye; keçik di mala bavê xwe de pîr bûye, bê mîr maye. Di keçikaniya xwe de xelkê xerîb dest avêtiyê, xelkê ew ji xwe re biriye.

Romana kurdî jî wilo ye, xelkê xerîb ji xwe re biriye, ji xwe re kiriye mal. Yanî

divê em sûc nexin stûyê romana kurdî. Her straneke kurdî romanek e. Lê mixabin, em li folklorâ xwe, li zimanê xwe xwedî derneketine. Me ji ziman û edebiyata xelkê re xizmet kiriye. Me fedekariyên mezin ji bo ziman, folklor û kultura xerîban kiriye. Loma zimanê kurdî jî îro tola xwe ji me hiltîne. Dibêje, binêr, hûn li min xwedî derneketin, ez jî li we xwedî dernakevim. Rewşa ku îro em tê de ne, ew tolstandina zimanê kurdî ye.

Niha tête gotin ku li Tirkîyê zimanê kurdî qedexe ye, ji ber vê yekê me nikarîbû bi zimanê kurdî binivîsanda. Ez ne di wê baweriye de me. Çunki li Tirkîyê sosyalîzm û komunîzm jî qedexe bû û di gel ku me dizanîbû qedexe ye û li gor madeyên 141-142 ku heft sal û nîv ceza wê hebû, lê ji bo zimanê kurdî mirov tenê du salan ceze dixwar. Ger te pirtûkek bi kurdî binivîsanda, cezayê wê du sal bûn, lê ger te meqaleyek an jî pirtûkek li ser sosyalîzm û komunîzmê binivîsanda, heft sal û nîv cezayê wê hebû. Me radibû ji bo komunîzmê heft sal û nîv dida ber çavan, lê em ji du salan direviyan.

Ya dudan jî digotin û dibêjin nivîsandina bi kurdî zehmet e, em nikarin fér bibin.

Ev jî ne rast e, mirov dikare di hefteyekê, nebû di mehekê de fêrî nivîsandina bi kurdî bibe, lê mirov nikare di sê salan de fêrî Kapîtala Marx bibe.

Wilo, me ê biçûya li ku derê ci pirtûkek zehmet bi zimanê xelkê hebûya, peyda bikira; girtin, zîndan û îşkence bida ber çavan, lê em li zimanê xwe hûr nedibûn, di gel ku me dizanîbû ew li ber mirinê ye, me guh nedidayê.

Baş bû ku em derketin derive. Me li we-latekî mîna Swêdê xwe nas kir, şexsiyet û nivîskarên kurd bêhna xwe berdan, tırsawan ji partî û rêkxistinan neman, ew êdi ne bi serê siyasetên xwe, lê bi serê xwe fikirîn û berhemên hêja asirandin.

Swêdê jî qîmet da vî karî, sazgehêne wê bersiva pirsên aborî dan û îro zimanê kurdî roj bi roj geş dibe.

# ROMAN HUNERA CIVATÊN PÊŞKETÎ Û MODERN E



Mehmed UZUN

**NÜDEM:** *Pirsa yekemûn ez dixwazim em ji ronesansê dest pê bikin. Di van demên dawî de terma "ronesans" gelekî di navâ kurdan de tê bikaranîn. Di ziman û edebiyata kurdî de behsa ronesansê tê kirin. Tu dikarî ronesansê şirove bikî? Di dema ronesansê de çi guhertin di huner û edebiyatê de çêbûne? Ronesansa ku kurd behs dikan çi ye?*

**Mehmed Uzun:** Em ji ku dest bi vê pirsa gelekî zehmet bikin? Ji ronesansê, tarîx û tevgera ronesansê? Yan ji rewşa aloz, kambax û tevíhev a kurdan? Heye ku ya herî baş destpêkeke basîd e. Hin rastiyênd kurdan ên basîd û berbiçav hene; kurd jihevkeş ne, welatê kurdan perçeye, ferq û nakokî di navbera navçe, never, cîh, eşîr, malbat û hêzên siyasiyê kurdan de bêhejmar in. Loma jî di tu meseleyî de, tu carî, yekitîyeke xurt a kurdan nehatiye pê. Loma tiştên ku em li ser rewşê û celebêñ pêşketinê bibêjin, tu carî, ji bo hemû Kurdistanê, derbas nabe. Heye ku ew ji bo hin mintiqeyan rast bin, lê ne ji bo hemû welêt. Ev rastiyek ji rastiyênd basîd (lê nexwes) ên kurdî ye. Em bêñ ser ronesansê...

Ronesans? Ronesansa ziman û edebiyata kurdî? Ronesans ku gotineke latîmî ye, "mot a mot" zayîn û vejîn e. Nûkirin û ji nû ve avakirin e. Ronesansa ku di qîrnêñ 15-16-an de, li Îtaliyayê hate pê û pê re li hemû Ewrûpayê belav bû, meriv dikare bibêje, ev tişt kir; cîhanê ji dewr û dewranen kevn qulipand ser dewr û dewranen nû. Bi her awayî, di her aliyê jiyanê de. Wê rûpeleke kevn a tarîxî girt û yeka nû vekir, riyêñ nû pêşkeşî însaniyetê kir, cîhan bi pêş de, ber bi serfiraziyê bir. Cîhana kevn ji eşîr, mal, malbat, mîrekî, bajar û navçeyêñ biçûk hatibû pê. Dewletên neteweyî (nasyonal) nîn bûn. Axa, beg, mîr û serekên dînî di wê cîhana kevnde hespê xwe taw didan. Cîhan, ya wan bû. Ronesansê ev yeka hanê, ji binî, guhert. Wê civat guhert, ziman guhert, rabûn û rûniştin, edet û ûsila civatê guhert, çand û hunera civatê guhert, heş û bîrê civatê guhert, hîs û nêrînê merivan guhert, pêwendîya serdestî û bindestiyê guhert. Ronesans têkoşîmeke piralî û bêhempa bû, -li hember cîhana kevn. Voltaire di kitaba xwe "Essai sur les

*moeurs et l'esprit des nations*" (Ceribadin li ser edet û ruhê neteweyan) de behsa vê guhertinê dike. Di cîhana kevn de însan ne azad bû, ew bi gelek celeb qeydan hatibû girêdan. Însan, mîna şexş û kes, nîn bû, ew mensûbê cîhekî, tiştekî bû. Ronesansê însan kir însan, însan kir şexş û kes (indiviud). Kitab û ansiklopediyên li ser ronesansê weha dibêjin; peydakirin û pêkanîna kesahî û şexsiyeta meriv, bi serê xwe, şoreşke bêhempa bû. Makyaveli ku bi kitaba xwe "Mîr" bû ramangirê siyasta gerandina karên dewleta nû, teoriyên xwe li ser ev kes û şexsiyeta nû ava kir. Rêber û pêşewayên heyama ronesansê, mîna Columbus, Copernicus, Luther, Kalvîn, Rabelais, Montaigne, Shakespeare, Cervantes û hwd. hîmêngingîn ên cîhana ku li ser piştâ kes û şexsan e, lêkirin. Bê guman bi hezaran zehmetî. Bê guman teví muxalefeteke çavşor û dijwar a hêz, quwet û berdevkên cîhana kevn a riziyât. Hingî? Hingî, meriv dikare bibêje, ku ronesans şoreşke guhertinan bû. Wê zikê eva tarî a avis qelaşt û şoreşke bêrawest anî pê.

Esas û qayideyên vê şoreşê gelek in. Lî me, li vir, ew hemû navên, ji bo bersîva pirsa we, bi tenê yek, dido divên; humanîsm , kitab û lixwevegerîn. Eger ronesans û tevgereke cîhanî û hemû cîhan, hêdî hêdî guhert, ev yeka bi saya humanîsmê û kitaban bû. Humanîsmê dinyaya civat û merivan pir fireh kir, civat û merivan ji qalibên eşîrî, malbatî, mîrekî, navçeyî, berberî û dijminahiya hundîrî rizgar kir. Humanîsmê cîhana bêser û bêdawî pêşkeşî meriva kir. Wê kirasê pir teng ê hesûdî, fesadî, dexesî, berberî ku ji nezanî, paştemayin û ceħalêtê dihatin pê, cirand û kirasekî nû yê "moderne" li civatê û merivan kir. Wê civata merivan û hemû cîhan nêzîkî hev kirin. Herçî kitab bû, ronahî reşand ser

civatê, dinya biçük kir, civat û merivan perwerde kir, rê li îlîm, çand, edebiyat û hunerê vekir; bîr, hes, hest, ziman û ruhiyeta meriv nû kir. Kitabê edebiyata cîhanê ji ser lêvan veguhest ser tîpan, edebiyateke nivîskî ya hemû civatê anî pê, qata zanîn û bîrbirinê bilind kir, pîvanêñ îlîmî û muspet ava kirin... Û lixwevegerîn, lixwevegerîna ku ji bo kurda jî pir pêwist e; ronesans şores bû, nûbûn û nûkirin bû, lê li ser heyin û medeniyeta kevn a pozitîv. Nivîskar, alîm û ronakbîrîn ronesansê li reh û rîçen xwe ji hûr bûn da ku "merivê/a nû yê/ya ronahiyê" bînin pê. Zanîna ronesans û pêşketina tevger û heyama ronesansê ji bo kurdan û rewşa ku ew tê de ne, gelekî girîng e. Hem ya giştî hem jî ya her welatê taybetî. Mesela tevgera ronesansa Alemanyayê ku bala rîberê tevgera vejandina ziman û edebiyata kurdî Celadet Alî Bedir-Xan jî kişandiye, gelekî balkêş e. Alemanyâ ku ji mîrekiyên bûcûk dihate pê û ne xwedîyê dewleteke neteweyî bû, bi xêra ronesansa alemanî, yekitiya xwe ava kir. Alemanan pêşî ji zimên dest pê kirin. Wan yekitiya zimên ava kirin, paşê yekitiya edebiyatê û bîr, şîur û fikra neteweyî ava kirin û paşê jî yekitiya welatê xwe. Loma eger em bibêjin ku ronasans destpêka yekîtiya ziman, çand, welatan e, ez bawer im, ew ê ne şaş be.

Baş e, rewşa kurdan? Bi ya min, heye ku ez şaş bim, lê bi qasî ku ez dibînim, Kurdistanî iro, bi awayekî giştî, di heyameke gelekî reş de ye. Tevgera çekdar li hersê perçen welêt, li perçê Turkiyê, İran û İraqê, xurt e. Bêguman, berxwedana gelê kurd pîroz e, rabûna gelê kurd li Turkiyê heyameke nû ye. Lî digel vê yekê, perçebûn, berberî, dijîtî, ji her carê, zêdetir e. Şer li perçê Turkiyê qata hisyarî û hest û zanîna kurdî, gelekî bi pêş biriye. İro kurd li piyan in, li pey mafêñ xwe ne.

Lê li milê din, herwekî perçên Îran û Iraqê, îro, perçê Turkiyê jî kavil dibe, xelk ji ber zulm û zordariyê, koç dike, welat wêran dibe. Di rewşeye weha de ku gelekî zîz e û jê xwîn dirêje, behsa ronesansê kirin, hinekî ji rastiyê bi dûr e. Pêla bilind a hişyariya kurdî li Turkiyê gelekî pîvanên nû yên lebata civatê û bilbûna şixulên edebî, çandî, hunerî anîne pê. Ji bo vejandina jiyanâ kurdî, bi hezaran xort û keçen kurd bedenê xwe yên tezebişkovî gorbehîşt kirine. Li Turkiyê rojnameyeke kurdî ya hefteyî "Welat" û hin rojname û kovarên kurdî/tirkî derketine, weşanxanê kurdî hin kitabêñ kurdî weşandine, hin dezgehîn çandî yên kurdî jî ava bûne. Ev hemû gavêñ hêja, baş û nû ne. Lê li milê din zimanê kurdî, bi leza birûskê, dihele û winda dibe. Edet û ûsilên kurdî, edebiyata devkî a kurdî, tarîx û medeniyeta kurdî, ji ber van pêşketinê dawî yên teknikî, winda dibin. Civata kurdî û piraniya tevgera kurdî, îro, bi zimanê tirkî, xwe ifade dike. hejmara nivîskarêñ ku bi kurdî dinivîsin, bi tiliyên destan têñ hijmartin. Hejmara kitaban pir û pir kêm e. Meriv nikare bibêje ku jiyanekê felsefi, îlmî, hunerî û ronakbîrî ya kurdî hatiye pê.

Herçî derveyî welêt û Ewrûpa ye, meriv dikare bibêje, tevgera çandî, edebî, hunerî û zimên a kurdî, kêm-zêde bi tenê li Swêdê hinekî xurt e. Lê li Swêde jî, hejmara kitabêñ ku di salekê de derdikeyin, hemû bi hev re, nagihêñ sedî. Rast e, di warê standardîzasyona zimanê kurdî de hin gay hatine avêtin, navêñ nû yên edebiyata kurdî derketine; roman, kurte-çîrokêñ modern, şano û kitabêñ çeşnêñ nû yên edebiyatê weşiyane, hin kovar û rojname çap bûne, klasîkêñ kurdî qulipîne ser tipêñ latîñî, folklorâ kurdî heta radeyekê hatiye nivîsin. Lê ka humanîsm, ka civat û jiyanâ kurdî ya kitaban, ka yekîti û hevkariya civat û însanê kurd, ka kûrahiya

tevgeren îlmî yên kurdî, ka tevgera vejandina reh û rêçen kurdî? Ka seferberiyêñ xwendin û nivisîna zimanê kurdî?.. Ev pêşketin, kar û şixulên hêja ku min li jorê qal kirin, têra tevgereke ronesansa kurdî nakin Heye ku ev, di rojêñ pêş de, bibin tovê (embriyon) ronesansa kurdî. Lê ne îro. Hevalêñ ku îro ji ronesanseke kurdî behs dikan, ji realîtê bêtir, behsa daxwazekê dikan, ew daxwazekê tînin zimên. Roja ku zimanê tevgera ronakbîrî bû kurdî, yekitiya ziman û edebiyata kurdî hate pê, hejmara kitabêñ kurdî gîhîste deh hezaran, hejmara nivîskar, zane û ronakbîrîñ kurdan gîhîste hezaran, kitabxanêñ kurdî ava bûn, akademî, enstîtu û yekitiyîñ îlmî, çandî, edebî yên hemû netewayê kurd hatin pê, wê rojê, belê wê rojê, em ê behsa ronesansa ges a kurdî, ronesansa ku îro pir pêwist e, bikin...

*- Di şaxê edebiyatê de hunera romanê ne zûde ye, nû ye. Don Quijote a Cervantes ji romana pêşî tête hesibandin, ev jî bi kultura burjûvazî û civaka kapîtalîzmê ve tê girêdan. Gelo ji bo çi roman berhemeye civaka kapîtalîzmê ye? Sedemîn wê yên dîrokî û civakî çi ne?*

- Di warê hunera romanê de, mîna destpêk, kitabêñ tarîxa edebiyata cîhanê navê 5 nivîskaran hildidin; Cervantes (İspanya), Grimmelshausen (Almanya) Defoe û Swîft(Engîlîstan) û Le Sage (Frans). Gelo van nivîskarêñ ku bûne nemir, çi kirine? Eger meriv pir bi kurtahî qal bike, wan ev tişîñ nû di edebiyatê de anîne pê; şêweyêñ nû yên vegotinê ava kirine, jîn û ruhekî nû dane vegotinê, hîs, pejn, bîr û ruhiyetekê nû jenandine, risandine û hûnandine... Wan edebiyatêñ xwe yên neteweyî derxistine qateke bilind, lê herweha pîvanêñ nû jî dane edebiyata cîhanê, bi berhemêñ xwe, cîhan biçûktır

kirine. Ew hem neteweyî hem jî navnete-  
weyî bûne. Li ser riya ronesansa neteweyî  
û navneteweyî, wan ziman, edebiyat û  
şêweyên vegotina edebî nû kirine. Wan  
hîmîn çesneke nû ya edebî danîne  
roman...

Mîna her tiştî, edebiyat jî bi wext û  
heyaman girêdayî ye. Her wext û heyam  
awa û şêweyên xwe yên taybetî yên edebî  
tîne holê. Her pêwendîyeke nû ya civakî,  
her guherîna şexs û şexsiyetê çêşnên xwe  
yên taybetî yên edebî tînin pê. Roman  
encameke riya ronî û dirêj a ronesansê,  
zaroka heyameke nû ya însaniyetê ye.  
Mîna ku hûn jî dibêjin, roman hunera  
nûjen a edebî ya heyama kapîtalîzmê ye.  
Ev nivîskarênu ku min li jorê qal kirin, hêz  
û quweta xwe ya guherîn û nûkirina  
ziman, huner û vegotinê ji ku stendin?  
Naxwe wan hêz û quwetek, bîr û şîrek,  
hîs û hesteke nû diviya da ku wan bikari-  
biya çesn û hunereke nû ya edebî ava  
bikira? Wan ev tişt ji guherînên heyama  
xwe wergirtin. Ew dûrbîn û rêber bûn, li  
pêşıya civatê bûn. Hê di destpêka  
guherînan de, wan bîhn, tahm û rengên nû  
yê guherînan ditin û berhemîn xwe li gora  
wan ava kirin.

Ne hewce ye ku ez wan guherînan, li  
vir, bi dûr û dûrêjî binivîsim. Haya me  
hemûyan ji wan heye; cîhana feodalîzmê  
hildiweşîya, çîneke nû ya desthilat dihate  
pê, burjuwazî. Digel burzuwazî, cêwikê  
wê proletarya jî dihate pê. Çîn û komên  
din ên nû yên civatê dihatine pê. Hem  
burjuwazî hem çîn û komên nû, tevî  
tiştîn din, hewcedarî şêweyên nû yên  
vegotinê bûn. Şêweyên welê ku bikaribûna  
guherînan salix bidana, ziman û úslîb nû  
bikirina, nûbûn û vejînê nîşan bidana,  
"merivê/a nû yê/a ronahiyê" taswîr bikirina,  
xwe bi gel çîn û komên din ên civatê  
bigîhandina, lê di eynî wextê de, ji  
berhem û eserên heyamên kevn, ji şêwe û

çêşnên vegotinê yên kevnar jî destkevtî  
bûna. Çi? Kîjan?

Roman...

Belê, roman, hunera romanê, celeba nû  
ya vegotinê, weha hate dinê. Romanê  
weha dest bi jiyana xwe ya dirêj, ges,  
balkêş û rengîn kir. Roman nû ye, nûyişî  
ye, lê ew li ser hîmîn çêşnê kevnar rawes-  
ta ye. Roman vedibêje, lê ew agahîyen  
civakî, tarîxî, siyasî, çandî û edebî jî dide.  
Roman tevger, şoreş, guherîn û dewr û  
dewranen kevn/nû salix dide, lê ew li ruh  
û hestîn şexs û kesan jî hûr dibe. Roman  
xwendevanan dibe cîhanen cîhê, lê armanc  
analîz û lêhûrbûna ruhiyeta xwendevan bi  
xwe ye. Roman şîhîrî ye lê ne şîhîr e;  
destanî ye, lê ne destan e; şanogerî ye, lê  
ne şano ye; çîrokî û efsanewî ye, lê ne  
çîrok û efsane ye; ilmî ye, lê ne ilm e,  
felsefî ye lê ne felsefe ye; psîkolojîk e, lê  
ne psîkolojî ye... Ne hewce ye ku meriv  
listê dirêj bike. Roman ev hemû tişt in, lê  
ne tiştîk ji van e jî. Roman, roman e.  
Roman hunera civatên pêşketî û modern  
e, şêweyê vegotina merivên heyamên nû  
ye...

- Roman çawan ji destanê tê vegetandin?  
Ferqîyeta wan ci ye?

- Di bersîva pirsa jorîn de, di warê fer-  
qiyyeta roman û destanê de hin agahî hene.  
Roman hunera heyama kes û şexsên nû  
ye, lê destan ya heyama kom û komikên  
kevnare ye. Roman ji aliyê şexs û kesekî  
tê nivisîn, lê destan avahîyeke civatê ye.  
Xwedîyê romanê diyar e, lê yê destanê  
hemû civat e. Roman bi hîzr, bîr, zanîn,  
ked û quweta şexsekî ava dibe, lê di  
destanê de keda hemû civatê û nifşen  
civatê heye. Roman encameke xebata  
şexsî ya nivîskarekî ye, lê destan encame-  
ke salan, sedsalan a lebata civatê ye.  
Roman, di destpêkê de, tê nivîsin, lê

destan tê gotin. Roman tê nivîsîn û karê wê xelas dibe, lê destâ tê gotin û veguhesin û guhertin, ji nifşekî kevn ta nifşekî nû. Di romanê de her celeb şêweyên vegotinê hene, realist ne realist, çêkirî, neçêkirî, û hwd. lê destan, bi giştî, xwediyyê şêweyekê ye; nerealist û efsanewî. Deh, panzdeh, bîst, sîh, cil, sed şêwe û variyantên romaneke nivîsî tune ne û nabin, lê yên destanê hene û dikarin hebin. Eger ne bi qesta rabûna karê hunerî û estetikî be, kes nikare li romaneke nivîsî zêde bike û awayê xwe bidiyê, lê meriv dikare li destanekê zêde bike, bi gotin û ûsliba xwe bibêje, rengê xwe bidiyê. Roman vegotina hîs, pejn, deng, bîr, şîur û hestan e, lê destan vegotina bûyer, pêwendî û qewimandinan e.

Lê bêguman, gelek roman hene ku bi şêweyê destanê hatine nivîsîn. Meriv nikare wan mîna destanê qebûl bike û bisinifîne. Ew, bizanîn, bi ziman û ûsliba destanê, bi awa û şêweyên vegotina destanê, hatine nivîsîn. Lê kesê ku wa nivisiye, diyar e, armanc û hedefen wî diyar in. Eger ez hin mîsalan bidim, nivîskarên mîna Hermann Broch, Per Lagerkvist, I.B. Singer, Christa Wolf, İtalo Calvino, Michel Tournier, Yaşar Kemal û hwd. jî ev celeb nivîskaran in. Ew di romanên xwe de destanan, ji nû ve vedijînin. Lê destanên wan, ji nû ve, ava bûne; ew roman in.

Kurd jî dikarin, bi rengên nû, destanên xwe vejînin. Destanên kurdî ku mîna lehiyekê diherikin, dikarin bibin kahniyeke bêpayan ya romana kurdî. Gel û netewayen din ên cihanê destanên xwe vegustine ser çeşnên nû yên edebî. Îlyada û Odesa bûye kahniya, heye ku, bi hezaran romanen. Destanên latînî, cihû, file, çîrokên Încil û Tewratê bûne bingehê hêja yên romana ewrupayî. Çima kurdên bi van metodan romanen xwe ava nekin?

Kurdên ku ji herkesî bêtir hewcedarê romanen in, dikarin, bi alîkariya destanen mîna Memê Alan, Siyabend û Xecê, Zembîlfiroş, Cembeliyê Hekarê û Binevsâ Narîn, Ker û Kulik û yên din, edebiyateke nûjen a gelekî xurt, di demeke kurt de ava bikin.

- *Mîna ku roman di sedsalê 18 û 19' an de xurttir bû. Fransizan, rûsan, emerîkiyan gelek deha derxistîne. Berhemên wan hê jî bi zewq têne xwendin, problemen ku wan anîne ziman hê jî aktuel in. Gelo teknolojî û industralîzma ku bi lez bi pêş dikeve, romanê qelsir, xwendevanen wê bi sînortir dike; an jî postmodernîzm, bikaranîna stil û uslûb, tema û naveroka romanê êdî ji bo piraniyê ne balkêş e?*

- Ev pirsiyara we, iro, pirsiyara cîhana rojava, welatên endustriyê û civatên xwende ye. Pirseke weha, bişik, ji bo kurdan ku hê nû hunera romanê dinasin û ava dikin, xerîb e. Mîna civat, civata kurdî ne civateke pêşketî ya endustriyê ye û kurd jî, mîna civat, ne xwende ne, eger xwende bin jî ne yên hunera romanê. Loma pirsên weha ji bo kurdan gelekî luks in. Lê civatên rojava vê pirsê, iro, bi xurî munâqeşe dike.

Berî niha bi du salan, Akademiya Swêdê konferanseke du rojî li ser vê pirsê amade kiribû. Gelek nivîskar û şahîrên navdar ên cihanê hatibûn wê konferansê. Roja duwemîn, gava dor hate şahîr û feylesofê navdar ê meksîkî Octavio Paz, mîna niha tê bîra min, wî di dereke gotara xwe de, weha got; "heta ku ev cîhana kevnar li dora royê bizivire û însan û însaniyet bijîn, heta ku haletên însanî hebin, rewşen xweş û nexweş, rind û kirêt ên însanî hebin, hewcedarî bi gotin, vegotin, edebiyat û çeşnên edebî hebe. Ne roman

*xelas dibe, ne jî şihîr. Ji ber ku herdu jî neynika ïnsan û ïnsaniyetê ne. Însan jî her hewcedarê neynikan e..."*

Kî ci dibê bila bibê, kahniya romanê nemîciqiye. Ji bervajiyê, îro ji her carê bêtir roman diweşin. Xelk ji her carê bêtir dixwînin. Lê tiştek heye; civatê ewrûpa û welatên rojava, di nav van çend salên dawîn de, guherînine mezin ên teknolojiyê tînin pê. Civat, ji nû ve, li gora van guherînan, bi rê dikevin. Bêguman e ku nivîskar û xwendevanê van civatan jî, li gora guherînan, xwe diguherînin, li celebên nû yên xwendin û nivisînê digerin, wan diceribînin, dixwazin di warê nivisîn û xwendinê de heyamên nû ava bikin. Edebiyata cîhanê û hunera romanê dewrêne weha gelek dîtine. Di her destpêka heyameke nû de, munaqeşe û guftûguh bûne, gelek caran hatiye gotin ku roman hew tê xwendin. Lê romanê hertim, bi krasekî nû (geh bi kirasê modernîzmê, romantîzmê, geh bi yê naturalîzmê, realîzmê...) xwe daye xwendin û îspatkirin. Rast e, êdî kes îro mîna romana Tolstoy, romaneke bi çend hezar rûpelan nanivisîne, lê hejmara roman-nivîskarêن îro, heye ku hezar car ji dema Tolstoy zêdetir be.

Bila kes meraq neke, çawan Dante, Shakespeare, Cervantes, Hugo, Goethe, Flaubert, Dostoyevski, Proust û hwd. do û îro nûjen bûn/in, herweha sibê roj jî ew ê ji nûjeniya xwe tu tiştî winda nekin û bêñ xwendin, -tevî nivîskarêن heyamên nû.

- *Di cîhaneke ku klasîzm, realîzm, naturalîzm, romantîzm û bi dehan ïzmên din munaqeşe kiriye û jiyaye de, rewşa edebiyat û hunera kurdi çawa ye?*

- Klasîzm, naturalîzm, romantîzm, realîzm û bi dehan ïzmên din ku hûn qal

dikin, ne ji bo kurdan e. Edebiyata kurdi, tu carî, heyamên edebî yên weha nejiyaye, tê re derbas nebûye. Ji destpêkê heta îro, edebiyata kurdi bûye edebiyata xwe paras-tin û berxwedana bingehîn. Mîna her tişte kurdi, ziman û edebiyata kurdi jî bûne hedefen xedar ên serdesten biyanî. Heye ku di dereca yekemîn de. Dijminen kurdan ku hertim hebûne, êrîşen gelekî xedar birine ser ziman û edebiyata kurdi. Di ser de, civata kurdi jî her girtî maye û pêwendiyen xwe yên eşîrî domandiye. Ji levre, ne zimanê kurdi bi pêş ketiye, ne jî edebiyatê karibûye gavên nû bavêje û xwe bi heyamên nû yên edebî bigihîne. Gava meriv piçekî çavê xwe li edebiyata kurdi digerîne, meriv dibîne ku tema, daxwaz û armancen edebiyata kurdi her parastina ziman û huwiyyeta kurdi bûye. Ji ber rewşa kambax a "konstant", nivîskarêن kurdan fersend û imkan nedîne ku pêñusa xwe di war, çêşn û şêweyên nû yên edebî de bi kar bînin. % 99'ê edebiyata kurdi ya nivîskî, bi teknîk û estetîkeke gelekî qels û sivik, li ser berxwedan, serîhildan, zulim, zordarî, hebûn û mayinê ye. Loma bi ya min, herwekî ku min di gelek cîhan de gotiye, edebiyata kurdi edebiyata man û nemanê ye. Meriv nikare edebiyata kurdi bide ber edebiyatê din ên cîhanê. Şert û mercen ku edebiyata kurdi tê de ye, ji yên din gelekî cihê ye. Edebiyata kurdi ji imkan, pêwendî, sazgeh, zanîn û perwer-deyî û bazarên edebiyatê din bêpar e.

Edebiyata kurdi, zaroka sêwî û stûxwar a edebiyata cîhanê ye.

Herçî rewşa îro ye, meriv nizane ci bibêje. Ez pirsa we li we vegerînim; hûn rewşa ziman û edebiyata kurdi çawan dibînin?.. Ez ne bawer im ku tu kes bikaribe bibêje ku rewşa ziman û edebiyata kurdi baş e. Eger yek bibêje jî, meriv divê pê bawer neke. Ew wê yekê, ji bo dilxweşiyê, dibêje. Bi baweriya min, li

dinyayê tu edebiyat nîn e ku mîna edebiyata kurdî di nav rewşekê zîz, nexweş û kambax de be. (Eger em welatên mîna Rwanda ku bi şerên eşîrî, bi sed hezaran meriv tê de hatine kuştin, li aliye kî bibîlin...) Em divê qebûl bikin ku civata kurdî (bi giştî) û ronakbîrên wê civatê, bi şûnde mane, di warê pêwendiyêñ navnete-veyî de pir girtî ne û nikarin xwe bi leza wext û dewranê bigihînin. Ji ber rewşa ku kurd tê de dijîn, meriv nikare behsa jiyanekê xurt a edebî û ronakbîrî ya kurdî bike. Bêguman hin lebat hene, lê ev jiyanâ edebî û ronakbîrî pir û pir qels e. Hejmara nivîskarêñ kurd bi qasî tiliyêñ destan in, kovar û rojname pir kêm in û pir kêm belav dibin, kitab (her celeb) pir kêm diweşin. Kurd bi zimanê xwe pir kêm dixwînin. Pêwendiyâ ku di navbera ronakbîr, nivîskar, kovar û rojnameyan de hene, ne baş in...

Jixwe li welêt rewş li ber çavan e. Zordarî û dijminahiya dijminêñ gelê kurd bêhidûd e. Hema ci bigire li her aliye welêt şer heye. Li cîhêñ ku tê de şer nîn e jî, bandûra şer hilawestiye. Di rewşekê weha de, meriv nikare jiyanekê edebî û ronakbîrî ava bike. Li derveyî welêt jî, kurd pereğende û jihevketî ne. Problemêñ wan in civakî, siyasî û kulturî bê hejmar in. Mixabin wan bi civatêñ ku tê de dijîn re, pêwendiyêñ baş û bikêr ava nekirine, bi xurtî neketine nav ziman, çand û edebiyatêñ din ên cîhanê. Ew îzole dijîn û ecizî û esebiyeta xerîbiyê û surgûnê her li ser wan e. Ev ecizî û esebiyet tesîrê li ziman, uslib, pêwendî û berhemêñ wan dike. Gava meriv nikaribe xwe nû bike û bikeve nav ziman, çand, felsefe û edebiyatêñ nû û bi ava dewlemendî û tecrubêñ wan ku ji bo kurdan pir pêwist in, xwe bişo, hingê meriv li xwe û li yên xwe vedigere û ji bo ku bikaribe xwe biparêze û hebûna xwe nişan bide, wê

ecizî û esebiyeta xwe, bê pîvan û bê payan, di serê der û dora xwe de, dibarfîne. Loma dijîtî û berberiyêñ şexsî, siyasî, komeletû yên kurdan pir in. Kurd di nav derya dijîtiyan de dijîn. Di rewşekê weha de jî meriv nikare jiyanekê xweş û bikêr a edebî, felsefî û ronakbîrî ava bike. Û gava jiyanekê weha jî neyê pê, bêguman, meriv nikare eser û berhem jî biafirîne.

(Eger iro, carina, hin eser derdi kevin, em divê ji bîr nekin ku ew bi hezar zehmetiyan diweşin.)

*- Di romanê de bikaranîna zimêñ girîng e. Gelo bi zimanekî mîna kurdî ku bi sed-salan e nebûye zimanê nivîsandinê, avakirina romaneke modern ne zehmet e? Romana modern ci ye?*

- Bê guman e ku her kar û şixulê nû yê ziman û edebiyata kurdî zehmet e. Heta meriv dikare bibêje, pir zehmet e. Ne romaneke modern, bi zimanê kurdî, nivîsîna romanekê bi xwe, bi serê xwe, karekî gelekî dijwar e. Nivîsîna şîhîra nûjen jî zehmet e, şano jî zehmet e, ceribandi jî zehmet e. Zimanê kurdî, cîhana zimanê kurdî, bîhn, tahm û rengêñ zimanê kurdî ne yên iro û civata iro ne. Ew yên do û civatabihurî ne. Zimanê kurdî, ji ber sebebêñ nas, nikaribûye xwe bi heyamêñ nû bigihîne. Ev jî rastiyêñ basîd ên zimanê kurdî ne.

Lê belê, meriv divê ci bike?..

Bi qasî ku ez ji tecrubêñ xwe dizanim, rî li ber merivan ne zêde ne; ya meriv ê israr bike û bi kurdî binivîse, yan jî merivê zimanekî din ku ji kurdî gelekî pêşketî ye, tercîh bike. Kîjan? Di hilbijartînê de gelek faktorêñ şexsî, exlaqî, siyasî, civakî, edebî, aborî û psîkolojîk hene. Piraniya kurdêñ Turkiyê, hema ci bigire, % 95'êñ wan zimanê tirkî tercîh dîkin. Çima ew weha dîkin? Berî ku

meriv rexneyên tûj li wan bigire û wan ta-wanbar bike, divê meriv li ser sebeban serê xwe biêşîne.

Eger em vegeerin ser kesêن ku zimanê kurdî hildibijêrin, berî her tiştî, meriv divê bibêje ku ew hem bi karekî gelekî hêja û giranbiha yê ehleqî radibin, lê di eynî wext de, ew Donkîşotiyekê bêpayan dîkin. Bi zimanê kurdî nivîsin, zimanê kurdî parastin û pêşxistin, berî her tiştî, ji bo ronakbîrêñ kurd, wezifeyeke ehleqî ye. Hez û evîna parastin û pêşxistina zimanê kurdî, hez û evîna însan û însaniyetê ye. Lê digel pîroziya vî karî, jiber rewşa ku min li jorê qal kir, karekî Donkîşotî ye; ziman ne standard e, yekitiya zimên çenebûye, hê ferheng, ansiklopedî, kitabêñ berdest ên bingehîn nîn in, dezgeh û mueseseyen neteweyî yêñ ziman û edebiyatê nîn in; civîn, civat û hevîduđitînen neteweyî yêñ ziman û edebiyatê nayêñ pê, mîsalêñ nûjen ên nivîskî bi qasî tiliyêñ destan in...

Rewş weha ye, lê pîrsiyar dîsan eynî ye; meriv divê çi bike?.. Eger meriv biryar daye ku rahêje pêñûsê û bi zimanê kurdî binivîse, hingê rê yek e; nivîsin, nivîsin û nivîsin... Herkesê ku bi kurdî binivîse, di destpêkê de û heta demeke dirêj, ê pergî zehmetiyêñ mezin were. Ev weha ye. Ji bo min jî weha ye, ji bo kesêñ din jî weha ye, ji bo bavê tevgera vejandina zimanê kurdî Celadet Alî Bedir-Xan jî weha bû. Heta destpêka salêñ 1930-î jî, C.A. Bedir-Xan nikarîbû nameyek bi kurdî binivîsa. Lê bi saya nivîsin, nivîsin û dîsan nivîsinê, wî bîhn û nefeseke nû da zimanê kurdi.

Ez li ser xwe bibêjim, gava min dest bi nivîsîna zimanê kurdî kir, tiştîn ku min dînivîsin, bêyî zimanê kurdî, bi her tiştî dişibîyan. Meriv dikarîbû ew bi her tiştî bi nav bikirina, lê ne mîna "nivîsarêñ zimanê kurdî..." Hûn nizanîn ka rebenê

zimanê kurdî ji destê min çi kişandiye, bi destê min çend caran qetî bûye! Çendîn car min zulim lê kiriye û nezanî û qelsiyêñ xwe xistine ser stûyê wî! Lê ez bawer im ku îro rewş gelekî cihê ye. Di destpêka salêñ 80-an de, gava min dil hebû, dest bi nivîsîna romanekê bikira, hin heval û dostêñ min, bi dostî bala min kişandin û gotin, "ma tu dîn bûyi, ma meriv dikare bi zimanê kurdî tu romanen biafirine? Çima tu bi swêdî yan jî bi tirkî nanivîsi? Tu dê bi van zimanen, bi hêsanî, miyeser bî..." Lê min, bi zimanê kurdî, dest bi nivîsîna romana xwe kir. Ji ber du sebeban;

Yek: Ji ber wê berpirsiyariya ehleqî ku min qal kir û bi baweriya min divê hemû ronakbîrêñ kurd hîs bikin. Dido: Baweriya min bi nivîsîna kurdî hebû. Ez pê bawer bûm ku meriv ê bikaribûya, bi zimanê kurdî, romanek ava bikira. Berî min, kesinin din ev şixul bi ser xistibûn. Çima min ê nekira?

Îro jî ez di eynî baweriyyê de me; meriv dikare, bi zimanê kurdî, romanen, heta romanen modern, binivîse. Îmkanen zimanê kurdî hene, avahî, vokabuler, rêziman, qayideyên nivîsinê û xurtiya zimanê kurdî rê dide vê yekê. Meriv dikare edebiyateke bedew ava bike, bi her awayî xwe bi zimanê kurdî ifade bike, pê bixwîne û binivîse. Lê bêguman, jê re wext, sebir, xebat, azîm, zanîn, lêger, temrîn û nivîsin, nivîsin û dîsan nivîsin divê... Ji xwe eger weha nebe, eger nivîskar û ronakbîrêñ kurd nikarîbin bi zimanê kurdî xwe ifade bikin, edebiyateke bedew bînin pê, roman, kurte-çîrok, piyes, şîhîra nûjen, ceribandinan binivîsinin, hingê tu mana nivîsîna kurdî namîne. Hingê zimanê kurdî dê ne zimanê civatê yê zînde, lê zimanekî mirî yê mu-zeyan be.

Helbet, barê nivîskar, zimanzan û

ronakbîrê kurdan pir giran e. Li milekî ew divê ziman biparêzin û wî bi kar bînin, li milekî ew divê li xwe, li gencîneyên folklora kurdî vegerin û li dewlemendiyêñ zimanê kurdî ku iro ji bîr bûne, hûr bin û wan ji nû ve vejînin, di berhem û eserên xwe de bi kar bînin. Li milekî jî ew divê kirasekî nû yê modern li zimanê kurdî bikin, bîhn, tâhm û rengên modern bidinê. Yanê ew divê zimanê kurdî biguhezînin roja iro, dema nû û bikin zimanê iro yê civat û her celeb tevgerê. Eger weha nebe û zimanê kurdî dernekeve qata zimanêñ cîran û yên din ên cîhanê, tu xelasiya zimanê kurdî nûn e. Ew ê winda be. Iro gelek netewe û gel bi vî karî mijûl in. Hinêñ wan li ser riya serketinê, hin jî bin ketinê ne. Welatêñ erebî yên Mixribê, iro, gelekî hewl didin ku zimanê erebî, di ware xwe îfadekirina jiyanâ edebî, felsefî û ronakbîrî de derkeve qata zimanê fransizî û li hember zimanê fransizî, xweseribûna merivê ereb nîşan bide. Gelek ji welatêñ Afrîka û Asya Dûr jî li hember zimanêñ ewrûpî seferberiyeye neteweyî ilan kirine. Heye ku ev şer û xebata wan pûç û vala ye. Lê ew vî karî dikin. Çima kurd ê nekin?

- Problemên edebiyata kurdî yên bingehîn ci ne? Ji bo başkirin û geşkirina wê divê ci bêne kirin?

- Her cara ku pirseke weha ji min dibe, Platon û şikefta wî tê bîra min; di binê axê de şikefta heye. Deriyê şikeftê ronî ye û riyekê ronî ji ber devê şikeftê derbas dibe. Di şikeftê de merivin hene, dest, pî, pişt, stû û lingêñ wan bi zînciran hatine girêdan. Pişta wan ne bi dîwarê şieftê, ji bervajiyê, ber bi deriyê şikeftê ye. Ew deriyê şikeftê, rê û ronahiyê nabînin, çavêñ wan bi tenê dîwarêñ tahtên şikeftê dibînin. Ew nikarin serê xwe jî bizi virînin da ku derî û ronahiyê bibînin. Her û her ew di şikeftê de ne, haya wa ji derive

nîn e. Meriv di riya ber devê derî re derbas dibin, ronahî siya wan li dîwarê şikeftê dixîne. Lê kesêñ şikeftê, bi tenê, siya meriva dibînin.

Rewşa kurdan jî, kêm-zêde, weha ye; dest û piyê wan li qeydan ketine, bi qehîmî, ew bi hev re hatine girêdan, rûyê wan ji derî, rê û ronahiyê hatiye zivirîn, rê û ronahî li pey wan in. Ew bi tenê dîwar û siyêñ li ser dîwêr dibînin. Û di ser de jî, ew li hev nakin, ji hev hez nakin û bi dest û piyan li hev dixin, -dewsa ku alîkariya hevûdu bikin da ku ji wan qeyd û zincîran xwe rizgar bikin.

Problemên bingehîn ên civata kurdî û herweha yên edebiyata kurdî di nav vê tabloya kambax de veşartî ne. Problemên herî mezin tarîfî, nezanî, cehalet, berberî û bêgavî ne. Pêşî kurd divê dev ji berberiyêñ xwe yên bêmane û bêsebeb ku pirî caran ji nezaniyê têñ holê, berdin. Ev berberî û dijîti di her warî de, edebiyat jî tê de, hêz, quwet, daxwaz û besta kurdan dadixe nikta sifirê. Bi van probleman, ne mumkin e ku meriv bikaribe edebiyateke ges û bedew ava bike. Û ne mumkin e ku meriv xwe bi derî, riya ronî û tîrêjîn ronahiyê bigihîne. Hin gavêñ pîroz têñ avêtin, li vir, li wir, kesin, komin hin tiştêñ hêja dikin û hin berhem û eser diafîrinin. Ew li ber dilê min pir ezîz û bi qîmet in. Lê ew nikarin xwe li ber pêlêñ berberî û perçebûnê rabigirin.

Edebiyata kurdî, iro, hewcedarî germahî û samîmiyetê, biratû û dilsoziyê, zanîn û pisporiyê, rabûn û geşbûnê, hebûn û yekityî ye. Ji bo vê yekê jî kampanya û seferberiyêñ mezin û boş pêwist in. Karêñ weha jî ne karê şexs û kesan in; divê civat, hêz û quwetêñ civakî, siyasî û aborî bi karêñ weha rabin.

Em divê xwe bi mîjî, şêwe, ziman û üslibêñ xebatê yên medenî bigihînin. İdeolojî û siyasetên wan ci dibe bila bibe, lê yên medenî. Me dezgeh û mueseseyên medenî, xebat û lebatêñ medenî, hedef û armancêñ medenî divêñ.

# KEVOKÊ

Arjen ARÎ

Kevoka aştiyê, kevoka spî  
vê sibê tu çi dikî di ezmanê Lîcê de?  
Bazên goştxwir, teyrêن xwînî te dîtin?  
Axa şewitî te dît, bîhna miriyan hate  
te?

Ne şaxek zeytûnê ne pelek çilo hiştin  
kevokê, tê xwe li ser çi deynî?

Xwe daneyne kevokê, xwe daneyne  
peşkên xwînê li te dikevin.  
Teyrêن xwînî bibînin... te çengo  
bikin...

Çavêن min ziwa ne nola kaniyên  
miçiqî  
û nikarim bigirîm kevokê, nikarim  
bigirîm  
hêsrên min Lîcê bûn, bi Lîcê re  
teriqîn.

Xwe daneyne kevokê, bifire.  
Ji aliyekî li hêsrên min bigere  
ger tu layiqî aştiyê bû  
silavan lê bike ji kîsê min.  
Ku bijê biraftî: biraftî?  
kevokê,  
xwîn sor e niha;  
spî ye aşfî...

# MASÎKO

Masîkê ku di nava qeşê de asê mayî,  
masîko!  
looo masî!  
tu di avêñ derdora Helepçê de bijiya  
tê şérîn ba ewqasî?

Reqêñ qeraxa behran bi xwedî ne  
û ax berdane ji wan re, azad bûne.  
- çengek ax de biraftî- kî navê  
masîko,  
kî navê bijî  
bin ezmanekî de bi şahî?

lê wer bibîn  
fetisandin ava Munzir de biraftî.  
Newala quesaban veşartî,  
lê nepirse  
binax kirine mirovahî...

dîsa jî  
masîko, dîsa jî  
li ber xwe bide.

# RÊVINGÊ BÊNAV

Rojan H.

## I.

Jî tevazû û dilnizmiya xwe çu cara behsê jiyan û serborîya xwe nedikir. "Ji xwe behs kirin" ji wî dûr bû. Eve xasyeta wî bû... Dema yekê di nav refek mirov an jî di civatekê da axivtin anîba ser jiyan, kar û kiryarên xwe, sor dibû, xûhê di ser û çavêن wî da wekî morikan xûya dikir... Mirovekî pîrbêj nebû. Bêdeng bû. Lê belê, bêdengîya wî, bêdengîyeke rûmetû û serbîlîdiyê bû... Mirovekî sernerm bû, lê sernermîyeke bi xwe bawer... Cihê bêdengîyê bêdeng, lê yê axivtinê jî mirovê gotina xwe bû... Bêdengî û axivtina wî di senga şêrêstor da bû : Di her du alîyên wî da jî sehm û şîrînîyek hebû...

Xasyeteke herî başe wî jî ew bû ku xwe dida ber hemû zor û zehmetîyên jiyanê. Li ber herikîna dijware jiyanê dilsistî jî ji wî dûr bû...

Xwediyyê van xasyetên baş û qenc di nav civatê da birûmet û qedir bû...

Xwediyyê van delalîya, xwediyyê dengekî xweş û zelal jî bû. Ji mewlid û qesîdêni ayîmî bigre heta stranê koçika û folklorîk wekî pêlîn aveke fûr û zelal ji dengê wî belav dibûn... Strana folklorîke Gelîyê

Qewalê, Kevoka Hesen Cizîrî û Mewlîda Bateyî li serê repertuara wî bûn...

Belê xwediyyê van delalîya, xwediyyê bejn û baleke bedewe şîrîn jî bû. Bejn û baleke bişêl... Her cil û berg ji bedena wî ya mîna tayê spîndara biharê dihatin... Digel dilnizmî û sadetîya xwe, lê herweha mirovekî hejxwekirî jî bû. Li gor her cûre cilêن wî aksesuarek hebû. Dema cejn û şahîya şel û şepik berdikirin, şasik girêdida, lê herweha gopalê zirave heyzeran jî ji destê xwe kêm nedikir. Lê belê, dema çakêt û pantol jî berdikirin berçavka qeytan zêr ji ber çavêن xwe yên mîna morikêن xwezayî dûr nedikir...

## II.

Dema em zarok, me ev mirovê mirovhez bi van xasyetên herî baş û pak dinasî... Wekî ev abîdê qencî û başiyê barkirî çûye navçeyeke dî ya welat xelk bi tevayı gelek xemgîn bibû...

Sal bi dûv salan ketin em jî mezin bûn, bûne xort û ciwan... Dema em careke dî rastî vî mirovê kûbare mirovhez hatî, ew jî bi nav salan ketibû lê hêj jî gelekî aza û li ser xwe bû...

Digel derbazbûna deh salan, lê çawa em rastî hev hatin heçku ew deh salen borî qet nehatine jiyan wisa dilgermî û rûkenîyeke ji dil nîşanî me dabû...

Li cihê rasthatina me yê nû, kêm zêde pênc salên me bi hev ra derbaz bûn. Di midchê van pênc salan da dan û standinê me germ, ges û bilindtir bibûn... Ew nasyarî û peywendîyên dostayetî û hevwelatiyê têr û tijîtir bibûn. Bawerî û welatperwerîya ji dil bibû hevîrê dan û standinê me yên nû... Heroj nêzîkbûna wî ya ji vî alf ve qedir û qîmetê wî mezin û bilindtir dikir di nav me da... Ew sadetî, tevazû û dilnizmîya di kesînîya wî da ji xwe rengekî gestir dida peywendîyên wî... Ew êdî bi vê pêşketinê û pey-

wendîyêñ nû ketibû nav rêzêñ welatperwerîya têkoşer...

### III.

Di têkoşîna jîyana rojane da bedeldan carek be, di têkoşîna bawerî û welatperwerîye da ev bedele ducar û hetta zêdetir e... Helbet bedela herî mezin jî serîdane... Heke mafê herî mezinî mirov jîyan be hingê mana û naveroka serîdanê baş tête zanîn...

Ev mirovê netirs pêşîyê kete nav dezgehê şkence û zindana... Piştî zindanîya du meha dema derketî û hatîye nav mal, eyal û hevalên xwe, ken ji devê wî kêm nebibû. Ne xem, ne hêrs û ne jî tirs... Herwekî tiştek nebûy wî hewayê germe berê di navbera xwe û dost û hevalên xwe da domandibû...

Lê belê, wî carekê xezeba hêzên dijgeliû dewletê kişandibû ser xwe. Ketibûn ser dewsa vî mirovê dilsoze welatparêz. Li gorî destûr û sistema wan ya azar, şkence û kuştinê êdî mafê jîyana wî nemabû li ser rûyê erdê... Diviyabû ku rojek zûtir vî mirovê pake têkoşer, dilsozê xebat û serketina gel û welatê xwe kêm bikin ji nifûsa gel... Diviyabû ku ew êdî nejî, bêhna wî çik bibe... Qol û qirar dabûn carekê dijminen gel. Li hêviya keysekê bûn. Pêşîyê girtin, du meha hefs kirin. Diviya demekî dirêj nekeve navberê. Ji ser derketina wî sê meh derbaz nebûn vêca ferманa sekinandina dilê wî yê ku ji bo gel û welat davêt, dan...

### IV.

Zivistanekê dijwar û hişkesar bi ser payîza direng da hat. Mij û morana serbajêrê dewleta dagîrker û şevdirêjîya zivistanê bi kêrî nijdevanêñ dijmin dihat...

Meha Kanûna 79-ê ber bi xilasbûnê ve bû. Digel vê mehê salek dî jî dikete nav

rûpelên dîrokê. Hazirîya sala nû xûya dikir... Gelek plan dihatin danîn, xewn û xiyal dihatin kirin, fanteziyeke kûr û fireh peyda dibû di serê mirovan da ji bo sala nû...

### V.

Wekî heroj, sibê zû ji xew hişyar bû. Li ser cihê xwe ser û çavêñ xwe perixandin, bawişî... Pê hesîya ku îro leşê wî piçekê giran bûye... Xwe vî alî wî alî bada û paşê yekcar da xwe û rabû ser piya... Pêşîyê destê xwe avête saeta xwe ku li destê xwe girêde... Dûdilî bû gelo biçe serşokê avekê li xwe bike an ne... Paşê biryar da ku aveke sivik li xwe bike. Saeta xwe girênedâ û dîsa danî ser komodînê... Derî hêdîka vekir ku jin û zaro hişyar nebin. Eve adetê wî bû. Çu cara digel hişyarbûna xwe nedixwest kes ji vê xewa şirîne spêdê hişyar bin. Lewma gelek bi bêdengî radibû...

Çu serşokê xwe rûs kir. Sûrik vekir, piçekê ma heta av germ bû. Li serşokê jî hizirî ku gelo aveke sivik li xwe bike an qederekê bimîne û hestîyên xwe baş germ bike di nav ava kelegerm da... Lê belê, dîsa zû biryar da ku wext nekuje, zû aveke sivik li xwe bike û ji karê xwe ra direng nemîne...

Ew nêzîkî sih salan bû dixebeitî. Çu cara direng nemabû bo kar... "Her tiş li wextê xwe" prensîba wî bû... Bi van bîr û hizra û bi lez avek li xwe kir, rabû xwe zûha kir, rihêñ xwe tiraşîn, ava gula li rûye xwe'y nerme hilû kir, pora xwe şe kir û ji serşokê derket... Çu mezela nivistinê cilêñ xwe derxistin û li kolanê xwe cilik kir... Dîsa vegerî serşokê û li awênenê nêri. Şeyekî dî jî avête pora xwe û derket... Rûnişte ser kursîya li kolanê û pêlavâ xwe kire pê xwe û benêñ wê girêdan. Êdî hazirî çûna kar bû... Sakoyê xwe yê dirêj û bi kemer berkîr, şewqê

xwe kire serê xwe û vê carê çû ber awêna li kolanê û berê xwe da bejn û balê... Wê bejn û bala zirave tenik... Niha û timam bû. Berê xwe da derî, destê xwe avêtê ku veke, lê sekinî, digel hizirîneke kurt derî vekir û derket. Digel derketina xwe derî gelek hêdî û bi qayde girt...

Bi pêlekana ve berjêr bû, hate tebeqa binî û berê xwe da derîyê mezînî avahî ku derkeve... Rastî du kesan hat. Bêhemd piçekî sekinî li wan nêrî û derbaz bû... Destê xwe avête derî ku veke, ji pişt ve demance dirêjî pişta wî kirin û gotinê ku nebizive û rast derkeve...

Ew li pêşiyê, kuştedar li paş derketin...

Berê spêdê saet 7. Spêdehîyeke reş û tarîye zivistanê. Li derve sir û seqem, mij û moran... Dinya ker û kip... Hercar vê demê hat û çûn pir bûn. Lê mîrata wê rojê hûnê bêjin ku erd ker bûye û mirov tê da winda bûne... Ne hatin ne jî çûnek...

Herdu xwûnrêjan ew dane pêşîya xwe ber bi avahîyekî nû destpêkirî birin. Sir û seqemê, mij û moran û tarîfiya berê spêdê hewa gelek bêhnçik kiribû... Qederê du sed gava wisa bêdeng çûn... Ketine nav kavilê avahî. Xwûnrêj neaxivtin, deng jê derneket... Ew birine ser çala kişlê. Sekinîn...

Spêdehîyeke zû û tarî, spîşîya kişlê jî lê tarî bû... Wîzanî eve sekinîna dawîyê ye... Destên xwe qet ji berûkêna sakoyê xwe dernexistin. Hizirî... Jîyan wekî filmekî li ber çavan derbaz bû... Ne tîrsî, lê xemgîn bû... Zû diçû... Hêj jîyaba dê baş biba... Xwe ne livand, lavayî xwûnrêja nekir... Bêhneke biçûk wisa man... Gel, welat, serketin, azadî û jin, zarok hemû di maweyê saniyekê da herikîn li ber wan çavên delal...

Teqandin... Yek, du... û pênc gule teqandin... Ji pişt ve... Neyar bitirs bûn...

Neyar egît nebûn... Mêrane demance neteqandin... Bi tûlekî û ji paş ve teqandin...

Ne ax, ne ay!.. Ket... Kete rexê çala kişlê... Xwûna sore biriqî û pak herikî... Tevî nav kişişa sîsespî bû...

Dengê pênc guleyan nehatebihîstîn. Male nêzîk bû... Lê ma kê ew hizir dikir ku ew dê necamérane û di tarîfiya spêdehîyeke zû da bête kuştin...

Dem ne sekinî bû, pêşve diçû, lê mixabin dilê polayî yê wî sekinandi bûn...

Adetê wî bû. Heroj berî nîvro li malê digerîya, halê zarok û xanimê dipirsî... Wê rojê jî jin û zarok li hêviya telefona babê malê bûn... Lê nehat... Pişti qedererekê telefonek hat... Xanimê ahîze rakir... Xwe hazır kiribû ku bêjê cîma direng ma bo telefonê... Lê belê, dengekî nenas li ser telefonê bû û xeberekî nebixêr dida!.. Xanim serwext nebû, şaş mehtel jê pîrsî ku ci dibêje... Dengê li telefonê axivtina xwe didomand ku mala Wî ye an ne... Xanimê got belê... Xeberê reş dubare kir û jê xwest ku ji mal dernekevin û li hêviya polis bimînin... Xanim ji xwe çû... Ahîze kete erdê. Wê gavê zarokê malê yê biçûk nû ji dibistanê hatibû. Bezî diya xwe. Lê diya wî li xwe nebû... Zarokî xwe şaş nekir, ahîze rakir û pîrsî ku ci qewimîye... Dengê li ser telefonê xeberê dilsoj dubare kir û jê xwest ku li mal li hêviya polis bimînin... Zarokî got bila û telefon girt...

Zarokekî 12 salî, lê li ser hemda xwe û dilpolayî dîsa xwe şaş nekir, çû piçek lewante anî li ser û rûyê diya xwe kir... Pişti demekî kurt diya wî bi ser xwe ve hat lê girin jê kêm nebû... Di wê gavê da polisan derî quata... Zarokî derî vekir... Polisan bûyer jê ra gotin û jê xwestin ku digel wan bêt û bi hev ra biçin "kuştî" nas bikin... Bi hev ra çûn kavilê avahîyê

nêzîkî mala wan... Çi bibînin!.. Ew şerezelam ketîye rexê çala kişlê... Ew xwûna sore pak kişil sor kirîye... Zarokî dîsa xwe şaş nekir. Gelek bi xwûnsarî û metaneteke mirovên mezin got ku ew babê wî ye...

Polisan ambûlans anîn û ew rakirin birin morga nexweşxana mezine bajêr... Zarok bêyî rondikek çava vegerî malê... Cîran li ser girîna dayîka wî kom bibûn... Aşkera kir ku babê wî haşîye kuştin...

## VI.

Keberê reş û dilsoj zû belav dibe... Şehadeta wî deng veda... Heval, dost, kes û karêñ wî ref ref li malê kom bûn... Lê belê, çu hewayê şînê li mal nebû... Xwûnrêj aşkera bûn... Hêzên tarîye dewletê ev kare kiribûn... Lewma, her di serî da jin û zarok, kes û kar tevî dost û hevalê wî xem û kula xwe kirin rika têkoşîna dijî dijmin û hêzên xwûnrêje dewletê... Rondikên çavêñ xwe werandin nav dilêñ xwe û xwe pê bihêz kirin... Digel vê dilqâimîyê jî xem, kul û kesera wî digel valahîya wî xûya dikir di malê da...

Dezgehêñ resmîye dijmin ketine tirs û xofeke mezin û bi lez û bez ew ji 'morg'ê revandin û birin gor kirin... Xema mezin eve bû. Şehîdê gel û welat ji gel û welatê wî dihate dûr kirin... Eve nedihate qebûl kirin... Biryar hate dan ku ji nav axa dewleta dijmîne xwûnxwar bête derxistin... Digel hazırlîyeke rêk û pêk ew ji nav axa dewleta dagîrker hate derxistin û bi refake dost, heval û kes û karan ber bi welat ve hate rêkirin...

## VII.

Zivistaneke dijwar, sir û seqem.. Mij û moran, hewayekî bêhnçik... Dema otobûs bi rê kefî bêdengîya nav otobûsê

bi dengê girîneke dilsoj dengveda. Lê dirêj nekir. Girîneke kurt... Heq bû. Ev çend roj bû ku rondikêñ çava werîyabûne nav dil û hinavan... Dil qaîm kiribûn... Hemû dilpolayî bibûn... Carekê, tenê carekê dengê girîneke bilind û çend rondik... Gelek nebû...

Otobûsê sinaly da milê rastê û bi rêket. Yêñ mayî destmalêñ sor hejandin... Otobûs hêj ji deriyê garajê derneketî refek ciwanan rê li otobûsê birîn, otobûs sekinî. Şofêr deriyê otobûsê vekir, ciwan hatin ber derî. Yek ji wan hate jor, qevdek gulêñ sor di destî da her li rexê kursîya şofêr sekinî... Bi serê xwe silav da û axivtinek kurt li ser Wî kir... Dîsa bi serê xwe silav li giyanê şehîdê pakî nemir da, qevda gulêñ sor danî ber pence-ra otobûsê û derket... Digel yêñ li derive yêñ di otobûsê da jî dest bi çepikan kirin... Otobûs bi van çepikan ji deriyê garajê derket û berê xwe da ser riya welat û ber bi Kurdistanâ delal ve hêl da gazê...

Piştî bêdengîyeke kurt, êdî yêñ di otobûsê da jî vebûn... Axivtin, suhbet dirêj û kûr kirin. Stran ji teypa otobûsê nehate birîn. Şîn nebû. Kes ne mirî bû... Ma dê bo çi bi kel û girî bûna... Şehîdê gel û welat bi şahîyeke ges ber bi axa xwe ve diçû...

## VIII.

Zivistana dijwar, sir û seqem... Lê belê, ne mij û ne jî moran... Esman sîrsahî... Belê bayekî hişk, çeq û tayêñ darêñ rût û tazî dihejîne, befra toze sîsspi li der û dora belav dike... Hewayê welat, zivistana welat jî, ji ya welatê dijmin cûdatir e... Hewayekî bêhnfireh ku gava mirov dikişîne nav dil û hinava xweşîyeke bijûn dide mirov...

Pêlên gola Wanê bilind in... Digel wî hewayê vekirî û sahî, ji alîyekê bayê

Nemrûd û Sîpanê Xelat, li alîyê dî jî bayê deşta Wanê ji gupika çiyayê Arakê pêlên golê bilind û gur dike... Gol hêç bûye... Çu cara pêlên xwe wisa bi hêrs û rik li rex û lêvên reşahî nedaye... Lê vê carê cûdayî rojên dî ye... Bayê Nemrûd, Sîpan û Arakê gotina xwe kirine yek û pêlên golê rakirine... Hersê çiyayê berzebilindên navça Bidîs û Wanê digel golê qol û qirar dane hev ku hatina wî deng vedin, hêrs û rika xwe nîşan bidin...

Dema otobûs gihiştîye ber deşta çiyayê Nemrûd refa dost û hevalan xûya kir... Otobûs êdî bitenê nebû. Di wan riyên tenge dijwar da otobûs bi refeqeta çendîn otomobilên hevalan riya xwe domand... Dengê ba û pêlên Gola Wanê her diçû bilindir dibûn... Dema kêşa otobûs û otomobilan gihişte Tetwanê fîrîna ba û pêlên golê silav didan... Pêlên gure bilind bi rik û hêleke mezin lêvên reşahî dialîstin... Eve silav bû. Silava şehîdê pakî nemir bû. Silava wî bû...

Piştî kurtedemekê otobûs û kêşa otomobilâ ber bi Wanê ve bi rê ketin. Digel slogan, çepik û hejandina dest û destmalên kesk, sor û zer otobûsê agirê gaza xwe zêde kir li ser riya Wanê...

Kêm mabû bo Wanê... Wan!.. Bajarê delale rengîn. Mirafîya Kurdistanê. Bajarê wî... Xema wî bi ser bajêr ketibû... Lê dîsa xema xwe nîşan nedida... Wekî otobûs û kêşa otomobilâ gihiştîye ber navça Westanê, dengê pêlên golê bilindir bû. Bayê çiyayê hindava Westanê difirîn... Eve jî silava wî bû... Silaveke ji dil. Wî demeke dirêj li Westanê xizmeta gelê xwe kiribû... Çiyayê hindava Westanê deng vedida ku wî çendîn cara qedem dabû û çûbû nêçîra pezkûvî û kewan...

Otobûs li pêşîyê û kêşa otomobilan li paş hêdî hêdî di ber Westanê da ber bi

Wanê ve herikî... Silava çiya û pêlên golê dom dikir. Wî silava wan bê bersiv nehêla. Deng veda li çiyayê Westanê :

Westan e Westan e

Xweş Westan e

Cihê dost û hevalan

Warê mîr û egîdan e

Eve jî silav û dilozîya wî bû li beramber silava çiyayê Westanê û pêlên gure bilindên Gola Wanê...

## IX.

Roj êdî bi direngî ketibû... Rojên kurte zivistanê keys neda ku ew gereke kurt li nav bajarê Wanê bide. Leza wî hebû... Demekî zû dixwest bigîhe Elbakê. Elbaka xopan... Cih û warê bab û kalên wî... Deşta Elbakê. Deşta bi xêr û bereket... Cihê bûyîn û mezînbûna wî... Cihê xortî û ciwanîyê... Elbak!.. Xewn û xiyala wî bû Elbak.... Sotîyê warê xwe bû. Ci gava demekî valayî dirêj ji karê xwe bigirta, bêhna xwe li Elbakê vedida.... Ji xwe çemê Kêlegomê cihê geşt û şahîyê wî bû...

## X.

Kêşa otobûs û otomobilâ berî ku bigîhin bajarê Wanê qederê 20 Km badan milê rastê û ber bi deşta Qesrik û Xoşebê ve lezandin... Roj dakefîbû. Dema kêş gihişte sêriya Qesrik, Wan û Xoşebê refeke mezine dost û hevalan li hêvîya refa wî bûn. Piştî sekinîneke kurt hemû makîne bûne rêz... Rêza otomobilâ bû kêşke dirêj... Otobûsa ku tabûta wî tê da li pêşîyê û paşê jî makînên dî li pey hev dane rê...

Dema otobûs û otomobil ji ser pira Xoşebê derbaz bûyî silava wî gihişte Kela Xoşebê. Kela bilinde dîrokî... Xwezi dem û keys heba û bêhneke dirêj li Xoşebê sekinîban... Lê mixabin, ne dem ne jî mecal hebû... Otobûs û otomobilan xwe dane ber evrazê "Gedûka Çûxê"... Hewayê pake bijûn dil û hinav

paqij kirin... Virajên evrazê "Mila Çûxê" xwe li ber leza otobûs û otomobilâ rane-digirt... Dema gihiştine serê milê êdî gupikên gir û çiyayê deşta Elbakê xûya dikirin... Elbaka rengîn... Evîna wî... Elbaka xopan... Kul û kesera wî...

## XI.

Zivistana mîrat roj kurt kiribûn... Evara-reke direng gihiştin nav bajérkê Elbakê. Befrê, deşta Elbakê sîsspî kiribû. Di tarîgewirkâ êvarê da ev deşta bilinde şîrîn dibiriqî li bin perda spîye befrê...

Ezman sîrsahî bû.. Digel sahiya esman sira êvarê ji zêde bibû... Lambên elektrîka bajérkê Elbakê digel delalî û xemla befrê diteyisî...

Elbak li hêviya wî bû. Çarsû û dikan girtibûn... Eve rêt û sîyaneta wî bû... Xelk, dost, nas, heval, kes û karêñ wî hemû, jin, zaro, kal û ciwan pêkve ref ref hatin pêşîya wî... Elbakê ji zû ve xwe hazîrif ragirtina Wî kiribû... Elbakê cara pêşîn bû ku şeveke geş, bi deng û boşahî didit... Heta spêdê ew nema bitenê...

Elbakî biçûk mezin, jin û mîr bûne rêt û hatin silava wî... Sirûdêñ têkoşîn û welatparêziyê ji ber serê wî kêm nebûn... Ne şîn, ne ji xem... Şahîya şehîdê gel û welat bû... Şahîya mirovê dilsozê gel û welat bû... Ev şahîye li gorî dilê wî bû. Xûya bû... Ew di nav xeweke kûre şîrîn da bû, lê di wêneyê dest û bersingêñ dost û hevalên wî da bi rûkenîyeke esîl û delal dida xûya kirin...

## XII.

Bû spêde... Ne bangê dîkan ne ji bangê mela Elbak hişyar kir. Hewce nebû... Elbak, ev du şev û roj bû ku li ser piya bû... Elbak pêkve çike hişyar bû...

Heval, dost û hemû Elbakî li ber derîyê hewşa mizgeftê kombûn. Hazîriya dawîn bû... Heval bezîn. Hevalên bawerî û tekoşînê li pêşîyê bezîn... Darbesta şehîdê gel rakirin û ketin pêşîya civatê...

Bi rêt û siyaneteke mezin ew boşahîya mirovan wekî lehîyê ji nav bajér ra derbaz bû... Axa şîrine Elbakê koşa xwe vekiribû bo hêjayê xwe... Bêhn û hêlma bijûn ji axa welat bilind dibû... Darbest danîn ber lêva gorê... Elbakî û dost û hevalên wî yên riya dirêj hemû li ser piya sekinîbûn... Eve sekinîn û silava dawîn bû... Digel silava bilinde têkoşer, ew teslimî axa wî kirin... Axa pake paqij... Axa welat... Axa ku serî li ber hatîye dan...

Axê şehîdê xwe bi rûmet û serbilindî ji dost û hevalên wî yên têkoşer wergirt û bi dilgermî û dilsoziyeke mezin da ber singê xwe û rapêça...

Ew i şâ bû... Serê xwe bi serbilindî danî... Axa welat ew germ kiribû... Axa welat bi danîna serê Wî yê ezîz gavek dî ji nêzîki rizgarî û serxwebûnê bibû...

Digel axivtin û silava dawîya dost, heval, nas, kes û kar û hemû Elbakîyan kêl hatin danîn... Berî belavbûnê tovê mîrg, çîmen, gul û kulîlka hate reşandin li ser gora şehîdê pakî nemir...


## XIII.

Ezman sîrsahî, tîrîn hetavê ji serê baskên berze bilinde Elbakê hewa germ kiribû... Befîra sîsespî di bin tîrîn hetavê da dibiriqî... Hetav bilind bibû... Roje nîvro nava bajér ji boşahîya mirovan mişt bibû...

Dema vegekerê hatibû... Vegereke bi xem, kul û keser... Lê herweha vegereke şâ... Vegereke bêyî Wî, lê vegereke dilniya ku ew teslimî axa wî bibû... Çav li paş neman... Xem di dêm û rûyan da man, rondik dîsa werîyane nav dil û hînavan... Otobûs bi rê ket... Destan silav da û destmal hatin hejandin... Eve ji silava ji dile Elbaka Wî bû...

Kanûn 1992

# TÊ BÎRA TE?...



Mervanê KELEŞ

Tê bîra te  
dema  
ez û tu  
man bi tenê  
û  
oda tey li ser me  
xemgîn  
reş li xwe kir.

Tê bîra te  
laşê tey germ

Ji bo Leyla... Yara  
war û kavilan

û  
tiliyên min î  
bi tirs buhirîn  
li ser.

Tê bîra te,  
çavêن tey fedyokî  
li min nerîn  
û  
li ser lêvan  
sed rengê gulân  
vebûn  
ez û tu  
û  
oda te  
em  
hilgirtin mijekê  
em  
kirin ewr  
û  
baran bariya  
hûr...hûr  
li ser  
fediya te  
û  
tirsa min  
û  
rê da lêvên te  
û  
tiliyên min...

Tê bîra te,  
çend kanî herikîn  
hingê  
ji hinareñ sînga te

Tê bîra te,  
çawa tiliyên min  
winda dibûn  
di nav  
hevrimeşê porê te

Tê bîra te,  
dema

şikest fediya te  
    û  
hilanî bi xwe re  
    tirsa min  
    hingê  
çendî germ bû  
    livîna me  
    û  
çendî seyr bû  
dilana sûretên  
    li ser  
diwarêن oda te  
    oda te...

Tê bîra te,  
    dema  
    şefeq bi şerm derket  
    dema  
te got: gerek tu herî  
çawa ez rabûm  
    û  
çawa deriyê mala te  
    li ser me  
    giriya  
    dema te ez  
    himbêz kirim  
    li ber cara dawî...

Tê bîra te,  
    çendî  
    siya min  
jar  
    û  
westiyayî  
hêdfî bi hêdfî  
meşıya li dû min

Tê bîra te,  
    hêşirên ku cobar bûn  
    li ser  
    dêma te  
    û  
şewata digvaşt  
    dilê min.

Tê bîra te,  
    ku me vêneexistibû  
    çira oda te  
        dema  
te ez bi rê kirim  
    û  
    min nedît  
    hingê  
    bejna te.

Tê bîra te,  
    çendî  
    xweş bûn  
sozên me  
çendî  
me ava kirin  
    xewn û hêvî  
çendî  
em keniyân  
    û  
çendî  
em giriyan  
    û  
çendî zor bû  
jihevbûna me.


Tê bîra te,  
    riyên dirêj  
ku me dan ber xwe.  
    Tê...  
Bîra te  
çendî  
li qoziyêن welat  
    me,  
dest dan hev  
çendî,  
me deng dikir  
    û  
çendî  
em diman bê deng.

Tê bîra te,  
    Newroz

<p>û govenda dilên me kirasê tey kesk û xeml û daholên li dora me.</p> <p>Tê bîra te, ew ciyê han ew gulên li ser masê û ew ava der di bû li kêleka me û ew xortê dirêj dikeniya ji bo me.</p> <p>Tê bîra te, hevalên me bîna çinîna genim û hêlînên qitikan şevbêrkên devê deriyan kelandina danûkan.</p> <p>Tê bîra te, serê kaniyê siya darêن havînê û</p>	<p>ew zarokên li nav avê. Tê bîra te, çendî pir bûn kulên şîn hatin li nav rehêن xwîna me dema, ji ber çavan kirin ew çend hevalên me.</p> <p>Tê bîra te, çendî xweş bû tama nanê diya te tê bîra te tê bîra te...</p> <p>Tê bîra te, dema tu ma şiyar ta berbanga sibê dema ez der bûm ji welêt tê bîra te tê bîra te?!</p>
---	--

Swêd, 11.2.1991

# MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN



Sebrî BOTANÎ

*Celadet bi Hawara xwe tenûr dada  
Cewerî bi Nûdema xwe nan pêveda*  
S. Botanî

Rola Mîr Celadet Alî Bedir-Xan û xwendingeha wî di dîroka rewşenbîrî û hişyarbûna gelê kurd de mezin e. Berî her tiştî perwerdekîrin û gihadina hinek ji kurdên ronakbîr e, ku bi zimanê kurdî, nemaze bi vê ABC'ya tekûz û kêrhatî ya bi tîpêñ latînî ye. Me got, xwendingeh, çunkî bi rastî jî kovarê Celadet û nivîsarên wî ji her alî ve, li gorî rewşa ku gelê kurd tê de bû, di wê dema teng û tarî de, bi tevayî xwendingehek mezin bû.

Nemaze kurd bi şîret û gazinê Xanî ên dijwar hişyar nebûbûn. Herweha gerçî berî vê xwendingeha Celadet bi sih safî rojnameya Kurdistan dest pê kiribû, lê ew bi zor û stema dijminê me hatibû herişandin û bi tundî hatibû qedexekirin jî. Celadet û hevalên xwe hatin ji nû ve bi vê xwendingehê dest pê kirin. Celadet zanayekî dûrbîn bû, lewre wî piştî şikestinê şoresh û tevgerên 1925-28-30<sup>(1)</sup> dest bi xebata zanyarî kir. Wî tibabek xorîn jîr û welatperwer li dora xwe ci-vandin û bi şîretên xwe, bi çapkirina Hawara xwe û bi alîkariya wan, ala rewşenbîrî û hişyarkirina miletê kurd bilind kir. Aha li vir em dişen bibêjin eger vî mirovê çist û çeleng baweriyeq mezin bi hişyarbûna miletê xwe tunebûya, wî piştî wan şikestinê dijwar û di wê pergala şepirze de ew bizava zanyarî nedikir, wî hînkirina milet ji xwe re nedikir kar û pîşeyê herdemî, lê çunkî ji miletê xwe bêhêvî nebûbû, wî ji her tiştî bêtir xwe kiribû seydayê xwendin û nivîsandina zimanê kurdî.

Piştî Celadetê rehmetî, ronakbîrên vê xwendingehê bi bîr û baweriye nete-weyî, bi helbest û nivîsarên xwe û hem bi xwîn û xwêdana xwe jî karwanê rewşenbîrî û hişyarbûna gelê kurd ajotin, ta gihadin vê dema me. Lewre em dişen bibêjin ev rewşenbîrî û hişyarbûna me ji xwendingeha Mîr Celadet dest pê dike, lê ma çiye gelo, kurdino eger me got, ew şoreşek rewşenbîrî bû ronakbîrên wê xwendingehê bi rûpelên Hawarê dayisan-din? Kurd pê hişyar kirin, dijmin pê lerizandin. Bi rastî jî wilo ye, va ye em bi çavêñ serê xwe dibînin, berdewam e û pêta wê qet û qet danaxume. Lê digel vê rastiyê jî em ji bîr nekin ku hinek ji

komunîstên kurd li dijî xebata rewşenbîriya kurdî ya millî bûn.

Ez ê li vir bersiva xwe rawestînim û rola Celadet û kovarêni wî ji heval û şagirtêni wî, ronakbîr û navdarêni zemanê wî bipirsim. Werin em ji Enwer Mayî dest pê bikin.

Mayî digot: "Mîr Celadet bo miletê kurd hawarek bû, ronahiyek bû, rojek nû bû, navêni kovarêni wî bi ser wî ve bûn, ji sifatê wî bûn. Wî bi wan kovarêni xwe zimanê kurdî paqîj û nerm û zelal kir".(2)

Nûredîn Zaza: Di xwendin û nivîsandina kurmancî de Osman Sebrî jî şagirtê rehmetî Mîr Celadet Bedir-Xan bû. Gotiye "jî", yanî şagirtek ji şagirtêni wî bû. (3)

Hesen Hişyar: "Em hemû şagirtêni dibistana Mîr Celadet in, şagirtêni vê dibistana kurdî li pirraniya deverêni Kurdistanê hebûn û gelek ji wan xwedî berhemêne neçapkîri ne, ku ez bi xwe jî yek ji wan im".(4)

Cegerxwîn: "Erê, rast e, berî çapkirina kovarêni Mîr Celadet jî ez şâîr bûm, lê heta ew kovarêni wî nehatin çapkirin ez jî baş nehatim naskirin. Celadet bi van kovarêni xwe xizmetek pir mezin ji miletê xwe re kir. Wî alîkariya min jî dikir".(5)

Mîrê biçûk Kamiran Bedir-Xan: "Berî çapkirina Hawarê bi salekê Celadetê rehmetî ji min û dost û hevalêni xwe re got, gerek me rojnameyek hebe, da ku seyda û xwendevanêni me xwe pê bigirin û hev nas bikin û miletê xwe jî pê hişyar bikin". (6)

Qanatê Kurdo: "Eger ew kovarêni Celadet tunebûna, ew helbestêni Cegerxwîn jî qet çap nedibûn". (7)

Lîsteya navan dirêj e kurdino, niha hew nabe, lê ji destûra we, ez ê rola Celadet û kovarêni wî di dîroka rewşenbîri û hişyarbûna gelê kurd de, ji hevalê wî Îhsan Nûrî paşa bipirsim, ka ew ci dibêje?

Îhsan Nûrî Paşa: "Di sala 1971'ê de li Tehranê min xwe gihadê. (8) Min libek ji belavokek ya ku bi navê wî û bi tîrkiya Osmanî di sala 1925'an de li Bexda-Çapxana İstiqlal hatiye çapkirin- pêşkêsi wî kir, pir kîfa wî pê hat, xwend û got: " Dîsan spas, vê belavokê hinek tiştêni ku li bîra min nemabûn niha anîn bîra min".

Min jê pirsî: " Te kovarêni Mîr Celadet didîtin?"

Got: " Erê, min didîtin. Ma tiştêkî qenc maye ku wî nekiriye? Lê ax..."

Li dawîya axaftina xwe got " Lê Mîr Celadet ji karêni xwe yên rewşenbîri mezzintir bû, ew di kar û barêni siyasi û şoreshan de jî şareza bû, lê axxx..."

Vê axîna qomandarê şoresha çiyayê Agîfî tîra pirtûkekê dikir.

Min gotê: " Di pirtûka Barzan El Mezlûme de gotinek heye ku efserê kurd Îzet Ebdulezîz ji alî hukûmeta Iraqê ve bi endametiya Xoybûnê hatiye sûcdarkirin, hûn ci dibêjin? Û em hez dîkin tiştêkî di derheqa wan efserêni endam de bizanîn, wek rola wan û nav û hejmara wan.(9) Wî bi kurtî pirsa me wilo bersivand: " Bil ji Îzet û hevalêni wî jî li Iraqê hebûn, li hemû deveran hebûn, ez bi xwe jî yek ji wan bûm, heta Celadet bi xwe jî efser bû, lê Celadet tiştêkî din bû".

Silavêni me û dilovaniya Xwedê li pêşengê rewşenbîriya me Mîr Celadet û hemû hevalêni wî be, cihê wan bihişt be.

(1) Kurdê hêja Hakim Reşîd Bacelan ji devê polîsekî kurd dibêje: " Gava ku Mir Celadet bi girtî ji Îranê anîn Iraqê, ez hazir bûm, min jê pirsî: Çima tu hatiyî girtin?" Celadet Got: " Çunkî ez kurd im, sibe dora te ye jî".

(2) Bîranînên min- Kongreya mamos- teyen kurd li Şeqlawe 1959. Cegerxwîn xwe kenand û got: Seydayoooo, Enwerê Enwer, xwe şaş neke, Roja Nû, ne ya Celadet e". Enwer Mayî gotê: "Kamiran jî Celadet e, herdu yek in".

(3) Dîwana Osman Sebrî, sal û cih û çapxane nehatine nivîsandin.

(4) Mehekê berdewam ew û ez li Gelale bi hev re bûn, rehmetî navêne gelek xwedî berhem anîn ziman, lê tenê navêne Kemal Badîlî, Enwer Mayî, Musa Enter, Mihemed Emîn Etman û Mela Xelîl li bîra min mane.

(5) Du hevpayvîn bi Cegerxwîn re, li Bexda û Gelale.

(6) Kurdên Libnan bi navê " Mîrê Biçûk" nav kiribûn û ji Celadet re jî "Mîrê Mezin" digotin. Du caran ez çûme cem û carekê jî wî ez xwestime cem xwe.

(7) Dîwana Zend-Avesta, Cegerxwîn- pêşgotina Qanatê Kurdo.

(8) Çûna min û Faiq Akreyî bi seredanî. Paşê di sala 1975'an de jî li Şîno ez çûm cem.

(9) İzzet Ebdilezîz û hersê hevalên xwe: Mistefa Koşnaw, Xeyrî Ebdilkerîm û Mehemmed mahmod Qudsî, ji wan efserên kurd bûn ên ku beşdarî di şoreşa Barzan 1943-1945 de kiribûn û bi Barzaniyê rehmetî re çûbûn Mehabad jî, lê pişî hilweşîna Komara Kürdistanê vegeriyan û xwe spartin dewletoka Iraqê û li roja 19.6.1947 hatin dar de kîrin.

---

Ev nivîsa han ji bo bîranîna sedsaliya Celadet Alî Bedir-Xan ji Sebrî Botanî hatîbû xwestin, lê mixabin ji ber ku ew dereng gîhîste me, me nikarîbû di hejmara 8'an de biweşanda. Em ji Sebrî Botanî û ji xwendevanan lêborînê dixwazin.

## BINGEHÎN GRAMERA KURDMANCI

Celadet Alî Bedir-Xan



NÜDEM

Cihê Hawarê û xwedî û berpirsiyarê wê Celadet Alî Bedir-Xan, di dîroka hişyarî û intelektueliya gelê kurd de bilind e. Ma miletekî bê ziman ci ye? Gelekî bê kultur, bê huner, bê edebiyat ji ci re dibe?

Ev e, Celadet Beg xwest ku miletê kurd ji cîhaneye tarî, kirêt û cahîl derxe, berê wî bide ser riyekî rohnî, medenî û zana. Loma wî tavilê dest avête zimanê kurdî, ji bo ku bike zimanekî edebî û yê nivîsandinê, dest bi weşandina kovara xwe kir û bi xêra wê kovarê ye ku em iro xwidiyê zimanekî nivîskî yê standart in.


Ev pirtûka biçûk, lê wek nan û avê girîng, ji xebatên Celadet Beg yên di Hawarê de pêk hatiye. Di vê xebata ku zimananzê me bi Bingehîn Gramera Kurdmancî navandiye, li ser navdîr, mîjîr, tewang, vejetandek, pronav, rendgîr û gelek term û formê din yên gramerî tête rawestandin.

Bi munasebeta bîranîna sedsaliya Celadet Alî Bedir-Xan û bi hêviya ku wê xwendevan û nivîkarêne kurd vê pirtûkê ji ber serê xwe hilneyin, weşanxaneyâ me wê pêşkêşî pirtûkxaneyâ kurdî dike.

### Navnîşana xwestinê:

Termov. 52, 175 77 Järfälla/  
Sweden Tel û Fax: 8-58356468

# NANPÊJ



Jan DOST

û

te çavêن xwe  
li girikek hevîrê din  
pelandin...

Dipirsim  
tenê vê dipirsim  
ta niha  
te çend nan  
şewitandin??!

Stembol, 17.12.93

## REŞ Û GEWR

"Ji wê re...  
di payizeke xweş de  
min dilê xwe winda kir..."

Te ev dil  
weke girikek hevîrê sor stira  
Awirêñ te  
tîrek ji dara tuyê bûn  
Dilê min tenik kir  
te ew dilê tenik  
Li ser sêla sozên derewîn danî  
Sêl sincirî bû  
te dilê min li ser  
ji bîr kir

Te berf dîtî?!  
Weke tacek spî boz e  
Li zozana  
Ew e porê çiyayêñ me  
Spî bûye  
Ji ber jana!!

Te ev dîtî?!  
Li dora gerdena cîhan  
Weke maran  
Xwe pêça ye  
Ew e cîhan  
Li ser wan kuştiyêñ me reş girê dane!!

# PYTHAGORAS

## Dîtin û Dinyabîniya

### Wî

Mustafa DÜZGÜN

**P**ythagoras (580-500) ji Samos e, ku niha wek Girava Sîsam tê bi nav kirin. Hê di salên xortaniya xwe de ji wir derbasê Îtalîa Başûr dibe, li bajarê Krotonê cîwar dibe û jîna xwe li wir didomîne.

Li gel dîtinê xwe yên felsefî bi bîr û baweriyêñ dînî ve jî xwe diwestîne û terîqetek taybetî ava dike. Pythagoras pêyrevê dînê Orpheusî ye.

Avakarê vê baweriyê bi navê Orpheus dengbêjek dastanî û mîstîk bû. Li gor şirovekirina hinek zana û filosofen navdar, wek gelek tiştîn Yewnana qedîm ev rêça dînî jî ji Misrê hatiye wergirtin. Lê Yewnaniyan jî hinek reng û dîtinê xwe pê ve zêde kirine, bi vî awayî ev dînê Orpheusî pêk hatiye.

Dûketî an pêyrevê dînê Orpheus wisa bawer in ku ruh tucar namire, hebûna xwe tim û tim didomîne, ji bedenekê derdikeve û dikeve bedeneke din. Anglo hebûna xwe ya di bedena mirovekî de, yan jî di bedena heywanekî de berdewam dike.

Divê mirin ji bo ruh mîna rîyek xilasbûn û rizgarbûnê bê dîtin. Bo ku bedenê, mîna dîwarekî der û dora ruh girtiye, nahêle ruh li gor gotina xwe azad û serbest hereket bike. Bi kurtî ruh di nava bedenê de bîhnteng bûye, asê bûye,

maye. Ji ber vê yekê, ji bo rizgarkirina ruh divê mirov eza û cefayê li bedena xwe bikin! Ku bikaribin ruh ji vê bar û nerehetiyê rizgar bikin, an vê rewşa giran qet nebe hebekî sivik bikin.

Pêyrevê vê baweriyê tim parêz digirin û goştê heywanan naxwin. Ji wan re wesa tê ku kesên ku pez serjê dîkin, mirovên pezkuj, bi awakî birayêñ xwe an mirovan dikujin û her goştê mirovan dixwin. Ji ber ku ew ruha niha di heywanekî de hebûna xwe dimeşîne, berê di mirovekî de bûye. Pişti ji holê rabûna wê bedenê, derbasî bedena wî heywanî bûye... Lewma kî ku heywanan dikuje û goştê wan dixwe, divê mîna mirovkuj bê hesibandin, li gor Orpheusîyan.

Li gor gotinan, dema ku Pythagoras li Misrê bûye, Persa êriş kirine ser wir. Pişti ser, gelek kes êxsîr bûye û Persan ew kesên êxsîr bi xwe re anîne İranê. Dibêjin Pythagoras jî di nav wan êxsîran de bûye.

Ku çûye İranê, li wir Pythagoras bi Zerdeş re rûbirû bûye, li hev naşîne, dan û standinek germ di nava wan de çêbûye. Hinek şirovekar û lêkolîneren Pythagoras dibêjin ku Pythagoras di bin tesîra dîtin û dinyabîniya Zerdeş de maye. Hinek jî hê pêve zêde dîkin, dibêjin, Pythagoras ji İranê jî çûye Hindistanê. Li wir jî bi Budha ve rûbirû bûye û hînî felsefe û baweriya wî jî bûye. Bi mînakî dubendîya yek û cotê, cîhguhartina ruh, goşt nexwarinê, azebmâyînê, di bin dîsiplînek sext û dijwar de bi hev re jîyînê, bi xwe hîşyarbûn (xwe kontrol kîrin) û kûr û dûr hîzîrandinê, ji mirovan hezkîrin û bi wan bawerbûnê ji Budha hîn bûye.

Her weha ronahî û tarî ku du esasên bingehîn ên hebûnê ne; nerm, sivik û gerimbûna ronahiyê û li himber vê sar, terr, hişk û giranbûna tariyê jî ji Zerdeş hîn bûye...

Em nikarin rastî û şaşıya van gotinan bi awakî zanistî diyar bikin. Her weha zana û filosofan jî ev gotin mîna texmîn

û rîvayet hesibandine. Ne wek dîtinek sedî de sed rast û xwedî belge. Lî belê wek dixuye dînê Pythagoras gelek motîv û taybetiyêن Zerdeştiyê û Bûdistiyê di naveroka xwe de diparêze. An di navbera dînê Pythagoras û ya Zerdeşt û ya Budha de gele reng û xetên lihevçûyî, heta yên wek hev hene. Gelo ev tiştên mişterek çawa û bi ci awayî pêk hatine? Her çiqas bersîva vê pirsiyarê hê zelal nebûye jî, bi ci awayî dibe bila bibe wisa dixuye ku Pythagoras ji heyî û naveroka dînê Zerdeşt û ya Budha agahdar e.

Pythagoras mîna ewliyayekî xwedî sir û kirametê hatiye nasîn. Dîtinê wî ji aliyê xwende û pêyrevêن wî ve hatine berhev kîrin û pêşkeş bûne. Bilî nivîsarêن xwendeyêن Pythagoras, ji berhemêن wî yên nivîskariyê tiştek di dest de nemaye. Qasî ku hevrîyêن wî dibêjin, bîr û baweriya wî bi cîhguhartina ruhan nebûye. Bi mînakî, çawa ku Ksenophanes digerîne, carek mirovek bi tundî li segê xwe dide û kujinî bi segî dikeve. Pythagoras ku dengê segî digire pir nerehet dibe û deng li xwediyê segî dike û dibeje «Êdî bese! Lî mede! Ruhê mirovekî dost di wî segî de ye. Ku min dengê wî bîhîst, min ew (ruhê wî mirovî) nas kir».

Li gel vê yekê dîrokzan Herodotos jî Tarîxa xwe de, nav nade lê behsa dîtinê Pythagorasiyan dike û weha dibêje:

«Misriyan bîr û bawerî bi nemirbûna ruhan û pişî mirinê ku bedena mirov ji nav de radibe, derbasê bedenek dinê bûna wê dianîn. Her weha rih, sê hezar sal di nav heyiyên erd û ezman û yên avê de digeriya û vêga dikete bedenek nû. Lî Hellen wisa didin nasîn ku ev bîr û baweriya her tenê ya wan bûye. Ez navên wan kesan dizanim, lê naxwazim eşkera bikim. »

Belê ji vê gotinêن Herodotos jî derdikeve ku dinyabîniya Pythagoras bi giranî girêdayî bi dîn û terîqeta wî ye. Li gel vê yekê ew û pêyrevêن wî her bi siyaset û çand û felsefê ve jî mijûl bûne. Bi

mînakî bajarê Kroton de hewl didin ku hukmê bi dest bixin. Di vî warâ de bi ser dikevin û her dibin hukumdar jî. Lî pişti demeke kurt li dijî wan kutdayek çêdibe û Pythagorasî ji hukm dikevin û mirovêن wan di xwînê de têن gewizandin.

Pythagoras û bendeyêن wî li ser Matematikê jî dixebeitin û lêdikolînin ku nihêniyêن hejmaran eşkere bikin. Li gor dîtina wan, giş hebûn ji hejmaran pêk hatiye. Tu tişt û prensibên hebûnê, bê hejmaran û bê pêywendiyêن navbera hejmaran nikarin bêne nasîn.

Her weha hejmar wek madeyek zayîndar û afiraner, bingeh û binyata hebûnê ye û her tişt ji hejmaran pêyda bûye. Bi mînakî dadparêzî, ruh, bîr û hwd. her tişt xwedî hejmarek taybetî ye an ser bi wê ye.

Mirov ku serê xwe bi vê dîtina Pythagorasiyan ve diêşîne, bi rehetî dikare bîbîne ku ew êdî di rêça Filosofên Xwezayê ên beriya xwe de nameşin, ango tiştek an madeyek berbiçav wek ewil-prensib pêşniyar bikin. Bi vê dîtin û pêçûna xwe ve ew êdî derbasê meshûmêن micaret bûne û her bi awakî berfireh difikrin. Her weha ew, hejmarê hê wek meshûmek micaret nagirin berçav, belku hê haydarê micretî ya hejmaran nebûne.

Pythagorasî bêsinor û bisinor bûna hejmaran, di bahsa bersîva pirsa pêydarbûna kaînatê de wek şertek bingehîn pêşkeş dikin. Hejmara yek, li gor wan, bêsinor e û hîmdara hemû tiştan e. Li gel vê yekê yek her cot bi xwe ye jî. Yek, him bêsinoriyê him jî bisinoriyê di naveroka xwe de dicivîne. Lî jî vê rewşê tu ecibiye sadir nabe; bo ku yek û cot ne dijberî hev in. Di rasû de navbera wan de harmoniyek xweşik heye. Ji ber vê hebûna harmoniyê yek û zêde, çep û rast, nêr û mê, sekinî û herikî, baş û nebaş, çarkoşe û sêkoşe... bi hevre têن xûyan. Çawa yek him yek e û him du ye, hatine ba hev bûne yek; her

weha dijênu ku di naveroka hebûnan bi xwe de her hene, jixwe ji ber vê sedemê tim bi hev re dijîn. Anglo di navbera dijan de harmoniyek berdewam her heye. Û ew ji bo her tiştî mîna prensîbek bingehîn xwe diyar dike.

Diyar e ku Pythagoras û bendeyên wî, hejmaran bi awakî tevatur şirove dîkin û wan mîna tîştîn mîstîk û xwedî nihêniyan didin nasandinê. Di dînyabîniya xwe de jî tim dikevin dualîtiyê (İng. dualisme) û nikarin xwe ji vê dubendiyê rizgar bikin.

Pythagorasî di derheqa Ezmannasî (Astronomî) de xwedî têbîniyêne gele balkêş in. Ewilcar ew dînyayê mîna navenda (merkez) kaînatê nabînin. Ew wê wek kureyek girover bi nav dîkin.

Dîsa ew dibêjin, di valayiya kaînatê de agirekî nexûyayî heye û dinya li dora vî agirî tim di rewşa geranê de ye. Lê dinya vê gerana xwe ne bi awakî serbixwe, ser bi deh cîsmîn gerok teva dike. Ev deh cîsmîn gerok jî her li dora wî agirê nexûyayî de rêz bûne. Erd, ji rojavayê ber bi rohilatê diherike.

Wek tê xûyan bi saya vê fîkr û dîtinâ hêja êdî ji bo têoriya Kopernîkus rê hêsan bûye.

Wek di serî de jî hatibû gotin Pythagoras bi awakî nivîsarî tiştek li dû xwe nehiştiye. Tiştîn ku di derheqa wî û felsefa wî de têz zanîn, xasima gotin û şiroveyen pêyrev û xwendeyen wîne, ku li ser navê wî hatine pêşkeş kirinê. Yekek ji wan pêyrevan hekîm Alkmaion e. Pişti mirina Pythagoras terîqeta Pythagoras ges û belav bûye, lê dîtinê wî ji aña Phîlolaos ve -ku hevdemê Sokrates e- derbasê Attîkayê bûne.

## ÇEND RÎVAYET Û GOTINÊN KEVIN DI DERHEQA PYTHAGORAS DE\*

1. Ksenophanes di derheqa Pythagoras de hinek hêkatan neqil dike.

### Dibêje:

"Rojek îskence bi segekî dikirin. Di wê saetê de Pythagoras di wir re derbas dibe. Bi kujîniya wî segî dihese û wesa deng li xwe dike: «Êdî bese! Lê mede! Ruhê mirovekî dost di wî segî de ye. Ku min dengê wî bîhîst min ew (ruhê wî mirovi) nas kir.»

### 2. Empedokles1:

"Di nav wan de zanayekî herî bilind hebû.

Xwedî xezîna fîkrê ya herî mezintir, pir çêtir jê fêm dikir ji hemû cûrê karê zanatiyê.

Bi qewet û qudraeta aqlê xwe ve ku dirêjê jor dibû

Bi rehetî hebûnen heyî yek bi yek dîditin

Ta berê (neslê) dehemîn û bîstemîn ê mirovan."

### 3. Dibêjin Pythagoras gotiye:

"Rojek wê bê ku ez ê bi vî gopalê xwe ve dîsan werim hizûra we. Dê dersê ji we re bibêjim."

### 4. Herakleitos:

"Kurê Mnesarkhos Pythagorasî, ji her kesî bêtir lêgerîn û lêpirsîn çêkirine, dû re ji van nivîsaran hinek helbijartine û felsefeya xwe daniye li ser wan: pir-tişt-zanîn ango dek û lîstok. Pir-tişt-zanîn baqılburûnê nîşan nade (hînkîrin nade); Ku wesa bûya (hînkîrin bidaya) li Hesîodos, Pythagoras û her li Ksenophanes û Herakleitos dida hîn kirin. Pythagoras serekê derewan e."

\* Ev gotinênu ku di vî beşî de cih digirin, me ji kitêba Felsefeya Antik a Walther Kranz , ya wergêra Tirkî (Antik Felsefe/Metinler ve Açıklamalar, Türkçesi: Suad Y. Baydur, Sosyal Yayınlar, 1984) girtine.

1 Empedokles behsa mirovîn pêşîya xwe dike, ku ser bi neslê beriya wîne. Pythagoras jî yekek ji wan kesan e, ku bawerî bi gerana ruhê (inkorporation) heye. Empedokles bi van gotinênu xwe ve demek dûr û dirêj tîne bîra xwe.

# SEXTIYAN

---

Murathan MUNGAN



1.

zê dixurişin ji dolên Dêrsimê  
lehiyên wan qedîfe, kupikên wan bêrîk  
û dendikên bêrîkan  
qurban û diyarî ne ji zarokên ji gunehan re emanetkirî

2.

niha ev huwiyyeta rêving ê bide pey kîjan şopa xwe?  
feodal, wekî çiqleke zirav  
hilkişiyayî simbelê min  
ew aska jîr a golên ji xwe hezkirî  
sextiyanâ ku li pey nêçîr û nêçîrvanan maye  
ku bi hêdîka xwe rûbarî me dike  
gava ew xwe digihîne daristana siran  
sirê kefenkirî yê tarîxê berpêş dike, kêm'bûna wê jî ber vê yekê ye  
helbet dewran ê bibihure, roj ê bibihurin, umir ê bibihure

ez şahîr im spartiyê çiyan  
ku tu kesî nedîtiye, ax!

3.

çavêن min, ew çiksayıya hesinî  
hesinkerên pîroz ên efsanê kevnare  
rengê çavêن min, bi laneta çîroka min hatiye kutandin  
bi hezaran robaran av danê, qerisî,  
weki sahiyekê, agirê xwe li xwe kelemçe kiriye  
çavêن min, niha guhdara koran

ji bo vê çendê ye maneya şidandî ku di awirê min de digere  
kêmahiya çavêن min nefta wan

tevî hemahilka stûhê min, danê êvareke havînê ku xwîn jê dere  
ji deh salan û vir ve

ew edet û ûsila eşîrî ku bi gulêن mihemedî nîşana xwe li eniya min xistiye  
derdikeve huzûra tarîxê, li huwiyyeta xwe dipirse  
dilê min di bin berfê de ye  
dûjeh koçer in  
û rojekê bê  
bedena min, ew heyama tixûban ê xwe bide zanîn

jixwe ma kî dikare hemû dûjehêن civateke dest bi sanayiyê kirî binivîse  
eger kitab rast hatibine xwendin -jiyanek 'gelek' umir hatibin jiyîn,  
êdî di her dijîtiyekê de bedewiyeke dramê, nazenîniya tragedya ku xwe ji lorîneke zîz  
dawdişine,

li rexekî min ew aska yeman -ku ez nikarim ji bilî daristanan li derekî bigerînim-,  
bi dû re taritiya murekebê - tenetiya min a demên nivisînê-,  
di can û çermê min de, bi hemû kûrahiya xwe, sextiyan -ku li pey nêçîr û  
nêçîrvanan mayî-  
û nîşana ku di navenda birûyêن min de diheze

yanê kêmasiya bavêن wan in hemû panikiya hin zarokan

4.

eger bêdeng be, çiya dê bêdeng be  
geliyê ku înfîxarê bi bîr tîne -devê bîra tirsê ku gavêن me li doraliyê digerin-  
her kilam gûzaneke bêdeng -ku bêdengiyan tûj kiriye-  
dol û şikevtêن ku em bi tirs behs dikinê  
deşta bê ser û bin ku me wext nedît jê hez bikin  
em ji evîna te bêpar hatin berdan/li pey me siwarêن rewan  
salteneta beyaran bi havînê dest pê dikir, nobeta umrê me, û cendirme

nubihara ku li hember her tiştî radiwesta, mîna zaroktiya me ya vegeŕî bû  
hemû ew dolên veşartî  
şikevt,  
çiya,  
tarîtî  
tarîtî  
niha hemû jibûrkirina demsalekê ne

havîneke stûr bêtirs û kêşaneke cîxarê ya zarokekî

5.

di kûrahiyên tarîxên çiyan de navnîşanên spartiyên çiyan  
her çiyayekî rawestana xwe heye  
sir û penyên asê (jibûrkirî, yan jî qiflekirî)  
ku bi tenê xezal dinasin, bi tenê gol, bi tenê daristan  
ku mijê hemû vegirtiye,  
mîna mufrezan ji deşte herikîne -tew carekê jî li pey xwe nezivirîne û nenihêrîne-  
sextiyan ku li pey evîn û sewdayêñ bi xetêñ destan nivisî maye

6.

tiştê ku ez ji çiyan hîn bûm  
rawestana jîr û zane ya sebûrê  
dilê min ku pişî binketinêñ dijwar li min vedigere, dibe ya min  
dilê min yanê heyama mayinan  
di tirsa wî de qanûnêñ tixûban,  
di rohelata wî de ew sûretê te yê spartî yêñ çiyan

7.

di fotografêñ te yêñ peregende de  
niha hin mirî  
çaxa hêviya min dîl dikeve  
evîna min dîl e  
ez ê çawan ji xurbeta bedeneke dîl  
pirsiyar bikim?

tu min meraq meke  
ez baş im, baş im

8.

gava me serê xwe ji kitabêñ ku me dixwendin radikirin  
gava çavêñ me bi hevûdu diketin  
gava bi hevûdu diketin çavêñ me  
me fahm dikir ku em dixwînin

an jî her rêzê cîhê xwe di şihîrê de werdigirt  
da ku di mîjiyê me de tu nezelalî nemîne

helbet min jî hinek alîyên nedagirtî hene  
ku min wext nedîtiye bihûnim, ku wextê têr nekiriye  
yan jî hin tiştên din  
em bêjin ev heyamên bê demsalan  
ku mîna ewrêñ reş ketine navbera me û tavê  
eger jiyana min, şihîra min  
jî tiştên biçûk, ji kitekitêñ rojane bêpar in  
eger dilê min  
her evînê mîna çîrokekê, her çîrokê mîna destanekê dijî  
eger siya caxêñ hesinî çavêñ min dikutin  
hingî bihîstiyariya min niha mecbûrî di gerê de ye  
li ser gopikêñ wan çiyayêñ maxrûr  
evîna min, hingî herçiqas em li ber xwe bidin jî  
em û tarîxê pêşberî hev bin jî  
ev şer, ev bahoza feodal xelas nabe  
hingî diyar e  
ku desthilatiya çiyan her berdewam e di cografyayê de  
lê te got, ez xemgîn im?  
na, naxêr, tu min meraq meke

ez baş im, baş im

9.

birîna min bigire bide ber sînga xwe  
ez nizanim ka meriv çawan dikeve nav axa hepsekê  
kî ji me li derve ye, -ew jî behseke din e-  
di nav rêzêñ te de qalikêñ xalî yên fişekan digerin  
ez vê bêdengiya te ya xayin nas dikim  
gaziyeke eşîrî ye her cara ku tu serê xwe li ber xwe xwar dikî  
-çaxa tu serê xwe radikî, çavêñ te bi awayekî din in-  
her name ji dirandinê zor xilas bûye  
di her namê de bi hezaran tiştên nîvçemayî  
destêñ xwe li min dirêj dikan  
mîna ku te jî rabirduya xwe ya eşîrî daye ser şopa lez û beza tarîxê  
mîna ku tu dibêjî;  
têkoşîna me ku hûtekî bi hezar serî, bi hezar şaşî bû,  
dê îlam car bi car ji nû ve derbasî nav û nîşana tarîxê bibe

te got, ez şaş û mat im?  
na, naxêr, tu min meraq meke  
ez baş im, baş im

rojhelat, xalxalka hemû zîzî û bihîstiyariya me ye, ez baş dizanim

10.

ev ê girtîbûna min a dawîn be, te gotibû  
ew fotografa ku gava te simbêlên xwe şeh dikirin, kêşiyaye  
li ber serê min hilwestaye  
-kela dawîn a umrê min ku min li hember jiyanê diparêze-  
û îcar jî ez  
bi vî sûretê xwe yê fanî  
silavên germîn li te,  
li evîndara min a qedirbilind  
dikim

11.

(Siwarêñ cirûskêñ polayê, dengê nalan mîna xenîmetekê hêlan û derbas bûn di nav  
damarêñ min re)

ez bi dengê deryayê hişyar bûm  
milekî min bi bayêñ çiyan xwîhdayî -xewnêñ min-  
milekî min bahoza Behra Spî -ew kişwer-  
ma mumkin e? helbet tu hatiyî bîra min  
ya rastî, ez bi te re hişyar bûm  
-hilma bi mij û dûman a rojhelatê, di nîvê şevekê de, li dora Behra Spî,  
di bîhnyvedaneke havînê de, xewa min birî û ez bi sûretê te bi tenê liştim-

heta sibê ez nikarîbûm razama

12.

bi dirêjiya qeraxêñ avê heyv, şev, tenêti  
pirsiyârêñ rûçikzerbûyi di kûrahiyêñ mîjîyê min de  
û şihîrek, şihîreke dostekî: "ew demanca ku te xistiye ber cêninga xwe  
ew dijminê veşartî ku tu di hundirê xwe de mezin dikî  
nîşandeka pirsê ye di serê min de  
ewçend stûr mîna rûpeleke marksîzmê  
ku hê nehatiye nivisîn"

di serê min de nîşandeka pirsê  
ev şihîr, ev havîn, ev romana xelasnebûyî  
yanê serfiraziya kêmâniyeke qalkirî  
bi dilê me yê girs, destêñ me yên girs, xewnêñ me yên girs  
çîroka pêwendîyan ku em hewl didin damezrînin  
bi dû re zanayêñ ku navêñ wan qemçîkirî ne  
weledêñ tarîxê, marx, freud, nietzsche  
û li vê dera min a hanê ew êşa dil a bi tîpêñ kevn

û ez ji xwe dipirsim  
bi cesareteke ûnfixarî ve  
em çawan di nîvê şevekê de li xwe vegeriyan

heyy diçe ava, derya bêxew  
damanên harmaniya min gewrehiya pêlan  
guh mediyê evîna min! helbet di her hesretekê de bahozake nîvçemayî ya havînê  
heye

13.

nebûye, kêm maye, bi paşte xistine  
çendin şevêن havînê mîna robarêن xwîhdayî  
milêن min hew digihîne hev  
ez ê li ku peyda bikim  
wî tiştê kembûyî ku êdî tu havîn nikare têxe dewsê  
ku kî dizane di kîjan heyy, kîjan stêrikê de bûye sir

keleha dawîn a umrê min jî ket  
çend havîn di ser re bihurûn  
çendin jî bûn girtî  
niha ez dendikeke fişekê me ku emanetî gunehan bûye  
neftiya çavêن min ji dûriya wan e û aliyekî rûyê min sextiyana nijm  
tu li min nenihêre, guhê xwe mede min evîna min  
tevî hemahilka stûyê min  
ev deh sal in ez baş im, baş im.


Tebax 1981

Wergera ji tirkî: **Muhsîn Kızılkaya**  
**Mehmed Uzun**

**Murathan Mungan;** ji Mêrdînê, ji malbata mezin Munganan e. Ew yek ji şairêن Tirkîyê yê mezintirîn tê hesibandin. Wî zimanekî taybetî yê nivîsandînê, li gora xwe ava kiriye. Zimanê wî yê edebî li ser sembol, gotin, adet û usûlên kevin, nêrînêن nûjen, pîvanên ronakbûrî hatiye pê. Ew hem şîr hem jî pexşanê dinivîsîne. Şanoyêن wî, "Trîlojiya Mezopotamya" car bi car li tiyatroyêن Tirkîyê dilîzin. Ev şîra jorîn ji pirtûka wî ya şîran "Sahitiyan" hatiye wergerandin. Gotina *Sahitiyan* çermê ask û xezalan e.

**M. Kızılkaya - M. Uzun.**

# FESTİVALA HELBESTA KURDÎ



Heyderê OMER

**P**eyv, viyangiyanekê bi hêrs û bi hêz, dîlîtiyeke berdewam, şînoyeke rojane û nêrîneke nû gihan hev û helbesteke nûjen ji wan peyda bû; ronahiya tariyê ramûsand û helbestvan avêt nava agirekî bê tebat, da roj bi roj bisote û tariyê bigelêşe, destêx xwe têxe qirika cirawestinê û pûtên paşvenêrîna sar bişkîne û kelepûra me bide ber nêrîneke hemdem û pêşve bide, an careke dîtir wê bi awayekî nûjen biafîrîne.

Helbesta kurdî li Sûriyê bi vî awayî û ji ber vê mebestê dixebite û gavêñ sozdar

di vê penavê de pêş ve davêje û tevî ku ew bi xwe jî ta îro keça demeke kurt e, lê belê bîna pêşerojeke geş û bi rewneq jê tê.

Ev yeka, nîşankirina vê helbesta nûjen, yek bû ji gelek meremên komîta amadekirina (Mehrîcana yekem, ya helbesta kurdî li Sûriyê) dabû ber xwe lewre jî ew xebitî bû, da bikaribe hin deng û rûyêñ nû, di wê rojê de, pêşkêş bike.

Vê komîte danûstandin û hevpeyvînê xwe, li derdora heyvekê domand û dawî, roja 22.10.1993 ji bo lidarxistina Mehrecana yekem, ya helbesta kurdî li Sûriyê di cî de dît.

## Çima ev roj?

Wek em giş dizanin, Seyda Cegerxwîn, helbestvanê ku demek dûr û dirêj û bi cefa di guhêñ miletê xwe de diqêri û heşt dîwan çap kirine û hinêñ din yên neçapkirî li dû xwe hiştine, di vê rojê de, sala 1984'an de li Stockholmê, koç kir. Ji vê boneyê komîte dîtibû ku mehrecanê di vê rojê de li dar bixe, da bikaribe hinekî ji deynê wî mirovê hêja, ji stûyê xwe û yên helbestvanê îro derxînin û rola ku ew û hemdemê wî, di helbest û toreyâ kurdî de lîstine, bi bîr bînin. Çimkî wê komîte, di daxuyaniya xwe, ya ku di mehrecanê de belav kiribû, weha gotibû: "Helbestvanê me yê hêja, mîna Celadet û Kamûran Bedirxan, Osman Sebrî, Qedîri Can, Tîrêj, Keleş bi gelempêrî, û "Cegerxwîn" bi taybetî, helbesta kurdî li Sûriyê şen kirin û a niha hinek ji wan bi me re wê av didin".

## Roja Helbestê

Lê xuya bû ne tenê ev yeka mebest û daxwaza komîte bû, lê belê ji vê kûrtir û nerxtir bû jî, ji ber ku di mehrêcanê de (Roja helbesta kurdî) jî li Sûriyê hate nîşankirin, ku roja 22 çireyê pêşî bi vî navî bête naskirin. Daxuyana komîte weha dibêje: "Lewre piştî hevpeyvîneke

*ges, me pêwîst dît ku roja 22.10. roja koçkirina Cegerxwîn bibe roja helbesta kurdî li Sûriyê û her sal mehrecanên helbestê di vê rojê de pêk bê... Weha em helbestvan û hemî beşdarên li vir, roja 22.10. bi navê Roja Helbesta Kurdî li Sûriyê li dar dixin".*

### Mehrecan

Roj ûn bû, dem sibe bû. Cîgeh newqa Kurdaxê; keleha Horî Pêxember bû. Mehrecanê li wir, di hemêza siruştê de, bi beşdariya 25 helbestvanan û derdora 400 kesên guhdar, dest pê kir. Li destpêkê hemû helbestvan, guhdarêñ beşdar, ji bo giyanê Seydayê rehme lê Cegerxwîn û her kesên ku di doza gelparêziyê de çûne, piçekî rawestîn û di dû re birêvebirê mehrecanê; helbestvanê Hawarê **Gundî**, bi navê komîtê, xêrhatina hemû beşdaran kir û helbestvan **Şêrko Bedirxan** pêşkêş kir, da pêşewaziya mehrecanê bixwine. Wî jî bi navê komîtê xêrhatina hemûyan kir û dawî got: "Wek em dizanin, Seyda Cegerxwîn di sala 1903'an de, ji dayik bûye... Lî mixabin dîroka wêjeya kurdî roja jidayikbûna Seydayê Zindî, nizane, ji ber wê, mîlag bikin ku di kîjan mehê de, 90 sal, di ser roja dayikbûna Seyda têper bûye, lewre em dixwazin sala 1993'an bikin cejna derbasbûna 90 salî di ser roja zayîna Seydayê me, helbestvanê mezin; Cegerxwîn". Di dû re helbestvan **Rûxweşê Zîvar** daxuyana komîtê xwend.

Helbestên ku li mehrecanê hatibûne xwendin, ji du cureyan bûn, wek çawa helbestvan jî, li ser du dibistanêñ hunerî parve dibûn; dibistana klasîk ku Cizîrî, Xanî û Cegerxwîn bi me bîr anî û yê nûjen ku bi hêrs û bi hêz, bi hebûna hin helbestvanê nûjen, pêşve diçe û şûna peyên xwe di zemîna helbesta kurdî de nîşan dike.

### Helbesta Klasîk

Eger ev helbesta kevneşop ji zû ve, di



Seydayê Tîrêj

toreya kurdî de peyda bûye û Herîrî, Teyran û Cizîrî bi me bîr tîne, wisa jî ta îro bi destê hin helbestvanê rûmetdar, wek **Tîrêj**, berdewam e, lê bi naveroka xwe, ji ya kevnaran cuda ye. Lewre Klasîka nû jê re tê gotin. Peyvîn wê bijarte ne, hevokên wê bi hêz in, awaza wê dervayî û sert e, rêzbenda wê beloq û berz e û babetên rojane li wan alavêñ hunerî siwar in.

Lê tevlî ku pêşveçûna helbestê li durvê wê siwar e, ne li naverokê, dîsan jî giyan û hestê kurd, pirî car bi vê helbesta klasîk mest û kêfxwêş dibin. Çimkî pirrê têkiliyên jiyanâ kurd jî, ta îro klasîk in û pirrê kurdan hê rîncber û gundî ne, ji bajarvaniyê û şarezayîyê evqas ne nêzîk in. Lewre ev helbest zûzû û bi hêsanî rê ji ya nûjen re bernade, ji bo vê yekê û hin sedemên dîtir, ev cure helbest, ta îro li nik pirr kesan ciyê pesnê ye. Ev yeka han di roja mehrecanê de berçav bû. Çimkî pirrê beşdarêñ guhdar, bi deng û awaza helbestên Tîrêj re mest bûn... Bi rastî jî Seyda Tîrêj karîbû bi helbestên xwe yên bijarte, kêfa

guhdaran bi cî bianiya û çepikêن wan germ bikira. Lê mixabin nimûneyên wan helbestan di destêن me de nîn in. Ev helbesta klasîk, di mehrecanê de, ji bili Tîrêj bi deng û xwendina **Omerê Lalê, Dr. Hesen, Hişyar û Diya Ciwan** besdar bû. Lê dîsan mixabin, tenê helbesta Diya Ciwan di destêن me de heye.



Diya Ciwan

Diya Ciwan xwediya berhevoka **Pêlek Ji Deryayê Kovanê Min** e. Wê deng û xwaziya jina kurd li mehrecanê bilind kir û dilêsiya ku jin tê de dijin, di navbera peyvine nazik û hulmeke germ re, şanî me da. Evîn ne ji mafê keçê ye û eger carekê ji dilê wê lê de, pêwîst e ew dilê xwe bin pê bike, kovan û xwaziyêن xwe tevlîhev bike, bi tenê wan bicû. Çimkî evindarî ne ji mafê wê ye û biryar ne di destên wê de ye.

*"Ji ber ku keç im, evînî ne ji mafê min e.*


*Biryarî ne bi destê min e  
Piştî wî Xwedayê mezin,  
Jîn û mirin bi destê bira û bavê min e".*

Vêca ev keça evîndar, wê ci bike? Wê dil û evîna xwe bin pê bike û bêje evîndarê xwe:

*Xwe li ber min melûl neke  
Kulên xwe jî li min bar neke  
Ne tu tenê li min bûyî evîndar,  
Ji te pê ve gelek man bê cî û war  
Ku bêjim ez evîndar im,  
Wê tifû û lanet li min bibarin  
Ku bêjim ez evîndar im,  
Gunehê min pir mezin e  
Bi ku ve herim, bi ku ve baz dim  
Mirina reş her li hêviya min e.*

Dêrsim jî hin helbestêن xwe yên klasîk xwendin û keserên xwe û yên welêt, tê de lorandin:


*Te lêv sor in ji xwîna min  
Te çav kil dan ji reşka dil  
Tu yi dîlber û yara min  
Tu yi rihan û lala min  
Ronî der bû ji sîngê te  
Dil û ceger pê dax dane  
Ji ber êş û evîna te  
Me ax û ox û nal dane.*



Dêrsim

## **Helbesta Nûjen**

Ji van pê ve, piraniya helbestên ku li mehrecanê hatîbûne xwendin, li deriyê nûjeniyê didan û didane xuyakirin ku helbesta kurdî ya nûjen li Sûriyê, wê rojeke ne dûr, cihê xwe dagire. Mebesta me, ji vê gotarê, ne nirxandina wan helbestan e, lê merem ji vê yekê ew e ku em hin nimûneyan ji wan bi xwendevanên **NÜDEM**'ê bidin nasîn.



Mûm

**Mûm** yek e ji wan helbestvanên ku ber bi nûjeniya dûrv diçe, lê hêdî hêdî gavêن xwe davêje. Mûm wisa evîna xwe dirêse:

*Evîna min!...  
Dizanim gûmanê bikeve,  
Xewnê bişewite  
Pêjn ê bireve  
Derya yê ziwa be  
Ango tim û tim  
Wê ji hev bişele  
Lê dil get ranakeve:  
... ...  
Dizanim ku narvîn  
Çekeke zingarî ye; bê ber e.*

... ...

*Lê... Yare!*

*Tazîbûnê hokirim ku belengazî demek  
bê bihar e*

*Û Xwedêtî, yekbûnek romansî ye  
Dilxwaziya tac e...*

*Şêrgel ji yeke ji wan helbestvanên u  
roj dû rojê helbestên xwe, ber ve durvê  
nû têvedide. Wî li mehrecanê sê hel-  
bestên xwe xwendin. Di yekê ji wan de  
weha xwazîyen xwe pêskêş dike:*

*Xwazî darek bama!...*

*Li çiyakî bilind*

*Li ser kaniyekê*

*Çûk û çivîk li min bicivîna  
Şivan, gavan, pêrî û rêwî,  
bihêwirîna siya min...*

*Min ê pîrsa te ji wan bikira...*



Xemgînê Remo

Eger Şêrgel di helbesta xwe de pîrsê dike, **Xemgînê Remo** tiliya xwe dide ser birîna kûr û ber ken û xemên xwe ji Salar re, vî mendalê ku nû dîghîne û azar û êşan li ser milêن xwe dibîne, ji Salarê hesînerm ê ku hêviyan bi fermêskan av dide re Xemgînê Remo dîlorîne:

*Belê Salar belê...*  
*Karwanê me tim li rê ye*  
*Li ser rêça girtin û kuştinê ye*  
*Li ser rêça ronîkirina jînê ye...*  
*Salarê min!...*  
*Li çiyan û deştên me,*  
*bahoz e... barove ye,*  
*Zeviyêne me jehrkirî ne...*  
*Gulistanêne me berbat û talankirî ne...*  
*Ü kevokêne aştiyê, li ezmanê welatê me*  
*serjekirî ne.*  
*Salarê min!...*  
*Bi azar û fixanêne girtiyan*  
*Bi xwîna gehîdan,*  
*Gulên me geş dibin...*  
*Ü giya di bin keviran de namîne Salar.*  
*De mezin bibin... Mezin bibin!...*  
*Çem û kaniyêne welatê me ci şerîn*  
*in!...*  
*Ü em tî nin... gelekî tî nin...*

Bi rastî em dikarin bêjin hemû helbesvanen kurd, di vê babetê de nalîna welêt, hevpar û hevpiş in. Hunermendêne kurd heya di bilindtirîn pêlekên eztiyê de jî, nalînen tevayî li gel yên ezûn dirêse û wan li hevdu ba dide û dalfine û çend lat giran be jî Sîzif wî ji ser milêne xwe navêje. Xwêdanê ji eniya xwe paqîj dike û ber xwe dide... Roja ku latê xwe di serê ciyê de biçikîne, her û her di hiş û bîra wî de bi rewneq û ronak e.

*Na...*  
*Ez ê binêrim...*  
*Bila dilopa dawiyê,*  
*Ji roniya çavêne min bikeve!...*  
*Ez ê binêrim.*  
*Ez ê çend dilopêne roniye*  
*Ji tîrêjene çavêne te bidizim*  
*Pêlêne porê dilbera min,*  
*Nazik nazik hevdu maç dikin.*  
*Qermûçekene bêzariyê*  
*Li ser rûyê wê wek sînorê welatê min*  
*nîgar bûn*

Dîsan digot:  
*Bes e... Çavêne xwe bi nêrîna ciyan û*  
*giran*  
*biwestîne*  
*bêşîn e!...*  
*Bes e!...*

Bi vî awayî **Şêrko Bedirxan** nalînen

xwe yên dîlberê û yên welêt, di gel hev distire û hevîre nanê xwe, yên rojane, jê amade dike û evîna xwe li bejn û giyanê hejmara (yek) dipêce:

*Mamostê min,*  
*her car, reqema "çaran" dibêje...*  
*Lê ez jî, ji reqema "yek" hez dikim.*  
*Eger ji min dipirse:*  
*Yek û yek û yek û dîsan, çend in?*  
*Bersivê didim,*  
*Ü dibêjim yek...*

Wilo jî bi ser kelepûre kurdî de û hin wateyên xwe jê digre û bi awayekî nûjen derpêş dike:

*Şérîn e!...*  
*Wek dilopa şebnemê*  
*Li ser pelê gulsora rûçikên "Zînê"*  
*di cejna "Newrozê" de,*  
*bi ser lêvén "Mem"ê de*  
*dikeve!...*

*Şérîn e!...*  
 Eger hin helbestvanen me, mîna Feqê Teyran çelengiya dîlberê ji ya sirûstê bîlindtir dibînin, siruşt li nik Ş. Bedirxan ji qesengî û çelengiya dîlberê çavteng û tenezar dibe:

*Şérîna min!...*  
*Sirûstê bi xwe, bi min re got:*  
*"Ez ji memikên şérîna te,*  
*Çavteng dibim.*  
*Bi xwe, li xwena*  
*Bi xwe, li xwena.*

Pirrêne helbestvanen me, sûdeyê ji kelepûre kurdî digirin û wî deziyê ku di navbera nûjeniyê û kelepûr de heye, berz dikin, çimkê çande, bi xwe gewdeyekî zindî ye, ku bi hezarê salan temen kirî dike. Pêş û paş, serî û nigêne wê ji hevdu naqetin, wek çawa mirov bê nig, şel û lenger e, wisa jî çande, bê bingeh, lenger e. Çawa mirov bê serî, ker, kor, gêj û mirî ye, wisa jî şande bê pêşvebirin û nûjenkirin mirî ye... Ev wate li nik pirrê helbestvanen me bi cî bûye. **H Gundî** jî di vê penavê de ye:


*Çavêne te havîngeh in*  
*Yezdan bêhna xwe lê dike der*  
*Pêxember li kêlekê nimêj dikin*  
*Ferhad û Mem*  
*axînen dil lê sar dikin*  
*Çima iro sîn û keseran*  
*li wan dicivînî?!*...

*Cîma dicivînî?!*...

U gava dixwaze tîna xwe bi ava lêvên yarê bişkîne, wan lêvan ji sirûşa welêt bi dûr naxe:

*Lêvên te sérîn in,  
wek avkaniya Sîmanê  
Sozdar in, wek memikên Helebçe  
Ku zanîbû, bin barîna reşbaranê.  
Çawân mendalan bimêjîne.  
Çawân hestiyêñ kuzurî biguvêše,  
Şahiyê jê derîne...  
Cîma iro çilmissi xuya dibî  
Ü wan lêvan dimiçiqînî?!*  
*Cîma dimiçiqînî??*

Xwedîyê berhevoka helbestî Goristana Bê Gor Rûxweşê Zîvar jî bi sê helbestan besdarî Mehrecanê bû. Kesê ku helbesten Goristana Bê Gor û yên ku Rûxweş di dû re afirandine, bide ber hevdu, dikare bêje Rûxweş gavine fireh û berçav pêşve diçe û li pey pêkanîna dengekî xweser dixebite. Lê gupkên wî dengî hê nepeqîne. Çimkî hefsarê (kurte-helbesta ramankî) ya ku Rûxweş li



Rûxweş Zîvar

deriyê wê dide, hê di destê Şêrko Bêkes de ye. Lê belê xuya ye wê Rûxweş bikaribe cihê pêyên xwe di helbesta zaravayê kurmancî de dûz bike. Nimûneyek ji hel-

besten ku wî di mehrecanê de xwandin e:

*Xewn û hêviyên wî dizîn  
Lê hay nebû...  
Ken û peyvên wî girê dan  
Li ber wan neket...  
Hesten wî kurmî kirin,  
Lê nepirsî,  
Li giyanê wî siwar bûn,  
xwe nelivand.  
Nav lê kirin "ker",  
Pengirî...*

Xuya ye ev kurte-helbest ji ber hin sedemên derûnî û hinên ezîtî, ku bi helbestvan ve girêdayî ne, wê cihê xwe di penava nivîsa kurdî de dagire. Nemaze li nik cîlê nû. Çimkî piraniya wan, di vê dema bê tebat de, li deriyê wê kurte-helbestê didin. Hoşeng yeke ji wan helbestvanan, ku hin kurte-helbesten xwe, li mehrecanê xwendin. Nimûneyek ji yên wî ev e:

*Dema ku xewnек,  
ji xewnên min helçenî  
Wê çaxê...  
Min seh kir, ku heyvek ji esmanê min  
vemirt.*

*Min nav lê kir: (lava).*


Nimûneyek din ji yên Hoşeng ev e:

*Kelikeke tazî  
li ber temenê min î pêçayî  
bi îske îska,  
serî tewand  
xatir xwast  
Bar kir  
Ta niha,  
ne kêlik vege riya,  
û ne jî temen hêvî birrîn.*

Ev hêviya ku li ba Hoşeng nehatiye birrîn, li nik M. Hemo jî berz û beloq e. Çimkî di helbesta xwe de weha dibêje: *Éger ez nanek bûma,*  
*Divê min rojekê, Zikekî birçî têr  
bikira.*

*Lê eger helbestek bûma,  
Bi navê azadî,  
bihatama xwandin  
min ê xwe berda vî mileti  
Ji bîr nedibûm ta roja serbestî...*

Di destpêka vê panoramê de, em li der û dora helbesta nûjen peyivîn û me hin nimûne jî ji wê berçav kirin. Lê em ê



M. Hemo

hin helbestvanê ku nû derbasî penava helbestê dîbin û nûjenî dane ber xwe, bi xwendevanan bidin nasîn.

Tiştê ku cihê pesnê bû, mehrecanê û komîta wê karibûn hin helbestvanê nû û di toreya kurdî de nenas, bidana nasîn. Lewre em ji dixwazin cihekî taybetî û berz, li vir bidin wan.

Yek ji van helbestvanan, keça dilsoz û dil bi xem **Axîn** e ku nû li deriyê helbesta kurdî dide û xuya ye wê bi serbilindî cihê xwe di vê penavê de çêbike. Ez berî mehrecanê bi wê keçikê ne nas bûm û ne ji min tu tişt ji afirandinên wê xwendibû. A niha, tenê du kurte-helbestên wê yên ku li mehrecanê xwandine, di destênen min de peyda dîbin. Lewre ez nikarim nêrîneke cîgirtî der mafê wê keçikê de bidim, lê wek hatiye gotin "Dikê çê di hêkê de xuya ye" ez dikarim bêjim ez du kurte-helbestên Axîn'ê destpêkine sozdar in û mizgîna dayikbûna helbestvaneke jîr didine me. Nimûneyek ji afirandinên Axîn'ê ev e:

*Ji çîrokêñ şevbihêrka  
di şevêñ tarî de,  
Ji axîna dildara  
di ferhenga evîndara*



Axîn

*Ji dengê bilûra dil bi xem  
Ü weşandina pelên dara,  
Ji rohilata û roava,  
Dilê min ji evîna te helbestek danîbû.  
Lê gava ew bayê xurt hat,  
Ü bahozek rabû  
Rûpelên wê firyan,  
Bûn ewrek li ezmana  
Bi hêşirên şîn,  
hêdî hêdî giriyan.*

**Şêlan** ji yeke ji van kesen ku nû pênuşa xwe ji kulavê kişandiye, hesten xwe li helbestê dipêçin û siwar dîkin. Ew ji li mehrecanê, bi hin helbesten xwe yên kurt besdar bû. Ev kurte-helbesten wî, mizgînekê didin:

*Her car buhar tê,  
ez nizanim çiqas kulîlk diçînim.  
Ne ji bo dilê min,  
Bona dilê te...  
Îro min û buharê çavêñ hev ramûsandin.  
Kulîlk ji min pirsîn:  
Kanî yara te kengî tê?  
Min hêşirên xwe li ber weşandin,  
Ü min got:  
Bila buharek din bê!...  
Eger helbesten Şêlan mizgînî didin,*

helbesta **Şiyê** ji ji nişka ve "Awazê Kalo" li qada helbesta kurdî, wek dareke gewre, bilind û berşêrîn nîşan dike. "Awaz" bê destûr û bi hêz derbasî vê penavê dibe û helbestvanekî jîr û jêhatî tê xuyakirin. Em pêşerojeke gewre û bi rewneq jê re texmîn dîkin û bawer dîkin ku para Awaz di pêşvebirin û nûjenkirina helbesta kurdî de wê pir û berz be. Helbesta **Şiyê** bi nîşanen vê yekê avis e, gava tu wê dixwînî, dibînî çawa peyv li ser zimanê Awaz bi hêsanî û nerm diherikin:

*Rojekê...*

*Ramûsanek bê dawî,  
Li ser gerdenê ciyayekî evîndar  
reng vedan!...*  
*"Şiyê" iroj keçek e,  
li ber awazên bilûra bayê "Cêrcim",  
Sibehêن xwe, hevd bi hevde dihûne...*

Ev tengâ ku Awaz daye ber xwe û dixwaze bi destê xwe ve bîne, hin xurtê dîtir, di wê rêtê diçin. Yek ji wan **Rufet Şêxo** ye yê ku di helbesta erebî de cîgehê xwe, bi xebata berçav, dûz kirî û iro ji berê xwe daye tore û helbesta kurdî. Em bawer in ku eger R. Şêxo alavên derbirfîna zimanê kurdî bi dest xwe ve bîne, wê karibe roleke berçav di pêşvebirina helbesta kurdî de bilîze. Helbesten wî, yêñ destpêkê, vê yekê numa dîkin:

*Ji nişka ve,  
Mistek gezkirin weşî ser goştê  
ramanek sêwi.*

Nimûneyek dîtir ji helbesten R. Şêxo ev e:

*Mix gêj bû,  
Gava ku xwest  
Bi qoçêن xwe  
Hêlinêkê di bîna min de bikole.*

Wek me li destpêkê gotibû, ji bo derbasbûna 90 salî di ser bûyina Ce-



Dr. E. Şêxo

gerxwîn û 9 sal di ser koçkirina wî re, ev festîval pêk hatibû. Ji bo vê yekê jî Cegerxwîn ci bi bandûra xwe ya hunerî, ci bi helbest û navê xwe û ci jî bi bîranîn, li mehrecanê amade bû. Lewre, helbesta "Li ser riya Cegerxwîn" ya M. Bêkes cî girtibû.

M. Bêkes di penava helbesta kurdî de, dengekî nû ye. Anglo berî niha navê wî ne-hatibû bihîstîn. Lî tevî ku gavê wî destpêkî ne jî, em helbesta wî wek mizgînekê dibînîn û dikarin bêjin, eger ew pêşerojeke bi ronî bibîne. Ev kîteke ji helbesta wî ye:

*Ey meyxana evînê!...*

*Vegere li min*

*Min bike helbestek û li ser gora Cegerxwîn  
bilorîne...*

*Vegere li min*

*Bîranînê te sirûdêñ ilahî ne*

*Vegere li min*

*Dilê min dax nede bi dûrbînê...*

Ev mehrecan, wê di dîroka toreya kurdî de xaleke bi nîşan bimîne û wê wan helbestvanen ku lê besdar bûne, di dîrokê de rûmetdar bike.

Ev mehrecan bi vî awayê ku me di vê panoramê de berçav kiribû, me wilô dîtibû, ji ber ku em lê amade bûn û tê de hevpar bûn. Lî eger me hin nav negotibin, wek **Tengezar, İbo, F. Huseynî** û **B. Ciger** û tu nimûne ji helbesten wan pêşkêş nekiribin, em hêvîdar in wê bibûrin, ji ber ku helbesten wan di destê me de nîn in.

Gotina yekê di mehrecanê de bi "Siba we xwes" dest pê kir û bi "Şeva we xwes" dawî hat.


# MALVA SÎMFONIYEKE TARÎ YE

---

Sîwan A. MUSTAFA

Omer Hemdi (Malva) li  
gundê Tellnayif-Hisîce,  
1951, ji dayik bûye. Endamê  
sendika hunerên spehî ya  
Sûriyê ye. Endamê yekîtiya  
gişî ya hunermendê ereban,  
endamê yekîtiya huner-  
mendên Awistirya, endamê  
yekîtiya hunermendên  
şêwekarî -UNESCO-Paris e.

Li ser jiyan û xebata wî du  
pirtûk derketine; yek bi  
zimanê erebî, 1976; ya din  
bi zimanê almanî, hatine  
nivîsandin. Navê wî ketiye  
ferhenga hunerê cîhanê, ya  
ku ji aliyê kovara Flash Art  
ve tê derxistin. Pêşangehêن  
hevbeş li Sûriyê û li derveyî  
welêt; Bexda, Kuwêt, Urdin,  
Îskenderyê, Cezaîr, Lîbya,  
Sofiya, Buxarist, Prag,  
Moskova, Belgrad, Berlîn,  
Parîs, Roma, Estland;  
Pêşangehêن şexsî  
(îndîvîduel) li Hisîce,  
Heleb, Şam, Viyana, New  
York, Şîkago, Tînsî, Bud-  
apest, Moskova, Madrîd, S.  
Fransisco, Monaco, Frak-  
furt.



MALVA ( Omer Hemdi)

Jana nav xwe û ya gelê xwe derî çav dike.

"Şapeyek e û çavên min dadigire... reng ji destên min dirijin, xwe berdidin nav kêlekên çiya û lûtikeyên çandî bi zeytûn û hinê. Di gotinan de ez dibim çûkekî bê reng û bê çeng ji bo ku xemleke nû ji rûyê xwe re destnîşan bidim".

### Malva

Li gundê Tellnayif-Hisîce, di hawîrgehekê de ku hunerê kevnare, şehremanî û rengxweş li hev dikin; di sala 1951'ê de di malbateke kurd de, hunermend Omer Hemdî (Malva) ji dayik bû.

Lihevkirin û integrasyona di navbera ronak, reng û livandinê de siya xwe avêtin ser canê wî yê zarokî û hestê wî hişyar kirin. Ji ber ku Malva bi xwe jî xwedî hestekî nazik bû, hê di şes saliya wî de daxwaza wênekêşê ciyê xwe di cîhana wî ya zarokiyê de girt, lê bavê wî rî nedayê û bi gir pê da zanîn ku divê berî her tişfî ew fêrî xwendin û nivîsandinê bibe. Ji ber vê yekê bavê wî tabloyeke reş û biçûk jê re kirî da xwe li ser fêrî xwendin û nivîsandinê bike. Kirîna tabloyê şer di hundurê wî de ges kir, di navbera nivîsandinê ji rexekî ve û wênekêşiyê ji rexekî din ve; evî şerî hişt ku nivîsandin li cem wî riyeke nû bigire û rengekî nû bistîne. Formên tîpan bûne wêne û dîmenên sozdayî ji mirovan û hawîrgehekê û perîşaniyê re û qonaxa wênekêşiyê bi dizîkî- ji tîrsa bavê- di jiyana wî de dest pê kir. Vî tişfî hişt ku hin pirtir di nava wî de bicive û şer di hundurê wî de xurt bibe. Her weha ji bêçareyî di wê demê de wî bi bavê xwe re

karê giran û zehmet dikir, ji bo bikaribe pariyeq nan peyda bike û wênekêşya xwe berdewam bike.

Vê zaroktiya giran mentalîteta wênekêş û hunermendekî rasteqînî li cem wî çêkir, di ber re jî wî xwendina xwe berdewam kir û mamostayetî di sala 1968'an de tewaw kir. Hêdî hêdî Omer Hemdî dest bi beşdarbûnê di pêşangehan de kir. Yekemîn car bi tabloyeke tenê bû beşdarê pêşangeha turîzmê li Keşmîr (Hindistan) di sala 1965'an de, navê wê tabloyê "Dayiktî di reşê de" bû.

Piştre wî di çiriya pêşîn ya 1966'an de, xelata serekane ya cirîda hunerên spehî hatibû organîzekerin ji aliyê navenda rewşenbîrî ve li Hisîçê, stand. Di çiriya pêşîn ya 1967'an de qonaxa yekemîn di jiyana wî de, hunermendekî xwedî bingeh dest pê kir. Wî di vê demê de yekemîn pêşangeha tabloyê xwe di navenda rewşenbîriya Hisîçê de çêkir.

Hunerê ku wî di wê pêşangehê de pêşkêş kiribû, hunereke realist bû. Wêneyên rasteqînî ji jiyana cotkar û karkeran pêşkêş kirin. Gelek tablo hebûn ku di her yekî ji wan de gelek element û mirov hebûn, ew element û mirov her dem di şer û berberiyê de bûn. Bi erdê re, bi bênderan re, bi tîbûn û birçîbûnê re, bi tîrêjîn rojê re, yên ku wî kişandibûn, bi rengên sor û zer û meydanên berfireh ji rûyê tabloyê dabûna wan. Tabloyên pêşangeha yekemîn gelekî realistîk û derbirîn bûn. O. Hemdî bi germî û bi hêz derbirînî ya ku ji hêrsan dagirtî danûstandin bi wan re kiribû, loma jî hêrsên wî bi hêztir dihatin ji firçê û ji germareng ya ku ji şefeqa rojê û xwêdana cotkar û karkeran, wergirtibû. Girîngtîrîn



*Café de Wien*, 160 x 120 cm, 1988

tabloyêν vê pêşangehê ev bûn: Realîta me, Jineke kurd, cotkarê iro, Palahî, Berxwedana li gund, Pişî kar, Xoragerî, Zarok, Dakyikti û hwd...(1)

Çaxa O. Hemdî li rewşa gelê xwe yê ku li hêviya pêşerojeke baştir de bû, di-meyizand; hest û hêrsên xurt di hundurê wî de dikelîn. Loma jî wî di wêneyêن realîtûk yên wê çaxê de xwest bi alîkariya reng û wênekêşıya hundurê mirovan li gel hemî hest û jan û derdêñ wî-nerxêñ derbirîñî rêze û di tabloyêن xwe de riwêñ şîngirtî û laşen westiyayî di bin zordestî û bizava rojane de pêşandan.

Hestêñ wî yên nazik û dîmenêñ trajedî yên ji jiyana rojane nîşaneke gelek bilî û

taybetmend li cem wî çêkirin, ev nîşanî şîn bû ku xwe berdabû kûrahiya heyina wî û xwe avêtibû ser hemû tabloyêن wî. Di pêşangehêن xwe yên diwayhatî de wî hemû tabloyêن xwe di bin navê MALVA de pêşkêş kirin; ev nav bû weke perçeyekî ji hunerê wî û li hemû cîhanê hate naskirin bi navê MALVA û gava ku di hevpeyvînekê de pirsa vî navî jê re kirin, got: " Ev nav naverokeke wî ya gelek û gelek mezin heye. "Malva" malbat û bi xwedîbûn e. Ew rengê sor e li ser şahîkdirêjahiyeke spî û derbirîñîn mirovanî ( şîn, jan, westandin, perçebûn, evîn, şahî...) kirin wêne û rengê xak, an jî keçek an jî dayikek an jî zaroktiyê di

guriya şîna aram û jan û perçebûn û diltengiyê de, da wan .(2)

Salekê piştî pêşangeha xwe ya yekemîn, O. Hemdî tabloyên xwe û xemên xwe hilgirtin û berê xwe da Şamê bi hêviyeke mezin ku bikaribe li bajarê mezin û mişt ji mirovan, bajarê hunermendêñ mezin, pêşangehekê pêşkêş bike. Û bi vî awayî pêşangeha xwe ya diwemîn di sala 1968'an de li Navenda rewşenbûrî li Şamê çêkir.

Ev pêşangeh derbirînî bû û bi jiyanâ Cizîrê ve girêdayî bû. Bi xwezayê ve û bi hêrs û hestêñ mirovanî ve girêdayî bû.

Tabloyên vê pêşangehê hatibû kêşandin tenha bi rengê sor û piştî bi dumahîkbûna pêşangehê hunermend kes nizane ji bo çi- hemû tablo şewitandin.

Di hevpeyvîna digel rojnamevanekî de, ew li ser wan tabloyên şewitandî, dibêje: " Hê di bîra min de ye, ta nuha jî, ez bîna diwê şewata tabloyan dikim. Mirov dikare bêje ku pêşangeha min şutikeke sor e pêçayî bû li salona spî û pêşangeh di tevahiya xwe de jî hawîrgeha bakurî Sûriyê bû, bi alîkariya rengê sor min



L'amour - P'huil sur canava - 122 x 200 cm - 1990

wêneya mirovan bi derbirîneke bi hêrs û tûj dikêşand. Min wêneyêñ cotkar û kesen dora xwe kêşandin. Ew serpêhatiyeke hişk bû, sêplêñ li ser wê heta niha jî bi min re dimîn". (3)

Piştî wê bûyerê O. Hemdî berde-wam ma li ser wênekêsiyê û beşdarbûnê di pêşangehê hevbeş (kolektîv) de li Sûriyê û derveyî wê.

Di gulana

1976'an de, pêşangeha xwe ya sêyemîn di destpêkê de li Helebê, piştre li Şamê bi awayekî nû; pêşkêş kir. Di vê pêşangehê de ew ji zordesiya rengê sor azad bû û kategoriya şêwekarî (teşkilî) li cem wî pêş ve çû û girîngiyeke pirtir ji berê da pîvanan û valahiyê. Hunermend nema weke berê, serpêhatiyê wî û zanîna li cem wî kombûyî, hiştin, ku ew bikaribe hest û hêrsan organîze bike; û bi awayekî wî derbirînê navxweyî yêñ mirovan û şîna xwe di rengên şewî de parast (qehweyî û soretarî) û di riwên şîngirtî û laşen westiyayî de.

Di wê dema ku li Şamê dima nivîskarî û rexnegiriya hunerî dikir, wî berhemên

modern û hevçax di kovar û rojnameyên Sûriyê û Lubnanê de belav kirin. Ew karî riyeke nû di montaja rojnamevaniyê de veke, ku beriya wî tu kesî di Sûriyê de bi kar neanîbû.

Herweha gelek motîv ji helbest û gotarêñ rojnaman re çekirin. Motîvên wî roleke gelek mezin di pêşvebirina destekne hunermendêñ nûhatî de û bi taybetî yêñ kurd de leyistin.(4) Di sala 1978'an de, hunermend derbederî welat bû, ew dewlemendiya xwe ya hunerî, serpêhatiyêñ xwe û jana xwe bi xwe re hilgirt û berê xwe da Kanada û ji wê derê ji çû Viyanayê.

Li wê derê, li biyaniyê, tirs bû elemen-tekî berdewam di jiyanâ wî de. Ew pêre di odayeke biçûktir dijî û di nîvenê de radiza; vê tirsê bingeha hunerekî nû li cem wî peyda kir û siya xwe avête ser hemû tabloyêñ wî û lehengên wî yêñ westiyayî, sîngirtî bi riwêñ xwe yêñ bizdiyayî, çavêñ beloq, dest û lepêñ tarî û qîrêñ bêdeng di rengêñ volkanî de, formeke nû standin.

Malva hewl da vê formê weke pêşangeh pêşkêş bike "lê hesabê malê û bênderê li hev derneket" û diyar bû ku xewn û hêviyêñ wî yêñ dûrbûn ji realêñ jiyanê li Awistiryê û nikarî di destpêkê de heyina xwe di meydana hunerê Ewrûpî de bi cî bîne. Vî tiştî jî hevdijîtî di navbera wî û hunerê Ewrûpî de xurt kir û hişt ku hunermend MALVA xwe biguhere û serrûkeke devbiken ji xwe re deyne, da bikaribe bi regan nan bikire.

Di havîna 1980 de, li pêşangeha navnetewî ya Frankfurtê de, di quncikeke melûl de sê tabloyêñ xwe li ser navê salineke bazirganî pêşkêş kirin. Ev hersê

tabloyan bi xurtî bala bazirganekî huner ji Amerika bi navê Herbert Arnot kişand. Vî bazirganî dest pê kir û li hunermend Malva geriya û ew li Viyanê dît. Dema ku H. Arnot derbasî oda wî ya biçûk û bû û gifîkên rengan ên erzan li vir û wir dîtin, wî bawer nekir ku ev bû hunermendê yê ku ew tablo kêşandî. Wî hemû tabloyêñ Malva kirîn û pêşangehek ji 27 tabloyan jê re li Şîkago çekir. Ev gav bû destpêka serkevtineke mezin, hunermend piştî wê navekî cîhanî stand û pêşangehêñ xwe yêñ biserkevtî li gelek welatan, pêşkêş kirin.

Piştî 15 salan ji derbederiye Malva vedigere Sûriyê û berî çend mehan du pêşangehan li Şamê pêşkêş kirin. Tabloyêñ pêşangeha yekemîn bi şeweyekî Imprisionizmê dilrevîn, hate çekirin. Pêşangeha duwem tabloyêñ mezin bûn û bi şeweyekî expresionizmê hatibûn çekirin. Tablo pêk ve dewlemend bûn bi rengan û hêza derbirînî, hunermend bi ceger di gel wan dabû û stanbibû.(5)

Bi vî awayî hunermend Malva bû peydabûneke xuyane di hunerê şewekarî yê kurdi û cîhanî de. Bi riya danehênerê xwe yê serbixwe û dijwariya rengan yêñ ku xemla xwe ji rengêñ stranvanekî û sîmfonî girtibûn, ku jana hundurê wî û gelê wî çavdiyar kirin.

#### Serekânî:

(1) Xelil Safiye, kovara Al-Şebîba-1976, Şam.


(2) Mahmûd Za'rûr, rojnama Al-Destûr-1977, Eman.

(3) Selaheddin Mihemed, rojnama Al-Baas-1988, Şam.

(4) Mehîmûd Şahîn, rojnama Tişrîn.1993, Şam.

(5) Ased Ürabî, kovara Al-Manbir-1992, No 63, Paris.

# SÊ DERÎ JI BO WELATEKÎ ZÎNDANKIRÎ



Necîb BALAYÎ

## Nelson Mandela

Dêmê te yê reş  
dozek paqij pawan dike.  
Eniya te  
ya ji rengê xwehdana hejaran  
perestgeha rastîperestan e.  
Tîkên li rûyên te  
bûne çemên evînê û...  
ketine pêlan

Ey Mandela!  
Rojhilata çerxê jiyane  
Te kevneperesi û  
peyva kirêt 'ATATÜRK'  
xelatê xwînê li paş xwe hêla  
Hespê te rîya rastîye girtîye  
tu siwarekî kîl î.  
Ew welatê  
bi şîrhên asê hatiye perçekirin  
te bi simên hespê xwe kêla

Ey Mandela!  
Silav dikî xîvet û kulkên jaran  
ji împeratorî û hikimdaran  
berê xwe werdigerî  
Ey dengê bilind û welatê zîndankirî!  
Ey dengê spî li kêşwerê reş!  
Ey şahidê dîroka azadiyê!  
dengê tepeser û gaziya roja heşrê!  
Tu li serê duriyana azadiyê rawestayî û  
te deravê rîbaza jiyanê veguhast.  
Te destê pîroz ji xelatê bînivêj parast.  
...û tu çûye rîya rast

ber bi welatekî zîndankirî ketiye  
rê.

Simê hespê te bi rê da  
kefte tizbîyên ji morîkên  
Sefewî, Osmanî û Ataturkî hatine  
vehandin  
te bizdandin.  
Xewnê toraniyan  
te li ber piyan ser jê kirin.  
şîhîna hespê te  
...û peyvîn te yên şêriyê  
li ser mînbera rastiyê  
ji çerxê bindestiyê re bûne  
navûnişan.

## Beşikçi


Welatê ku  
bihara wî bi xwînê hişîn dibe  
Tu dizanî kîjan welat e.  
Welatê ku  
bi birînê gelê xwe hatî navkirin  
tu dizanî kîjan welat e.  
Welatê ku avahiya wî  
ji kuloxêن şehîdan ava bûye  
tu dizanî kîjan welat e.  
Ew welatê  
malavayîya vî çerxî  
di birfîna HELEBÇE da derbas kirî  
tu dizanî kîjan welat e.  
Ey welatê kederan!  
dema Beşikçi silavî derazînka te  
dike  
sê caran rabe û rûne.

## Medam Mîteran

Ho sişiyê!  
Xanîma çerxa bîstê!  
(Miryem)a çerxa kurdînîyê!  
Dergehê Diyarbekrê yê li taq e.  
Bêrîvan û Zekiya Alkan  
li frîngeha şehîdan  
pêşwazîya te dikin.  
Li rîya azafäyê  
polisê me dê bine kevok  
pasportê ji te naxwazin.  
Wêneyê te  
bi pora pemeyî û çavên kesk  
bejna zîrav mîna ala me  
li hemê cade ê kolanên me hatiye  
çiklandin.  
Her sal bîranîna (Enfal)ê tê  
te mîna zaroyê enfalkirî  
di dergûşa welatê me da himbêz  
dike.

Dihok, 2.3. 1994

# EZ Û HEZ



Suut KILIÇ

**E**v bû mehek ku jiyan, bêyî min derbas dibe. Dilê min dixewire, hildibe, lê dike nake firseta herikandinê nabîne. Ev mehek e ku min xwe ji bîr kiriye. Li aliyekî Ezê min, berê xwe dide cihekî û li aliyê din Hezê min, ji qehra, xwe dixe nav hezarpizrûkên xwe. Ji hev belavbûn, qey wiha ye. Cihê raketina min li derekê ye û cihê xwarina min li dereke din e. Porê min xwe li cihekî şeh dike, li cihekî jî sola xwe ji bîr dikim.

Li vî bajarî min kevneşopên xwe jî - ku gava bi tenê dimam, min xwe lê datanî - ji bîr kiriye. Eza min, min bi colbirî, li vî bajarî digerand; bê war û bê

kar bûm. Heza min bi colbirî di kolanan de derbas dibû û li quncikên xemilandî dinêrî; bê yar bûm.

\* \* \*

Şev ronahiya dil bû. Di vê ronahiye de Heza min, xwe bi aramî vedizeland. Roj, durûtiya mêtî bû; Eza min di vê durûtiye de rû bi xwe re nehiştibû. Ez nikarîbû Hez ragirta. Di nav vê atmosferê de min xwe du şeq didît. Lê xelkê min yek didît. Ji van şeqan yek Eza min, siyek tarî bû, bi siya Hez re li hev nedikir. Ji ber ku Hez, siyek sipî bû (di ronahiya dil de dibiriqî), siya reş belek belek dikir.

\* \* \*

Min xwe hew nasdikir (di bêdemîya jiyanê de bê hejmar mabûm).

Êdî guhê min, ji bêdengiya xwe, devê min jî ji dengê xwe ditirsîya. Rû, ji çavan şerm nedikir ku, çav li hızûra Aşa şâ'detiyê bide jî. Mêtî deyndarê nigan bû, ji bêhiyiya xwe, ava reş dilopî solan kiribû.

Heza min, wek her car, serî li ber Ez danetanî, lê carinan jî ji ber Ez, Hezê ji fediya rûyê dilê xwe qul dikir. Ji ber vî awayî carinan hesta Hezê, wek pêlên bahrê radibûn an dadihatîn. Di nav van pêlan de newalok çêdibûn. Wek newalokên jiyanâ roj bi roj, bîhna Hezê diçikand. Dil, di vê tengasiyê de xwe nedigirt û diherikî. Ji xwe re golên avê çêdikir ji van bîhnçikandinan. Hezê di van golan de ku wek bahrê bê av bûn, ji xwe re Ez difetisand. Hew marê kuşû jî nedikarîbû bi Hez veda. Êdî Hez dibû marekî sipî ku siya wî jî sipî bû. Lê belê ev tiştan giş, xewnek mijgewr bû ku Hezê ji xwe re çêdikir.

Bi yek carî min xwe jihevxitî didît.

Perçakî mîjîyê min di kolanekê de, xewnê nîvco di xaniyekî de, pêjnek bê hêvî li bin darekê hatibûn jîbîrkirin.

Derbasbûn jî derbas dibûn. Saet ne sekîm bûn, lê zû bi zû digerîyan, dibûn zîzok. Ji gera wan, çavên min şaş dibûn, hişê min î bêhiş, di kundirê serî de xwe wenda dikir. Dotir, do, fro, sibe û dahatû, min di vê wendakirinê de bihurandibû.

Mehek ji heyyên payizê bû. Meha darrûtinê kestanê dev ji hev (ku li benda evînê bûn) û qelişî, kelmezota birçîbûnê difûrandin ser çavên netêrxwarî.

Bê war, bê kar û bê yar bûm di vî bajarê gêrgîrîkan de. Jiyanol, di şikeftên çaralî de xwe nixwumandibûn. Ji min re şikeftek çaralî jî tune bû li vî bajarî ku jiyanokek nixwamî tê de heba.

Xwestek, bê bilêt, di îskela keştiyan de li hêviya otobusên belediyê bû ku ew otobus, heta dev bi nexwestekan hatibûn dagirtin. Li vî bajarî ji dêlva keştiyên hêviyan keştiyên siluetên mirovan çûn û hatin di pêl avê bahrê de dikirin. Xwestek û daxwaz, di nav pêlên pelê bi sûret de hatibûn veşartin.

Tenêbûna min dimir li vî bajarî.

Bi hisreta hêviyên hatibûn dizî, Heza min di fershengan de "libendemabûn" nehiştibû. Di demsala jîbîrkirinê de bûm ku ew demsal, bi xwe re xewnê mijgewr anî bû. Di van xewnê mijgewr de bi per, min bazik difûrandin ji hêviya hatibûn dizî re. Ewrêن bê reng, ku bi asoyê ve zeliqî bûn, mijgewrbûna xewnê min diherimandin.

Hebûn bûbû hewbûn. Di vê hewbûnê de Heza min, biryara tevavbûnê dida. Lê

Ez, ev yek qebûl nedikir. "Tevavbûn hêviyek e" digot Ezê. "Hêviya binavbanê ye ku ew ji a nemabûnê ye û di wê nemabûnê de Hez, wê Ez ji xwe re bike surban" digot Ezê.

Ez tirsonek bû, lê Hez bêtirs bû. Ev bêtirsbûna Hez, qidûmê nigan dişkenand. Ew nigênu ku radibûn ser piyan, ji dêlva piyan, radipelikîn ser çavan, ji ber vê bêtirsbûna Hezê niha bêmecal difisiyan.

Hez hêvî bû, lê hêvî ji hêla jiyanâ derewîn ve hatibûn dizîn. Ji ber vê yekê Hez, nedixwest li jiyanâ derewîn bima, wî dixwest biçe devera dijjiyanê, warê bêdawîbûnê, cem Mazdayê mezin. Êdî ji ber Gaviyên nûjen li vî bajarî dilşewatî jî nemabû.

Hezê rojekê di xewna xwe de dît ku Rîzergeyek, jê re qala warê bêdawîbûnê dike. Bi zimanê van kesan, li gorî Rîzerge, navê vî warî Binrastî bû. Rîzerge çîroka warê Binrastiyê bi vî awayî digot ji Hez re: "Ên ku gava bixwazin biçin wir, hewce ye ku heft qata dakeve bin erdê û mîjîyê xwe û hisê xwe bidin masiyekî da ku ew masî mîjî û hisî bixwe û karibe biçe warê bêdawîbûnê, dinya Binrastiyê. Li gorî Rîzerge ev cihê ku masî lê ye, îskeleya ragihandina warê Binrastiyê ye. Ev îskela li ser tîrçemekî hatiye avakirin. Di çem de her masiyek, ji bo mirovên dinya derewîn hatine amadekirin. Pişî ku ew kesê mîjî û hisê xwe da masî, wê bikaribe lê siwar be û çavê xwe bigire. Ewê masî wî kesî di fitlanek û zîvironekên qelşê bin erdê de derbas bike. Di nav van qelşan de ziyayê heftserî, hûtê tilîmisas û yek çav, pîrhebokên hincikbel cin û acinî, marêñ kor û ji xeynî van tebanan

pîra bi gopal heye. Ji van tebana yek jê heye ku pir bi talûke ye; pîra bi gopal. Ev pîra bi gopal, bi dengekî ewqas xweş distirê ku kerrekî sedsale jî (ji meraqan) dibihîse. Korekî sedsale ji ber dengê xweş (ji meraqan) çavê xwe vedike. Heger tu çavê xwe (ji meraqan) veke û li vê pîrê binêre, tê bibî kevir. Gelek heb (kes) çûn lê gava ku di wir re derbas bûn, ji meraqa dengxweşbûnê çavê xwe vekirin (bê ka ev dengxweşa hanê jineke çawa ye) û bûn kevir. Ku tu bi xwe bawer be, bi çavgirtînkê karibe gopalê wê ji destê wê derxîne, wê ew pîra bi gopal bibe qîzek û tê wê bi xwe re bibî (bi jîntî) warê Binrastiyê. roka pîra bi gopal jî wiha ye: Pîra bi gopal, qîza padîşahê cina ye ku ji ber hezkirina xortekî, ji aliyê bavê xwe ve hatiye ceza-kirin. Navê wê yê rastîn Gula Gulavê ye. Ew dengê xweş, ji bo xapandina xortan e ku ev nifir jî, ji aliyê diya wê ve lê hatiyê kirin. Kîjan xort karibe çavê xwe (ji meraqan) veneke û gopalê wê ji dest wê derxe, wê Gula Gulavê bibe jina wî. Lê heta vê gavê di riya warê Binrastiyê de gelek xort, xwestiye vî gopalî ji dest derxîne, lê tu kes bi ser neketiye û ji meraqa dengxweşiya wê, çavê xwe vekirine û bûne sfenksekî kevir. Lê heger te cesaret nekir û te ew derbas kir, çavê xwe venekir û pê ve, wê masî ji te re bibêje êdî tu dikare çavê xwe veke. Pişî çavvekirinê, tu ê cel salî li pişta masî, biçe. Çel salên welatê Binrastiyê, wek bîhsitendinek vê dinya derewîn e. Li dû cel salî, çem her diçe wê fireh bibe û akek zelal, ji şîr sipîtir, dest pê bike. Misqalekî din jî hunê biçin. Li rexê avê, însan wê hebin. Ji dûr ve timtêlên wan

sor (çeksor) wê xuya bibin, lê gava ku te nêzîkahî li wan kir, di nav wan de kesen ku timtêlên wan sipî (çeksipî) ji xuya bibin.

Ew kesen timtêl sipî, paşeroja te ye. Yanî kesen ku li dinya derewîn mirî ne, kalikê te, pîrika te û merivê ku tu nas dike, giş li wir in.

Ew kesen timtêl sor, paşeroja te, dahatûya te ye. Di nav wan de ji zariyê te (yênu ku wê çêbiban), zariyên zariyê te (lê ji ber ku tu ji dinya derewîn diçe, dê ev zarokan jî, ruh biguherînin û bibin yênu mirovokî li dinya derewîn dijî) a kesen ku hîna nehatine dinya derewîn, hemû timtêl sor in. Li wê dinya Binrastiyê Ez tune, Hew bi tenê Hez hene. Gava tu mêmî û hişê xwe dide masî, li wir Ezê te jî dimire. Binrastî, warê bêdawîbûnê, tevavbûn û nemabûn e (mabûn, peyvek dinya derewîn e, ji bo xapandina mirovan) e. Li wir, Rîzermezinek heye ku ew her roj, ji dêlva jiyanê dijjiyanê di wê ava zelal ku ji şîr sipîtir e, ava dike. Li warê Binrastiyê xwarin tune, raketin, kar û kelmezo-ta birçîbanê jî tune. Bi tenê gulpek av, tîra rojekê dike. Li vî warî jiyan, bêdem e, şev û roj, tevlîhev bûne, wek xewnec mijgewr".

\* \* \*

Ev xewnê mijgewr, Hez ji ava şîrsipî serxweş dixist. Ev xewnan, hêviya warê bêdawîbûnê, dinya Binrastiyê, ji Hez re çedîkir. Rîzergê, wek xapînoka şivanan, Hezê serxweş bi çiyayê xewnê mijgewr ve dixist. Lê, rastiya jiyanâ dinya derewîn û Ez, ev hêviyan vedimirandin.

Her mirov xwedî Ez û Hezekê bû. Lê kes ne wek min bû; ne wek kesî jî bûm.

Jihevketin, tê bê qey para min bû. Min xwe wek sê kesan didît. Sê kes di laşekî de wê çawa li hev bikiran?

Nigên min laş ranedigirtin û hebûnên min, li dû xwe dihiştin. Bîranîn ji mêjî re tu tişt netanî ji xeynî jibîrkirinê pê ve. Ziman bûbû goştê bê hesî, di dev de mabû bi sistî. Wî hew xweziya dil, ji mêjî re bilêv nedikir, lê ji Ez re bûbû berdevk, wî hay ji Hez tune bû. Di nav vê jibîrkirin û belavbûnê de min rojekê, nigên xwe wenda kir li kolanek bajêr (a rastî ne wendakirin jî bû, nigan ji min bazda bûn). Êdî bê nig mabûm. Bi destan, min xwe dixişikand li ser kevirên şoprêkê. Di nav heriyê de, di nav tozê de, bîhna nigên xelkê, pozê min dişewitandin, lê pozê Ezê min nedîşewîti. Hew ba jî di pozê min de nedisekinî. Diran jî, di dev de, hingî li benda hestiyan mabûn, bûbûn hesî.

Rojekê min bihîst ku bi şev pozê min, ji şerma, riya xwe girtiye û çûye. Pişta xwe dabû oxirê û berê xwe dabû bayê felekê. Bê poz û bê nig mabûm. Bîhna nigên xelkê jî hew nedihat min, bîhna kelmezota birçîbûnê jî...

Êdî yekcarî min xwe belavbûyî didît.

Min hew xwe nasnedikir (bê nasnamayê, bê nasnamê mayî). Rûyê bêçerm hew li neynikan (ji fediya) nedinêri. Min digot gelo, bûme tiştekî din?

Ji ber çend perçebûn û xwenasneki-ribûnê, di bîra miçiqî ya bê bîranînan de fetisîbûm. Kes li min bixwedi jî dernediket. Di navbera Min de û di navbera Ez û Hez de mabûm; neçar, bêxwedî û sêpar...

Rojê din li pey hev; çerm, goşt û pişî wan jî hestiyan, riya xwe girtin û ji laşê bêwar, bar kirin çûn. Li kêleka riyekê, li

ser şoprêkê mabûm; bê serê xwe. Ê ku diçûn û dihatin, carinan hesinê bi sûret davêtin pêşıya min. Ez, zû bi zû, li van hesinê bi sûret xwedî derdiket. Çav, dev û rûyê bêçerm, pêşmîrtiya Ez dikirin bi aîkariya desten gunehkar. Hez mabû bi tenêbûna dilê reben. Hew nig ji nemabûn ku karîban Hez, bibiran warekî din, warê tevavbûn, bêdawîbûn û belkî jî wek gotina Rîzergê, warê Binrastiyê.

Debariya Hez nemabû û her diqirqilî. Ezê min êdî ji Hez aciz bûbû û dixwest ku jê xelas biba, lewra Hez ji hesinê bi sûret heznedikir. Ez, Hez danîbû ber firotinê. Rojekê Ezek hat pêşıya min û bi Ezê min re bazarek kirin, ji bo kirîna Hezê min. Ew Eza bê Hez bû û ji xwe re li Hezekî digeriya. Ezê min bê fedî, Hez ji xwe re kir berdêlî. Li hember Hez, ji xwe re nîgek sitend, da ku Ez, bi vî nigî xwe êvaran bavêje biniya pirekê. Ezê ku Hezê min ji xwe re kirî, Rîzergeyek bû, bê fesal û bê rû bû.

Jihevketina min temam bûbû, lê tevav nebabû. Êdî Hez tune bû, bê serê xwe mabû Ez. Min xwe bi xwe digot: "Kî wê ji min re bi çolbirî, li kolanen bajêr bigere li yaran, di quncikên xemilandî de".

Ew Ezê min, bi desten gunehkar, çavê zclûl, rûyê bê çerm, zimanê bê hesti û bê hêvî, dijîyan li vî bajarı...

2.11.1993, Stembol

Hez: Ev bêjeya bi wateya Eza duwemîn hatiye bikaranîn, ango 'binhis' temsîl dike. Wek ku têzanîn di zîrnânê Kurdi de tu bêje bi dengderan dest pê nakin û yê ku dest pê dikin jî istisna ne. İcar bêjeya Ez wek ku üpa 'H' jî ber ketibe min hesibandiye û ez bi xwe ji vê yekê re dibêjim Eza jibîrkirî, ango ya ku di mirovan de di plana duwemîn de maye.

# AZADÎ

Kemal AKAY

Min dixwest lawekî min hebe,  
navê wî azad,  
keçeye min hebe,  
navê wê azad,  
birayekî min,  
xuşkeke min,  
gundiyekî min,  
cîranekî min,  
hevalekî min,  
evîneke min  
dijminekî min hebe,  
navê wî azad  
çiqas tî bû me ji azadiyê re.

Ji esirekî re,  
kesekî bi muebetê xistiye  
ewê ku bi qeydê xistiye  
ji jinekê re,  
xebatkarekî re  
fikrekê re,  
mirina bi rûmet re  
çiqas tiyê te me  
hey azadî.

Hemû tişt azad,  
hemû tişt azadî be.


Mirov azad,  
ceza,  
moral,  
exlaq,  
erf û edet.  
Sînor,  
sîlah,  
pere,  
egoîzm-kar  
herb tune be,  
min çiqas dixwest  
welatekî min hebe  
navê wî azad be.

Em birçiyê azadiyê ne,  
mîna,  
çemê Mûradê  
Gola Xamîrpêtê  
Çiyayê Xanşerefê  
Sîpan,  
Agirî,  
mîna  
evîndarekî bibêjim  
ez ji te hez dikim.  
Qasî gûliyên gulê  
wek kokberdana fidanekê  
bi qasî rojên azad...

---

**Kemal Akay** ev helbesta xwe ji pirtûka xwe ya bi tirkî "Xamîrpêtin Sevdası" ku di nava weşanên Berhemê de derketibû, wergerandiye kurdî û ji me re şandiye. Em diweşînin û hêvîdar in ku wê şârî me ji niha pê ve şîrîn xwe bi kurdî binivîse.

# MELA MENSÛRÊ GÊRGASÎ



Zeynelabidîn ZINAR

**B**edewî û rindiya her tişti, bêguman bi hostatî û hunermendiya hunermendant ve, rewşen û şanaziya xwe diyar dikan. Çewa ku xwarin bi hunerên kebaniyên hunermend, xwestir û zewqgartir diban, herweha ziman û nivîsar jî ceynî wisan bi xameya xamekêşen hunermend, rindî û şenîtiya xwe radixêlin.

Ev jî li diyarî çavan e, heta ku mirov nexweşî û kulekiyan nebîne, mirov bihayê xweşî û rastiyê jî kêm dinase. Lê zivistaneke xedar gava ku hovîtiya xwe dadixîne holê, ewçax bihayê bihara rengin jî zêdetir payedariya xwe dadixîne pêberî çavêñ ramandar.

Erê, bihar û xweşîya biharê, xwîna hemû ganiyan germ dikan û her wisan jî bi agirê vîn û evîneke dijwar dikelinin. Lewra bihar, jiyanekî nû dixe xwezayê û reng û rû lê şen dike, bevz û madê her tişti geş dike, rewş û tewra nîvmîri diguhîne ser tewrekî hewesdar ku bê daxwaz û vîna dilan be jî, qulçavkîn dilê xemdar

têne heyteholê û dibin mîna Dîcle û Firatê bindest.

Bi hatina biharê re, jiyanekî nû dest pê dike. Ji xwezayê zêdetir, şenîtiya ganiyan jî şentir dibe; teyr û tirûd dest bi çêkirina hêlînan dikan, rawil û tebayêن çolane piştî gornevêneke kurt têjik û kudikên xwe tînin û ew bi dilovanî xwedî dikan. Herweha ew bi deng û qîrêñ pirtexlit jî,bihna xwe berdidin û dev bi reqs û collanine xwezayî dikan.

Ew awe, tewr û tore li nava mirovan jî her wisan çêdibe; ji aliyekevî ve geşt û seyran, ji aliyekevî ve kar û xebat, ji hin aliyen ve jî Newroz û şahî li pey hevdû kaşerêz dibin û dixulkulin.

Lê demsala biharê, ji Neteweyê Kurd re cuda ye; ji aliyekevî ve şenî ye û ji aliyekevî ve jî şînî ye. Ji hersê mehan jî, xasma ya biharê...

Erê, vê biharê çi kir û çi nekir! Biharê, Kurdan bi Newrozê şad û şadan kiriye, lê ji gelek aliyen ve jî ew xemdar û perîşan kirine; rûxandina Serhildana 1925-an û qirkirina Helebçeya Şehîn, di 1988-an de...

Mensûrê Girgaşî nizanibû ku dê hewqas reşî û belengazî bi serê Neteweyê wî ve bêtin. Eger wî zanibiya, bêguman wî hewqas pesn û wesyetê delalî û kêlsima biharê nedida. Lê, de her çi be, dîsan jî giyana wî di gorê de şad û şen be, ku hewqas rindiya Bihara Kurdistanê bi xameya xwe aniye zimên û vêjeya kurdî bi nexş û nimûşan ve kiriye rewneqa cîhana mirovatîyê.

Berî destpêkirina helbestên li ser xweşikayî û delaltiya bihara rengin a Kurdistanê, em ê berê xwe bidin hin çavkaniyên ku behsa Girgaşî kirine û ew bi nav û nîşan dane nasandin.

Helbestvanê hêja Mensûrê Girgaşî, li Kurdistanê, ji helbestvanî û nivîskariya bi zimanê kurdî bêtir, bi pîşeya xwe ya "mele"tiyê mensûr bûye û ji gundê Girgaşê ye. Lê li gorî hin çavkaniyan, ew bi eslê xwe ji herêma Botan e. Îcar ew kengê û bo çi çûye li başûrê Kurdish-

tanê bi cih bûye, hê jî rind nehatiyezanîn.

Gigaş (yan jî Gêrgaş) dikeve rojhilata bajarê Amêdiyê. Ji mêj ve ye ku li wê herêmê lavje, stiran û helbest têne gotin. Her çiqasî ku tarîxeke xwepêgir a rast bo jidayîkbûn û çûna dilovaniya Girgaşî li pêşberî çavan tune, lê belê li gorî hin delîl û belgeyan, ew di Sedsala Şanzde û ya Hivde yên Zayıne de jiyye. Herweha di dem û çaxê Mele Ehmed Hiseynê Bateyî de jî bûye.

Mamosteyê nemir Enwer Maî gotiye ku Mele Mensûr: "Ji gundê Gêrgaşê ye yê ku dikevite başûrê rojhelata Amêdiyê, di Sedê Yanzdê Mişexî da jiye. Çend hozanêt cuda-cuda, ne ku bi rengê dîwanekê bi zimanê kurdî û bi awayê klasikî hene, ji hemî hozan û helbestên wî yên spehî û taze berêkana hozanvanîyê ye digel hozanvanê Hekarî yê mezin Melayê Bateyê ye." Bi vê rastiya li jorê, îcar diyar dibe ku Girgaşî di dema Mela Hiseynê Bateyî de bûye. Doktor Bileç Şerko û Micerson jî, gotine ku: Bateyî di Sedsala Pazdehan de, di navbera salên 1417-1490-ê Zayıne de jiye. Mamoste Elaedîn Secadî jî, vê gotina li jorî pejîrandiye û gotiye ku: Girgaşî hevdemê Mele Ehmed Hiseyn Bateyî bûye.

Nexwe madem ku Bateyî di navbera salên 1417-1490-î de jiye, îcar kêm-zêde mirov dikare bêje ku tarîxa çêbûn û mirina Girgaşî jî, her li dengyê wan salan bûye.

Ev nivîskar û kurdologên bi navûdeng ên ku li jorê behsa navêwan hate kirin, herweha kek Evdilreqîb Üsiv jî digel wan, hemiyan gotiye ku, di navbera Girgaşî û Bateyî de helbesteke munazere hatiye gotin.

Ew helbesta munazere ya ku di navbera Girgaşî û Bateyî de çêbûye, bi temamiya xwe heft malik in. Çar ji wan ên Girgaşî ne û her yekê şes rêzan in. Lê malikên Bateyî sisê ne, ew jî her yekê şes rêz in. Destpêka wan ev e:

Mela Mensûrê Gêrgaşî:  
Silava min seherxêzî  
Li te, ey Bate her karî  
Ji şehbazan şekirdîz î  
Ji 'eqda dirr û mirwarî  
Ji mewca fitneengîz î  
Ji lutfa Xaliqê barî

Melayê Bateyî:  
Ji lutfê û înayatê  
Tu yî Mensûrê rehmanî  
Here goşê xirabatê  
Bibîn fincan û xaqañî  
Ji sîmaya bit û latê  
Xuyabû sira Subhanî  
...

Belê helbestvanê bi navûdeng Girgaşî, ne tenê helbesta Bihara Kurdistanê risitiye, herweha wî gelek helbest û qesîdene din jî ristine û dewlemendiya vêjeya zimanê kurdî kiriye şox û şaneşîna evîndaran:...

Delala nazika rend î  
Şepal î, dêm weku find î  
Bi rastî ayeta zend î  
Bihar û xweşîya can î

Tu daxwaza min î, dîlber  
Ji min tu çak bike bawer  
Ji bihişt û Zemzem û Kewser  
Bi tenha min tu yazan î  
...

#### Çavkanî:

1- Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî, Z. Zinar, Stockholm, 1991, rûpel: 153-157.

2- Çavkanîyen ku mamoste Sadiq Behaeddîn Amêdî di Hozanvanê Kurd de (Bexdad, 1970, rûpel: 243-259)

nivîsinê:

a) Enwer Maî, El Ekradu fi Behdînan, Metbe'et-ul Hissan, Musil 1960, s: 204.

b) Diktor Bileç Şerko, El Qeziyet-ul Kurdiyetî, 1930, el Qahîre, s: 21.

c) Mecerson. Kirmancî ya zimanê Kurdî, Lenden, 1913, berperê


#### AGAHDARÎ

Di hejmara NÜDEMê ya Nehan, rûpel: 40 de, şasyek di tarîxa çêbûn û mirina Xalid Axayê Zêbarî de çêbûye. Ew şâşî ev e: (1827-1828). Herweha ew şâşî di stûn: didu, peregraf: sisê de jî, dubare bûye.

Jixwe tarîxa mirina Zîbarî, ta niha jî nehatiye diyarkirin. Lê tarîxa jidayîkbûna wî, 1243-yê Hierî ye ku beramberî ya Miladî dike 1827-1828.

Em ji ber vê şâşiyê ji xwendevanê xwe lêborîn dixwazin.

# ROJNAMEGERIYA KURDÎ



Mehfûz MAYÎ

**L**i ser rûyê vê dinyayê sal, heyam û zeman derbas dibin, çendî diçe jiyanâ mirovatiyê û şaristanî her pêşde diçe. Mirovê ku di demekê de mîna heywanêñ kûvî bûn, şev û roj li deş, çiya û beriyân ji xwe re li xwarina xwe ya rojane di-geriya, niha ji ser heyvî jî derbas bûye, li ser banê stêrkên li asmanî digere. Ev pêketin jî gelek bi lez di vê çerxê me de derbas dibe, ku êdî di jiyanâ me a rojane de, tiştine wisa çedibin ku mirov nema dikare di mejiyê serê xwe de kom bike û jê fêhm bike.

Yek jî aliyêñ pêşketina şaristaniyê, pêşketina ferheng û edebiyatê ye, ku ji wê jî ROJNAMEGERÎ şaxê herî pêşketî

û modern di pêşketina edebiyatê de ye. Îro di cîhana pêşketî de rojnamegerî bi rîya kompyoterê di pileya herî bilind de ye. Di televizyona di nav mala mirovî de, (text tv) dikare karê çend rojname û kovaran bi cih bîne.

## ROJNAMEGERÎ ÇI YE?

Peyva ROJNAMEGERÎ, peyveke îranî ye, ROZNAMEGERÎ ji sê peyvîn bi hev re girêdayî pêk tê: ROZ- NAMEGERÎ. Roz; yanî roj. Name; yanî nivîstok, yan reşbelek. Gerî; yanî kirin, anku; karê rojnameyî. Ev peyve bêtir ji bo rojnameke rojane dipejire, ji ber ku Rojname mebest pê nameya rojê ye. Lê di karê praktik de ji wê gazetê re tê gotin, ku rojê, heta mehê carekê derdikeve, ji bultenê mezintir û ji kovarê biçüktir e.

Ji bo ku em baştir rewşa peydabûna Rojnamegeriya Kurdî bizanîn, baştir e em bi lez jî be, çavekî li tarîxa peydabûna çapemenî û rojnamegeriyê li Rojhilata Navîn, yan nêziktir bêjîn; wan milletên ku cîranêñ Kurdan in, lê binêrin, ew jî Ereb, Tirk û Fars in. Wek em dizanîn, heta berî şerê cihanê yê yekemîn 1914-1918 gelê Kurd û Kurdistan di bin destê du hakiman de hatibûn perçekirin, ew jî Tirkê Osmanî û Farsêñ Ecem bûn. Di herdu perçan de jî gel kole û tepeser bû. Di bin siya Osmaniyan de, gelên Ereb û Ermanî jî mîna gelê Kurd kole û bindest bûn, cudahiyeck biçük hebû, ew jî ew bû ku gelê Misrê hinek serxwebûna xwe hebû, tîrojkêñ roniya şoreşa Fransê zû gehîştibûn wê derê.

Her ji ber wê jî bû, ku yekemîn rojna-

meya li Efrîqa û rojhilata navîn, heta berî Stenbolê û Tehranê jî li Misrê derket. Ew jî rojnameya (Al-weqaî Al-Misriyeh) bû, ku di sala 1828an'de li bajarê Qahîre derket.

### ÇAPEMENÎ

Yekemîn çapxane ku gehîste devera Rojhelata Navîn di sala 1620'î da, li (Dérhezqa) li Lubnanê bû. Sala 1686'ê jî li Sûriyê, bajarê (Helebê) çapxane peyda bû.

Wilo, hêdî hêdî çapxane zêde bûn. Di sala 1728'an da li Stenbolê û sala 1798'an Napolyon çapxane anî Qahîre, navê wê kirin (çapxana Al-Ahliye).

Yekemîn çapa bi tîpêñ erebî (ew tîpêñ ku yekemîn rojnameya kurdî pê derketibû) li bajarê (Fano) li Îtyalya, di sala 1514'an da, li ser destê (Papa Yolyos) peyda bû.

Yekemîn rojnameya erebî (Al-weqaî Al-Misriye) di sala 1828'an de li Qahîre derket. Di sala 1860'î da (Al-Cewanib) li Stenbolê derket.

Di demêñ berê da, çapxane li musulmanan heram bûn, heta di sala 1728'an da (şêxul-İslam) li Stenbolê destûr da ku çapxane bêne danîn -herçende ew bi riya dêr û kenîsan jî hatibûn-. Ew sal bi sala destpêka çapkîrinê li Stenbolê tête hejmartin. Di sala 1840'î da yekemîn çapxana hikûmetê ya resmî hat danîn û her wê salê jî yekemîn rojnameya tirkî (Osmanî) bi navê (Teqwîm Weqaî) derket.

Di destpêka sedsaliya 17'an da û bi riya dêr û kenîseyên ermenî çapkîrin ge-hijte Îranê. Yekemîn rojnameya îranî (Exbar û Weqaî) di sala (1253'ê hicrî-

gemerî) angò di nîva sedsaliya nozdehan de, mîna bulteneke xeberî derdiket. Yekmîn rojnameya Îranî a rojane (Xulaset Al-Hewadis)"9" di sala 1850'î da derket û heta sala 1950'î dom kir.

### ROJNAMEGERIYA KURDÎ


Gelê me devgirtî, destgirêdayî, ketiye ber pêlên dijwar yên ragehandina neyaran, nahêlin ew baweriya xwe bêje. Gelê kurd ji derbirîna kesatiya xwe a netewî bêpar e... ji dengbilindkirinê bêpar e... ji rîyêñ derbrîna gotina xwe bêpar e... ji wê jî ku ew bi xwe re deng bike bêpar e...

Bi milyonan ji gelê kurd çaverêyi radyo, rojname û nûçexaneyê cîhanê ye, ku ew jî her na gihîjin wî, ne ji ber xwendevaniyê, yan nezaniya zimanêñ biyanî, yan nebûna rojnameyêñ kurdî yên ku tiştê ji bo wî û li dij wî tê gotin, ji wî re wergerînin, agehdarbûn jî li ser wî qedexekirî ye, pejanêñ bilind û bi dirfî li derdora wî danîne. Yanî ew ji mafê agehdarbûnê jî bêpar e... nahêlin ku ew jî gotina xwe bêje? Bi azadî baweriya xwe li ser tiştê dixwaze, tiştê ku li ser wî tê gotin û programêñ ku ji wî re têñ çekirin bêje?

Ev gel di zivrokek bi stirî (dirfî) de dizivre... carna wî bi "paşketin"ê gunehkar dikin. Di rastiyê de jî sedema paşketina wî ew bixwe ne, yên ku bi rasistiya xwe, wî paşketî dihêlin... ji vê jî mezin-tir, ew dikin û dixwazin ku ew "paşketî" be. Ji ber ku gelê zana zûtir, mezin û birêkxistinek xurttir, li dij sedemêñ bindestî û kolebûna xwe şoreş dike. Bi her buhayekî giran be jî, rizgariya xwe dixwaze.

Em nabêjin ku gelê me di vî warî de kêmasî kiriye, yan heta niha, ji bo aza-diya xwe qurbanî nedane.

Weke di xwendina dîrokê de eßkere ye, torevan (edîb) û zanayên kurd gelek qurbanî ji bo damez-randina, zengînkirin û pêşdebirina rojnamegeriya xwe dane. Hinek ji wan hene jî, ku bi tenê ji bo nivîsandin, çap û belavkirinê jiyanê.



Danerê rojnameya Kurdistan M. Mîdhet Bedir xan

Mîna (Mîdhet û Celadet Bedirxan, Huznî Mukryanî, Pîremêrd, Ela`eddîn Sicadî... û yên din) ji serkêşen rojnamegeriyê û mîrên serhildana çanda kurdî.

Dîsa jî belê dibe ku ew hemû hewil-danêñ ji dil kirin jî dihatin rawestandin, piranî ji ber sedemên siyasî, ji wan jî sedemên netewî bûn. Anku rawestandin û qedexekirina wan bi tenê ji ber ku ew bi zimanê kurdî bûn.

Heta rawestandina ji ber sedemên madî jî, bi awakî objektîv girêdayî her wan egerên aborî, civakî, siyasî û çanda veşartî dibin rewşa bêparkirinê û bindestiya netewî de bûn. Xasma wê bêdengkirina siyasî, ku gelên din jî mîna gelê Kurd girtibû, êdî hîn kovanêñ rojnamegeriya kurdî zêdetir û girantir bûn.

Nexweşıya herî mezin di perçebûna vî mileti de ye, di rewşa wî ya ku ne xwedî biçüktirîn mafê xwe yê netewî û civakî

de ye.

Rewşa koletî, dûrbûn ji serbestiya siyasî û civakî, dûr ji serbestiya bîrûbaweran, weşandin û axiftinê. Herwisa nebûna delîvîn (firset) pêşdeçûna roşinbîriyê, nemaze ger bikaranîna zimanê netewî li mîletekî hat qedexekirin, ew dibe egera peydabûna astengan di rîya çêbûn, şînbûn û pêşdeçûna çanda

gelerî ya her mîletekî, ji wê jî û berî her tiştî rojnamegriya wî mileti.

Yekemîn çapxana kurdî dîrokzan û rojnamevanê kurd (Huznî Mukriyanî) di sala 1915'an de li (Heleb)ê daniye. Ev jî bûyereke din di dîroka çanda kurdî de ye, ku yekemîn çapxana kurdî li derveyî welêt û bi xwe jî li bajarekî erebî çêbibe! ku yekemîn rojnameya kurdî jî li derveyî welêt û her li welatekî erebî derketibû.

Rewşa Kurdistanê, rewşa xelkê Kurd di bin barê bindestiyê de, bêparkirin ji mafê axiftin û nivîsandninê û bêparbûn ji her mafekî mirovatî, ev hemû sedem û rewşa gelê Kurd bûn ku yekemîn rojnameya kurdî li penaberiyê, dûr ji destê zâlim û dagîrkeran ji dayik bibe.

Roşenbîr û dilsozêñ Kurdistanê, yên ku dilê wan ji bo gelê wan dişewite, nema wê bindestiyê qebûl bikin. Nemaze roşenbîrê ku ji malbatek kurdperwer û

welatparêz, malbata ku bi sed salane serê xwe ji bo serxwebûna Kurdistanê hildayê û di navçayê dagîrkeran de qîrandiyê û dibêjê ; na, bindestiyê naxwazim. Belê malbata Bedirxaniyan ku taca serê me ne, vê malbatê yekemîn gaziya serxwebûna Kurdistanê di asmanê welatê me de bilind kir, ku iro jî heroj dilsozên welêt ji bo wê serxwebûnê mal û giyanê xwe qurbanî dikin.

Belê, ji xêra serê lawê wê binemalê Midhet Bedirxan Begê destpêka tarîxa rojnamegeriya me jî çêbû. Wî di 22 nisana 1898'an de dayika rojnamên kurdî, bi xweştrîn û şêrîntrîn nav (Kurdistan) û bi savik û şêrfintirîn ziman ku zimanê Ehmedê Xaniye li derbederiyyê, li welatê Misrê derxist. Çawa Ehmedê Xanî bi (Mem û Zîn)a xwe bersiva wan dijminan da yên ku digotin Kurd ne xwedî tarîx û ferheng in, wisa Midhet Bedirxan jî bi rojnama KURDISTAN bersiva wan dilreşan da, yên ku digotin Kurd nezan û paşdemayî ne.

Du sedemên serekî hebûn ku yekemîn rojnameya kurdî li Misrê derkeve:

Egera yekem ew bû, ku li Misrê şertên dîrokî yên baş peyda bûn, tê de çand bi serbestiyê, carna jî serbestiya berfireh xweş bû. Ji ber vê jî heta niha Misrê cihê xwe yê cuda heye, bêyî ku mirov li rejîmên wê mîze bike.

Egera din ew bû ku roşenbîrên kurd û daxwazkerên azadiyê, yên li gelê xwe xwedî derdiketin, li alê herdu dewletên Îranî û Osmanî ve dihatin girtin û kuştin. Ew di nava organên siyasi-civakî yên hevíşk de, mil bi milê xebatkarên Ereb û Ermen ve li dijî Osmaniyan dixe-bitîn....

Ev du eger bûne sedema wê, ku ew büyera dîrokî di dîroka gelê kurd de biqwime, ew jî derketina yekemîn rojnameya kurdî li Misrê.

Eger (Mehemed Ebde) û (Cemaliddîn El-Esgamî) ji bo serbestiya gotinê pena (hewar) biribû Parîsê û rojnameya (Al-Urwe Al-Wesqî) di sala 1883'an de derxistibû, Midhet Bedirxan jî ji Stenbolê pena bire Qahîreyê ji bo geryan li dû serbestiya gotina bi kurdî û rojnama xwe derbixe.

Hokarêñ bindestbûn, bêparbûn û paşdemana civakî û çandî wekir ku yekemîn rojnameya kurdî nêzîkî nîv qern (sedsalî) paşî derketina rojnameya wan gelên ku Kurd li deverê pêre dijî derkeve.

## PROBLEMÎN ROJNAMEGERIYA KURDÎ

Em Kurd, weke milletekî ji hev qetyayî û ne xwedî dewlet û hêjta bindest, problem di her warê jiyanê de zehf in. Di warê rojnamegerî de jî barê me û giriftariyê me pir in, lê yên herî berçav ev in:

1- Hebûna çend diyalektan, ji wan jî du yên serekî, ku rewşa me ya bindestî, parçebûyî û jihevqetyayî wilo kir ku bi derbasbûna sal û zemanên dirêj, millet ji hev dûr û sinorê dewletan ew ji hev dûr kiriye, êdî gel nema ji dialektên hevdû fehm bike. Tiştê ku hîn vî barî di vê xalê de gran dike, bikaranîna du alfabevêyên cuda-cuda ye, eger em nebêjin sê.

2- Ji vê xalê jî giringtir, nebûna azadiyê ye. Nimûneya wê jî ew e, ku her ji ber nebûna serbesî û azadiyê bû ku dayika rojnamên kurdî "Kurdistan" li mi-haciriyê ji dayik bibe. Heta iro jî bi

dehan rojname û kovarên kurdî li derbide-riyê, li welatên biyanî derdikevin, ku destê xelkê Kurdistanê nagihîje wan.

Astenga herî pêşin problema bêparkirin, bêdengkirin, nehêlan û bindestkirinê ye... çunkî di hinek serdemên kin de, ku hinek azadî hebû, rojnameyêن kurdî derdiketin. Mîna serdemê hikmeta şêx Mehmûd, serdema Komara Mehabadê, serdema piştî şorişa 14'ê gelawêjê li Iraqê û serdema piştî beiannama 11'ê adara 1970'yî li başûrê Kurdistanê.

3- Ji astengên rojnamegeriya kurdî, ji bilî azadiya weşanê, problemên çapkiranê û belavkirinê, rewşa diravî û kadroyan û...hwd.) trajediyeke bi serê xwe ye. Ji bo behskirina wê rûpelên dirêj divê, li vir delfveya wê tune ye. Lê em werin ser naveroka mijara vê nivîsa xwe:

4- Bilindiya hejmara nexwendevana di nav gelê Kurd da, ku ev jî her ji sedema bindestiyê tê. Rojnamên ku bi kêmâniya xwe derdikevin jî, kesên ku dixwînin hindik in. Di vê xalê de başûrê Kurdistanê ji perçen din baştir e, ew jî ji ber ku her ji sala 1970'î ve, xwendina kurdî di dibistanan de heye.

5- Rojnamegeriya ne bi zimanê kurdî. Ev jî her ji rewêa bindestiyê tê. Yek ji sexletêن rojnamegeriya kurdî ew e, ku her ji dayikbûna wê bi zimanêne ne kurdî, yên cuda-cuda derketiye "27" rewşa paçebûn, bêbahirkirin û bindestbûna netweya kurd bû sedema wê ku rêexistin, hêz û partiyêن kurdî rojnamegeriya xwe (ya ku taybet bi civata kurdî û doza wî ve ye) pir caran bi zimanê biyanî, carna jî têkel, kêm caran jî bi kurdî derbixin.

Hosa rojnamegeriya kurdî ya bi tirkî, farisî û erebî peyda bû. Yan jî ya têkel, kurdî-tirkî, kurdî-farisî û kurdî-erebî. Ev rewş heyâ iro jî dom dike, xasma rojnameyêن rêkxistinê kurdî li Kurdistanâ

Trkiyê.

Li Iraqê jî rojnameyêن kurdî yên rojane bi zimanê erebî derketin, mîna (Xebat) di salêن 1959-1961. Rojnama (Al-Ta`axî) ji meha nîsanê sala 1967, heta tîrmeha sla 1968 (di peryoda yekem da). Rojnameya (Ennor) di salêن 1968-1970 (periyoda duwem) da.

Yanî rojnamegeriya kurdî bi zimanê sê neteweyêن cuda, bi zimanê kurdî (herdu diyalîkt û elseba erebî û latînî) derkitey....

Bi Milyonan gelê me ji zimanê bab û kalan hatiye qedexekirin, roşenbîrên me jî mela û feqî bûn, bi zimanê erebî ve mijûl dibûn, êdî dema niviştok jî dinivîsandin, bi zimanê serdest dinivîsin da ku xelk ji nivîsîna wa fehm bike.

Hêz û rêkxistinê siyasî jî, yên ku dixwazin gel ji bindestiyê rizgar bikin, eynî rolê dilîzin. Ji ber ku gel nexwenda ye, yan yê xwenda jî zimanê biyanî ji zimanê Kurdî baştir dizane, êdî ew rêkxistin jî, ji bo ku dengê wan bighîje pirtir kesî, rojname û niviştokên xwe bi zimanê biyanî derdixin. Helbet ev jî ziyanek mezin dide zimanê kurdî, kesê kurd û tevgera rizgariya kurdî.

Çavkanî:

1- Mêjûy edebî kurdî, Ela'eddîn Siccadî bexda, 1952.

2- Rojnamegeriya kurdî li bakûrê Kurdistanê û Tirkîyê, Malmisanj û Mehmûd Lewendî, Swêd, 1989.

3- Derbarê rojnamegeriya kurdî, Dr, Îzeddîn Mistefa, Bexda, 1973.bi erebî.

4- Sabir Eli Ehmed, miletê ne xwedî rojnameke rojane, Kurdistan, 1989. bi erebî.

5- Jiyana rewşenbîrî û siyaâf ya Kurdan, .Dr. Celîl Celîl, w: Eli-sêr, Swêd 1985.


6- Çend rûpel ji dîroka gelê Kurd, Dr, Kemal Mezher, w: Eli-sêr, swêd, 1991.

7- Kurd le sedey 19& 20 da, Kris Koçera, w: Mehemed Riyani, Tehran 1989.

8- Mêjûy wêjey kurd, Siddiq Borekeyî, Banê-Kurdistan, 1991.

# TERORÎST

M. Alî K.



**S**al, hezar û nehsed û heftê û yek e; bûyerek ku li gundekî Mêrdinê diqewume, rojeva Turkîyê dagir dike û ji hêla raya giştî ve bi baldarî tê taqîp kirin.

Li gor agahdarîyên rojnameyan li vê navçeyê terorîstek peyda bûbû. Lê, dîsan li gor şiroveyên wan ev terorîstekî gelekî xweser bû û bi tu diruvê teroristekî din ve ne diçû: di dîroka Turkîyê de ku ji vê hêlê de zengîn bû, heta nuha mînakên wusan ne hatibûn dîtin. Rojname zêdetir li ser metodên wî disekeinîn û digotin;" Ew metodên ku terorîst bikar tîne taybetî ne! Ew êrîşen xwe bi şevê, dema hîvtarî ye dike. Û heta nuha jî ew êrîşen xwe li ser leşkerên ku harisê tixûbê Sûrîyê ne dike. Gelekî balkêş e ku heta nuha vî terorîstî hêj fişek ne teqandiye. Tenê di taritîya şevê de ew digre ser kozikên leşkeran û ji nişka ve wan diqutifine. Bi vî babeti heta nuha sê leşker şehît xistine!"

Lewra, rojnameyanê ku ev nivîs nivîsî bû, hezar caran poşman bû ku çavêن xwe li vê dunyaya fanî vekirîye û şîrê diya xwe mîtiye! Ji ber ku ordiya tîrk eva li xwe weke heqaretek mezin qebûl kir û bi çeplê rojnameyan girtin, ew avêtin zindanê û ji wê rojê û virde, ji vî rojnameyanî kesekî tu salox nema hilanî!

Paşê jî serokgeneralê ordiyê xwe mecbûr dît û di radyo û elevizyonê de gotarek da; di

gotara xwe de got ku:"Mehmetçik ji tu tişti û tu kesî natirse! Yênu ku tersî vê dibêن xayînêن milet û dewleta me ne!" Bi dû de jî ferman da ordîyê ku ci pêwist be bikin , ji bo ku vî terorîstî sax an mirî bi dest bixin. Ji bo vê vatiniyê jî tabûrek qumando rêkirin navçeyê.

Tabûra qumando di navçeyê de dest bi operasyonan kir û pişti çend rojan jî netice girt: statistika operasyonan, çar gundêن şewutî, panzdeh zilamênu ku bi işkencê seqet mabûn û sêsed gundiyan girî bûn.

Gundiyan hewar û gazîya xwe gihadin nûnerênu xwe ku di parlamentojê de bûn. Nûneran ji gundiyan re gotin ku ew ê nikaribin tu sozê bidine wan, ji ber ku eva meseleke leşkerin bû. Lî dîsan jî tiştê ku ji destê wanbihata ê kiribana, diva bû şika gundiyan ji vê yekê tuneba, ji ber ku aha dîsan wexta hilbijartinê bû û pêwistiya wan geleki ji dengen gundiyan hebû.

Rîspiyêñ gundiyan hêj li Ankarê, li hêviya bersiva parlamenteñ xwe bûn , dema ku ji navçeyê saloxêñ xêrê bihîstin. Parlamenteñ ku ne dixwestin xwe bi carî gundiyan bixin , bi dû van saloxêñ xêrê re , hatin xwe zû zûka gihadin gundiyan û gotin ku hikûmetê bi ya wan kiriye û loma ev operasyonana hatine rawestandin. Lî heqîqet helbet bi babetekî din bû, ji ber ku hemû gundênu navçeyê nesibê xwe ji van operasyonê tabûra qumando girtibûn.

Di wê navbêñ re jî êrîşen "terorist" rawestibûn. Lî herkesî eva bi hilatina hîvê ve girê dida û digotin:"Dema ku dîsan hîvtarî bibe ewê terorîst dest bi êrîşen xwe bike!"

Bi rastî jî ew her panzdeh şevênu ku tava hîvê bû, tu deng û salox ji terorîst derneketin. Ü heta bi dû hersê şevênu ku hîvtarîbû jî tiştê neqewumî. Lî şeva çaran terorîst dîsan êrîşek biribû ser wan û di vê êrîşê de leşkerekî din kuştibû. Sibehî dema ku kontrol çûbû ser kozikan, ji bo ku harisan biguhere, leşkerek di kozika xwe de mirî ditibûn. Karbidesten leşkerî zû dest danîn ser vê meselê û nehiştin ku di vê derbarê de tu ïnformasyon belav bibe.

Lî, eger ne bi tevayî bû jî dîsan di rojnameyan de hin salox belav bûbûn. Li gor van saloxan MÎT'ê di derheqê vî terorîstî de hin agahdarî bi dest xistibûn û hêvî dikirin ku di wextekî kin de ewê wî bigirin.

Çend roj şûnde di hemû rojnameyên Turkiyê, di bergê pêşî de, xeberek hebû;"Terorîst girtin!" Ü li bin vê xeberê jî wêneyek hebû. Di wêne de, zilamekî navser bi rî û şâşik li ber kerekî rawestibû. Li gor saloxêñ rojnameyan, terorîst heta nuha êrîşen xwe li ser vî kerî dikirin. Di êrîşa dawîn de, şopa ker hatibû derxistin û çend şopgerên jêhatî şop gerandibûn û terorîst li mal, li gel kerê wî zeft kiribûn. Heta digotin ku ew di amadekirina êrîşin nû jî de bû...

Wê rojê li Turkiyê, êdî li sûka reş jî rojname peyda ne dibûn. Ew kesênu ku di jiyana xwe de qet rojname ne kiribûn û nexwendibûn jî çûbûn rojnameyek sitandibûn. Rojti-ra din gelek rojnameyan çapa xwe ducar kiribûn.

Bi dû çend rojan de hate famkirin ku yê weke terorîst hatiye girtin melayê gundê P. ye. Mela herçendî gotibû ku bêguneh e, dîsan jî kesekî jê bawer nekiribû. Dadistênu di

derheqê mela û kirinên wî de dosyek ji dused rûpelî amade kiribû û ji bo mela tawanê herî giran, dardekirin xwestibû.

Rojnamekê jî di derheqê mele û jiyana wî ya terorîstî de lêkolînek çêkiribû û eva perçe bi perçe heroj çap dikir. Li gor saloxên rojnamê têkilîyên mela bi Ermenîstan û Yewnan re jî çêbûbûn û ji van dewleta pere distandin, ji bo ku li Kurdistanê serhilda-nekê li darxe û Turkiyê perçe bike. Rojekê jî rojnamê secereya bav û ejdadê melê weşand û bi vê riyê mele hate agahdarkirin ku di eslê xwe de ew ne ji Neqşebendîyan, lê ji Bedirxaniyan e; bavê wî û Emîn Bedirxanê ku mîrê kurd yê dawîn bû pismamên hevedin bûn. Wekî din jî xezûrê bavê melê di serhildana Şêx Saîd de besdar bûbû. Rojnamê lê zêde dikir û digot ku; "Mele li pey heyfa bav û kalê xwe ye!"

Mele di rewşeka xirab de bû, û dizanî bû ku şensê wî tuneye, ji bo ku bikaribe bêgunehiya xwe îspat bike. Hemû kesî û hemû tiştî li dij wî digot! Di rewşeka wusan neçar de, mîna hemû mirovîn dîndar melê jî li ocaxên xwe, yên mîna Şêx Evdilqadirê Geylanî, kire hewar û gazî û li hêviya deriyekî xêrê ma.

Piştî demekê, di wexteke ku mehkemeya melê nêzîk dibû û hêviya wî kêm bûbû, te digo qey ocaxên melê dengê wî bihîstibûn û bi hewara wî ve hatibûn. Ji ber ku dîsan leşkerek li ber tixûb di kozika xwe de mirî hatibû dîtin. Ew jî mîna yên din navqetî bûbû, lê bi şêwê fermî digotin ku "hatiye fetisandin". Lê ya baş ji bo melê ew bû ku, li ser kozika yê leşker şopa pîkola kerekî hatibû dîtin. Eva delfîleke xurt bû ku terorîst hêj nehatiye girtin. Ji ber ku kerê melê weke unsûrekî tawanê melê li hêviya mehke-meyê, li axurê belediyê girêdayî bû.

Bi dû vê bûyerê de, karbdestêñ leşkerî yên heremê biryar dan ku wan kesên xwedî ker in teva bigrin bin çav. Bi dû vê fermanê de li heremê bi hezaran kerên bêxwedî û beradayî bi çolê de terqiya bûn! Lê di vê navbêne re tabûra qumando jî dest bi operasyonên xwe kiribû. Di operasyonan de kerek li kû didîtin ew gulebaran dikirin û dikuştin. Bi vî babefî wan dixwest rê li "terorîst" teng bikin.

Wusan hêj qumandoyan kuştina keran didomand û ji nişka ve vê bûyerê rengekî navnetewî girt. Ji ber ku çend wêneyên kerên gulebarankirî di rojnameyên Ewropî de jî çap bûbûn. Van wêneyan tesîra xwe li hîsên Ewropîyan yên ji vî aî de nazik, kiribûn û dilê teva şewutandibû. Loma jî hemû komikên heywanparêz seferber bûbûn û bi rîya Konseya Awropî dewleta Turkiyê protesto kiribûn. Di protestoyê de xwestinek jî hebû ku Turkiyê divê problemên xwe yên etnîk bi rîyên demokrasî hal bike.

Serokwezîrê Turkiyê, Cengîzhan Selçûkê ku heta nuha xwe di qultixê xwe de giran kiribû û ne xwestibû van bûyeran şirove bike, rabû di televizyonê de axaftinek kir. Di axaftina xwe de, serokwezîr, weke welat serxwebûna Turkiyê paraztibû û gotibû ku; "Mafê welatên din tuneye ku têkilî karêñ Turkiyê yên hundurîn bibin. Dewlet him li mirovê xwe dixe û him jî ji wan hez dike, eva kesekî din eleqedar nake! Ya din jî li Turkiyê tu meseleke etnîkî tuneye. Ew tirkêñ ku weke kurd têñ nasîn li Turkiyê hem-welaîyên di dereca yekemîn de ne! Lî li welatê me li vê herema paşmayî, meseleke terorê heye. Di eslê xwe de evana Ermenî ne û ji Yewnan jî alîkariyê werdigrin ji bo

ku welatê me perçe bikin. Lê dewleta me bi hêz e û ewê vê meselê çareser bike. Û di vê çareserkirinê de jî dewletê û qewetên leşkerin tu carî jî ji prensîbêñ demokrasî ê dûr nekevin, bila şika tukesi ji vê çenebe! Ewropî dibêñ hêzêñ leşkerî ker gulebaran kirine, eva jî ne rast e û propaganda terorîstan e; tenê li cihekî erebeyek leşkerin li binguhê kerekê ketiye û ev kera mirîye, lê eva tenê qezeyek e û qezêñ wusan li Ewropa jî çedibin!" Bi dû axaftina serokwezîr re, li Turkiyê minaqeşa li ser terorê û talûka perçekirina welêt gurr bûbû. Rojnameyan heroj li ser têkiliyên terorîstan ku bi Ermenî û Yewnan re hebûn, dinivisîn. Li gor saloxêñ rojnameyan; heremêñ rojhilat tijî çek û cepxane bûbûn, bi gotineke din digotin;"Bûye kodika barûdê!" ha diteqiya, ha diteqiya... Heta rojnameyekê nivisî bû ku; "Dehlîzek binerdê di navbêna Agirî û Êrivanê de hatiye tespît kirin û çekêñ ku hatine welêt hemû di vê dehlîzê re derbas bûne" Lê çend roj şunde hate famkirin ku eva ne tu dehlîz, tenê şikeftek bû!

Di hengameyek wusan de, rojekê serokgeneral derket di radyo û televizyonê de gotarek da. Got ku:"Terorist ê pêşin di ser cenazê min re derbas bin û paşê vî welatî ê perçe bikin!" Bi dû vê gotarê re hêj çend roj nebuhurîbûn û generalan hemû hikum kirin destê xwe.

Rojekê di televizyonê de xeyala zatê serokgeneral û çend qumandanêñ wî xweyanî bûn. Bi dû bêhniikeke bêdeng re serokgeneral şekirek şikenand û dest bi axaftinê kir: Di axaftina xwe de da famkirin ku parlamento fesex kiriye û serokwezîr jî avetiye zindanê. Paşê jî da famkirin ku ew ê ji bo demekê him serokwezîr û him jî serokkomar be. Lê dîsan jî ji bo ku şaş neyê famkirin ê kincêñ leşkerin ji xwe nekirina!

Eva dihate wê manê ku hemû tiştên çapemenî û weşamî dikete bin kontrola hêzêñ leşkerî. Ji ber vê yekê jî tu salox û agahdarî di derheqê bûyerên ku li vê navçeya Mêrdînê dibûn, nema gihiş raya gişî û heqîqeta vê meselê ji xelkê veşartî ma. Hêzêñ leşkerî bi carekê perdeyek kişiandin ser vê meselê û bi vî babetî mesele tefandin.

Lê dibêñ, zeman hakimê adil e, û eva gelekî jî rast e. Ji ber ku berya demekê pirtûkek lêkolîner û kurdnasê Rûsi Îskenderovê Baba çap bûbû. Di vê pirtûkê de Î. Baba, çend nivîskar û şâîrên kurd yên vê demê jî, li gel berhemên wan dide nasîn. Ji herema Mêrdînê jî behsa nivîskarekî bi navê "Xwînherê Kurdi" dike. Î. Baba heyfa xwe lê tîne ku di derheqê jiyan û navê vî nivîskar yê rastîn de, tu agahdarî bi dest nexistiye. Tenê çend nivîs û şîrên vî nivîskarî ku bi dest xistiye, di pirtûka xwe de weşandiye. Xwînherê Kurdi, di bin serniviseke; "Ji nifşê ku bê re!" bûyerên wê demê jî kat dike û rastiya li paş van bûyeran bi vî babetê jêrin şirove dike: "Eva serê demekê ye ku zilm û zordariya dewleta tirk û hêzêñ wê yên leşkerî, li vê navçeya me bêhawê zêde bûye. Heta nuha pênc gundêñ nêzî xeta tixûbê Sûriyê bi carekê ve şewutandise; bi sedan gundi bê sedem hatine girtin û işkence kirin. Dewlet ji gundiyan re dibê hûn terorîstan vedişêrin û ev terorîst bi şevê digrin ser kozikêñ leşkeran û wan difetisiñin, lê heqîqeta meselê ne wusa ye.

Li gundekî navçeyê kerekî bêxwedî hebû û eva hertim nêzî xeta tixûb ji xwe re dicêriya. Ez nizanim bê ji ber ci sedemê bû, lê vî kerî qet ji leşkeren tirk hez nedikir û

li kû didîtin êrîş dibire ser wan. Eva carekê min bi çavêن xwe dît. Rojekê leşkeran bi tirumpêlekê girtin ser gund ku saxtî bikin. Dema ku leşker li nav gund belav bûn, min dît ku ev ker nêzî tirumpêla wan bû û bi zîtirkan herdu lempeyên wê yên pêşin şikenandin. Bêşik yê ku bi şevê jî êrîş dibire ser wan ev kera bû; û di êrîşa dawîn de jî şehît ket!

Di wexteke ku mîrê kurd bi xwe li dewa xwe xwedî dergediket, kirinêñ vî kerî ji bo min serefrazîyek bûn û ez bi kirinêñ wî dilşa dibûm û bi mirina wî re jî gelek êşiyam. Ez ji nifşê ku bê, hêvî dikim ku kirinêñ vî kerî ji bîr nekin."

Eger ne ji Xwînherê Kurdi ba, ê rastiya vê bûyerê jî mîna gelek bûyerêñ din, di tarîtiya dîroka me de winda bibaya. Herweha ji xeyn zimêñ, berî ku ez li vir niqteyekê deynim, ez ê wê şîira Xwînherê Kurdi jî pêşkêşî we dikim:

## KERÊ BI NAMÛS

*Bi tarîxa heftê û yekê hîva dehan bîst û yekê  
Li serxetê li ber qelêç leşker girt dora gundekî  
Wisa neyar wisa dijmin tifing dagirt ji fişekê.  
Şevez reş i pir tarî bû saet li duwnzdeh û yekê  
Kerek hebû qut i kem bû him jî kor bû bi çavekî  
Rengê wî reş qama wî kin umrê wî li dor çar û yekê  
Beradayî bê xwedî bû kesî ne dihewand malekê  
Bi namûs û pir zana bû û zû neyaran nas dikî  
Him fêris û qehreman bû çêtir ji şêr û filekî  
Wî leşker dît li ber benê hema bi lez hicûm dikî  
Bi zir zirê û qor qorê leşker li erdê dirêj dikî  
Paşê li ser pîkolê dikî  
Quđûm şikest nav qetiha bi ser de mîza zer dikî  
Navê wîya Dûrmış bû û navê bajarê wî Hendekê  
Qumandan hat ser lê nerî dît ew çawan sikratê dikî  
"Eywah oglum şehit duştun" ker jî zir zira xwe dikî  
Gundî civand zirta dikî wana davêje feleqê  
Temo weke mîran qîrek dayê tu çi dawê li me dikî  
Qutîfîye leşkerê te ji kerê qut i kem bi çavekî  
Rabûn bi lez leşker civand wîna davêjin cemsekê  
Berî bîghin nexweşxanê can da nema çav bel dikî!*

# FEDÎ

## ROJHAT

Ji dil û can dixwaze bike  
Fedî dike vedişêre  
Naxwaze kes bibîne  
Bi hev re çawa dijîn  
Naxwaze kes pê bihese  
Ser dibe mîna cemedê  
Naxwaze kes bibihîze  
Bi dil nexweş dikevin  
Dixwazin wenda bibin  
Her yek bi alîkî de  
Di ronahiya findeke nîvmirî de

Bi kenebkî kelegirî  
Bi dilekî bê dili  
Te dihebînim wek mîvanekî  
Ji te sar in bi rasî  
Lê naxwazin tu pê bihesî  
Ne ji ber tiştekî ewqas girîng e  
Ji ber bi tenê racketineke bêdil e

Bimîne neçe dibêjin bi dev  
Rabe bigewite dibêjin ji dil  
Hinek bê silav wenda dibin  
Di tariya nîvê şevê de  
Di ronahiya findeke vemirî de

Ji çavêwan tê xwendin  
Bi mirûz dibên here  
Bi dev dibêbimîne  
Herdu jî qet naxwazin  
Wê şevê bi tenê razin  
Xewnîn ji hev cuda bibînin

Belkî tirsâ wan  
Ji biyaniya mîvan  
Hiltînin wê kirinê  
Ji bo şeva li dû tê

Xwastina wan ne tiştekî zêde bû  
Tenê çend keliyên ji xwe çûyin bû  
Demek pir kin be jî  
Xwe di hev de dîtin bû  
Di ronahiya tariyê de  
Li ber findeke vêsiyayî  
Di nav cihekî germ de  
Ramûsanek ji agir bû  
Bi ser du bedenên qefîlî de  
Bi ser du bedenên xwîdayî de

Kanibûn xwestina xwe bianîna cih  
Ne xema mîvan bû  
Lê nedixwestin kes pê bihese  
Ji bilî çend kesan  
Di ronahiya tariyê de  
Li ber finda vêsiyayî

Wê şevê xew neket çavan  
Ne mîvan ji xew ve çû  
Ne agirê temirî sar bû  
Belki yar jî nebûn ji dil de  
Tenê xwestibûn agirekî vêsinin  
Wê şevê di bin cih de

Di xew de pilepila wan  
Mîvan fam nekir  
Ji bayê xewan  
Belki jî di xewnan de  
Gîhîştibûn armancan

Di tariya heyva spî de  
Di bin nîvînek diheziya de  
Li ber finden vêsiyayî  
Belki jî mîvan ketibûn xewnê  
Ji ku derketibûn wê nîvê şevê  
Him jî bê dawet  
Av li agir kiribûn  
Agirê vênedisiya bi ava cemedê

Bi rasî ne sûcê wan e  
Kevneşöpiyek e  
Ji bay û kalan maye  
Ji salan jê re gotine  
Şerm e  
Fedî ye  
Bê rûmelî ye

Bênamûsî bû mîzekirina li hev  
Sedema kuştinê bû bi hev re bûn  
Tewanê giran hesibandin hinek wek ên din  
Li ber melekî  
Ango li ser masekê  
Markirina li hevûdin  
Yanî tapikirina li ser hev  
Hevûdin xapandina  
Bi kelepçeve zêrin  
Tiştekî bi rûmet dîtine

Lê ji bo xwarin û vexwarinê  
Qet şertek danenîne  
Ji bo zaranînê jî  
Tiştekî xerab negotine  
Kêmaqilekî aqil daye bav û kalan  
Tiştêm nemînin têr serê pisên pisan  
Nê mafê tu mirovî ye  
Binêre li dostekî  
Bi dilekî sar ê cemidî  
Li ber findekê diperpite nîvmirî


# KARÎKATORVANÊ KURD EYNAT

Karîkatorvan û hunermendê hêja Eynat di sala 1964'an de li gundê Qêsim, ji malbateke navdar, malbata Dîkê hatiye dinyayê. Malbata Dîkê ji malmezinên Çiyayê kurmênc e.

Eynat xwendina xwe ya liseyê (bekeloriya) li bajarê Helebê xelas kiriye.

Mamoste Eynat çi bi latînî, çi jî bi erebî xêzkêsekî gelekî jîr e û herweha tembûrvan û dengbêjekî koma "Aşîfî" ye.

M. HEMO




Eynat Dîko



Karîkatorekî Eynat Dîko

## Du Klasîkên Bi Kurdî



Medenî FERHO

**V**ê biharê du pirtûk; yek jê Mişk û Mirov ya John Steinbeck ya din jî Şevêن Spî ya Dostoyevskî ji aliyê Fîrat Cewerî ve hatin wergerandin û di nava weşanên Nûdemê de li Swêdê derkestin. Erê, we şaş nexwend: Wergera zimanê kurdî... Pirtûkên klasîk, bi zimanê kurdî...

Van çend rêzên min dilgermik nebînin. Ger ji nava gotinan hilma germ bifûre jî, bidin xatirê dilşahiya nivîskar.

Ber, kar, pir mezin e!...

Bi qasî mezînbûna xwe jî karekî pir girîng e!...

Karekî hêja, karekî pêwîst e!...

Karê wergera pirtûkan, karên wilo giran karê dewletan e. Ne kes, dewlet van karan didin ser milêñ xwe. Kes nikare hilgirin. Kes ku di vî nîrxî de binbar bibe,

rabûna wî/wê zehmet e, tim li ser çogan dimîne, dawî çogên wî/wê diqerimin, dikeve. Ya duduyan aliyê aborî... Di nîrxê wergera pirtûkan de dilojarê ye!... Weyn e!... Wawaylê ye!... Haveynê mecalê nade!... Pêşî xweş e, paşî reş e.

Mixabin dewleta me kurdan tune ye. Dev ji dewletê berdin, hebûn û nebûna me kurdan bi tayekî xav ve girêdayî ye. İro li Kurdistanê şerê hebûn û nebûnê tê dayîn. Xwezî cihê xwe daye hêviyê. Hêvi mezin e...

İcar, karê dewletê ji aliyê Mîrza Cewerî ve hatiye pêkanîn. Di war û nîrxê edebî û çandî de karekî dîrokî ye. Pîrozî, dilxelaşî, wesif û pesin heqê wî ne.

Firat Cewerî bi wergerandin û weşandina van herdu pirtûkan agirê oçaxa edebî geş kiriye. Bexçen ku bi destêñ hostenecaran hatine çandin û bijartin, bi vî karî xemle û bargir kir. Bo berdestikêñ cîlêñ nû, rûniştina ber vî agirê geş, gera nav bexçen têr xemle û bargir wê pir xweş be.

Gelo kîjan hunermendî ji klasîk para xwe nestanidiye? Nivîskar be, wênekar be, hozan û dengbêj be... Di bingeha wî de, di xerc û avaniya hewngiriya wî de, di stewihandina mîjiyê wî de, para wan hunermendêñ klasîk tune ye?

Yekemîn:

**Dostoyevskî!** ...

Yê din nivîskarê Amerîkî: **John Steinbeck!** ...

Dabaşa me ji herdu nivîskar û du pirtûkên wan in.

Du nivîskarê nemir û du pirtûkên wan yên ku dergehêñ jiyana berdewam li rûyê wan vekirine... Ji herdu nivîskaran jî, xwendevan, têra xwe agahdar in. Wan xweş nas dikin. Ji hêla jiyana wan jî, ji hêla berhemêñ wan jî... Ji ber vê sedemê, heyâ ji min were, ez ê ji bo xwendevanê hêja di war û nîrxê cuda de qala wan bikim. Lê bi gumana min, li ser van nivîskaran, di ci nîrxê hebe de, bê qalkirin, bê nivîsandin, pir tiştên nuh wê tune bin. Her tiştên ku bêñ gotin, rona-hiya rojê dîtine. Tiştên nuh, di derheqa wan de, galgala kurdî ye... Ev jî pîr mezin û girîng e. Bi kurdî nivîsandina her nîrxî nuh e.

Nivîskarê pêşî Dostoyevskî ye... Çavkaniyek ji çandî, edebî û hewngiriya cîhanê ye. Pirtûka wî Şevêن Spî...

Dostoyevskî di hemû berhemêñ xwe de bûye palê mirovatiyê. Tim xêr xwesitiye... Xweşî û ronahî dil kiriye. Lê mixabin, her dem reş û tarî derketiye ber hemêza wî. Ji jiyana xêr û têr ronahî, ji danûstandina mirovatiyê têr nebûye. Girtin û sîrgun bûne heval-bendêñ wî. Perçek ji jiyana wî zor û zehmetî ye. Jiyanek têr qerqaşûn haya sala 1866 domandiye. Di vê salê de Sûc û Ceze weşandîye. Dabaş hemû azadî û serbestî ye. Kesêñ ku hatine pelçiqandin, belengaz, elemoyî, yên hatine marazdan bûne dabaşa pirtûkên wî. Ew kesêñ hatine pêlêkirin, bi rewşike psîkolojîk ji xwe re kirine

armanc. Mîna pêxemberekî li merivan xwedî derketiye. Bi gotin û nivîsandinê xwe di hawara wan de hatiye.

Ev e ku mohra Dostoyevskî li hemdema 19'an ketiye. Ew mohr jî bû nîşanî û armanca hostetiyê.

Di destpêka Şevêن Spî de ev dabaş li bîra wî ye. Ya dilê xwe û hêviyên di nava mêtjiyê xwe de, bi wê ava kîmyewî ku tê hilbijartîn, tîne ziman. "Şevêن wîlo xweş...(..) ku mirov ançax dikare şevêن wîlo di xorâniya xwe de bibîne!" Xortanî jiyan e. Jiyana ciwanik û gewrik... Hêviyên ronahî, xweş û geşiyê ye. Dostoyevskî li jiyana ciwanik û gewre digere. Heta dawiya emrê xwe ew gera xwe didomîne. Gotina wî ya "Heşt salên min in ez li Petersbûrgê dijîm, lê min hê jî, ji xwe re nasek peyda ne-kiriye!" Gelo ew nas kî ye, ku ew tim lê digere? Gelo ew nas ne jiyana di dilê wî de kat daye; di nava ava mêtjiyê wî ê kîmyewî ku pêlên têrkîl dide, de ye? "Dilşahiya wan dilşahiya min, xemgîniya wan xemgîniya min e". Ev gotin jî daxwaza nivîskar e... Bo mirovan nîşan dide. Xwe berpirsiyarê hemdema xwe dibîne. Berpirsiyarê jiyane û merivan...

Kalo jî, Matroniya, Nas-tenkaya delal jî, cîran, rîwingî, gerok, tevnepîrk, dîwar, boyaxa zpîzer, belen-gazî, kursî, gulfiroşa xweşik, bihar, xanî, pace, dar, kuçe, kolan, fayton, kinc, şifqe, ax, kevir, erd û ezman... Hemû hevalê wî ne. Bi kurtî jiyana berçav,

ku bi destan tê girtin, jiyana ku bi destan nayê girtin, bi çavan nayê dîtin, hevalê wî ne. Her tim biharê dixwaze... Ew cîhanekî jar û nexweş naxwaze. Ew... "...Keçîkek ciwan û bêhawê xweşik" dixwaze. Ew mîrikên belakir, lumpenan naxwaze... Ew, jinika di çengê xwe de, delal û kubar dixwaze. Ew rîwingtiya bi tenê naxwaze. Bi hev re, tevayî dixwaze. Jiyanekî tevayî, jiyanekî hevaltî, hogirtî, têr têkîl dixwaze...

Ew di dawiya pirtûkâ xwe de jî dibêje:

"Bila ezmanê te her tim sayî be, bila bisîrînên te yêñ dilovan şewq û şahîyên xwe winda nekin..."

Daxwaza wî, pêşî û paşî yet e. Pêşî ci dixwaze, paşî jî daxwaz ew e. "Xwedêyo!... Ew ci demeke xweş û dirêj bû!... Ma qey demeke wîlo jî bo temenê mirovîkî têr nake?"

Destpêka pirtûkê ci dixwest, bi galgala dawî jî, ew daxwaz bi rewşeka din ï hostenecarî tê meydânê.


Şevêن Spî ceribandineke nivîsandinê ya nû ye. Di hêla nivîsandinê de, ji cîlê xwe jî, ji cîlê berî xwe jî cuda ye. Nivîskar têkîlî bi xwendevanan re daniye. Di nava tevgera pirtûkê de, di nava avahiya pirtûkê de nivîskar serûbinî kesê yekemîn e. Ew xwendevan jî dikişîne nava tevgerê. Xwendevan bê hemdê xwe dikeve nava tevgera pirtûkê. Ev ji her nivîskarî nayê. Hostetiye pir mezin jê re divê. Lî, nivîskarê Şevêن Spî, Dostoyevskî ye. Ew mezin e, pîr e, pîrê

nivîskaran e. Çavkanî ye... Ev şiklê nivîsandinê, di roman de riyek nû ye. Nivîskar rewşa nû, ceribandinek serbixwe, bi cesaretêk pir mezin daniye meydânê. Xweş pêk anîye...

Bê xilaffî, divê meriv ji vê çavkaniya mezîn, gurr û ges, têr ronahî pir avê vexwe.

## MIŞK Û MIROV

John Steinbeck



Nivîskarê duymîn:  
John Steinbeck e.

John Steinbeck xelatgirê Nobelê ye 1962'an e. Bê guman, Steinbeck ji xwendevanen kurd re ne biyani ye. Xwendevanen kurd wî û berhemên wî baş nas dikan. Ji ber ku berhemên hêja û nemir xwe didin xwendin. Di dilê mirovan de cihêن xwe çêdikin. Salifêن wan, dabaşen wan, bi galgal û rewşa axafstinê, di serê merivan de dicemidin, cî digirin. Ji ber ku bi havênen jiyane tê hevîkirin. Bi agirê mirovatiyê tê germkirin. Bi desten hunermendên çê jî, xweş û rind tê pejirandin. Perçek ji jiyana rojê re, yan mehê re, yan salê re, demsalê didin xuyakirin. Dibe neynika roj, meh û

salênu ku bênu jî. Xwendevan di jiyanu xwe de, di bîranîn û xeyalênu xwe de, (qenc-xerab) xwe di nava wê avahiyê de dibînin.

Gelê Amerikî ji hêla rastî û bê xapandinê ve, ji kesenê mîna John Steinbeck hatiye diyar kirin. Bê xap û derew... Ew gavanê kirine qehreman, mîr û ciwanmîr ji terefê kesenê wilô ve, xweşik û bê xilafî hatine naskirin. Ew kesenê ku di şev û rojekî de, rewşa cîhanê di-guherin, komên mîrân dikujin, lê ew qet nayênu kuştin, kesenê sêhrdayî, têr çekênen elektronîk, qet neanîne meydanê. Ji ber ku ne rast e. Kes û kûs ne xapandine. Gotin ew kes kilê çavênu qîzan e, hêviya xorxen bi zend û bend in... Rastiya jiyanê jî ev e. Heke nivîskar berpirsiyarê jiyanê ye, gerek wilô be.

**John Steinbeck** di Mişk û Mirov de, ev rastî weke ku heye, bi her awayî daniye ber çavan.

Gelo kijan mirov dikare bêje ez ne George im, an jî ne Lennie me ?... Mirov ji hêlekê ve George, ji hêlekê ve jî Lennie ye. Jiyanu têr qerqeşûn, têr perçiqandin, têr xwîn, mirov diperçiqîne. Mêjiyê mirov tevlihev dike. Ji hêla aqil û psîkolojî ve, bê wasele dihêle. Ku goşt bê wasele ma, xav dibe. Xavîtu hin bi aqil e, hin bê aqil e. Hin li ser piya ye, hin bi ser hevdu de hêrifî ye.

Di pirtûka Mişk û Mirov

de, xwendevan ne bes têkîlî mirovan dibe. Ne bes xwe di cewibandina aqil û psîkolojîk de dibîne. Ew jiyanu ku ne dûrî ye; jiyanu xwezayî; Mar, av, çem, hezikandina ava zîvî, çîtik û pûş, qırşik, bayê sivik, bayê giran, pelê çinarê, patos, dexl, germ, xwêdan, paleyî, toz, remedîlk, bâblîsok, kibrît, agir, rê, şivîle, rîwingî, tifîk, xwarina serê çiya, westandin, gazî, bang, hawar û hwd... Jiyanu gundiyekejî-jiyanu kurdî-nışan dide. John Steinbeck ne bes jiyanu George û Lennie, keftelefta aborî bi tenê datîne ber çavan. Ev tiştîn ku em ne biyaniyê wan in, nışanî me dide... Bi axaftin û galgalên wan jî, bi serpêhatiyê wan jî, jiyanu me datîne ber çavan. Ev jiyan, ya gundî û rîncberên dînyayê teva ye. Ya mirovên bi aqil û bê aqil e... Ci gundî, ci bajarî!...

Zimanê kurdî xweş e, divê di her war û nîrxî de bê xilmet kirin. Bê xilafî dibêjim; min hê ji nû, xweşî û gesiya hewngîriya **Dostoyevskî** û **John Steinbeck** dît. Çiqas kêmasiyênergera herdu pirtûkan hebin jî, têgihîştina dabaşa romaninan, avahiya tevgera romaninan, jiyanu kesan pir xweşî û gesî daye dilê min. Zimanê kurdî, ew hûnandin û pêçandina edebî; tevgera têr şax û per, pirdengî, pîrrengîya danûstandina miro-

van, lezîzbûna hew jê xweşîr daniye meydanê. **Firat Cewerî** hakimê ziman e, hakimê hûnandin û pêçana romanian bi xwe ye jî. Wî têkîlî ji hevdu perce nekiriye. Qetandin tê de nekiriye. Ji bo vê yekê jî, riqa ji kîsê xwe lê neda ne. Bes hînek gotin hene li ser wan bê şor kirin. Di dewsa wan gotinan de, gotinê kurdî hebûn. Lî ew nabe kêmasiyekê mezin, ji ber ku xwendevan ne biyaniyê wan gotinan in.

Xwendevan ji armanca nîvîsandin û dabaşa pirtûkan dûr nakeve. Ducare dikim, karê wergera van pirtûkên klasikî, bi kurdî karekî pir mezin û hêja ye. Xemla bexçeyê çanda kurdî ye. Jiyanu pirdengî, pîrrengî, pîrxweşî ye...

Herdu çavkanî pir mezin, gur û ges in...

Ava wan çavkaniyan têr ronahî ye. Ava jiyanu berdewam el...

Ava nemirinê ye!... Ab-i heyat e!...

Divê mirov ji wan çavkaniyan têr vexwe!...


---

Ev herdu pirtûkên ku di nava **Weşanê Nûdemê** de derketine, dikarin ji navnîşana Nûdemê bêne xwestin. Buhayê wan 40 Kronê Swêdî ye.

Ji bo aboneyê Nûdemê ji sedî deh erzantir e.

Ji bo xwestina pirtûkan an ji Nûdemê re telefonê vekin, an faxê bişînin, an jî çend rîzan binivîsin.

## Di Folklorâ Kurdî de Serdestiyeke Jinan



### Nacî KUTLAY

**M**in bi xwe Rohat, her çiqas em hevnavçeyî jî bin, berî mihacîriya Swêdê, nas nedikir. Lê belê, di demeke kurt de, wî, bala min dikişand. Bi jîyan, xûyxisyet û tiştên ku pê ve mijûl dibû, ne wek Kurdêne me yên din bûn. Ji xwendin, tiştên cîvatî û çandî hez dikir. Hunermend, ne wek yên dinê ne. Ew jî wisa bû. Mehêne pêşîn, ev rewşen wî, bi min ecêb dihat. Tu dinhêrî, di civînekê de hemû heval dikenin, lê, Rohat, wek wan nîn bû. An jî, tişteku kes pê na-kenin, lê, Rohat dibe tiqînîya wî, bi deqîqan, kenekî bilind û xweş pê gîrşye. Gerek meriv Rohat baş fêhm bike.

Lê, ez bi alîkî wî hesiyam û min bala xwe dayê. Rohat jîr, zîrek û tiştên ku bala kesî nedikişand, wî didît. Tiliya

xwe dida ser tiştên gelekî enteresan.

Ez bi Kurdnasên nav û deng, bi saya Rohat agahdar bûm. Wî, bi Tirkî, "Kurdoloji Biliminin 200 Yılık Geçmiş, 1787-1987" pirtûka, '200 Salıya Ulmê Kurdolojîyê, 1787-1987' nivîsibû. Ya rastî jî, pirtûkeke pir hêja bû, me hemûya jî hewcedarıya pirtûkeke awha dikir.

"Di Çavkanîyên Swêdî de Motîvîn Kurdî" derket paşê. Meriv dibîne ku, carcaran em hine tiştan dixwînin, lê, bi balkêşî li ser nasekinin. Wek, sed-dused salî berê, gerokê -seyah- ku çûne Kurdîstanê, an jî, mîsyonerên ku li Kurdîstanê jîyane, ci nivîsîne û ci gotine. Lê, Rohat wek me nenihêriye. Ew kom kirine û çûye li ser van tiştan lêkolîn kiriye.

Di hemû cureyên edebîyata Tirkî de, li ser şopa 'Kurdan gerîyaye û bi Tirkî pirtûka' 'Çağdaş Türk Edebiyatında Kürtlî' 'Di Edebiyata Tirkî ya Nûjen de Kurdî nivîsîye.

Wek van babetan, em gişt Yaşar Kemal, nivîskarê ku bi eslê xwe Kurd e û bi Tirkî nivîsîye, qet nebe, ji pirtûkêni wî, wî nas dikin. Lê, bala kesî nekişandîye ku, Yaşar Kemal di romanen xwe de hertim qala Wanê û Edeneyê, bi hev re dike. Dêbabêvî Yaşar Kemal ji Wanê ne û hatine li Edenê bi cî bûne. Y. Kemal di romanen xwe de, hertim folklorâ Kurdî û realîta Kurdî nivîsîye. Rohat, bi Tirkî lêkolîna 'Yaşar Kemal'ın Yapıtlarında Kurt Gerçegî', 'Di berhemên Yaşar Kemal de Realîta

Kurdî' çap kir. Ne cîyê wê ye ku, em niha li ser van babeta û dirêj bisekinin; min xwest ku, tenê, ez bînim bîra xwendevanan.

Wek van, Rohat 'Ziya Gökalp'ın Büyük Çilesi Kürtler' Dilêşîya mezin ya Ziya Gökalp, 'Kurd' nivîsîye. Tirk wî wek bavê Tirkîşîye dibînin û jê hez dikin. Kurd jî, wî wek eslê xwe winda kiriye û bûye xayînê Kurdan, lewre bi çavekî pir xirab lê dinhêrin. Lê, Rohat, li sebebê van herdu rewşan digere, gelo çito halekî röhî li ser Zîya Gökalp tesîr dikir? Jîyana wî, li ber van sebeban hertim sero-bino bû.

Rohat, ji folklorâ Kurdî pir hez dike, ez wî ji nêzîk ve nas dikim, dikarim di vî warî de rehet bipeyivim. Lê, çawa min li jor jî got, ew, di folklorâ Kurdî de li tiştên enteresan digere. Wek, 'Di Stranê Kurdî de Navçeve Erotîk. Memik.' Rohat, nivîsareke dirêj bi vî navî berê di kovara Nûdemê de nivîsî bû, paşê wî ew nivîsara xwe fireh kiriye, li ser zêde kiriye û kiriye pirtûkek.

Bi vê têkilîyê, ez du-sê pirşan dîsa bêjîm û em bê ser babeta xwe. Di van salê dawîyê de, em Kurd di derheqê jinan de ne wek berê ne. Min bala xwe dayê, em di rewşa bindestî û neserbestîya wan de gele tiştên baş dibêjin û dinivîsîn. Di gelek kovar û rojnaman de nivîsîn balkêş derketin. Lê, bi gelemeperî, gelek ji me, di jîyana xwe de ne wisa ne, ne wek gotinê xwe ne. Divê kîrinêne me jî, wek gotinê

me bin. Min ev çend pirsan, ji bo kêmâsiyêne me yên di vî warî de, zû ji holê rabin, nivîsîn.

**"Di Folklorâ Kurdî De Serdestîyeke Jinan"** ji aliyê "Weşanên Nûdem"ê, 1994, îsal hat weşandinê. Çapa wê pir sipehî û xweşik e. Pirtûk 153 rûpel e.

Pirtûk, bi pêşgotinekê dest pê dike. Rohat bi xwe pêşgotinê de, Rohat, qedir û qîmetekî gelekî giranbiha dide folklorâ Kurdî. Bala hemû Kurda dikişîne ku, hemû Kurd xîret bikin, folklorâ Kurdî binivîsînin û têxin kaset û filman ku, bila ev folklorâ bêhempa winda nebe, nehele û ji dest dernekeve. Rohat, tîne bîra me ku, teknik û nûbûna dinyayê her diçe tiştên folklorîk qels dîkin û ji holê radikin.

Rohat, dîsa qebûl dike ku, ev lêkolîna wî, ne tiştekî kûr û sînorfireh e. Lê, ev lêkolîn destpêk e. Ya rastî ji wisa ne, berê, gele Kurdnasen bîyanî û Kurd, folklorâ Kurdî berhev kirine, xizmetên gelekî giranbiha anîne cî, lê, li ser babeta jinan û folklorâ Kurdî, ya ku ez zanim, heta niha, tu lêkolîn-analîz çênebûne. Ji bo vê ji, lêkolîn her bi qîmet e.

Pirtûk ji çar beşan avabûye. Her beşê mezin ji, di nav xwe de, bi beşen piçûk ve hatîye beşkirinê.

Beşa yekemîn û mezin:

**"Stâneke Çîrokbejîya Kurdî: Xelasîya Jinan."**

Li vir, Rohat, bi kurtî qala çîrokên Kurdî dike û di nav folklorâ Kurdî de cîyekî mezin dide wan. Di van

çîrokan de, jin bi ci tehrî tênenîşandanê? Ji bo ku vê babetê analîz bike, ev beşê mezin ji parvekirîye. Para ewlin:

**Welatê Hat- Nehatê.**

Di vê beşê de ew çîrokên ku, mîr ji bo zewacê, "ew xwe davêjin nav agirêne mezin, ji bo jinan canê xwe didin" hene. "Ew kesan diçin derdikevin welatê dêwan, cinan...", "vegera wan ewqas ne hêsaye..."

Rohat, ji van welatên ku mîr bo jinê diçe re, dibê, "welatê hat-nehatinê." Mîna Çîyayê Qaf, Çîn, Maçîn... Di vê beşê de, mîsala çîroka "Herzemê Qolan" dide.

**Keçen Padîşahan**

Rohat, behsa, "gelek kesen şivan, gavan, kesen belengaz û xizan dike. Piranîya wan hewl didin, bi keça padîşah û paşan re bize-wicin" dike. Çîroka Mîrza Mehmed Mîmûd an Mîrza Mihemed jî mîsal daye.

**Cembera Dora Jinan Teng Dibe**

Di vê babetê de ji qala ew kesen ku xweyî jin in, lê belê dixwazin bi jinê dinê ve ji jîyana eşqê, bi dizî bijîn, haşîye kirin. Hinek ji wan padîşah, mele, terzî û vezîr in. Lê, di van çîrokan de, tiştên weha, yê tore û edeba însanan re nedurust in, tê pişkirin û bêrûmetkirin. Rohat, çîrokên, "Jin û Padîşâ, Jina Wezîr Ya Biaqil, Gulê û Çûko, Terzî, Keçelok û Qîzika Amûtam, Kû Meriv Bixwaze, Çavreş Lingan Diweşîne" bi mîsal analîz kirine.

**Motîfa "Keça Biaqil"**

Di bin vî navî de, qala "jinê zane, femdar, xebat-

hez, qenc, helal û rastgo" hatîye kirinê. Çîrokên, "Eloyê Newêrek, Silêmanê Newêrek, Mêrê Şevê, Qîza Serwest, Bûka Biaqil", wek nimûne cî girtine.

**Komên Jinê Xirab**

Di hinek çîrokên Kurdî de, jinêni bi xirabî ten naskirinê cî girtine. Wek "damarî, xasî, hêwî, jîntî, dayikên bêbav û dilkevir..."

Çîrokên "Tûdi Qûşî, Elik û Fatik, Pepûk, Sûrfeyar, Bûka Gulsûn, Mêrê Du Jinan, Gulançikzêrin, Mîrza Mehmed û Xûşka Wî, Gulê, Ava Heyatê-Sêva Xelatê, Bengîboz, Silo û Rehmo, Silqo, Bila Ew Nan û Mastê Xwe Bixwe..." hatine qalkinê.

**Jinê Destgiran**

Di vê beşê de qala "jinê ku bi kêri tiştekî nayê" tê kirinê. Çîrokên, "Mena Komekê Ji Gotî Hebe, Ardu, Riya Şixrê" wek mîsal in.

**Çend Çîrokên Jîyana Real**

Di bo hinek çîrokên Kurdî, "çîrokên rastî (real) têni bi navkirin. Di jîyana rojane de, ev bûyer li ser mirovan û li ser civatê re derbas bûne, wek neynika civatê ne..." dibêje Rohat. Çîrokên, "Sûto û Tato, Revandina Qereçîyekê" mîsal dide. Paşê, çend nimûne ji Aleksandr Jaba pêşkêş dike. A. Jaba konsoloşê Rûsyayê yê li Erzûrûmê bû. Sed û pêncî sal berê, li wir Kurdî hîn dibe, folklor û edebîyata Kurdî meraq dike û di vî warî de pir tiştan kom dike û dice Petersbûrgê. Ev tişt paşê têne çapkirinê. Hinek ji van, çîrokên Kurdî ne. Rohat, qala çîrokên heyştan, donzdehan û noz-

dehan dike.

### Jinê Rawirîn

Di vê besê de, Rohat, analîza Kurd, tebiêt û heywanan dike. Kurd bi heywan xweyîkirinê ku mijûl bûne, rawiran -heywan- di jîjana wan de cî kî giring girtfye. Rohat, van têkîliyan rind derdixe pêş. Di hinek çirokan de rawir hene ku, bi zêdetir pêwendiyê wan bi jinan re heye.

Çirokên, "Zewaca Qijik û Kevokê, Kund û Bilbil, Kêz Xatûn, Mar, Hemend, Sahmaran" hinek ji van çirokan in.

### Jinê Çirokî

Di çend çirokên Kurdi de, "jin hene tenê jinê çirokî û mîtolojîk in, ne meriv, ne jî rawir in." Rohat qala van çirokan dike û "Silêmanê Zindî, Meymûn Xanim û Mîrza Memûd, Şarûr Bilbil, Nêçîra Çiyayê Reş" jî wek nimûne nîşan dide.

### Tekoşîn Û Keftelefta Jinan

Rohat, çend nimûne dide ku, di wan çirokan de, jin bi xurşî dijî neheciyên li wan bûyî derdikevin, "şer dikin, ji alîkî de jî wek pêşgîn û rêber bi zanebûn û famdarîya xwe ve rê nîşanî mîran didin." Ev çend çirok nîşan didin ku, hertim "jin ne tebiê mîre."

Wek mîsal, çirokên, "Mêr Neşen Bibin Kevanî, Qirx Saçlıyê, Jina Bêter, Masîyêñ Bejî, Üsîfê Tenbûrvan."

Pâşê di pirtûka Rohat de, em têr besa duemîn a mezin.

"Di Gotinêñ Pêşîya De Analîzeke Zîhnîyetêñ Jinparêz"

Rohat, berê li ser gotinêñ

pêşîya disekeine. Rûmeteka mezîn dide wan. Di folklorâ Kurdi de, ji wan re, caran, "bendêñ pêşîya" jî dibêjin. Qala xebete Prof. Hecîyê Cindi, Ordixanê Celil û Celîl Celil dike û navê "Meselok û Xeberokêd Cimeta Kurd" dide.

Rohat, di vê besê de gelek pirsên giranbiha, wek nimûne dide. Ez nikarim di van rûpelên bi sînorkirî de wan bînim ser ziman. Lî, Rohat, ev gotinêñ pêşîya ji bes kirine. Bi dor, navê wan: "Jin Kanîya Jiyînê ye, Jin Wek Avakara Malê, Cîhê Dayîkan Tijî Nabe, Wekhevîya Jin û Mêran, Motîva Jina Baş û Jina Xirab, Salân Keçanîyê, Şerê Bûk û Xasîyê, Neçariya Jinebîyan, Protestoke Dijî Pirjinîyê, Jin û Namûs."

Beşa sêemîn a mezin:

"Di Destanêñ Kurdi De Berxwedan û Serdestîke Jinan"

Rohat, rewşa jinan, di destanêñ Kurdi de analîz dike, paşê, dibêje ku, "di nav van destan, serpêhatîyên bi nav û deng de em rastî serdestîke jinan têr, jin xwedî erk û berpirsiyár in, di hevsazî û pêşketina bûyerên van destan de roleke mezîn dilîzin, ew timê li dijî neheqî û bêdadîyê radiwestin, ber xwe didin..."

Ev babet jî, bes bi bes hatîye analîzkirinê:

"Di Destanêñ Kurdi De Struktura Bingehîn: Dijayetîya Sêserî"

Rohat bala me dikişîne ku, di jîjana evîndarîyê û romantîk de, di destanêñ Kurdi de gelek caran du keç

dilê xwe didin xortekî, an jî, du xort dibin dilketîyê keçekê. Sê kes di nav xwe de dixwazin pêş kevin. "Şêx Ferx û Hatûn Astû, Hesenê Mûsa, Memê Alan û Zîna Zêdan, Laz û Xezal" wek mîsal hatine nîşandanê.

### Dijiminê Du Dilan û Çar Çevan

Rohat, di vî warî de wilo dibêje; "bêbextî, nokerî, xayîntî, dilresî û fîlbazî wek element-motifîn negatif di destanê Kurdi de gelek caran dibin sedemîn bêmirazî û bêbextîyê."

Wek, hinek kes dikevin navbera dilketîyan û hevhezan. Yê herî bi nav û deng Bekoyê Ewan` e ku dikeve nav Memê Alan û Zînê. Di vê babetê de, destana Şor Mehmûd û Merzîngan jî tê analîzkirinê.

### Çend Keçperî û Pîrejin

Di hinek destanan de keçen perî an jî pîrejin hene ku alîkarîya însanan û dilketîyan dîkin. Di vê babetê de, Rohat, li ser wan jî çend pîrsan dibêje û di destana Memê Alan de, Tavbano, Hîvbano û Stêrbano mîsal dide. Di destana Sêva Hecî de qala keçen wek perîya, Gulçîcka Dilan, Pîra Miraza, Qîza Qenc dike. Ev hersêk di şaxîn cure cure de bi nav in. Destana Rustemê Zal jî wek nimûne tê gotinê.

### Jin Di Rêke Rast De Dimeşin

Rohat, di vê besa piçûk de, dibêje ku dûrdîtinîya jinan serdikeve û ew di rêke rast de dimeşin, şasîtîyê nakin. Memê Alan û Zîna Zêdan, Sîyabend û Xecê tê

analîz kirinê. Jin dibînin, xirabî ne tiştekî baş e û dawîyê de jinxasîyê nîşan didin. Di destana Ker û Kulik de jî, dîya Kulik jineka famdar, rastzanîn û dûrditî ye. Rohat, paşê qala destana Filîtê Quto dike, dîya Filît wek nimûne li pêş derdixe.

### Ji Bo Mêran Danîna Çend Merc Û Hoyan

Di hinek destanê Kurdî de çend kar û mercên mezin dixin pêş mîrân û paşê jinan didin wan. Di destana Sêva Hecî, Nasir û Malmal, Şor Mehmûd û Merzingan wisa ye.

### Çima Mêr Dikevin Rola Şivanan?

Rohat dibêje ku, "jin mîrkirinê bêdil û reva bi zorê tu wext qebûl nakin, sal derbas bibin jî, ew nedîşâ ne, dîsa jî li rîya xelasîyê digerin..." Destana Binefşa Narîn û Cembelyê Hekarê analîz dike. Di jîyana gundêñ Kurdan de, keç hertim bi şivanan hevdû dibînin û firseten wan heye ku xeber bidin û bi tev diçin bêriyê. Lewre, di destanê Kurdan de, ev pêwendî, pir caran haşye ser ziman.

### Sînorêñ Namûs û Bênamûsîyê

Di vê besê de destanê Zembîlfiroş, Ûsif û Zelêxe, Mem û Eysê hatine analîz kirinê. Di van destanan de sînorê namûs û bênamûsîyê nêzî hev dibin. Lî, dîsajî di destanan de temayeka bi edeb û însanî tê xuyanê.

### Nefreta Kontra-Mîlîter

Kurdan di jîyana xwe de ji leşkeran pir telî û dijwarf dîtîye. " Ji ber vê yekê jî, di folklora Kurdî de element û

motîfên kontra-mîlîter cîhekî bingehîn digrin" dibêje Rohat. Jin dijî esker û zordestîya wan derdikevin. Menşa Elîyê Selîm Axa, Salîho û Nûrê, Bişarê Çeto, Mehr û Wefa, Dimdim, Rustemê Zal, bi vî avayî hatine lêkolînê.

### Welatê Şahîyê: Eldorado

Di gelek destanê Kurdî de, xort û keç nagihêjin mirazê xwe û jîyaneka dijwarf dijîn. Lî, kêm be jî, hinek ji wan ne wisa ne. Hemû kes digihêjin mirazê xwe, dilşa dibin û " wek cenneteke derewîn- welatê xweşiyê, şahîyê (eldorado) timê mirov bi mirazê xwe şâ dibin..."

Destanê, Sêva Hecî, Behram û Gulendam wisa ne.

Em têñ bêşâ mezin a çaremin.

" Di Stranêñ Kurdî De Navçeka Erotîk: Memik"

Ev beşâ, berê di kovara Nûdem'ê, hejmara 4'an de hatibû weşandinê. Rohat, hinekî din li ser xebitîye û lê zêde kirîye.

Di stranêñ Kurdî de tema evînê û memikan bi taybetî ye. Rohat, dûr-dirêj li ser vê babetê disekine. Berê, wek " peyeke erotîk: Memik" serê beşê vedike, qala anatomî û fonksiyona memikan dike. Fonksiyona erotîk jî, yek ji van fonksiyonan e.

" Pêşkêsa Memikan, Li Dora Memikan Barîkatêñ Edebî Têñ Kişandin, Fonksiyonêñ Memikan Yêñ Duwemîn, Motîva Mêrên Ji Heqên Memikan Dernakevin, Navkirina Formêñ Memikan, Gîhîştina Memikan

Û Serhildana Wan, Guhastina Formê Memikan, Dizê Memikan Û Mücîzeya Vebûna Bişkokan, Cengê Li Ser Memikan, Çend Motîfên Dînî Û Memik, Peydabûna Tema Jinêñ Memikfiroş, tema yêñ bi serê xwe ne. Dûr û dirêj hatine lêkolînê û bi nimûne ew stran jî hatine nîvîsandinê. Ya rastî, lêkolînêka balkêş e.

Ji bo vê pirtûka Rohat, meriv dikare gelek tiştan bêje. Lî belê, ez niha vê zehmetîyê dikişînim. Sebebê yekemîn, min ku ev pirtûk xwend, min bi xwe jî dixwest ku ez hê zêde hîn bibim. Lewra ez nikarim bêjim ku, min bi çavekî rexnevani lê nihêri. Lî disajî ezê çend dîtinêñ xwe pêşkêş bikim.

Cara ewlin li ser folklora Kurdî, bi vî tehrî lêkolîn tê kirinê. Wekî hemû tişten nû, kemasî hebûn, tiştekî tebî ye. Ji bo Rohat jî wisa. Lî, ya girfing ew e ku, Rohat, pêwîstbûna van babetan rind fêhm kirîye; ez bawer im, di rojêñ pêş de, ew ê lêkolînêñ her giranbiha pêşkêşî civatê bike.

Rohat divê qebûl bike ku, kûraya lêkolînê ne gelekî zêde ye. Di hinek ciyan de me hîşyar dike, bala me dikişîne, lî, ji wê zêde pêş de naçe. Wek, " Keçen Padşahan, rûp, 11", kesen feqîr û xizan dixwazin bi keçen padşahan û paşan re bizewicin. Meriv dikare bifikire ku, keçen dewlemen- dan' tê armanc kirin. Em bixwazin û nexwazin jî, di vê babetê de, gerek " mesela çînî-sinîfî-" bê xeberdanê. Gelo, vê dîtinê bi ci tehrî

tesîr li ser jîyana jina kîriye? Bi ya min, Rohat, gerek çend pirs di vî warî de bigota.

Yekê jî, Rohat dikaribû, her zêde li ser zewaca bêdil biskeine, taybetî li ser hêla cîvatî û ruhîyetê.

Gelek Kurd, dema ku tiştekî dinivîsin, bi bêxwestina wan, Tirkî, Farisî an jî Erebî, him di fikirandinê de û him jî di struktura gotinan de, bibê nebê xwe nîşan dide. Wek nivîsên me hemûyan min bîhna vê realîteyê di pirtûka Rohat de jî hilda.

Rohat û ez em hevnavçeyîne. Zaravê Qersê, Qerekosê hinek ji cîyên din cuda ye. Me hemûya hela hê ev zaravê navçeyî ji xwe dûr nexistîye. Ev ji tiştekî normal e, hewcedarîya zemanekî dirêj dixwaze. Min ev tesîr jî di pirtûkê de dît. Ev herdû dîtin, tiştekî li ser me ferz dike, divê em di nivîsarên xwe de hê jî bi dîqqet bin û bi zanebûn pêşîya van kîmasîyan bigrin.

Di destan û stranan de hinek gotin gundî û xelqê çawa gotîye, wisa jî hanîye nivîsandinê. Ev rast e. Lê, Rohat bi xwe jî ew gotin wek gundîya û xelqê kar hanîye, ev ne rast e. Wek, rûp. 10. "Husil Cemal, Husil Delal." Di çîrokan de wilo ye. Lê, di nav rêzên ku Rohat bi xwe dinivîse jî, bi vî tehrî ne, ya rastî gerek ' Husn-u Cemal, husn-u delal' bibûya. Ev ne Kurdi ne, eslê wan Erebî ye. Dixwazim bêjim ku, zimanê îlmî gerek ne mîna zimanê gundîya be, ziman bi vî tehrî pêş de naçe û serrast nabe.

Wek van, di xeberdana

xelkê de, hinek herf kêm bûne, jê ketine. Lê belê, di zimanê nivîsandinê de, gerek ya rastî bê karanîn. Wek, min di pirtûka Rohat de dîtin:

Awa nameşe Awha  
nameşe (Rûp. 16)

Carke din Careka din  
(Rûp. 16)


Pêli damara Pê li  
damara (Rûp. 16)

Bal Liba  
(Rûp. 17)

Cena -  
(Rûp. 17) Kûrdên Erîvanê vê  
pirsê kar tînin, ji Tirkî pirsa  
(çetin) tê, li tu cî Kurdistanê  
bi kar nayê.

"... teyrê dewletê tê serê  
wê rûdinê." (Rûp. 17.) Teyr  
rûnanê, teyr 'dañîn'.


Ev tiştên awha, ne awqas  
in, min wek nimûne nîşan  
da. Lê, ev kîmasîyan, ji gi-  
ranbihayîya pirtûkê tu tişti  
kêm nakin. Meriv zimanê  
Rohat baş fêhm dike û  
bêzehmet dixwîne.



**GARDIYAN**, Bûbê Eser,  
di nava Weşanên Roja Nû de  
derketiye. Li ser rewşa  
girtîgeha Diyarebekrê û  
îşkenciyê wê ne.

Navnîşana xwestinê:


G.Väg. 186 A, 161 36  
Bromma/ Sweden



### LI WIR LÊVÊN KEVIRAN ÇÎK DIDIN

Pirtûka şâtrê kurd Husêñ Hebeş ya nû ye. Ev pirtûka  
nivîskarê Nûdemê yê berde-  
wam Husêñ Hebeş, ji 58 hel-  
bestan pêk hatîye. Giraniya  
helbestan li ser welatheziyê  
û rewşa Kurdistanê ye.


Dikare ji navnîşana  
Nûdemê bête xwestin.



**SIWARÊ EŞÊ**, Fawaz  
Husêñ, ji neh çîrokan  
pêkhatiye û di nava  
Weşanên Welat de derke-  
tiye.

Navnîşana xwestinê:  
Box: 41 23, 141 04 Hud-  
dinge/ Sweden

# Smirnoff



## Xelîl DIHOKÎ

D ema yekem kurteçiroka Hesenê Metê ketiye ber çavêن min, hîngê yekser, baweriyeke mukum ji bo min çêbû ku ev heval, xwedî behreke (mewhîbe) bilind e. Lê dema pirtûka wî (smîrnoff) ronahî dît û gihîşte min, piştî xwendina çirokan, ez gihîştîm baweriyekekê ku ev berhemâ hêja ye ku mirov li ser binivîse. Hêviya min ew e, ku bikarim nivîskariya wî bisengînim. Her çend yekem kurteçiroka kurdî, di sala 1913 'an de di kovara Rojî Kurd de, ji aliyê Fuadê Temo ve belav bûye û paşî yên Nûredîn Zaza, Qedrî Can û hindekên din jî, di kovarê Ronahî Hawarê de belav bûne, lê ya modern ku ji aliyê form û naverokê ve, guherînê bingehîn bi ser de hatîn, li ba me bi kurmanciya jorî, di van bîst salêن

dawiyê de, bi germî hatiye qada edebiyata kurdî.

Pirtûka Hesenê Metê ji çardeh kurteçirokan pêkhatiye û hêvînê pirraniya wan, rewşa civatî, siyasi û pisikolojî ya kurdêñ derveyî welat e. Mirovê kurd yê ku ji kultureke paşketî hatî û pirr tiştîn nû dibîne. Pirr caran nikare xwe digel biguncenît, yan jî

beramber hinek karêñ ku nizane, xwe bi şarezâ û pispor nîşan dide û ev jî dibe egera peydabûna giriftarî û serêşîyan. Hesenê Metê şarezayetiyeke baş di civata Ewrûpa de heye û zîrekane kariye biçe nav giriftarî, bîr û bawerî û jiyanâ rojane ya xelkê. Ew desnîşana çendin giriftariyên welatî û vêre jî dike û me jî agehîdarî çendin xalêñ giringen civatê dike.

Di çiroka (Nivîskarî) de, xortekî kurd bi kar û barê nivîsinê ve mijûl e. Jiyan , jin û zarokêñ wî jî, bi tenê nivîsne û ne çi dî, bi şev û roj li ser masê dînivîse, bê ku demeke kurt jî bide jin û zarokêñ xwe ku, wan jî kesê xwe li vê xerîbiyê nîn e. Lê ne wî behre heye û ne jî bihayê nivîskariyê dizane! Mixabin ev karê gelek kesa ye. Bi rastî nivîskarî, ne tiştîkî hêsan e û ne jî tenê dem û serekê tena divê. Lê nivîskariyê, behre, rewşenbîrî, têgehiştin û zanîn, taqet û şayanê bilind, dem û serekê tena divê. Lewre her kes nikare bibe nivîskarekî rasteqîne. Lê ev çende ne tiştîkî taybete bi milletê kurd ve, belku; di nav tevaya milletê cîhanê de rûdaye û heye. Belê; raste ku, bi sadan kes

dînivîsin, lê çenda ji wan karîne nav û dengê xwe peyda bikin û berhemêñ jêhatî biafrînin! Lewre pêwîst e mirov xwe binase û bizane ka heta ci pileyê behre û şayanê wî hene û bi hinek berhemêñ lawaz û bêserüber, xwe neke lêbok û pêtirrankê xelkê. Belê; li vêre Hesenê Metê divê bigehe sê armancêñ girîng. Yek ew e bide xuya kirin ku, nivîskarî ne karê her kesekê ye. Ya duyê jî ew e ku, jin û zarok berpisyariyeke mezîn in, carna dibe asteng, nemaze eger xêzan(Jin û zarok) erk û bihayê nivîsinê nizanibe. Ya sê jî ew e ku, li vê xerîbiyê xwendevanê kurd mîne û giriftariyê çap û belavkirinê jî gelek in. Rast e nivîskariyê, demekê dirêj û serekê tena divê. Her wisa, dibe jin û zarokêñ nivîskarî jî, di welatên pêşketî de asteng bin. lê ji aliyê din ve jî, jin û zarokêñ wî jî pêdivî wî ne. Belê; li vêre giriftarî dest pê dike. Di civata ewrûpî de, hemî mirov, ci jin û ci mîr, xwedî mafêñ xwe yêñ taybetî û gişî ne. Anku li vêre, jin nîva civatê ye û ya ji bo mîrî dibe, ew ji bo jinê jî mafeke. Lê di civata kurdî de û her wisa di tevaya civatêna paşketî de, jin ji gelek mafêñ xwe hatiye bêbêş kirin. Ew bi tenê ji bo karêñ malê, xudankirina zarokan û dilxweşkirina mîrî peyda bûye! Ji ber vê çendê jî, dema jin ji neçarfî bi hemî ferمان û sitema civata kurdevariye razî dibû, ew li vêre bi wê çendê razî nabe û civata pêşketî ya ewrûpâ jî vî mafî didiyê. Lewre eger

mîr baweriyê bi vê rastiyê neîne û her li ser yeka xwe ya welatî be, hîngê, bêgoman ew dê toşî gelek giriftariyên mezin be û nimone jî pirr in. Belê; li welatên paşdamayî, jin nikare beramber mîrî rasteste û jê ra bêje, ev dibe û ev nabe. Lê li vir, jin ji aliye aborî ve ne pêdivî mîrî ye, ne jê ditirse û ne jî ji dor û beren xwe şerim dike. Gişt maf di destê wê de ye û kes nikare rê lê bigire. Lewre ew pirr bi hêsanî dikare ji zelamî re bêje: Pere yên me hemâ ne û tu nikarî bi keyfa dilê xwe bi mezîxî. Tu nikarî pirraniya şeva li kolanên bajêrî bigerî û me bi tenê di vê zîndana mezin de bîhêlî. Tu nikarî hemî gava dar û çîvî xwe li ser serê me bihejînî. Ev hemî mafê jinê ye û divê mîr razîbe. Çend ji bo xwe bivê, hind jî, ji bo jinê bivê, çinku herdu mirov in. Lewre jin bi hêsanî dikare ji mîrî xwe re bêje: "Na welle, xwe vedisiye! Sibê heta êvarê di binê qula xêni de mexel dikeve, ji rûniştinê kurmî dibe, kurmî!... nizane bi keçikê re bilîze, peyivîna bi min re jî ji bîra kiriye." (Rûpel 29-30) Rast e, giriftariyên nivîskarekî serketî, di welatekî pêşketî de, gelek in. Pêdivî demeke dirêj û serekê tenaye. Lê ew dikare pirogramma jiyana xwe çêke û bi çavekê bilindir temaşeyî jin û zarokên xwe jî bike, çunkî di vê xerîbiyê de, ew jî bi tenê ne. Erkên nivîskarî gelek in. Lewre divê ew ala hilgirê pêşketina civata xwe be. Mîna Nazim Hîkmetî gotiye: "Divê mirov, xwe bişewitîne da ku ronahiyê bide xelkê din." Ev e ji

aliyekî ve û ji aliye din ve jî, xerîbî û derbederiya mirovê kurd bi giştî û ya nivîskarê kurd bi taybetî, karekê xirab li ser psîkolojiya wî dike. Çinku ew ji bo xelkê dinivise û pêdiviye xwendevanê wî jî hebe, lê mixabin, li vê dûriyê û vê tenhayîye, ne xwendevan heye û ne jî bi hêsanî berhem têne çapkirin." Ez dinivîsim lê, lê nuhabihata çapkirin, xwendevan hebûya û bixwenda..." (Rûpel 32). Hesenê Metê bi germî li ser rewşa Felemerz radiweste û bi gelek riya jê re dide xuya-kirin ku, nivîskarî ne karê her kesî ye û li dawiyê bi aşkerayî dibê: "Ez dibêm, li mala xwe binêre. Pêwîst nake ku tu bibî nivîskar. Anku ne karê te ye." (Rûpel 34). Lê mixabin ew serhişk e. Ne guhê xwe dide peyvîn Hemreş û ne jî, bi pîlana jinikê dest ji nivîsinê berdi-de. Li dawiyê "rûkenî li rûyê xatûnê vemirî" (Rûpel 35) û dilê keçkê jî pirr êşîya.. Mirovên nezan û di nav civatên paşketî de jî, nikare zû bîryarêna rast û dirust bide. Lewre pirr caran toşî giriftarî û serêşîya dibe û ji civatê jî, dûr dikeve.

Gelto, xortekî kurd e û wisa xuya ye ku baweriyekê mukum, bi welatên sosyalist heye. Her çend wî ew welat ji nêzik, nedîşîne, lê her çi tişte guh lêbît, yekser baweriyê pê tîne. Ev e jî rewşek xirab ji bo peyda dike. Lewre pirr caran mirovên wilo, xelet di meselan digihê û ji bingehêna rastiyê dûr dikevin. Hesenê Metê, divê vê bide xuya kirin ku, di welatên sosyalist de jî,

kêmasî hene û karêna xirab û baş jî rû didin, herwek di welatên sermayedar de jî hene. Herdu cîn mirovin û milletên wan ji, ji çendin çînên civatê pêkhatîne. Belê; mirovî wisan, roleke baş di civatê de nabîne û wek Bebegayê, çi tişte jê re bête gotin, yan guh lê bibe, yekser dubare dike. Rast e, ev çende di nav mirovîn siyasi de mişebû û heta digehîste wê pileyê ku, bira û hevalen, bîr û bawer, ji hev cuda, sera ku, Sovyet, sosyaliste yan jî revizyonîst e, ji hevdu bienirrin û dilê hevdu jî bîhêlin. Ev ê çendê jî karekê negatîf dikire ser doza kurdî jî.

Çiroka Smîrnoff, çend aliyeen jiyana Celto xuya dike ku ew nimûneke di civata kurdî ji aliye kî ve, mijûlkirina wî bi çendin rengên xwarinê ve û mezaxtina pereyekê zûr ku, ev e di bawerîyê mirovîkê sosyalist de, ne gelek pêwîst e, çinku erkân gi-ringtir hene, ji aliye kî din ve jî, dijayedîya gişt karêna heta eger baş jî bin welatên sermayedar. lê ew bi xwe nizane ku Vodka ew vedixwe, ji Emrika hatiye û ew bi xwe jî li welatekî sermayedar dijî û dibe bi perên wan jî, jiyana xwe, bi rîve dibe.

Di civata kurdî ya paşketî de, jin ji cîhaneka tarî hatiye yeka tarîtit. Jin ji mîrî kêmter e û çi bihayê xwe nîne, belku; wek bûkeçûşekê ye tenha ji bo xizmeta mîrî hatiye ser rûyê goka zemîn. Ev çende jî, di gelek çirokênen Hesenê Metê de reng dide. Lût, qaremanê çiroka (Zewac), li derveyî

welatî dijî. Navsal e û porê serê wî jî weşyaye. Xuyaye piştî bûye sikrab(çı tê nemaye!) dixwaze jinekê ji xwe re bîne. Eger ew li welat ba, dibû keçeka li gor dilê wî bi dest neketiba, lê ez ci li şansê keçen rindên welatê bindestî û hejariyê bikim, ew neçar in bi cenabê Lût razî bin. Di kultura kurdî de, mirov yek keçê ji xwe re dixwaze, lê cenabê Lût, berovajî xelkê, ew pêncan ji xwe re destnîşan dike. Her çend ew li gor pirinsibê '11 ayînî, dikare çaran, ji xwe re bîne û mercen ayînî jî, bi hêsanî, tîne berhevkinir, lê dîsa, wî niha yek divê!! Lût, pênc wêneyêن xwe yên cihê, ji pênc keçen welatî re dişîne. Ne wî keçik dîsîne û ne jî keçik bi bejna wî şâ bûne. Ya girîng ji bo wî ew e ku, keçek ji welat bête hinartin, nexo ne xem e, wî nas bikin û di sinc, rewuşt, dîstin û bûçûnên wî bigehin ji xwe ev mesele nayê bahskirin û ji bo xortêñ kurd li welatî jî, astengaka mezin e. Her

wisa ew jî wan nas nakek, lê dibê ji zaroktiyê hindek ji wan dîtibin, yan jî salodanêñ wan ji bo wî hatibine vegêran. Bi rastî ev nişanê mirovê lawaz û paşdamayî ye. Mirovê ku çendîn sal e li welateki ewrûpê dijî, di nav wê şarristaniyetê de jiyanê dibe ser, bi vî rengê kirêt hizir bike û pîlanêñ genî jî darêje.

Belê; Hesenê Metê, zîrekane ev nimûna mirovê bêaqil û mejîhişk destnîşan dike. Ew naçte di nav giriftariyê de û wê şirove bike, lê ew hefsarê qaremanê xwe berdide û aza dike. Çewan

hizir dike, wesan xuya bike û nimûnêji vî rengî jî di nav civata me de mişene. Aşkeraye ku vê çendê derdekkî giran ji bo jina kurd ya reben, peyda kiriye. Bi rastî pir pêwîst e, bi berdewamî li ser vê rewşa kambax bête nivîsîn, çinku giriftarî û astengêñ mezin ji bo civata kurdî bi giştî û ji bo jin û mîrêñ kurd bi taybetî peyda dike. Dema çîroknivîs, behsa qaremanekî dike, mebest ne tenê miroveke di nav civatê de, belku; mebessta girîng ew e ku, ew kes bi çîneka milletî ve girêdayiye û destnîşana kesen nezan û kalfam bike û her wisa jî, li dijî rewuşt û ittalîn kevin, kirêt û ne jêhatî raweste, çinku ew baş dizane ku, ci astengin di riya pêşketina millefi de.

Her çend Xalê Çeto, di mîzgeftê de, ci tîr nekiribûn jî, lê dîsa Sofî yê tirrken ew gunehbar kir. Belê; di civatêñ pêşketî de, ev girêye bi çendîn riya tête çareserkirin û bi hêsanî bersiv peyda dibû, lê di civatêñ paşketî de, bersiv xencer e. Belê; bi hezaran cara, kiryarêñ wisan bê biha bûne sedemîn giriftarî û tengavîyêñ mezin, di nav binegal û eşfran de.

Bi vê çîrokê Hesenê Metê, pirr bi dengê xwe hawar dike:" Bila adet û rewuştîn kirêt binaxbin. Bila derdê nezanînê ji nav milletê me rabe.

"Di çîroka(Roja Pirozwer) de, Hesenê Metê, perdê ji ser rûyê jina kurd a paşdamayî radike. Ew jina nezan û gundî a bi sedan sala, di bin desteseryê û zulma civatê de

dinale. Divê xebateka gerim ji bo pêşdabirina wê bête kirin. Ev e jî ne tenê karê jinê bi xwe ye, belku; erkê mîrê kurde jî. Lê mixabin, pirraniya mîrêñ kurd dixwazin ku, jin her di rewşa bindestiyê de bimînin, çinku sûd û misfayê wan tê de ye. Ev jî paşmayêñ civata fiodaliye ku, hêşta di mejiyê mîrê kurd de maye û naxwaze xwe jê rizgar bike. Hesenê Metê, divê vê bide xuya kirin ku, rewş ne bi tenê di destê mîrî de ye, belku; fere li ser jinê bi xwe jî, xebateka gerim bike û giriftariyê xwe çareser bike. Lewre ew bi navê xwîşka Şîlan dibêje:" Ez dizanim ku anuha dîsa li derekê erzanî çêbûye û hemûyan berê xwe dane wir, an jî li dîra taxa hember xwarineke bêpere tê dayîn loma... Ez bi xaxêñ jinêñ me dizanim!.. Mîrê xwe dixapînîn, peran jê distînîn û pê ji zend û singê xwe re zêran dikirin. Ma ne gundiñ ne! Ci ji wan tê payîn!.. Ji tiştîn wisa re çavêñ xwe çar vedikin, lê...çiqas heyf e ku rojêñ weha pîrozwer jî tew ne li ser guhêñ wan e!.." (Rûpel 79 80) Belê pirr caran heval hene, gazinda ji hindê dikin ku, jina kurd paşdamayî ye, lê ji bir dikin ku, ev ne bi tenê gunehê jinê ye, belku; ya kultura kirêt û çepel û astengêñ din e. Belê; pirr kes hene peyvîn mezin davêjin û behsa dîmokrasî, sosyalîzim û mafêñ jinê dikin, lê ew bi xwe jin û keçen xwe, di nav çar diwarêñ xêñ de, girê didin û nahêlin ronahiyê bi dirustî bibînin. Lê ez bawer dikim ku, rewşa jina kurd wisan

namîne û dîrok jî ne erebe ye bo paş ve biçit, belku; hemî tişt ber bi pêş de diçe.

Pirr caran dema mirov çîrokeke Hesenê Metê dixwîne, yekser mebest û armanca wî dizane. Ev jî ne ku xaleke lawaz e, belku, rewşa naveroka çîrokê, ji wê çendê zêdetir hilnagire. Lî di gelek çîrokan de jî, mebestên veşartî hene û vekirina dergehêن gîrş û ladana tem û mijiyê li ser berhemî, erkê rexnegirê şareza ye ku, xwendevanî bigihîne mebestên nivîskarî.

Di çîroka (Râbiff) de, du xorten kurd digel du hevalen xwe yên, ewrûpi diçine xwarin gehêkê. Ew baş bi zimên jî nizanin û dema lista xwarinê tê, da ku xwe bi nezan nîşan nedin, ew li gor şansê, destê xwe li ser yekê datînin, lê dema xwarin tê, xuyaye ku, goştê xav e ew ji bo mirovekî kurd, tiştekî entîkeye, çinku goştê xav li cem me nayê xwarin. Lî ji ber ku xorten me naxwazin xwe bi nezan û bêageh nîşan bidin, lewre bi neçarf dixun û paşê vediresin û hetka xwe jî dibin. Belê; pirr caran biyanî toşî giriftariyên wisan dibin, lê mixabin ji ber nezanîn û nefamiya xwe, qûretî û rihbilîndiya xwe, rastiya xwe vedîşerîn. Gelek caran hinek mirovên me, dema digel ewrûpiya gêngesê dikin, wisan xwe didine nasîn ku, em milletekî xwedî rewuşt û adetên jêhatî ne û teknolojiya li hemî deverên welatê me heye. Em pêşketî ne û xwedî medeniyet in. Rast e, dijimnan rê li pêşdeçûna me girtîne, lê bila em ji bîr nekîn ku,

hêsta feodalîzim di nav me de maye û sera giriftariyeka biçûk, bi sedan kes hevdû di-kujin. Çira em ji kêmasiyên xwe bitirsin. Heta em destnîşana hele û kêmasiyên xwe nekin, em pêşnakevin. Ya girfing ew e ku em ji bo pêşketina xwe xebat û bizeveke gerim bikin. Tevaya milleten cîhanê di qonaxen em tê de, derbaz bûne û gîhane şarristaniyeta nuha. Me di destpêkê de xuya kiribû ku, hêvînê pirriya çîrokên Hesenê Metê, li ser rewşa kurdên deriveyî welat in û babetên hinek çîrokan nêzîkî hev in, pê nevêt em li ser hemûyan bipeyvîn, lê tiştê giring ew e ku, Hesenê Metê çîrokniviseki xwedî behreke bilind e ûtaqet û siyanen wî cihê rêzen e. Berhemên wî ji aliye form û naverokê ve biserketî ne û pirtûka wî, qulaçeve vala ya pirtûkxana kurdi kurmanciya jorî pir dike.

Her çend hinek kêmasiyên biçûk di nava çîrokên wî de hene, wek bi karanîna pironavan, kom û peyvîn zêde mîna: Ez û wî, em bi hev re... (Rûpel 11) Ya rast ev e: Ez û ew, em bi hev re... Bi kurtî her tiştîn wan xweştir e. (Rûpel 15) Ya rast ev e: Bi kurtî her tiştîn wan xweştir in. Lî bi rastî jî tu êdî pîr bûye. (Rûpel 62) Ya rast ev e: Lî bi rsatî tu êdî pîr bûyi.

Lî disan zimanê wî, sivik û xweş e, niqteşanî bi ciwanî bikar anîne, hevokên xwe rîk û pêk darêjtîne, hewil daye bi kurmanciyeke paqîj û petî binivse. Ew hinde caran bi teknika kevin ve girêdaye û rengê vegêranê bi kar anîye, lê pirriya

çîrokên wî, bi teknika modérin, monolog û dialog, paş û pêşxistina demî û zincîra rûdanî, heta dawiyê bi hev re girêdayî ye. Her wisa pirr zîrekane kariye qaramanen xwe bide peyivîn, ne ku gundiye kî zimanê mamostayekî û ne jî, jineke zana wek yeka nexweden van. Ew bi zanabûn giriftariyan pêşçav dike û serkeş bûye tê de, çinku Çexof dibêje: "Ne fere li ser nivîskarî ku, giriftariya çareserker, belku; erkê wî yê bingehîn ew e ku, wan berçavket."

Li dawiyê ez hêvîdar im, Hesenê Metê, berhemên jêhatîtir biafrîne û min bawerî bi behre û şîyanen wî heye.

## BIBE ABONEYÊ NÜDEMÊ!

Her abonetiyeyeke Nûdemê ji bo ava kirina edebiyata kurdi alîkariyek e, tu jî vê alîkariyê bike, bibe aboneyê Nûdemê!

Nûdem ji bo geşkirin û bipêşvexistina ziman û edebiyata kurdi bi biryar e, lê bêî piştgirî û alîkariya te nabe, bibe dostekî/dosteke Nûdemê!

## KURD Û MÎTOLOJÎ



Lokman POLAT

Destpêka Mîto洛jîyê ji dîroka antîk, ji dema Barbariyê dest pê dike. Wek tê zanîn di dema Barbariyê (dema kevnare- dema qedim) de nîvsandin tûnebû. Gelên wê demê tiştên ku di serê wan de derbas dibûn—ku ew dem dema tarîtiyê, dema tirs û xofê bû—nesil bi nesil ji hev re bi gotin qal dikirin. Bûyerên mîto洛jîk bi vê tewirê hat taa dema ku hendi medeniyet bi pêş ve çû û xwendin û nîvsandin derket meydanê. Bi pêşveçûna şarîstaniyê ve bûyerên Mîto洛jîk ku bi gotin dihaatin zanîn, hatin nîvsandin.

Di hêla Mîto洛jîyê de mirov dikare bibêje ku gelên Kurd û gelên Grek, yên herf dewlemend in. Hinek mîto洛jîyê Kurdan ji aliye Firdewsî ve di pirtûka wî ya bi navê "Şahname" de hatiye

nîvsandin. Firdewsî Îranî ye. Nivîskarê Kurd Şerefşan ji hinek mîto洛jîyê Kurdan ku di pirtûka xwe "Şerefname" de qal dike, têt gotin ku ji ber pirtûka Firdewsî girtiye.

Firdewsî, hinek mîto洛jîyê Kurdan kiriye malên gelên din, kiriye malê Ereban an jî malê Farisan. Firdewsî di "Şehname" xwe de weha dibêje: «Di çolê de egîtek hebû. Mirovekî bi qedir û qîmet bû. Adîl bû, di hêla alîkariye de mezin û bi rûmet bû. Navê wî Merdas bû.... Ew mirov Padîşah bû... Xwediyê bi hezaran heywanên çar ling yên ku şîr ji wan dihatin dotin bû. Yêñ ku hewcedariya wan bi şîr hebû, wî di cî de ew daxwaziya wan dianî cih.... Li wê derê hespêr rewan, yên ku pirr baş dibeziyan, hespêr Ereban hebû..»

Ev cihêن ku Firdewsî qal dike Zagros in. Firdewsî, her wek ku ew der Erebîstan e û Merdas jî Ereb e, qal dike. Têt zanîn ku hespêr Ereban bi hezar salan e ku di destê Kurd, Faris û Asûriyan de jî hebûne. Firdewsî, weha dom dike: «Ev mirovî ola wî pak, kurekî wî hebûye. Wî ji kurê xwe pirr hez dikir. Navê kurê wî Dehak bû. Zarokekî ku xuyê wî pirr pis bû.... Rojekê şeytan xwe kir şiklê mirovekî baş û hat cem Dehak.... Gotinêن Şeytên bi Dehak xweş hatin. Gava Şeytên dît ku wî Dehak bi xwe ve girê da ye, pirr kêfa Şeytên hat.... Şeytan ji Dehak xwest ku bavê xwe bikuje û di şûna wî de ew bibe padîşah.... Şeytan jê re got; ger tu guhdariya gotinê min

bikî tu ê li cîhanê bibî padîşah.... Paşê Dehak wek Şeytên kir û bi Şeytan re bavê xwe kuşt û taca padîşahiyê a Ereban kir serê xwe..»

Firdewsî, Dehak wek padîşahêن Ereban dide danasînê. Di vir de baş tê xuyakirin ku, di wê demê de, di nav Îranê û Ereban de nakokî hebû. Ew li dijî hevdu bûn. Loma jî Firdewsî, Dehakê zâlim dike Ereb. Cemşid jî dike Faris. Yanî Dehak Ereb e û yên ku li dijî wî derketine Îranî ne. Lê, li gor dîrokê Cemşid kralê—an padîşahê—Farisan nebûye, kralê Gutî'yan bûye. Gutî jî pêşiyêن, an jî bapîrêن Kurdan bûne.

Çiroka mîto洛jîya Dehak dirêj e, ez li vir naxwazim qala hemûyî bikim, lê ez ê bi kurtî vê bibêjim; hinek nivîskarên berê, yên kevnare, mîto洛jîyên gelekî ji gelekî din re kirine mal. Mijara vê nîvisa min ne ew e ku ez rexneyek dûr û dirêj li pirtûka Firdewsî bigirim. Ez dixwazim pirtûka "Mîto洛jîyên Mezopotamyâ"yê bi xwendevanan bidim naskirin.

Ev pirtûk, pirtûkek pirr muhîm û bi qîmet e. Mîto洛jîyên ku di pirtûkê de ne, ji nîvisa nameya bizmarî hatine wergerandin. Wek tê zanîn, medeniyeta cîhanê ji Mezopotamyayê dest pê dike. Gelên din nîvisa bizmarî ji Sumeran fêr bûne. Destpêka îlmên girîng—

wekî Matematik, Geometri, Medicin(TIP) û Astronomî di Mezopotamyayê de hatiyê danîn.

Ji bo zanîna li ser Mîtolojyên Mezopotamyayê, divê ev pirtûk miheqeq bê xwendin. Pirtûk 88 rûpel e. Tê de şes(6) wêneyên Mîtolojîk yên dema qedim heye. Nivîskarê pirtûkê Edward PETİŞKA'yê Bulgarî ye. Nivîskar û wergervanê Kurd Cemal BATUN pirtûk ji zimanê Bulgarî wergeran-diye. Pirtûk di nav weşanên APEC de hatiye weşandin. Cemal Batun bi wergera vê pirtûkê karekî hêja kiriye.

Di pirtûkê de, nivîskarê pirtûkê Edwar Petışka heft rûpel wek pêşgotin li ser Mezopotamyayê nivîsandiye. Pêşgotinek pîr balkêş e. Ev pêşgotin di kovara NÜDEM hejmara yekem de hatibû weşandin. Cemal Batun jî pêşgotinek sê rûpel nivîsandiye. Cemal di pêşgotina xwe de weha dibêje:

«... Mezopotamya û iro Kurdistan. Ev Mîtolojî ji Mezopotamya digihîştin roja me û di nav nijadên li vir jiyayî, tenê Kurd iro wekî neteweyekî ji hezarên salên dîrokê ve, xwe digihandin roja me. Ji bo bibin xwediyê mîrasê Mezopotamyayê.»

Di pirtûkê de çar Mîtolojî hene.

Mîtolojiya yekem; "a ku tê de tê gotin, ku çawa xwedaya Mezopotamya Îştar peyayê cîhana din bûye."

xwedayî ne."

Mîtolojija duyem; "a ku tê de tê gotin, ku çawa xwedaya Mezopotamya Îştar peyayê cîhana din bûye."

Mîtolojija sêyem; "a ku tê de tê gotin, ku çawa Mîrê bajarê Kîş ê Mezopotomî-Etana, bilindî ezmanan bûye."

Mîtolojija çarem; "a ku tê de tê gotin çawa Mîrê Mezopotamya- Gilgameş li nemirîbûnê geriya ye."

Li vir, tişte balkêş ev e. Grekî jî li hersê Mîtolojiyên dawî xweyî derdikevin. Navê Îştar û Etana di nav Mîtolojyên Grekiyan de pîr derbas dibe. Grekî li wan xwedî derdikevin, wan dikin yên xwe. Navê paytextê wan Athen, ji kralîça mîtolojîk Etanayê tê. Grekî li Mîtolojiya Gilgameş jî xweyî derdikevin û dikin yên xwe. Kurd jî li Mîtolojiya Gilgameş xwedsî derdikevin. Navê Gilgameş bixwe navekî Kurdi ye. Gilgameş, bi mana Gamêşê mezin e.

Wek min di pêsiy vê nivîsê de jî nivîsandibû; Ev pirtûk, pirtûkek bi qîmet e, xweş e û pîr balkêş e. Di hêla dîroka Mîtolojiyê de pirtûkek dewlemend e. Divê bê xwendin!. Ez nivîsa xwe bi gotinê nivîskarê pirtûkê ve girê didim û dawî lê tînim.

«Ew kesê ku bixwaze li ser dîroka kevnare agahdar bibe, bûyerên wê dema herî kevin bizanibe, berê vê pirtûkê veke û bixwîne.»

**ZEND**  
Kurda Enstituya Kurdu



Kovareke nû bi navê "Zend" ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Stembolê ve derket!

Birêvebirê kovarê yê giştî Şefîk Beyaz e û redaksiyon jî ji Şefîk Beyaz, Raîf Yaman û Felat Dilgeş pêk tê.

Di hejmara pêşî ya vê kovara sêmehî de giraniya nivîsan li ser zimanê kurdi û problemen zimanê kurdi ye.

Nivîsên nivîskarêni; F. Huseyin Sağrıç, Felat Dilgeş, Jemal Nebez, Baran Rizgar, İsmet Şerîf Vanlı, Malmîsanij, Torî, Rojhat Azadî û Firat Cewerî hene.

Navnîşana Xwestinê:  
**Tarlabası Bulvarı,**  
No: 128, Beyoğlu/  
İstanbul/Turkey

## ROMANEKE SOSYO PSİKOLOJİK



### ROHAT

**E**v cara pêşîn e ku romaneke Kurdi pêwendiyêن civat û mirovan bi tehrekî vekirî awa fireh radixe ber çavan. Hesenê Metê wek formekî edebî navê vê berhema xwe *novel* daniye, ev peyva Latînî di zimanê Ingilîzî de tê maneya romanê, di gelek zimanê mayîn de tê maneya kurteçîrok (serhatî, hikaye). Lê belê ev berhema ji 196 rûpelan pêkhatî zêdetir dişibîne romanê û bîna romaneke nûjen jê tê. Ev romana Hesenê Metê berî çend mehan li Stockholmê, di nav Weşanê Welat de bi navê Labirenta Cinan derçû.

Di romanê de serpêhatiya mamosteyekî cîh girtiye ku gundî bi ayîn, merasim, gîlî û gotin û kirinê xwe ve, wî dîn dikin an jî bi gotina nivîskar hişê wî "çelq"

dikin. Civateke ku ji çend gundiyan pêkhatî çawa em dibînin jiyana vî mamosteyî serobino dike û wî hildide bin bandûra xwe. Ji ber vê yekê jî, ev berhema wek romaneke sosyo-psîkololjîk dikare bê hesibîn.

Berî ku em li ser romanê bisekinin, ji bo ku mesaja romanê bê zelalkirin pêwîst e em peyva *labirent* piçekî vekin û koka wê bikolin. Ev peyva ji latînî tê û serpêhatiyeke wê ya mîtolojîk jî heye. Angorî mîtolojîyê rojekê ji *Mînos re heywanekî* beden mirov û serî boxe çêbûye. Mînos ji bo ku vî heywanê hov û bi tirs têxe cîhekî û vesêre, ji mîmarên xwe hêvî dike ku avahîyeke taybetî çêbikin. Paşê ji vê avahîyê re labirent hatîye gotin. Ev avahîya li girava Gîrîtê hatîye çêkirin. Pişti vê mîtolojîyê peyva labirent bi taybetî ji bo cîhê tevlihev û riya derketinê lê tune ye, hatîye bi kar anîn. Peyva labirent ji der vê maneya xwe ya yekemîn, ji bo dijwarî, tengasî, tevlihevî û problemên giran jî tê bi kar anîn. Di romanê de ev peyva bi vê maneya xwe ya duwemîn hatîye bi kar anîn.

Di romana Hesenê Metê de civat û pêwendiyên cikavî ji bo mamoste Kevanot (mîrxasê romanê) hêdî hêdî wusan giran dîbin ku, êdî demek tê ji wî re tu riyek xe-lasiyê namîne, di bin vî barî de diperpite. Ew gundê ku Kevanot lê mamosteyî dike, ji bo wî dibe labirentek, nikare ji nav derkeve, hejmara "kuçan", "kolan" û "çivanan" her

diçin lê zêdetir dibin, ew her diçe li xwe vedigere. Di romanê de peyva labirent tenê di cîhekî de derbas dibe û peyva devê Gebranê Baço derdikeve yê ku enînîvîs, serboriya wî û Kevanot gelek nêzîkî hev in. Gebranê Baço li vî mamosteyê nûhatî şîretan dike û bala mamoste dîksîne ser labirent, sergêjî û gêjgerînênu ku li vî gundi hene.

Roman bi xebera hatina mamoste Kevanot ve dest pê dike û hatina wî di nav gund de zû belav dibe. Ew û jina xwe Nêrgiza koçer bi "kevnetexsî" ya xwe ve tê vî gundi zêde nenaskirî. Nivîskar Hesêna Metê navê vî gundi di romanê de nade. Di destpêkê de gundi vî mamosteyî wek "kesekî dilovan û baş" bi nav dikin, bi vî awayî wî bi nazikî û kubarî "teslim" digrin, paşê jî êrisî wî dikin : "...kî tê gundi me, tasek ava gundi me vedixwe, ji me xirabtî dibe". Di destpêka romanê de Kevanot wek mamostekî îdealist ne tenê zarakan, wusan jî dil heye û dixwaze alîkariya gundiyan bike û wan jî biguhînê, bi vê hewas û bi vê kula dilan tê vî gundi. Di dawiya romanê de çawa em dibînin, vê carê civat li ser wî dibe barekî giran û wî di-guhîrîne, bi gotineke mayîn, wî difetisîne, çitî-çitî dike, davêje ber dîwarê dibistana gund.

Cara pêşîn di derheqa vî gundi de yê ku xof, tirs û saweke mezîn dîbarîne, Kevanot agahdarî û zaniyariyê fireh ji devê soffî, pîremêrekî gundi û Sêvdinê

Selîm dibîhîse. Ew, bi xwe jî ne ji vî gundiye, ji Serhedan hatiye li vî gundiye cîwar bûye. Ev

pîremêr qala Sofî Dîno dike ku yek ji wan avakarê wî gundiye bûye û nav daye. Kevanot di derheqa avakarê vî gundiye de tiştên baş nabihiye.

Pişî demekê vê carê mameste Kevanot rastî kesekî xwendekar tê, navê wî Gebranê Baço ye, "fakulta edebiyatê" di nîvî de berdeya û niha jî tividareka xwe dike ku ji vî gundiye bar bike, ew û diya xwe dixwazin herin cîhekî mayîn. Berî ku here pirtûkeke nîvmayî wek destnîvîs dide mameste Kevanot. Di vê destnîvîs de malen vî gundiye yek bi yek têna nasandin, nivîskar Hesenê Metê ev navan bi Jimare di romanê de cî kirine (mal 1-mal 16) û nasandina van malan beşekî romanê yê bingehîn pêk tînin. Bi alîkariya van notan, mameste Kevanot bi kurşî be jî di derheqa gundiye vî gundê "navdar" de dibe xweyê çend zaniyarî û agahdariyêng bingehîn. Çawa tê xuyan ev mal û endamên van malan bi sedan êş û janêniwan hene. Ev destnîvîsa bêguman hin tiştan di hişê mameste Kevanot de bi cîh dike. Ji aliye din ev notan an jî "pirtûka nîvhîşti" ji bo wî dibe dokumenteke bîntengiyê. Ev not xem, keser, kovan û êşen wî zêde dikin. Bêîmkaniyêng dibistanê, mirina zaroka wî û çend tiştên mayîn jî vî mamos-teyî gelek diêşînin û dihejînin.

Lê belê tiştên ku jiyana mameste Kevanot ji binî ve

tarî û reş dikin ne tenê ev in. Vî gundiye çawa em dibînin bi dirêjahiya salan ji xwe re gelek efsane, ayîn, merasim, gîlî û gotin li hev anîne, ji xwe re çandeke mistik û sofîtiye afirandije. Bi taybetî goristana gundiye, di nav goristanê de *Mekanê Mala Dînan* ji bo vî gundiye hem cihê xof û tirsekê, hem jî cîhekî wek ziyyaretke pîrozî. Gundiyani li ser van cihêng pîrozî gelek tişti ji ber xwe derxistîne û xwe spar-tinê, ji ber van taybelî û rûçikan, navê vî gundiye "Gundê Dînan" jî derketiye. Ew gîlî û gotinê gundiyan wusan tîr, tûj û fireh dibin, êdî guhê mameste Kevanot hem hêdi hêdi qul dikin, hem jî mameste mecbûr dimîne van riwayetan dike guhar, dixe guhê xwe. Ji aliye din jina wî Nêrgiza Koçer jî dibe hedefê van riwayetan, ew jî di bin bandûra gotinêng gun-diyan de dimîne.


Êdî çawa em dibînin mameste Kevanot angorî gundiyan, angorî kirin û gotinê gundiyan gavêng xwe davêje, teslimî wan dibe. Tu însiyatî û giranîke wî namîne. Gavêng xwe êdî bi fesal davêje, ruhiyeta wî her dije ber bi xirabûnê dije, pêwendiyêng xwe ji civatê dibire, şas û metel li ber dîwarê dibistanê bi rojan matmayî dimîne. Nîşanêng bêfesalî, kêmpeyivînê, kar-nekirinê, êrîşkarî û gelek tiştên mayîn yên neçê lê peyda dibin. Ew, her ji civatê direve û civat jî her bi ser wî de tê, bi vî tehrî çembera li dora wî her dije teng dibe. Mameste per û baskê xwe ji dinê diweşîne, gotinê gundiyan yên ku mirovan "dîn" dikin jî têna guhê wî. Êdî demek dibuhire vê carê Kevanot hem civata ku ji van gundiyan pêkhatî

dijmin dibîne, hem jî qet tiştekî nahesibîne. Êdî çawa em dibînin tu rîyeke xela-siyê ji mameste Kevanot re namîne, jiyan ji wî re dibe labîrentek, ev begê romanê bi hêsanî navê romanê tîne bîra mirovan. Di dawiya romanê de hem zenda gundiye, hem jî zenda xwe gez dike, xwe di nav xûnê de dihêle. Ëş, jan û kedera wî wusan zêde ye, bi vê xwînberdanê mirov dikare bêje ku ew ji xwe re li "rîyeke xelasiyê" digere, dorberê wî, rewşa gundiye ji vê yekê re gelek dest dide.

Romanâ Labîrenta Cinan nîşan dide ku civatek wek aşekî dikare gelek bi fesal û bi pergâl mirovan hêdî hêdî bihêre, bike pînekî, bavêje alîkî. Hesenê Metê serobînobûna jiyana vî mamos-teyî ji destpêkê heta dawiyê bi hostatî di romana xwe de hûnandiye, bi taybetî ew tehluke, mesaj û gotinêng ku ji aliye civatê de hatine afirandin gelek baş qefandiye û ditiye. Erîşkariyêng civatê ji hêسابûnê ber bi giranbûnê çawa beş beş lod bûne, Hesenê Metê ev prosesan li hev neqelibandine, di romanê de her proses dora xwe dipê. Bi kurtî Hesenê Metê zêde tevî bûyeran û kirinêng mîrxasên romanê nebûye, gotinêng mîrxasan di devê wan de nahêle an jî wek nivîskar niyet û dîtinêng xwe tijî devê mîrxasên romanê nekiriye, mecal û ümkanên mezin ji wan re peyda dike, angorî meş û herikîna jiyânê, wî bi fesal bûyeren romanê bi hev ve girêdaye, hevsaziya bûyeran ji cihê xwe neleqan-diye û nelivandiye. Ji ber vê hostatî û zelalbûna zimanê nivîskar, mirov dikare bêje ku ev romana delal xwe dide xwendinê.


# Pênc Pirtûkên Nû yên Weşanxaneya Pencînar

**XWENÇE CILD VI**  
Ev pirtûk weke her pênc



cildên pêsiya xwe pareke hindik e ku Zeynelabidin Zinar çend mist ji deryaya Folklorâ Kurdi hildane; ji navâ xelkê dave hev û mina pirtûk çap kiriye. Pirtûk ji du besan amade ye. **Beş-I:** a) Stiranên têkel, b) heşt stiranên evin û evindariyê. **Beş-II:** a) *Serpêhatiya Mîr Mehîmûdî Mîrê Cizîra Botan*, b) 19 meselok, c) 14 meselokên rawilan (fabî), d) 14 çirokên kevnare. Pirtûk 266 rûpel e, 13,5 x 21 cm. ye û ji kaxezekî spîgewî çebûye.

**XWENÇE CILD VII**  
Ev cild ji, her ji babeta wan şes cildan e. **Beş-I:** a) Du-



wazde Stiranên Dîrokî, b) 42 Stiranên Evinî û yên Gelêri. **Beş-II:** a) Ses meselokên cihêawê, b) *Serpêhatiya Kerrû Kulîkû ya Sêxê Sen ãnt*, c) Heft çirokên kevnare ku bi awa û tewrine dilşad hatine pêşkêskirin. Pirtûk 280 rûpel e, 13,5 x 21 cm ye ûjî eynî kaxiz çebûye.

## XWENDINAMEDRESE

Ev yekemîn car e ku pirtûkek wiha li ser medreseyen Kurdistanê hatiye nivîsandin. Z.Zinar, tê de rewsa wê sazgehê, xwedîkirina mele û feqîyan û ew 89 pirtûkên babecûda ku dihatin xwendin bi nav û nîşan nivîsiye. Pirtûk 100 rûpele û 12,5x19cmye.



## KADÎNA MIŞKAN

Ev pirtûk Çtroka Abîde Şkeftê ye ku Z. Zinar wê berfirehtir honaye û pê vêjeya çanda kurdi dewlemendir kiriye. Dema keçâ Paşa Rojava (Stenbol) ji kurê Paşayê Rojhilate (Diyarbekir) re anîne, di rê dê dawetvanî çûne navâ xazbaxçeyekî da bîhna xwe berdin. Lê ziyayekî maran xwe li hawidore baxçê gerandiye û nehêlay ku ew derkevin. Ziye xwestiye ku zava were û here jê re şûre Abîde Şkeftê bîne da xwe pê bikuje. Zave naçar maye û çûye li du dînyayêni bi teşqeleye geriye, piştire çûye dînyaya sisiyan ku

bê teşqeleye bûye û sûr anîye. Ew ziye xwe pê kuştiye û mi-

Zeynelabidin Zinar  
**KADÎNA MIŞKAN**




PENCİNAR  
WEŞANXANEYA ÇARDAK KÜNYE

rovekî sax ji zikê wî derkeviye. Pirtûk 144 rûpel e û 11,5x19cmye.

## BALAFIRA JÎNE

Ev pirtûk ji bi naveroxa xwe, ji babeta *Kadîna Mişkan* e; Kurê paşayekî li kerkerokê bayê siwar bûye û firiyaye riya xweşâkiriye çûyeli bajarekî biyanî daniye Li wir xwe kiriye lawê pîrekê. Piştî ku ew çavnas bûye, îcar keça qiralê bajêr revandîye. Lê wan di rê de hev wenda kiriye. Îcar keçikê xwe xistiye şûfê zilaran. Piştire ew bûye qiralê bajarekî din u hêj Kurê Paşê ditiye. Pirtûk 132 rûpel e û 11,5x19cmye.



Navnişana Xwestinê: Box 3088, 161 03, Bromma-Stockholm-Sweden.

# XELATA NÛDEMÊ YA EDEBIYATÊ

Heta niha nêzîkî deh çirokan ji bo pêşbaziya Nûdemê ji me re hatine. Piraniya çirokan ji Sûriyê hatine, hinekên wan jî ji Swêdê ne. Em bi xemgînî dibêjin ku li gorî pîvanên çiroka navneteweyî, çirokên ku ji NÛDEMÊ re hatine geleki qels in. Me nikaribû ji nava van çirokan sê çirok ji bo xelatê hilbijartina. Ji ber ku li ser gelek çirokan ji naznavekî pê ve tiştek tuneye, em nikarin bi xwedîyên wan çirokan re têkilyê deynin. Em tika dikin, yên ku ji me re çirok şandine û nav û navnîşana xwe nenivîsîne, ji kerema xwe re ji Nûdemê re binivîsin, da em li ser çirokên we agahdariyê bigihînin we û ew perçeyê ku me ji bo xelatê diyar kiribû, li we deh kesan belav bikin.

Em dixwazin li vir diyar bikin ku wê Xelata Nûdemê Ya Edebiyatê berdewam e, lê bi awayekî din. Wê jûriya Nûdemê ji salê carekê, pirtûka ku di salê de derketiye û qîmeta wê ya ziman, edebî û hunerî bilind e, xelat bike. Ji bo vê yekê jî em ê di hejmarêñ pêş de di nava rûpelêñ Nûdemê de agahdariyê bigihînin we.

## BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

Ger hewesa te li ser helbest, çirok, roman, rexne, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sînema û hwd hebe, pêşniyareke me heye; bibe aboneyê NÛDEMÊ!

Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya herçar perçeyêñ welêt haydar bibî û edebiyata dînyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwîne, dîsan bibe aboneyê NÛDEMÊ!

NÛDEM dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe aflatî, tu jî aflatîya wê bike, bibe abone!


Ez dixwazim ji avakinîa edebiyata kurdî re bibim aflatî. Ji kerema xwe re mîn bikin aboneyê/ aboneya NÛDEMÊ.

Ji bo Swêd salekê 190 Kron, welaîn din 39 Dolar.

**Nav û paşnav.....**

**Navnîşan.....**

Vê karta jor dagirin û kopiya wê li ser navnîşana Nûdemê bişînin. Çer ku ew bigihîje me, em ê NÛDEMÊ di gel karta abonetiyê ji we re bişînin.



NÜDEM

No 10 1994